

KOVARA LÊGERÎN Û LÊKOLÎNÊ

# B Î R

ARAŞTIRMA-İNCELEME DERGİSİ



Institut kurde de Paris

KOVARA LÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

# BÎR

ARAŞTIRMA - ÎNCELEME DERGİSİ

Institut kurde de

**B Î R**

KOVARA BÊKOLÎN Û LÊGERÎNÊ

# BÎR

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

**Ji Sê Mehan Carekê Tête**

**Weşandin**

**Ûç Ayda Bir Yayımlanır**

**16ê Tebaxa 2007**

**Bûha: 10 YTL**

**BÎR Reklamcılık -Yayıncılık**

**Sahibi ve Sorumlu Yazışleri**

**Müdürü:**

**Mehmet KONUK**

**Redakte:**

**Roşan LEZGÎN**

**Seîd VEROJ**

**Remezan PERTEW**

**Tîprêzî-Mîzanpaj: BÎR**

**e-mail: kovarabir@yahoo.com**

**kovarabir@hotmail.com**

**Şertên abonetiye**

**Bo nêva welat salek 30 YTL**

**Bo derveyê welat salek 80 \$**

**Çapxane/Matbaa:**

**Barış Matbaa Mücellit**

**Davutpaşa cad. Güven Sanayi Sitesi**

**C. Blok No: 274, 275, 276**

**İST/Topkapı**

**Tel:(0212) 6748528-29**

**Ciyê Rêvebirinê/Yönetim Yeri:**

**İnönü caddesi Magül İş Merkezi**

**No: 49**

**Dağkapı /DİYARBAKIR**

**Tel: (0412) 2287828**

**Berpirsariya her nivîsê yê nivîskar bi xwe ye.**

**Mesuliyetiya her nûsteyî ê nûstoxî bi xo ya**



## NAVEROK - İÇİNDEKİLER

### **Remezan Alan**

Mexdûrê Serdemekê ..... 7

### **Tahsin SEVER**

Serokê Komîteya Îstîklala Kurdistanê (Azadî) Mîralay **Xalid Begê Cibrî** ..14

### **M. Şefîq ONCU**

Kurdperwerekî Sînornenas: **Necmettîn Buyukkaya** (1943-1984).... 30

### **Îbrahîm GUÇLU**

Ji Bo Mela Ebdulkerîm Kurdistan di Ser Her Tîştî re Bû ..... 46

### **Tosinê Reşîd**

Qanatê Kurdo (KÛRDOYÊV) ..... 66

### **Nezîrê CİBO**

İhsan NURÎ PAŞA (1893-1976) ..... 75

### **Yaşar KARADOĞAN**

Her Zaman Cesur, Her Zaman Şair, Her Zaman Kavgacı Bir Dava  
Adamı Ya Da Tarih Şifrecisi Olarak **Orhan Kotan** ..... 89

### **V. BİRSİNÎ**

Kürt Kelimesinin En Çok Yakıştığı İnsan: **Hemzeyê Muksî** ..... 111

### **İbrahim Küreken**

Ferit UZUN ..... 131

### **Tosinê Reşîd**

Hecîyê Cindî ..... 146

### **Dr. Selah Mihemed Selîm Hirorî**

Ebdurrezaq Bedirxan (1864-1918): Jîyan û Têkilîyên Sîyasî ..... 153

### **Îbrahîm GUCLU**

**Edîp Karahan:** Rewşenbîrekî Têkoşer, "Mirovekî Bi Tenê" û  
Dozkarê Kurdistanê ..... 172

**Abdurrahman Demir**

Hapishanedeki Edîp KARAHAN ..... 187

**Seîd VEROJ**

Kesayetîyeke Îdealîst û Rêxistinkar, Şoreşgerekî Çalak:

Dr. Fuad (1887-1925) ..... 191

**Şakir EPOZDEMİR**

Hecî Musa Begê Xwêytî û Seîdê Nuh Begî ..... 197

**Ebubekir Çelebi**

Qedrî CEMÎL PAŞA ..... 204

**Mele XALÎD**

Fehmî Firat Kî ye? ..... 211

**Arjen ARÎ**

Yê Ku Peyv Ji Ezman Daxist Erdê: CEGERXWÎN ..... 218

**Fehîm Işık**

Hostayê Peyvan: Şêx Eskeriyê Axtepî ..... 223

**Ahmed ARAS**

Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê ..... 228

**Roşan Lezgîn**

Îxtîraseke Bêfesal ..... 245

**Ehmed Qerenî**

ŞEBEK: Lêkolîneweyekî Mêjûyî - Komelayetî - Zimanewaniye .... 253

**Sait Pektaş**

Kürd Aydınlanması ve DDKO Gerçeği ..... 264

**Nezir ŞEMMIKANLI**

DDKO Süreci Ve Düzce Olayı Üzerine,

Ali Beyköylü'nün Belirlemelerine Cevap ..... 287

Pirtûkxaneyê Ehmedê XANÎ ..... 215

## Pêşgotin

Xwendevanên hêja, careke dî kovara **BÎR** bi naverokeke dewlemend û mijareke nû digîje ber destê we. Dosyaya "*Danasîna 100 Navdarên Kurd*" bi vê hejmarê dest pê kir û dê bi hejmarên din berdewam bike. Wek mînakên di vê hejmarê de, hûn jî dikarin bi nivîsandina *navdarên bênav* hejmara wan zêdetir bikin. Bîranîn û nivîsandina van kesên kedkar û fîdakar, yek ji wezîfayên me yên dîrokî-neteweyî ye û her wiha, rêzgirtina me ya ji bo cenabê wan e. Bibîranîn û nivîsandina jînenîgarîya van kesên kedkar û fîdakar ên dîroka me, peywira me ya dîrokî û neteweyî ye. Lewre ew her yek li gorî xwe, di warê xwe de beşdarê pêvajoya afirandina komelgeh û dîrokeke hevçerx bûne û di vê rê de findekî ronîdar bûn di şevistanên tarî de. Xwezî bi wan kesan ku jiyana xwe di nav tarîtiyê de nebihurandin û xwezî bi wan kesan ku niha jiyana xwe bo neteweya xwe dikin findekê û ronîyê li hawirdora xwe belav dikin.

Dîroka mirovahîyê gelek rengîn e. Di serê mirovahîyê re gelek tişt derbas bûne. Ew tiştên ku di serê mirovahîyê re derbas bûne, ne mumkin e ku ji aliyê tu dîroknaşî ve bi tevayî bête îzehkirin. Yanî mirov dikare gelek vekirî bibêje ku jiyana mirovahîyê tu demê di pirtûkan de bi tevayî cih negirtiye. Di dema globalîzm û civata zanyarî û dema teknolojiyê de jî her çiqas jiyana mirovan, jiyana neteweyan, jiyana dewletan, jiyana rêxistinan, jiyana jin û mêran, jiyana ciwanan gelek bi firehî di mêjiyê teknolojiyê de cih bigre jî, derfet tune ku hemû jiyana li ser kaxîzê cih bigre.

Ev rastiya hanê hem jî bona kesan û hem jî bo nasandina mirovekî her wisan e. Fîlozof dibêjin, mirov û kes hê jî hemû aliyan ve nehatine keşîfkirin. Ji bona vê, mirov û kes, bi gelek aliyên xwe ve û bi gelek taybetmendiyên xwe ve hê nayêne naskirin. Lêbelê ji bona ku mirov bête keşîfkirin û bête naskirin hewildaneke xurt û meroqeke gelek balkêş heye. Ji bona vê jî mirov û kes bi gelek taybetmendiyên xwe ve tîn kategorîzekirin. Wek mînak: Mirovên dîrokî, mirovên navdar, mirovên zana, mirovên bawermend, mirovên xwenda, mirovên hunermend, mirovên xwedî doz û hwd...

Di nava van kesayetîyan de kategoriyeke heye ku ne ji bona xwe û ji bona malbat û zarokên xwe, lê ji bona welatê xwe, ji bona neteweya xwe xizmetên giranbiha kirine. Ew, berjewendiya netewe û civata xwe, di ser her berjewendiyekê re girtine. Ji bona ku neteweya wan azad bibe, welatê wan rizgar bibe, wan her tiştî dane ber çav û fedekarîyên bêemsal kirine. Lewra ew kes baş dizanin ku dema neteweya wan azad bibe û welatê wan rizgar bibe, qedr û qîmeta mirov, netewe û welatê wan bilind dibe û her wiha berjewendiya malbata wan, zarokên wan, bajar û gundên wan, şexsê wan jî tîte parastin, ew jî bi qedr û qîmet dibin.

Ji bona vê, heger ew kes nebin, ji wan kesan rêxistin û dezgeyên neteweyî

ava nebin, ew netewe û ew welat nakeve rêza neteweyên dinya û dîrokê; cihê xwe yên bi qedr û qîmet di jiyana mirovahîyê de nagrin.

Her miletek û civatek bi xebat û fidakariya dozkarên ve azad û rizgar bûye. Li gorî bîrûraya hinekan “dîrok, tevger û têkoşîna gelan e”. Li gorî bîrûraya hinekên din jî, “dîrok, têkoşîna mirovên dozkar û zanyaran e”. Destkevtiyên demokratîk û civakî-neteweyî jî, di encama têkoşîn û pêşengiya lehengên fikrî û mirovên dozkar de ava bûye. Heger ew kesên dozkar nebûna û xebata wan ya bê hempa nebûna, mirovahî, bi gelek aliyan ve bi pêş nediket û her dem mirovahî mehkûmî xeraban, mehkûmî rêjîmên xwînxwar û barbar dibû. Dinya û mirovahî, diket bin desthilatiya mirov, sistem û rêjîmên dîktatorî ve.

Neteweya kurd jî xwediyê dozkarên xwe yên gelek hêja û bi navûdeng e. Di dîroka tevgera miletê kurd a nêzik de, dîroka me ya destpêka sedsala bîstan de ew pêşeng û serokên Têvgera Serîhildana Kurdistanê Bakûr, bê gengeşî dozkarên miletê kurd bûn: Wan kesan canê xwe fedayî miletê xwe kir, hatin îdamkirin û hatin qetilkirin. Gelo heger Mela Mistefa Barzanî, Seyîd Ebdulkadir, Şêx Ubeydula, Qadî Mihemed, Şêx Seîd, Seyîd Riza, Xalid Begê Cîbrî, Yusif Ziya yê Bedlîsî, Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa, Bavê Tujo, Dr. Fuad, Hemzeyê Muksî, Erebe Şemo, Evdîrezaq Bedîrxan û bi hezaran kesên wek wan, wek dozkarê neteweya kurd xebat nekirana û canê xwe fedayî Kurdistanê nekirana, neteweya Kurd li hemberî êrişên mêtinkaran dê çawan li ser piya bisekiniya û Kurdistan dê çawan li ser rûyê dinyayê bimana? Di sedsala 21. de neteweya kurd, dê çawan di jiyana Rojhilata-Navîn de cîyekî girîng bigirta û kolonyalîstan bitirsandana?

Ji bo nîfşên nû yên gelê kurd û raya giştî ya dinyayê re herçî xebata danasîna rewşenbîr, pêşeng, dozkar û navdarên kurdan in, ev jî sê aliyan ve girîng e: Yekem, em hem li hember nîfşên keddar û berhemdarên beriya xwe û hem jî li hember nîfşên li pey xwe mesûl in. Lewra hebûn û rewşa me ya heyî, li ser ceribandîna, berhem, fedekarî û xebata yên beriya me de hatiye avakirin. Ji ber vê yekê, divê em jî ceribandîna û zanayî û keda yên beriya xwe bi yê xwe re bikin yek û bigehînin nîfşên li pey xwe. Yê duyem, danasîna jiyan, berhem, şexsiyet, fikir û raman û fealiyeta van navdaran dê ji nîfşên nû re bibe modêlekî xwenasîn û rênişandana ji bo pêşerojê. Û ev jî dê bi wan re bixwebawerbûna netewî-civakî peyda bike. Sêyem, li rûyê dinyayê de hîç miletek bê manewiyat nîne, naskirina ev kesayetiyên di heman demê de qewîkirin û zêdekirina manewiyata miletekî ye. Her wiha em baş dizanin ku gelek millet bo vî yekê jî xwe re şexsiyetên xeyalî jî çêkîrine. Lewre nasîn û danasîna şexsiyetên wisa arşîv û referanseke bingeîn e ji bo hafîzaya kollektîv ya neteweyan.

Bi hêviya hevdiîtina hejmareke nû ya **BÎRÊ**, di nav xêr û xweşiyê de bimînin.

# Mexdûrê Serdemekê

Remezan Alan

Li ser jiyana û şexsiyeta Erebe Şemo heger senaryoyek were nivîsandin, baştir e filma wî ji çar beşan pêk bê. Lê mirov dikare li gor naveroka berhemên wî, weke îroniyekê, beşa dawî jî wek berdewamiya ya diduyan bibîne û filmê bi sê beşan sînor bike. (Ez ê sedemê vê agahiya reng giriftar pişt re bibêjim; em niha hîmê beşa yekê daynin.)

1897-1924

Lehengê filmê, li gundekî Qersê - Azad/Sûsîz- di maleke feqîr û rêncber de çavên xwe vedike. Di mala (ya rast "merek") hişk û biring de pênc kes in: Bav, dê, du xwişk û du birayên ji jina bavê wan a ku serî daniye. Bav, havînan şivan an gavan e; zivistanan jî xulamê xwediyê mereka ku tê de ne. Dê, di malên halxweş de nanopêj e,



**Erebê Şemo(wêne kovara W)**

hirîşo ye. Zaro jî, ku bihar û havîn be, li çolê dûajoyê bavê xwe ne, pincarçîn

in; ku zivistan be, ji bo xwegermekir-  
inê di tewle û axuran de li ber afirê  
hesp û gamêş û dewaran in...

(Hin kîteyên din ên vê kesîbiyê,  
hûn dikarin ji romana *Şivanê Kurd*  
bixwînin.)

Dema ku Erebi dikeve temenê  
yazdehan, li gundekî -Melegan-  
xulamê malbateke rûs e. Piştî şeş salên  
dî (1914), li heman gundî, (dema bavê  
wî îcar gavanê vî gundî ye û ew ji  
dergevanê dibistana wê ye), xwendin û  
nivîsan -din dibe qismetê wî. Bi xêr û  
zordayîna mamosteya dilrehm û qîza  
wî Marûsyaya delal, (belkî di nav hes-  
tên xwişk û biratiyê de, belkî di nav  
yên florteke bêguneh de) Erebi êdî  
şagirtêkî jîr e. Lê rewşa dinyaya ku  
berê xwe dayê herbeke giran jî ne baş  
e; lewma Erebi vê carê li gundekî din -  
Axdas- xulam e. Feqîrî, malbatê tarû-  
mar dike: Birayê mezin Bro dev ji malê  
berdide, diçe gundekî din dibe şivan da  
ku bi zikekî têr bijî û birayê din Derwêş  
jî di nav pencên nexweşiyekê de dihele  
diçe.

Gava Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest  
pê dike, bi xêra zimanê rûsî, Erebi di  
artêşê de berdevkeki bi meaş e; lê di van  
rojên oxilmê giran de dema ku du-sê  
caran xelkê herêmê xelet rê nîşan didin,  
qumandar bi şika sixûriyê lê têne xeze-  
bê û meaşê wî jî nadinê.

Wisan bêtalîh e, evîn, ev hesta herî  
insanî jî, di postê hûtekî rastî wî dibe:  
Dema riya wî li gundê meta wî -  
Qiznefer- dikeve, li wir dilê wî dikeve  
metê, Karê\*. Bavê qîzê Şêx Sefo, bi 150  
manat (banqînot), bi hepsêk û tivingek

\* Di romana *Şivanê Kurd* de ev kes Gulê ye û Şêx  
Sefo jî Seîdo ye.

qîzê dide Erebi, lê pişt re poşman dibe;  
bi Erebi re dikeve xirecîreke mezin, ta  
ku tivinga Erebi bêhemd di dest de dite-  
qe û Şêx Sefo dimre. Karê jî diçe, qelen  
jî...

Dîsa heman rê devê xwe jê re  
vedikin: Erebi, cardin di artêşan de geh  
berdevk e, li cem malbatên halxweş  
geh xulam e. Û li vê erdnîgara ku her  
roj sînor û xwediyên wê diguherin, ji  
bal efendiyekî bar dike cem yekî din.  
Serboriya wî û hînbûna zimanên  
efendiyan\*\* dibe yek.

Serdem jî serdema feodalîzmeke  
pûç e. Ji xeynî şerê giran û mihacirîya  
devtûj, mêtinkariya kevneperest jî li ser  
hukm e. Piştî karker, gundî û  
belengazên wekî Erebi Şemo, di bin  
barê xerc û bacan de (pêşkêş, teşîr,  
bêgar, maledû, baca dextlê, baca  
koçeriyê, xerca begitiyê...) xûz e.  
Lewma di çekirina riya-hesinî ya  
Erziromê de dema rastî bolşevîkan tê û  
bi riya pirtûkan fikrên wan dinase, tê  
de qalibekî hazir ji nefreta xwe ya li  
hember kûlakan (beg/axa) dibîne. Erebi  
êdî wekî pêşengekî di nav karker û  
gundiyan de dixebite, ta ku di mîtinga  
li Sariqamişê ya li dijî Çar de tê girtin.  
Dema piştî çendekî tê berdan, tevlî  
"artêşa sor" dibe. Li eniya şer, di nav  
hurmequrma germ de dimîne. Di vê  
man û nemanê de, li şerê bi qazaxan re  
sê caran birîndar dibe, li nexweş-  
xaneyê radikeve, li wir tê girtin û rastî

\*\* Feraseta wî ya zimanzanîne, şayanî teqdîrê ye;  
wî heft ziman dizanibû: Rûsî, ermenkî, gürçîkî,  
azerî, tirkî, yewnanî (hurunî) û elmanî. Ez wisa  
bawer im, ji bilî elmanî, van zimanan tev wekî hew-  
cebûna karê xwe ji mecbûriyetê hîn bûbû. Lewma  
ew ziman têkiliyeke nejidil jî temsîl dikin.

êşkenceyan tê... Di vê navberê de bavê wî ji aliyê leşkerên osmanî ve bi lêdanê hatiye kuştin û diya wî ya ku revîyaye çûye Elegezê cem xwişka xwe, di xelayê de serî danîye.

Qareyên dijwar ên vê beşê, bi serkeftina bolşevîkan re dawî dibe. Vê demê Erebb, 27 salî ye.

## 1924-1937

Rengê vê beşê ronak e, şer û pevçûn cihê xwe dane aramiyê. Tê de pêûs, rojname, institû, devlikenî, xebat û elbet rengên sîstema nû hene. Erebbê Şemo, her wekî li pey heyfa salan ketibe, pêşî Institûya Lazarevskî ya li Yêrîvanê dixwîne, li ser rojhilatnasiyê dibe pispore; pişt re Akademiya Zanistî ya li Lenîngradê doktoraya xwe temam dike. Di wan salan de bi Hovsêp Orbelî û Qanatê Kurdo re li ser kurdzaniyê dixebite; di sala 1929an de bi Îshak Maragulov re elîfbayek ji bo kurdî<sup>1</sup> amade dike. Di sala 1930an de xebateke sereke dike ji bo rojname-


<sup>1</sup> Di amadekirina vê kurtejiyanê de min gelek fayde ji kovara "W'yê (Kovara Wêjeyî Çandî Hunerî, Hejmar 15, Tîrmeh-Gelawêj 2007) dît ku derbarê Erebbê Şemo de dosyayeke hejra amade kirine. Lê di vê dosyayê de jî dîsa halê me yê tevlihev xwe dabû dest. Wek nimûne; derbarê E.Şemo de Têmurê Xelil û Zeynel Abidin Zinar digotin 17 sal li hepisxaneyên Sibîryayê maye, Eskerê Boyik digot 19 sal; li gorî Ayhan Meretowar, Eskerê Boyik û Xelilê Çaçan, Şemo bi I. Morogûlov re di 1929an de cara pêşin ji bo kurdî alfabekeke latînî amade kiriye, lê li gorî hevpeyvîna Bavê Nazê (ji devê E.Şemo) wî û Morogûlov di wê salê de ji bo kurdî elîfbayekê kirilî çêkirine. Navê berhemeke wî Xelilê Çaçan *Tarîxa Şoreşa Oktobê* dida lê Eskerê Boyik û Abdurrahman Baqîr û wek *Terîqa Rêvolûsiya Oktobê* didan (û redaksiyona kovarê forma duyem qebûl dikir lê wê jî ve carê wek *Riya Şoreşa Oktobê* pêşkêş dikir). Dîsa li gorî T. Xelil heya niha berhema wî ya bi navê Alav, ji ber desttengiyê hê çap nebûye û li gorî E. Boyik *Kurdên Elegezê* jî romanek e.

ya *Riya Teze* ya di dilê hemû kurdan de qedirbilind e. Di vê navberê de li Lenîngradê, di Institûya Dîroka Kulturê de dersên kurdî dide. Ji gelê xwe re bo ku erka şoreşê û hêviyên wê serwest bike, broşûran dinivîsîne. Şanoya *Koçekê Derewîn* a Aleksandr Araratyan werdigerîne kurdî. (Belkî jî ev berhem yekemîn wergera kurdî be!) Pêûsa wî ya adan di sala 1931an de bi rûsî *Şivanê Kurd* dinivîsîne; heman berhem di 1935an de bi kurdî tê nivîsandin ku ev dîrok, destpêka romana kurdî ye. Piştî salekê Şemo bi tevî *Li Ser Peywendiyên Feodalî di Nav Kurdan de* vê carê *Kurdên Elegezê*<sup>2</sup> dinivîsîne...

Lê ne hebûna berhemên wek *Emrê Lenin û Terîqa Rêvolûsa Oktobê*, ne jî xîretkêşî û şoreşgeriya wî ya dilsoz fayde dike. Erebbê Şemo, di sala 1937an de bi emrê Stalîn, sirgûnî Sibîryayê dibe.

<sup>2</sup> Mîrov dikare ve berhema piçûk wek çîrokekê bihesibîne. Lê nîzanim çima di çapa 1994an a Weşanên Deng de wek beşeke *Şivanê Kurd* bi navê *Kurdên Alagöz* hatiye çapkirin ku min jî çend sal berê (kovara *Pelînê*, jimar 2, sal 1999) li ber vê çapê nivîseke rexneyî amade kiribû (*Bextewariya Îdeolojîk*) û tê de gotibû ku "Nîzanim çima ev vegotina zimansivîk û herikbar, bi beşa 'Kurdên Alagöz' re dev ji serpehatiya leheng û kîpa vegotina xwe berdide, diqulibe ser tenîsteke din û bi vî awayî hem vegotin û hem cûre (genre) derbeke xedar dixwe." Belê min li jê jî got, mixabin em hê ne xwediyê karekî bi rêkûpêk in; ji wî di qedera me de 'teshîh' rengê berbiçav e. Lê ji wî trajiktir ev e ku piştî 8 salan bi awayekî tesadufî dîsa li xwe ez hay dibim. Halbikî ji bo vê nivîsê, (*Bextewariya Îdeolojîk*) awira min çend car hatibû teqîrîkirin. Ez careke din bi dîlşikestî dibînim ku kes bi baldarî kesî naxwîne; heger bixwendana ku ev çapa bêtalîh wê demê li bal gelek kesî hebû, dê hem neheqîya min rast bikirina û hem jî layiqîya weşanxanê bidanayê.





Erebê Şemo

1937-1956

Temenê vê beşê ji 19 salên gilover pêk tê. Rengê wê spiyê sar e, qefa û sirra ku hestiyar dijenîne ye. Her kes behsa wê dike, lê tu kes teferûatên wê baş nizane. Xumam in xetên van salan. Heger teza qîza E.Şemo Zînê<sup>3</sup> di destê me de bûya (ku mijara wê li ser jiyana E.Şemo ye) an bîranînên E.Şemo yên wan salan ji arşîvên Partiya Komunîst a Ermenîstanê bihatana derxistin,<sup>4</sup> me yê xumamiyê ji ser rakira û me yê

<sup>3</sup> Binêrin kovara W, nivîsa Têmûrê Xelîl, r.29.

<sup>4</sup> Binêrin heman kovar, hevpeyvîna Bavê Nazê (Hevpeyvîna Bi Erebê Şemo Re Ya Berî 25 Salan), r.31.


nehiştta ku dawiya vê beşê bi tariyeke kûr biqede. Bêguman dê tu dokûmentên cewî, êşa şexsî şîrove nekin, lê ji bo têgihîştina van salan belkî ji li temaşekirina filma Chris Marker, *Lettre de Sibérie (Ji Sibîryayê Name)* û filma Bartabas, Chamane (Şaman), ango xwendina pir- tûka Aleksandr Soljenitsin, *Rojeke Îvan Denîsoviç*, faydeyek dê bide mirov.

## 1956-1978

Ji 22 salan pêk bê ji, ev ne beşeke taybetî ye. Mirov dikare vê beşê, wekî berdewamiya beşa duyemîn ji bihesibîne. Ji ber ku wek piştî navbirekê li ser xeta berê dişulike.

Hinek ji bi xêra wan salên rênçberî û karkeriyê, bedena E.Şemo ya hevalê zehmetiyan, ji sirgûna sar û azar sax vegeyriyaye. Xwediyê wê bedenê, dilşikestî ye? Dibe... Ji şoreşa ku bi eşq himbêz kiribû, ketiye şikê? Dibe... Lê bi rîya tu berhemên wî rêça dilşikes-tîbûnekê an şikbariyekê naxwiyê. Erebe Şemo, 19 sal berê ji cihê hiştî, dibezîne hespê xwe: Di 1958an de romana Berbang, piştî salekê ji Jiyana Bextewar diweşîne. Hinek diweste hespê wî, lê di sala 1965an de radibe çargaviyê û *Dimdim*, piştî çar salê din jî (1969) *Hopo* dinivîsîne.

Û rejîma Sovyetê jî wek xwebex-şandinekê li ser navê xizmeta kulturî, du xelatan (ordên) pêşkêşî wî dike: Ala Sor û Dostaniya Gelan. Dema Erebe Şemo di 1978an de diçe ser dilovaniya xwe jî merasîmeke mezin a dewletî jê nahêvişîne, wî li Pantîona Goristana Yêrîvanê defin dike.



## Piştî Eslê, Fesil...

Erebê Şemo, bi pênûs û tevgera xwe pêşengek bû. Wekî gelek pêşengî, rê-çêker bû. Di vê riyê de îro rengdêra "bavê romana kurdî" para wî ye. Ew dê her dem ji bo dîroka edebiyata kurdî figûrekî sereke be. Belê wî ji endîşeyên nivîskarekî afirîner bi dûr nivîsand; di nivîskariya wî de "erk" û "hewce" zêdetir derketine pêş. Lewma bi çavê projeyeke çandinî / perwerdehî li romanê nihêrî. Belkî guman dikir ku bi riya romanê mirov dikare tiştina hînî gelê xwe bike: Faydeyên kolxozan, têkoşîna li hember dijminê kedkaran,

dilpakiya xebatê hwd. pê bide fêhm kirin... Ji ber vê nêrînê belkî li ser xeteke *mêldayî* (ku navê vê xetê "realîzma sosyalîst" an "romantîzma şoreşge-rî" bû) nivîsand. Jixwe kêliya din di neynika jiyana wî de me dît ka çawa mirovekî derveyî (ekstrovert) ye, li hember zehmetiyên jiyanê çawa şer kirîye. Dibe ku ji ber van sedeman bo afirîneriyeke hunerî, motîvasyoneke hundirî bi dest nexistibe.

Digel vê, atmosfera serdemê jî wî mubtelayê vê mêldayîne kirîye. Divê em jibîr nekin di vê serdemê de polên Tolstoy, Dostoyevskî, Gogol û heta Çexov bê qîmet bûbûn û yê Gorkîyê<sup>5</sup> ku îradeya wî ji aliyê Stalînîzmê ve hatibû zebt kirin, ketibû rewacê.

Lewma ez dibêjim ne di *Jiyana Bextewar* û berdeyama wê *Hopo* de bal û dêla nivîskarekî afirîner heye; heta Dimdim a ku zêya xwe ji zargotinê girtiye jî wisan e.<sup>6</sup> Ev berhem di çarçova edebiyateke partînost\* de hatine nivîsandin. Lehengên wan ên ku fezîleteke polîtîk temsîl dikin, mînak in ji bo gel; ji bo perwerdekirin û ehîlkirina hemwelatîyan, bi cewherên paye-

<sup>5</sup> Çêbûna "realîzma sosyalîstî" de keda Gorkî jî hebû; jixwe dema di 1928an de vegeriyabû Sovyetîstanê, bi merasîmeke mezin hatibû pêşwazîkirin; di 1934an de bûbû serokê Yekîtîya Nivîskarên Sovyetê. Dibe ku E.Şemo jî heyraneke Gorkî yê wê demê be; (jixwe Eskerê Boyik qala rasthatîna wan a ku Erebe Şemo her dem bi kêfxweşî behs dikir, dike.) Lê wisa dixwiyê ne berhemên heja yên wek *Dotstvo* (Zaroktiya Mîn), *V lyudyah* (Dema Mîn Nanê Xwe Derdixist), *Moi universitet* (Universîteyên Mîn), *Na dne* (Nav Pêxwasan); yên wek *Mat* (Dayik) - ku li gorî rexnegiran berhema wî ya herî lawaz e-, *Jizn nemujnovo celoveka* (Dijminê Gel), *Vladimir Iliç Lenin* jî xwe re dikir model.

<sup>6</sup> Li ser navê realîzmekê Erebe Şemo, *Dimdim* jî

bilind hatine mucehezkirin... Belkî heya sînorekî *Şivanê Kurd* ji vê tabloyê cihê ye. Ji ber ku di vê romanoka otobiyografîk de çavdêriyeke antropolojîk (debên jiyana koçe-riyê), xetên îronîk (serpêhatiya lehen- gê wê gelek caran kenekî tahl li ber mirov dixê) û vegotineke herikok (ku ji bo berhemên otobiyografîk gelek girîng e) û ji van jî wêdetir vebêjerekî rewa heye.<sup>7</sup> Lê ew jî dema ne wek vebêjerekî, wek Erebe Şemo qiset dike romanê ( di "bira diwemîn" de) ji sînorên hunerî vediqete, rengê mêldayînekê digre û wekî wan ên din yekalî dibe.

Li vir tiştê balkêş ev e: *Şivanê Kurd* berî sirgûnê; *Jiyana Bextewar*, *Hopo* û *Dimdim* piştî sirgûnê hatine nivîsandin. Yanê romana pêşî ya ku ji taybetîyên mêldayînekê qismen bi dûr e, di dewra wê mêldayîne de hatiye nivîsandin; lê yên ku modelên wê mêldayîne ne, tev, piştî mirina hamiyê wê (Stalîn) û piştî têkçûna bandora wê êkolê hatine nivîsandin. Yanê piştî demodebûnekê! Ev e, ev taybetî bi min gelek manîdar e. Hûn ê bibêjin di qedera gelek pêşengî de nakokiyên bi vî awayî hene. Ser çavan! Dê ez ê ji bibêjim qedera her destpêkê, hinek jî qedera kêmasiyan e û jixwe destpêk, deste birayê kêmasiyan e... Lê heger ew

hemû devlemendiyên folklorîk û çirokî paqij kirîye; di şexsiyeta Xano de serokekî dadmend, fedakar û gelparêz, yanê tîpekî yekalî afirandiye. Ferqa Xano û Emerîk û Sehidê lehengên *J. Bextewar* û *Hopo* nîn in.

\* Navê din ê realizma sosyalîstî an romantîzma şoreşgerî; ango "edebiyata partiyê."

<sup>7</sup> Qey mirov dibêje ji xwe re Zaroktiya Mîn a Gorkî minak girtiye. (Di rastiya xwe de jiyan û qedera siyasî ya Erebe Şemo û ya Maksîm Gorkî gelek dişibin hev. Belkî di vî aliyê de jî E.Şemo, li ser Gorkî nêzikahiyeke dilînî kiribe.

kêmasî, ferxê awirekî îdeolojîk be, hingê kêmasî, rengêkî trajîk digre, siya wî (nawile qefaya wî) dikeve ser gelek hêjahiyên jî.

Di vê noqteyê de pirsê ku serê min mijûl dike ev e: Gelo sirgûnî çima Erebe Şemo sewkî nêrîneke muxalîf nekir an nêrîna wî ya edebî neguhert?

Di eslê xwe de bersiva vê pirsê zehmet e; ji ber ku di destê me de (ya rast di yê 'min' de) tu belge û anekdot nîn in. Lê dîsa jî mirov dikare feraseten çend tiştan bibêje.<sup>8</sup>

Bi min hêvîşikestina mirovên bawermend bi du awayî ye: Di ya yekemîn de devê derza vê şikestinê gelek fireh e, mirov tê de winda dibe; an li dinyayeke din digere. Pêvajoya pirsîyarîkirina wê radîkal e; finala wê derîgirtin e li ser hemû hêvî û qesrên wî yên berê...

Ya duyemîn wekî qezayekê ye ku bi du-sê şermixan mirov jê difilite. Ronahiya hêviyan tenê ji bo demekê vemirîne, dûvê xeyalan ji bo pêşerojê çêtirîn hatiye kesaxkirin. Jixwe musebîbê van dilêşiyên dewrî, sîstem nîn e, şexs in. Ji wî, ne lazim e mirov ji dîr derkeve an li qibleyekî din bigere. Heta bo ku ev xeta bête tamîrkirin, lazim e mirov "vegerê eslê" û ji duh bêtir bixebite û xwe feda bike!..

Bi min hêvîşikestina Şemo, eva duyemîn bû. Ew komunîstekî bawermend bû<sup>9</sup>, sedemê sirgûniya xwe ya 19 salan, wekî tetbîqeke şexsî didît. Sedemê wê (Stalîn) madem ji holê rabûbû, nexwe kêş û pîrsgirêk jî çareser bûbû.


<sup>8</sup> Ku rengêkî vê ferasetê, ji hevpeyvîna wî ya bi Bavê Nazê re der dibe; di wê hevpeyvînê de Erebe Şemo (ku sal 1972 ye) diyar dike ku 'rêbaza wî ya edebî, rîyalîzma sosyalîzmê' ye. Û ev 'rêbaz dikare hemû aliyên jiyanê ronî bike'.

Yanê sirgûnî, di Erebe Şemo de wek navbireke bêdil e; ne ezmûnek e ku mirov sewkî şik û guhertinan bike.<sup>10</sup>

An belkî jî (ku "belkî" bû motor-bêjeya vê nivîsê) di wijdana wî de minetdariya welatê duyem hebû; çawa be rejîma Sovyetê, wî û gelê wî ji mihaciriyê xelas kiribû, di mafên hemwelatîyê de nasnaveke wekhev dabû wan, filan bêvan...Elbet ev yek di nav awirekî 'dibe' de tîn gotin; xwezî bîranînên wî li ber destê me bûna, an pê re çend hevpeyvînên din hatibûna kirin... Lê, lê me got bi riya berheman jî mirov dikare hin diyardeyan êkhere bike. Ez bi riya her sê romanên wî yên li dû sirgûniyê tabloyeke wisan dixwînim. Qey nebe heya dokûmentên esehî, ser qewlê xwe ez agirê xebata Erebe Şemo ya piştî vegerê, ku tim pesinandinê jiyanê bextewar dikir, niha wisan şîrove dikim.

Heger îro fotografê bavê romana kurdî, di ber serbilindiyekê de hinek melûl tê çavên me, sedemê wê, ev qeder e. Ew û berhemên wî, mexdûrê serdemekî bûn, bi xêr û gûnehên xwe ve.

Tebax 2007 / Amed



<sup>9</sup> Di heman hevpeyvînê de dibêje, "Rêbaza min a edebî riyalîzma sosyalîzmê ye. Lê çima? Ji ber ku ez bi xwe riyalîst û soyalîst im." Ev hevpeyvîn, destpêka romana *Hopo* ya ku ji aliyê weşanxana Lîsê ve hatiye çapkirin de jî cih girtiye.

<sup>10</sup> Têmûrê Xelîl, di nivîsa xwe de (*Erebê Şemo Rûspîtiya Gelê Kurd*) dibêje ku E.Şemo, piştî efûya giştî, hîn bû ku kurdek bi xayîntî giliya wî kiriye, lê wî dev jê berda, nexwest ku xelk bibêjin kurd şikayetî hev dikin. (Binêrin kovara W, r.29). Heger rast be ev agahî, şîroveya me jî rast e; ji ber ku diyar e E.Şemo di bin-şîûra xwe de bawerî pê aniye ku sirgûniya wî bûyereke lokal e. Halbikî di wê salê de, ji her derî bi milyonan am û tam; û ji kurdan jî bi hezaran insan cêliyê Asyaya Navîn bûbûn.


## Serokê Komîteya Îstîklala Kurdistanê (Azadî) Mîralay Xalid Begê Cibrî

Tahsin SEVER

Xalid Begê Cibrî yek ji serokên neteweperwerîya kurd e. Vê îdeala ku di dema xwendekarîya xwe ya li navbera salên 1891-1902 de nas kirîye, hem di warê hizrî hem jî pratîkî de organîze kirîye. Di her gavavêtina vê dozê de wî xwestîye peywirdariyê bigre ser milê xwe. Tiştê ku di nameya bo Simko nivîsiye de qisat dike, gelek balkêş e. Dibêje:

“Komîteya Kurd tenê biryarên xwe beyan dike û hîç ne xwedîyê wê hizrê ye ku biryarên xwe li ser te ferz bike... Her wiha, plana Simko jî wek utopyayekê (xeyalekê) nedidît û dida xuyanîkirin ku dê piştgirîyê ji bo hemî hewldanên bo serxwebûna Kurdistanê bike...”<sup>1</sup>

Xalid Begî Kurdistanê yekparçe didît. Li kîjan parçeyî dibe bila bibe,



Xalid Begê Cibrî

<sup>1</sup> Dr. Afrasyaw Hawramanî, *Piranlî Şeyh Said Devr' ni*, Aktaran Aris Arda, <http://www.newroz.com/modules.php?name=News&file=article&sid=4238>

'serketina her hewldanek a ji bo serxwebûna Kurdistanê' wek serketina

xwe didît. Ji vê çendê ji tevgera kurd a di bin serokatîya Şex Mehmûd de ku li Kurdistanê Başur pêkdihat, gelek kêfxweş bû. Li gorî Xalid Begî heta ku Kurdistan azad bibe dê li hemî parçeyên Kurdistanê berxwedan her li dar be. Û Xalid Beg xwedîyê hizreke wisan e ku serketina kurdan di hev-girtina kurdan de dibîne. Ji vê çendê di serî de her bala xwe daye ser pêkhatina yekîtiya li navbera kurdan. Di vî warî de gelek mesafe jî digre. Bo numûne, hindek rêxistinên kurd ên ku ji hev cihê difikirin, bi taybet Komîteya Kurd a li Stenbolê (Kurd Tealî Cemîyetî) û Komîteya Kurd a Erziromê (Azadî) digihîne hev.

Niha em bîne ser jîyana kurt lê bi tîra xwe tijî ya Xalid Begî.

Xalid Beg di sala 1882 de li Gimgimê (Varto - Mûş) hate dinyayê. Bavê wî Mehmûd Beg mezinê eşîra Cibran e, diya wî jî meta Şêx Evdila Efendîyê Melekan (xwişka Şêx Mehmûd) e. Diya wî û diya Şêx Seîd efendî xwişkên hev in. Xalid Begê Cibrî û Şêx Seîd Efendî û Şex Evdila Efendî, ku her sê jî di tevgera kurd a sala 1925 de hatin dardekirin, pîsxaltî û kurmetên hev in. Her wiha, Şex Seîd Efendî ligel xwişka Xalid Begî zewicandî ye.

Xalid Beg yek ji xwendekarên pêşîn ên Mekteba Eşîran a li Stenbolê ye. Li Mekteba Eşîran, ku di sala 1892 de vebûye, wek xwendekarê bi jimareya 36. qeyd bû. Perwerdeya vê mektebê 5 sal e. Bernameya 7 salan xistine zikê 5 salan. Di vê mektebê de zimanê osmanî, fransîzî, erebî û farisî fêr bû. Ewên ku xwendina vê mektebê

birin serî, kirin du beş; beşek bo Mekteba Mulkîye û ya din bo Mekteba Herbiye hate şandin. Xalid Beg piştî ku Mekteba Eşîran temam kir bo Mekteba Herbiye (Yıldız Mekteb-i Harbiye) hate şandin. Di sala 1902 de bi pileya (rutbe) yaver yuzbaşîtiyê ji Herbiyeyê derçûbû.

Mekteba Eşîran parçeyek ji projeya entegrasyona osmanîbûnê ye ku bira-yetiya îslamê derdixist pêş. Lê ji ber ku ev sedsal êdî dema danîna netewedewletan e, lewma jî vê projeyê keysa serketinê bidest nexist. Di vî warî de tesbîtên Dr. Nuri Dêrsimî ku ew jî yek ji pêşewayên neteweperwerîya kurd e û ji mektebên Osmanî mezûn bûye, gelek girîng in, ku dibêje:

"Ji bo Mekteba Eşîran jî dê encam pêkhatina paradoksa klasîk û xusran bûya. Ji qewlê Hourani ve, çawan ku jon-tunûsî û jon-cezayîrî li dibistanên modern ên fransîzan, jon-turk li dibistanên Evdîlhemîd perwerde bûne, her wiha, dê jon-kurd jî ji nav kesên ku li dibistanên serweran, ango ji nav yên ku li dibistanên Osmanî perwerde bûne derbiketana."<sup>2</sup>

Bi gotina Eugene L. Rogan "Derbare 9 kesên ku ji nav wan 25 kurdên ku ji pênc salên sereta yên Mekteba Eşîran mezûn bibûn de ji ber sedema ku ew "hizrên neteweperwerîya kurdî diparêzin" dê li salên di pey re muskileyên gelek mezin çêbibûna, dê mirina wan jî li ser vê yekê bûya, ku navdartinê wan Xalid Begê Cibrî bû."

<sup>2</sup> Vet. Dr. M. Nuri Dersimi, Aktaran, Eugene L. Rogan, *Aşîret Mektep Devlet*, Aram Yayınları, İstanbul, Aralık 2001, r. 9

<sup>3</sup> Eugene L. Rogan, *Aşîret Mektep Devlet*, Aram Yayıncılık, İstanbul Aralık-2001, r. 9

Her wekî ku hem Dêrsimî hem jî Rogan diyar dikin, qismek ji wan kes-ayetiyan ku li despêka sedsala bîstem tevgera neteweperwerîya kurd geş kirin, ji nav xwendekarên **Mektebên Eşîran** derketine, ku sedema avakirina van mekteban pêkanîna 'çîmentoya osmanîbûnê' bû. Pêştirinê van kesayetiyan, bêguman, Mîralay Xalid Begê Cibrî ye.

Salên xwendevanîya li Stenbolê ji bo Xalid Begî qonaxa veguherînê ye. Li van salan ligel hizra neteweperwerîya kurd hevnas dibe. Ev hevnasîn bû sedem ku hizrên wî di vî warî de geş bibin û têkeve nav hewldanên têkoşîna azadîya kurdan. Ji wan kesên ku vê yekê diyar dikin yek jê jî Ersal Yavi ye. Yavi di kitêba xwe ya bi navê *Kürdistan Ütopyası* (*Ütopyaya Kurdistanê*) de viya dibeje:

“Salên xwendekarîya Xalid Begî yên li Stenbolê demeke wisan e ku xeyalên serxwebûna Kurdistanê her li dar in û ji her çar alîyan dengê pevçûnê bilind dibe.

Xalid Begî ligel pêşewayên ku doza serxwebûna Kurdistanê bo xwe kiribûn armanc pêwendîyên nepen danîbû û piştî sala 1914 van pêwendîyan gurtir kiribû. Bo numûne, di nav rêxistina Kurd Tealî Cemiyetî de ku di pêşengîya Seyîd Evdilqadir de hatibû avakirin ew ji endamên herî çeleng e.”<sup>4</sup>

## **Çalakîyên Xalid Begî yên Dema Şerê Cîhanê yê Yekem û Tevlibûna wî bo Kurdistan Tealî Cemiyetî**

Li sala 1902 ji Stenbolê bo yekemîn peywira xwe ya leşkerî çû Filistînê. Li bereya Filistînê û Îranê wek efser xebitî. Piştî ku Şerê Cîhanê yê Yekem dest pêkir li navçeya Gimgimê bû serokê Alayîya Suwarî ya cibrîyan. Dû re tevayî çekdarên eşîra Cibrî ketin bin fermanrewayîya Xalid Begî. Bi destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekem re artêşa Rûsyaya Qeyser heta bajarê Bidlîsê herêmê xiste destê xwe. Xalid Beg bi tundi li dijî dagîrkerîya orusan derdikeve. Bi taybet li şerê Pasînler û Çemê Zoro ji aliyê wêrekî û şervanîyê ve balê dikêşe ser xwe. Piştî Şoreşa Oktobêrê ya li sala 1917 ku artêşa orus paş ve vekîşîya, Xalid Beg jî vedigere bo Gimgimê. Îcar dest bi xebata organîzekirina kurdan dike. Di vê demê de ligel Cemiyeta Tealî ya Kurdistan di nav pêwendîyê de ye. Li gorî nivîsîna Îsmail Göltaş “... Mîralay Xalid Beg li herêma ku Kop, Gimgim, Kela Xînusê, Kanîreş, Boglan û Çewlîgê digre nava xwe berpirsîyarekî navendî bû.”<sup>5</sup>

Dr. M. Nuri Dêrsimî ku ew jî di heman demê de endamê Kurdistan Tealî Cemiyetî ye û yek ji serokên Serhildana Qoçgirîyê ye, di kitêba xwe ya bi navê *Hatıratım (Bîranînên Min)* de wiha dibêje:

“Li gorî biryarên Cemiyeta Tealî ya

<sup>4</sup> Ersal Yavi, *Kürdistan Ütopyası*, Yazıcı Yayınevi, 1. Basım, İzmir, 2006, r. 238

<sup>5</sup> İsmail Göltaş, *Kürdistan Teali Cemiyeti*, Doz Yayınları, İstanbul Kasım 1991, r. 42

Kurdistanê, li ser axa welatê xwe di bin pêşengîya qaremanê kurd Mîralay Xalid Begê Cibrî de dest bi danîna teşkilatên ji bo kurd û Kurdistanê kiribûn.”<sup>6</sup>

Ji van gotinên Nûrî Dêrsimî jî baş têye xuyanîkirin ku xwerêxistinîkirina Cemiyetî Tealî ya Kurdistanê li Kurdistanê di bin pêşengîya Mîralay Xalid Begê Cibrî de ye.

M. Şerif Fîratê ku dewletê bi wî pirtûga bi navê *Doğu İlleri Ve Varto Tarihi (Dîroka Gîngimê û Bajarên Rojhilatê)* dabû nivîsîn, wiha neql dike:

“Mîralay Xalid Begê Cibrî û Mîralay Xalid Begê Hesenan ligel birayên xwe çek didin destê eşîrê, bi cil û bergên kurdewar li gundan digerin, *Nûbara Piçûkan* ku bi destê Xalid Begî bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn, her wiha, *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Dîwana* Melayê Cizîrî li gundîyan belav dikin.”<sup>7</sup>

Pişti Şerê Cihanê yê Yekemîn Xalid Begî ji aliyekî ve dest bi xebata organîzekirina kurdan kiribû û ji aliyê din ve li ser çand û zimanê kurdî dixebatî. Du pirtûgên bi navê *Nûbara Piçûkan* û *Eqîdeya Îmanê* nivîsîne. Ji bilî vana, çend pirtûgên din jî bo kurdî wergerandine. Bi taybet gelek hewl daye xwe da ku zimanê kurdî bête axiftin û pê bête nivîsîn, her wiha, ji bo ku bixwînin berhemên Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî li gundîyan belav kirîye. Tespîten Faik Bulut ku xwe dispêre

belgeyên dewletê jî, van qisetkirinên li jor dupat dikin. Faik Bulut vana dibêje:

“Piştî ku di dawîya Şerê Cihanê yê Yekem de Împaratoriya Osmanî hilweşîya, hingê li Anatolê ihtîmala danîna dewleteke ferawan bo ermenan derket holê. Li ser viya roşinbîrên kurd bi awayekî fiilî ketin nav hewldanên serxwebûnê û ji bo pratîzekirina vê armancê li dora Cemiyetî Tealî ya Kurd ku wextekê ava bibû de kom bûn. Navenda vê rêxistinê li Stenbolê bû lê şaxên wê li Dîyarbekir, Xarpêt û Bidlîsê jî hatibûn danîn. Her wiha, ev rêxistin guman nîne, ku li bajarên wek Wan û Dêrsim û Mûşe û li hemî navçeyên ku kurd têde akincî ne jî belav bibûn.”<sup>8</sup>

Eşkera ye ku li herêma ku bajarên Mûş, Bidlîs û Çewlîgê digre nava xwe, di belavbûna şaxên Kurd Tealî Cemiyetî de rola Xalid Begî gelek mezin e. Di vê navberê de hem bala dewleta Tirkîyê û hem jî bala dewletên der û dorê kişandiye ser xwe. Di wan raportên ku bolşevîkan ji herêmê bo nevanda xwe dişandin de bi kitekit qala xebatên Xalid Begî têye kirin. Ji lêkolînerên Kurdîstana Başur Dr. Afrasyaw Hawramanî li wan gotarên wî yên ku xwe dispêrî dokumantên orusan de van agahîyan belav dike:

“Xalid Beg ta ji destpêkê ve bi hemî hêz û şîyana xwe li ser xebata huner û dîrok û ola kurdan hûr dibû û di wî warî de gelek jî ihtîramê didît. Niha jî di nav kurdan de ew merivekî xwendî û herî biqabîliyet e.

<sup>6</sup> Vet. Dr. M. Nuri Dersimi, *Hatıratım*, Öz-Ge Yayınları, Genişletilmiş yeni basım, Ankara 1992, r. 53

<sup>7</sup> M. Şerif Fîrat, *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Beşinci Basım, Ankara 1983, r. 155

<sup>8</sup> Faik Bulut, *Devletin Gözüyle Türkiye'de Kürt İsyanları*, Yön Yayınları, İstanbul Temmuz-1991, r. 12



Xalid Beg di warê leşkerî de gelek tēgihaştî û hostayê vî karî ye. Ji vê çendê aligirên wî gelek in û di nav kurdan de rêza wî gelek tēye girtin. Xebat û lêkolînên ku wî li ser kelepore û erf û edetên kurdan dikir, ji bo pêşveçûna civata kurd wî kiribû xwedî bawerîyeke mezin û di nav hewldanên xurt de bû. Xalidê Cîbrî armanca xwe ji kesî qet venedişt û li her derê elemeşkera qal dikir. Qet tevî tevgerên tirkî nebû, ji wan cihê tevdişîya. Ji ber ku wî dixwest bi awayekî azad xebatên xwe yê sosyal û civakî pêk bîne gelek caran taleb kiribû ku ji karê xwe yê leşkerî veqete. Lewre xebatên siyasî yê Xalid Begî ne bi dilê dewleta tirk bûn. Wan her tim hewl didan xwe da ku Xalid Beg ji saziya leşkerî dûr nekeve û ew bişên bi hêsanî wî di bin kontrola xwe de bigrin.”<sup>9</sup>

Di pirtûka bi navê *Dîroka Siyasetê Kurdan* a ku bi awayekî hevpar ji aliyê Komîsyona Kurd a Enstîtuya Zanyariya Rojhilatê li Akademiya Zanyariyê ya Yekîtiya Sovyetan û Enstîtuya Zanyariya Rojhilatê li Akademiya Zanyariyê ya Komara Ermenîstana Yekîtiya Sovyetan de amade bûye heman hizirînên li jor derbasbûyî tene qisetkirin. Di vê pirtûga navborî de bi vî awayî qala Xalid Begî tēye kirin:

“Li sala 1920 Xalid Beg û hindek efserên din ên ku di alayîya li bin fermarweyîya wî de bûn, propaganda-yeke gurr a hizrên Kurdisna serbixwe-

dan destpêkirin. Xalid Beg û hevalên xwe ji bo ku li hemberî biryarên kongreyên Erzirom û Sêwasê, di heman demê de li dijî xalên “Mîsakî Millî” ku Kurdistana Tirkîyê tevî axa Tirkîyê dikir, da ku kurdan organîze bikin, li navçeyên Gimgim, Kanîreş, Melazgîr, Kop û Kela Xînûsê ligel şex û serokeşîran ketibûn nav pêwendîyan. Di encamê de ew gihan hizreke wisan ku divê gelê kurd xwe ji bin nîrê dagîrkerîya tirk ku ev sedê salan e di nav tarîtiyê de hiştiye û hemî mafên wan yê rewa ji dest stendine êdî xwe rizgar bike. Ligel viya, pêşewayên kurd xwedîyê vî bawerîyê bûn ku ev yek dikare bi bilindkirina hest û hişyarîya netewî ya di nav gel de, her wiha, bi berxwe-daneke çekdarî pêk were. Pêşewayên kurd gelê xwe tembîl dikir ku her tim cîl û bergên netewî li xwe bikin û bi zîmanê kurdî bixwînin û binivîsin. Xalid Begê Cîbrî berhemên şexsiyet-ên siyasî yê wêk Mela Ehmedê Cizîrî û Ehmedê Xanî belav dikir.”<sup>10</sup>

### Peymana Sevrê û Xalid Beg

Xalid Beg digel ku Peymana Sevreyê kêr didit lê ji bo ku kurd bigihên mafên xwe, vî yekê wek firsendekê dipejirand. Ji vê çendê ew di nav hewl-daneke xurt de bû da ku xalên vî peymanê yê derbarê kurdan de bêne piratîzekirin. Li seranserî herêmê digere, ji giregir û şex û mela û serokeşîran îmze berhev dike û bo Yekîtiya Neteweyan (Cemîyeta Ewqam) dide şandin. M. Şerif Fîrat van hewldanên xalid Begî wiha neql dike:

<sup>9</sup>Dr. Afrasyaw Hawramanî, *Piranî Şeyh Said Devrimi*, Aktaran Aris Arda, <http://www.newroz.com/modules.php?name=News&file=article&sid=4157>

<sup>10</sup> Komîsyona Kurd, *Kürt Siyaset Tarihi*, Peri Yayınları, Üçüncü Baskı, İstanbul 1998, r. 116

“Xalidê Cibrî ku li ser vê hizirînê hewl dida xwe, di havîna sala 1920 de ligel Seyîd Evdilqadir ê serokê Cemîyeta Tealî ya Kurd ku li Stenbolê dima û Evdirehîmê Hekarya, her wiha, bi riya vana ligel Yusif Zîya ku li meclisê mebûsê Bitlisê bû û bi hevalên wî re li hev kiribû. Ew di vê baweriyê de bû ku dê mafên xwe bi wasitaya Yekîtiya Netewan bistî- nin. Xalid dê ji aliyekî ve amade- karîyên xwe yên li rojhilatê temam bikira û hêzên xwe yên çekdar sazbiyî bihiştana, ji aliyê din ve dê hukûmeta millî îxfal bikira.”

“Di vê navberê de Mîralay Xalid Begê Cibrî li herêmên Gimgim, Kop, Melezgir, Kela Xinûsê, Kanîreş, Boglan û Çewlikê ji serokeşîr û şex û mela û keyayên gundan mezbeteyên morkirî berhev dikir û bo Cemîyeta Tealî ya Kurd dişand. Ji wira jî, qasojî bo vî karî bo Mistefa Nemrûdî û Şerîfê Kurd ku li Yekîtiya Netewan dixebitîn dihatine şandin.”<sup>11</sup>

Ev hewldan jî encamekê bidest naxînin. Muhaweleyên aştiyê di navbera dewletên ku di Şerê Cîhanê yê Yekem de têk çûne û yên ku biserketine de dê bête îmzekirin. Belam ev lihevhatin ne bi dilê têkçûyîyan û ne jî bi dilê serketîyan e. Esasê wê, ev lihevhatin bi zora DYA çêbûye. Lê piştî ku di hîlbijartinên sermaweza sala 1918 de piranîya Kongreya DYA ket destê komarparêzan, hingê di serî de Peymana Versay ku Wilson li pişt wê bû û gelek lihevhatinên aştiyê ji aliyê

Kongreya DYA ve dê nehatana erêkirin. Polîtîkaya emperyalîst a derve di sala 1917 de li DYA dê li payîza paşîn a sala 1918 dawî lê bihatana, ligel viya ew projeyên ku DYA li pişt bû dê careke din nehatana rojevê, bêguman, di nava vana de ya ku me eleqedar dike Peymana Sevrê bû. Piştî ku DYA berê xwe dide hundir, her wiha, li Rûsyayê jî Şorişa Bolşevîkan lidar dikeve, hingê li Rojhilata Navîn meydana ji îngilîz û fransîzan re dimîne. Ev awa sazbiya mîzîna nufûzê li ser hesabê tevgera kemalistan e. Êdî tu şansê ji bo piratîzekirina Peymana Sevrê nemaye. Yewnanîyên ku li ser handana îngilîzan ketibûn Anetolê li ser piştê hatibûn xistin û êdî stêrka Mistefa Kemalî dst bi geşbûnê kiribû. Û jixwe, Cemiyetî Tealî ya Kurd jî neşîya li hemberî van polîtîkayên nuh tu havilekê bike.

Heta ku wext digihê sala 1920an Xalid Beg ligel eşîrên herêmê civînan li dar dixîne û hizrên xwe belav dike. Civînek ji van civînan, ya ku di hezîrana 1920 de ligel serokeşîrên elewîyan hatibû kirin. Gîrîngîya vê civînê ji viya têye, ku ji berê de bi fêlbazî û fitnetiyê, bi karanîna cudatîyên mezhebî, eşîrên kurd yên elewî û sunnî ji hevûdin hatine dûrxistin. Heta ku pêşî li van pevçûnên çekirî yên mezhebî nehatana girtin dê tu hewldanekê encameke erênî bi xwe re neanîyana. Xalid Beg di vî warî de hizrên xwe di civîna 20ê hezîran 1920 de wiha eşkera dike:

<sup>11</sup> M. Şerif Fırat, *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Beşinci Baskı, Ankara 1983, r. 156-157

“Kurd ji nesla Nemrûd û nijadeke arî ne ku bi sedê salan cîhanê di destê xwe de girtine lê di encama bêtifaqî-

**Şandina Xalid Beg bo Dêrsimê  
(1335-1919)**

yê de ketine bin nîrê tirkên û ev serê şeşsed salan e ku di nav lepê tirkên de wek dîl dijîn ku daketine radeya xulamtiyê lê îro stêrka azadîyê li wan ronî bûye, îdareya tirk hilwe-şîyaye û parçe bûye, eşîrên elewî yên li Rojhilatê jî her wekî eşîrên din ên li Rojhilatê kurd in, belam ew jî ber cihêtiyên mezhebî gelek salan bêsedem jî hevûdin kuştine lê divêtê di ew dem hatibe ku xwe bigihînin hev û mafên xwe yên hevpar jî tirkên bîstînin, li gorî Muahedeya Sevêrê îstîqlala Kurdistanê dê jî aliyê Yekîtiya Netewan ve bête tesdîqkirin, jî bo ku ev kar rojek berê bête destpêkirin divêtê eşîr dest biavêjin çek û rextên xwe û memûrên tirk jî ser axa xwe biqewirînin, esas divêt em berê xwe bidine padîşah, lewre hindik maye ku Hukûmeta Anqere ya asî ku li derveyî şerîetê ye jî aliyê yewnanîyan ve bête hilweşandin, hingê ez jî tevayî elewîyan, bi taybet jî serokên eşîra xormekîyan hêvî dikim ku ew jî tevî vî karê pîroz bibin.”<sup>12</sup>

Kemalist li dijî vê xebatê derdikevin. Li hemberî van dest bi taktîk û listikên cihê dikin, jî aliyekî ve Xalid Begî di peywira wî ya leşkerî de dihêlin, jî aliyê din bi fen û fûtan kurdan berdidin hevûdin. Xalid Beg dixwaze dev jî peywira xwe ya leşkerî berde lê ev daxwaza wî hatîye redkirin. Li Vacixê jî bo avakirina qonaxa hukûmatê wezîfe didin Xalid Begî da ku hem wî jî herêmê derxin derve û hem jî wî û kurdên elewî bikine pêsîra hev.

Ev bûyera ku di sala 1919 de çêbûye, jî aliyê Vet. Dr. M.Nûrî Dêrsimî ve wiha têye vegotin:

“Piştî ku herêma Erzîngan û Erzîromê jî hêzên çekdar ên orus û ermenan hate paqijkirin hingê li Dêrsimê cardin hindek serhildanên herêmî dest pêkirin.”

“Eşîrên Vacixê dema ku têngihaştin ew hatine xapandin êrîş birin ser herêmên tirkên.

Hukûmeta tirk li hemberî vê yekê dest bi fen û fûtên din kir. Ji hêzên çekdar ên alayîya eşîreta kurd ku di bin fermanariya Xalidê Cîbrî de bû şandin bo wê herêmê.”

“Te divê li hemberî fermanarê alayîyê û te divê li hemberî efradên wî, dêrsimîyan gelek xweşbîn û dostane reftarî kirin. Bêyî ku hîç bûyerek nexweş rûbide alayî bi hêsanî xwe gihande Vacixê. Vê rewşê bala hukûmeta tirk kişande. Tirkên ku dikarin jî her firsendê sûd wergerin, eşîretên kurd ên herêma Vacixê ku bi saya Xalidê kurd aram bibûn, rabûn jî vê rewşê îstîfade kirin û li Vacixê bi saya vî fermanarê kurd qeymaqamiya tirk dan avakirin.”

“Piştî ku avahiya qeymeqamiyê hate danîn, hingê li herêma Dêrsimê mayîna alaya Xalidê kurd jî aliyê tirkên ve wek xetere hate dîtin, lewre jî bo ku alayî tevî artêşê bibe paş ve hate kişandin.”<sup>13</sup>

<sup>12</sup> M. Şerîf Fîrat, *Doğu İleri ve Varto Tarihi*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Beşinci baskı, Ankara 1983, r. 157

<sup>13</sup> Vet. Dr. M.Nuri Dersimî, *Kürdistan Tarihinde Dersim*, Dilan Yayınları, Dördüncü baskı-1992, Diyarbakır, r. 119-120

Her wekî ku Dêrsimî jî qiset dike, şandina Xalid Beg bo Dêrsimê tenê ji fêlbazîyek îbaret e. Xalid Begê ku hewl dida xwe, da kurdên elewî û sunnî li dora armancekê bigihêne hev, vê fêlbazîya hanê jî berteref kiriye. Hevkarîya di navbera kesayetîya welatparêz a Xalid Begî û hişyariya eşîrên Dêrsimê pêkhatibû tirkên nerehet dikir. Ji vê çendê mayîna Alayîya Cibran a li Dêrsimê wek xetere hatiye dîtîn û di cih de fermana ji paş ve vegerîna hatiye dayîn. Piştî ku Xalid Beg vedigere Gimgimê dîsa xebata xwe her didomîne. Di vê navberê de Mistefa Kemalî Kongreya Erziromê lidarxistîye. Xalid Beg jî, bo Kongreya Erziromê hatiye vexwendin lê wî ev vexwendin red kiriye. Ji kesên ku kongreyê lidarxistibûn Süleyman Necatî qala vê vexwendinê dike û wiha dibêje:

“Ji alîyê Heyeta Merkezî ve nameyek bo Mîralay Xalid Begê Cibrî yê ku li nav kurdan gelek birêz û simayekî bifezîlet bû hinart û wî vexwend bo kongreyê. Xalid Begî di bersiva xwe de bi zimanekî welatperwer da zanîn ku ew û birayên wan eşîrên din yên kurd bi Erziromê ve girêdayî ne û ji niha ve biryaran qebul dikin û ji ber hindek mazeretan ew dê nikaribe di civîna bextewar de beşdariyê bike û di beyana xwe de dide zanîn ku ew Heyeta Merkezî ya Erziromê bo xwe wek wekîl qebul dike.”<sup>14</sup>

Süleyman Necatî qebul dike ku Xalid Begî vexwendinê red kiriye. Digel ku beşdarbûna bo kongreyê

qebul nekirîye lê daye zanîn ku ew biryarên kongreyê qebul dike, ev yek tenê taktîkek e. Reftarîya Xalid Begî gelek zelal e. Ev reftarî kemalîstan narehet dike. M. Şerif Fırat balê dikşîne bi ser vê yekê û viya dibêje:

“Dema ku mutesserifê Mûşê bo Mûşê û Nazim Beg jî bo Erziromê vedigerîyan, keyayên xormekî û lolaniyan mezbeteyên xwe dan artêşê, Xalidê Cibrî jî dixwest li hemberî hukûmatê serhildanekê lidarxîne û ji bo îstîqlala kurd bixe bite, ji ber ku eşîrên Xormek û Lolan li dû wan neçûne wan êrîş birîye ser wan...

Piştî vê bûyerê firqayê (kolordu) guman jê birîye ku Xalid Begê Cibrî li hemberî hukûmeta millî cebhe girêdaye, ji vê çendê li ser hatiye mûlahazekirin da ku Xalid Beg ji serokatîya eşîrê were dûrxistin û bo Erziromê bête şandin, her wiha, bi şertê ku di pileya mîralayîyê bête hiştin wek serokê dîwana muhasebeyê her li Erziromê bête hiştin. 19 tebax 1336-1920”<sup>15</sup>

**Çûyîna Xalid Beg bo Erziromê,  
Avabûna Komîteya Îstîqlala  
Kurdistanê (Azadî) û Bihevrebûna  
Ligel  
Cemîyeta Tealî ya Kurdistanê**

Piştî ku tayîna Xalid Begî derdikeve bo Erziromê êdî navenda xebatê Erzirom e. Dest bi xwerêxistinkirinê nûh dikin, ku bitaybet efserên

<sup>14</sup> Süleyman Necatî Günerî, *Erzurum Kitaplığı*, Birinci Baskı, İstanbul 1999, r. 59

<sup>15</sup> M. Şerif Fırat, *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Beşinci Baskı, Ankara 1983, r. 160

## Girtina Xalid Begî

kurd di pirranîyê de ne. Navê rêxistina nuh **Komîteya Îstîklala Kurdistanê (Azadî)** ye. Li gorî texmîna min li dawîya sala 1920 hatîye danîn. Rêxistinê heta sala 1923 xebata xwe bi awayekî nihênî (îlegal berdewam kirîye. Xebat zêdetir wek xwerêxistinkirina kadroyî di nav yekîneyên artêşê de ye. Di salên 1922-23 de di nav hewldaneke gurr de ne ku alîkarî a welatên derve bo xwe peyda bikin. Ji aliyekê ve ligel bolşevîkan û ji aliyê din ve ligel îngilîz û fransîzan dikevin nav pêwendîyan. Bi qasî ku ji dokumantên bolşevîkan têye famkirin Azadî ligel bizavên kurd ên li parçeyên din jî di nav pêwendîyê de ye. Xalid Begî bo xwe kirîye armanc ku tevayî rêxistinên kurdan di bin banekê de bigihêne hev. Di yekkirina Cemîyeta Tealî ya Kurdistanê û Teşkilatî Îçtîmâî û Komîteya Kurd a Erziromê de bi ser dikeve. Bi vî awayî daye îspatkirin ku kurd, digel ku xwedîyê hizirînê jî hev cihê bin jî, lê ew dişên li dora bernameyekê xwe bigihênin hev û wek rêxistinekê derbikevin qada sîyasî ya cîhanê, bi vî awayî ew “qenaet” a giştî ku dibêje kurd nabin yek, hatîye hilweşandin.

Piştî ku di sala 1923 de Peymana Lozanê têye îmzekirin êdî Azadî dest bi organîzekirineke giştî dike. Di demeke kurt de li 23 bajar û bajarokan şaxên wê tene danîn. Ji her tebeqeyê, gel bi girseyî tevî Azadîyê dibe û dest bi xebateke gurr dikin ku di rewşeke musaît de serhildanê lidarxînin.

Gurrbûna xebatê bala dewletê her dikêşe. Ji gelek çavkanîyan herikîna agahîyan bo Anqerê dest pêkirîye. Di dawîya sala 1924 de Mistefa Kemal diçe Erziromê. Xalid Beg bo şîvekê hatîye vexwendin ku Mistefa Kemal jî li wira ye. Xalid Beg dixwaze neçe şîvê lê piştî gelek rica û minetan radibe ligel yaverê xwe bînbaşî Reşîd Beg diçe. Digel ku li derveyî edetên protokolê ye jî lê cardin Xalid Beg dixwaze ku Reşîd Beg jî ligel wî têkeve salona xwaringehê. Wêr tîye famkirin ku Xalid Beg dixwaze Reşîd Beg ji rûdanan re bibe şahid. Atmosfera xwarinê gelek gir û gij e. Xalid Beg dibêje ez dixwazim ji wezîfeya xwe ya leşkerî îstîfa bikim. Xalid Beg dibêje, ez nîzanim ku çima hûn nahêlin yekî ku bi were îxanetîyê dike ji kar veqete? Û bîyî ku xwarinê bixwe derdikeve derve.

Hevdîtina dawîn a Xalid Begî ligel Mebûsê Mûşê Îlyas Begî ye. Îlyas Samî jî aliyê Mistefa Kemal ve bi taybet hatîye wezîfedarkirin. Gelek sal pişt re Ahmet Sever (Birayê Xalid Begî) ji devê Îlyas Samî bi xwe dibihîse. Li gorî qisetkirina Îlyas Samî hevdîtina wan wiha çêdibe:

“Rojekê Hezretî Xazî gazî min kir û ji min xwest ku ez ligel Xalid Begî hevdîtinekê bikim. Hezretî Xazî ji min xwest ku ez Xalid Begî îqna bikim da ku ew dev ji vê dozê berde. Her wiha, got pê bide zanîn, em amade ne ku pêwîstîyên kesane yên Xalid Begî bicih bînin, lê heke ew îqna nebe dê ji bo wî qet jî baş nebe.”

“Li ser vê yekê ez ketim rê û çûm Erziromê, li otêla Fuadîye bicih bûm. Min di pusulayekê de hatina xwe ya ji Anqere û daxwaza hevdîtîna ligel wî nivîsand û bi peywirdarekê re şand. Demek bi şun de peywirdar bi heman pusulayê paş ve zîvirî. Di pişt pusulayê de nivîsandîye ku “Pêwîstî bi hevdîtîne nîne” û paş ve zîvirandîye. Li ser viya ez gelek hêrs bûm. Min xwest ku ez vegerim bo Anqere lê ez fikirîm ku Hezretî Xazî vê peywirê daye min, lewre min biryar da ku ez biçim mala Xalid Begî. Dema ez giham mala wî, li ser dîwanê rûniştî bû. Qet li rûyê min nenihêrî. Lewre min pêwîstî dît ku ez xwe bidim nasîn û min got “Ez Mela Îlyas im”. Wî got, “Mela Îlyasê ku ez wî nas dikim, ne tu yî!” Dû re ez ketim nav xebardane û min got, “Hezretî Xazî gotîye ku bila ew dev ji vê dozê berde. Heke dev jê berde dê hemî pêwîstîyên wî yên kesane bêne cihanîn.” Min got, heke na, dê qet ji ji bo te baş nebe.

Piştî van gotinên min, bi ser min de vegerîya û bi kurtî got “Heke we ji bo serê min kindirek amade kiribe, ez amade me.” Li ser viya, ez ji Erziromê vegeriyam û min vê rewşê bo Hezretî Xazî qiset kir.”

Digel ku ew qas bi eşkerayî gef li Xalid Begî tîne xwendin lê cardin ew ji Erziromê dernakeve. Li gorî Xalid Begî dewlet dixwazê rojek berê tevgera wan bifetisîne. Ji bo viya li pey firsendan e. Derketina wî ya ji Erziromê têye wateya destpêkirina serîhildanê. Lê serîhildana ku di seqema zivistanê de dest pê bike ne pêkan e ku bi ser keve. Ji vê çendê bêtir ku bikevin

dafikekê divêt zivistana 1925 di nav bêdengîyê de bête bihurîn. Birayê wî Ehmed Beg (Ahmet Sever) ku di kanûna paşî ya 1924 de diçe Erziromê, ew jî di heman fikrî de ye. Ehmed Beg dibêje “Dema ku min jê re got, jiyana te di xetereyê de ye, divêt tu ji Erziromê derkevî”, hingê wî ji min re got “Ez hay jê heme ku li dora min xetere heye lê çi dema ku ez vê serê zivistanê ji Erziromê derkevim ev dê ji bo kurdan bibe felaket, teqez divêt em li benda biharê bimînin.” Piştî van gotinan, lê zêde dike û dibêje “Herin, xwe amade bikin lê bisekinin heta ku bihar têye.”

Serhildana Beytüşebabê ku di 4ê îlon 1924 de çêdibe, dibe sedem ku li hemberî Azadîyê operasyon bêne dest pêkirin. Şeva ku 3yê îlonê bi 4ê îlonê ve girê dide efser û serbazên kurd ên li 7 ayîya Piyade ya bi ser Tumena 18. a Qolorduya 7. ku ji aliyê Azadî ve di bin serokatîya Yuzbaşî Îhsan Nûrî de hatine organizekirin, serî hildidin. Piştî ku serîhildan bi ser neket hingê firsendeke dîrokî kete destê kemalîstan. Li Bidlîsê Dîwana Herbê danîn û dest bi operasyonan kirin.

Xalid Beg di roja 20 kanûn 1924 de li Erziromê hate girtin û wî birin zindana Bidlîsê. Xalid Beg piştî ku têye girtin jî ligel tekane kesê ku dihêlin pê re pêwendîyê dayne, ango bi riya xizmetkarê xwe Hemîdê Mamaşî xebere ji birayên xwe re dişîne û wan hîşyar dike dibêje, “Bila ew ji ber girtina wî qet nekevin nav dudilîyê, bila ji bo rizgarkirina wî ya ji zindanê serê xwe neêşînin, bila her li amadekarîyên xwe berdewam bin û amadekarîyên xwe di nav bêdengîyê de bikin û qet firsendê

nedin lîstikan, bila li benda biharê bimînin.” Li ser van hîşyarkirinên Xalid Begî, ji bo rizgarkirina wî cibrî dev ji avêtina ser zindana Bidlîsê berdidin.

## Dîwana Herbê ya Bedlîsê û Xalid Beg

Dîwana Herbê ya Bidlîsê bi nihênîtiyên (muamma) xwe derketiye rojevê. Bi awayekî tekuz nayête zanîn ku gelo endamên Dîwana Herbê ya Bidlîsê kî ne. Ji viya jî grîngtir tu peyvek ji xweparastinên kesên ku hatine dadgehkirin derneketiye derve. Gelek vekirî ye ku Komara Tirk ji vî alî de di nav reftariyeke gelek ketum de ye. Tiştên ku di nav rêzikên nivîsandinên berpîrsiyarên dewletê yên wê demê de carinan têne qisetkirin di vî warî de sedema ewçend ketumbûna dewletê bi me didin famkirin. Bo numûne, Ahmet Sureyya Orgeevren, di kitêba xwe ya bi navê *Şeyh Sait İsyani ve Şark İstiklal Mahkemesi (Serhildana Şex Seîd û Dadgeha İstiklalê ya Şerqê)* de dibêje:

“Belê, li Şerqê amadekarîyên ku bi mehan û salan dihatine kirin dibe ku hê temam nebûbin. Belam li havîna sala 1340 (1924) li ser qewimîna bûyerên ku li herêmen Mûş û Bidlîsê rûdabûn ku bi navê “Tevgera Nâstûrîyan” diha in navkirin li Bidlîsê bi sernavê “Dîwanê Herbê ya Taybet a Bidlîsê” di encama hindek pîrsiyarkirin û dadgehkirinan de, her wiha, di encama hindek biryarên ku derheqê hin beg û serekên kurdan de hatibûn girtin, wê rûpoşa ku rûyê doza îstik-

lala Kurdistanê ku li dijî welat û komarê bû diveşart, hatibû daxistin. “Her wiha Alî Rizayê ku li dewreya yekemîn ya Meclisa Miletî ya Mezin wek mebûsê Bidlîsê wezîfedar bû, Mîralay Xalid Begê Cibrî ku zavayê wî bû û Mela Evdirehmanê Şîrnexî û hindek kesên din di encama biryara Dîwana Herbê ya Taybet bi tawanbarîya doza kurd û Kurdistanê cezaya dardekirinê li wan hatiye birin.”<sup>16</sup>

Ji van gotinên dozger encameke wisan hasil dibe ku Xalid Begî û hevalên wî xweparastineke cidî ya siyasî li hemberî dadgehê kirine. Jixwe, heta bi roja îroyîn nihênî mayîna biryarên Dîwana Herbê ya Bidlîsê jî vê qenacê îspat dike. Çünke kemalistan hem di pêvajoya merhaleyên dadgehê de û hem jî piştî wê zeafên serekên kurdan gelek bikar anîn. Lêbelê wek sirreke gelek nihênî ewçend veşartî girtina dokumantên Dîwana Herbê ya Bidlîsê bi me dide nîşandan ku tu malzemeyeke zeafiyatê ku bête karanîn bidest nexistine.

## Xalid Beg Xwedîyê Kesayetiyeke Kurdewar û Wêrek Bûye

Xalid Beg kesayetiyeke wisan e ku nasnameya kurdayetiye derxistiye pêş û vê nasnameyê bi her kesî daye qebulkirin. Xebata aktîf a li nav Cemîyeta Tealî ya Kurdistanê, rola wî ya di avakirina Azadî û organîzekirina

<sup>16</sup> Ahmet Sureyya Orgeevren, *Şeyh Sait İsyani ve Şark İstiklal Mahkemesi*, Temel Yayınları, İstanbul 2002, r. 38

wê de, her wiha, xebatên wî yên li ser ziman û dîroka kurdan, xebatên wî yên ji bo xwendin û nivîsandina zimanê kurdî di çêbûna nasnameyeke wisan de karîger bûn. Berpirsiyarên wê demê yên dewletê jî xwestine vê nasnameya wî bikarbînin. Mistefa Kemal nameyekê ku ji aliyê mebusêkî muxalîf ê li meclîsê bo Xalid Begî hatîye şandin qest dike û di axiftina xwe de îbareyeke wisan bikartîne: "Nameya ku wî bo Xalid Begê Cibrîyê kurd nivîsandîye."<sup>17</sup> Cardin Sûleyman Necatî yê ku yek ji organîzatorên Kongreya Erziromê ye, dema qala vexwendina Xalid Beg bo Kongreyê dike, derbarê Xalid Begî de îfadeyeke wisan bikartîne: "Miralay Xalid Begê Cibrî yê ku li nav kurdan gelek birêz û sîmayekî bifezîlet bû..." Derbarê Xalid Begê Cibrî de îfadeya herî balkêş aîde M. Halit Fîrat e, ku li Gimgimê yek ji axayên eşîra Xormekîyan û fermandeyê hêza mîlîs a dewletê bûye. M. Halit Fîrat di bîranînên xwe de derbarê Xalid Begî de vana dibêje:

"Gelek baş zimanê erebî û farisî dizanibû. Ez bi awayekî qetî îfade dikim ku di dema me de ji aliyê maqulî û exlaqê paqij de kes di ser Xalid Begî re tune bû".

"Li gor karakterê xwe ji gotina ku ji devê wî derbiketana paş ve gav nedîavêt. Ji bo ku ew dev ji vê dozê berde Atatîrk rabû ji Anqerê bi awayekî taybet mebusê Mûşê Hecî Mela Îlyas Begê Mûşî şande îqametgeha wî ya li Erziromê, pê re dûr û dirêj muhawe-

le kir lê di encamê de têgihaşt ku ew dev ji doza xwe bernade, hingê destvala paş ve vegerîya. Di wê navberê de dema ku Atatîrk ligel jina xwe Lutfîye Xanimê hate bo Erziromê, pê re hevdişînekê kir lê nikarî ji resmîyetê wêdetir biçe"<sup>18</sup>

Yekî ku li dijî Tevgera 1925an mîlîstîya dewletê kiribe û bi kirinên xwe ji serbilind be, gelek balkêş e ku ew derbarê Xalid Begî de van gotinan dibêje. Çi dost çi dijmin ji aliyê her kesî ve bawerîya xurt a Xalid Begî ya li ser doza kurd û Kurdistanê hatîye qebulkirin.

Çavdêriyeke bi vî awayî derbasî raporên bolşevîkan ên ku ji vê herêmê hatine şandin jî bûye. Di raporêkê jî wan raporên ku hatinee şandin de derbarê Xalid Begî de ev yek têye gotin:

"Tenê ez viya dizanim, digel ku tîrk li dû wî ne da ku Xalid Begî tewqîf bikin, her wiha, digel ku sê kadroyên îrtibatê ku ligel me di nav pêwendîyan de bûn hatine girtin jî, lê cardin pêwendîyên wî yên ligel Kurdistanê her berdewam in. Her roj ji Kurdistanê kurd, bi taybet jî cotyarên kurd ji bo ku Xalid Begî bibînin tene Erziromê... Xalid Beg bi her yekî re cihê-cihê hevdişînan pêktîne."

Reftarîya Xalid Begî ya ku li Zindana Bedlîsê nişan daye jî gelek

<sup>17</sup> Mustafa Kemal Atatîrk, *Nutuk*, Cilt II, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul-1968, r. 890

<sup>18</sup> M. Halit Fîrat, *75 Senelik Derbeder Bir Hayat Hikayesi*, Kardeş Matbaası, Ankara-1968, r. 16-20

<sup>19</sup> Dr. Afrasayaw Hawramani, *Piranî Şeyh Said Devrimi*, Çeviren Aris Arda, <http://www.newroz.com/modules.php?name=News&file=article&sid=4238>



rênîşandar e. Yek ji şêxên Norşînê ji Kazim Paşayê (kazim Dirik) walîyê Bidlîsê destûrê dixwaze da ku li zindanê Xalid Begî bibîne. Kazim Paşa dibêje, bi şertê ku hûn ê bi zimanê tirkî bi axifin ez ê destûrê bidim. Lêbelê Xalid Beg şertê axiftina bi zimanê tirkî red dike. Di hev-dîtîna de bi kurdî diaxifin. Şêxê Norşînê dema ku vedigere dibêje “Xwedê we ji vira xilas bike.” Hingê Xalid Beg jî dibêje “Ne ji bo min jî bo kurdan dua bike ku Xwedê wan xilas bike.”

Wêrekî û biryardarîya Xalid Begî di nav xelkê de wî tîne radexa efsaneyekî. Ji vê çendê derbarê wêrekîya wî de gelek çîrok têne qalkirin. Di wan stranên ku di nav gel de derbarê Xalid Begî de têne stîrîn her temaya wêrekîyê têye şuxilandin. Bi taybet jî di strana bi navê “*Mîrê Min*” de ku Denbêj Reso li ser Xalid Begî ristîye ev tema gelek li pêş e. Kilamên ku derbarê Xalid Begî de di nav xelkê de her têne gotin bala kesên ku ji derve hatine jî kişandine ser xwe. Ji vana yê herî li pêş Demir Ozlu ye. Demir Ozlû dema ku li Mûşe wezîfeya xwe ya leşkerîyê dike, gelek di bin tesîra qalkirinên derheqê Xalid Begî de dimîne û çîroka bi sernavê “*Mirina Xalid Begê Cibrî*” dinivîse. Beşek ji çîrokê wisan e:

“*Mirina Xalid Begê Cibrî bûyereke wisan e ku rehên wê di nav kûrahîya salan de ne. Lêbelê ger tu ji yekê Rojhilatî re qala Xalid Begê Cibrî bikî û ev Rojhilatî jî ger yekî dinyadîtî be dê çavên xwe biloq bike û bipirse bibêje “Ma tu ji kû bi mirina Xalid Begê Cibrî dizanî?” Lê ne ku tenê yên dinyadîtî, gelê wê herêmê jî bi mirina Xalid Begê Cibrî dizane. Ez bi xwe jî ji ber eleqedarîya xwe ya bo wan kolosên ku tevayî zivistanê, ji piçûk heta bi mezinan, ku li serê xelkê Mûşe bûn min ev mesele bihîst.*”

“Min ev tişt ji zilamekî ku li sûka Mûşê, li pêşîya dikanê li ber halê guhdarî kir. Dikandarî jî ligel min guhdarî kir, wî jî got “Ew rast dibêje”. Zilamî digot “Xalid Beg general bû”. Li gorî wî, bêguman, ew general bû. Ez li sûka Mûşê bi van tiştan hesiyam. Ez li sûka Mûşê hê bi gelek tiştên din jî hesiyam.”<sup>20</sup>

Wexta ku gel li lehengên xwe xwedî dardikeve dewlet jî destvala nese kinîye. Dewletê bi destê hin kesan pirtûgîn dane nivîsandin û gelek hewl daye xwe da ku Xalid Begî di nav şerê eşîran de nîşan bide, her wiha, bi taybet hewl daye xwe da ku wî tevî “*Komelkujîya Ermenan*” bike. Dema ku wî tiştî kirîye, carînan hindêk nav tevlihev kirine, carînan jî tomet û îffîra kirine. Her çendî ku neyête zanîn bê hela niha Xalid Beg li kû derê di bin axê de ye jî lê ew çiraya ku wî di salên 1920î de vexistibû xwe gihandîye ta bi roja îroyîn.

Di roja 14 nîsan 1925 de lîderê Komîteya Îstîklala Kurdistanê (Azadî) Mîralay Xalid Begê Cibrî ligel mebusê Bidlîsê Yusif Zîya Beg û zavayê wî mulazimê yekem Alî Rîza, her wiha, zavayê wî yê din Faîq, û Mela Evdirehman li sûka Bidlîsê hatin dardekirin.

Li gorî ku Garo Sasunî qal dike, gotinên serokê Azadîyê yên dawîn ev in:

“*Xalid Begê Cibrî: Li hemberî we ez ne bi tenê me. Li pey min hemî neteweya kurd a mezin heye. Hûn îro min gulebaran dîkin, lê qet şubhe nakim dê neviyên me we tune bikin!*”

<sup>20</sup> Demir Özlu, *Öteki Günler Gibi Bir Gün*, Dûnya Yayınları, II. Basım İzmir-2004, r. 43-44

## NÎZAMNAMEYA DERVEYÎ YA KOMÎTEYA ÎSTÎQLALA KURDISTANÊ\*

(wergerandina bo kurdî: Mamoste Qedrî)

1- Armanca Komîteyê ev e ku di navbera kurdan de yekîtiyê çêke û bi alîkariya Hukûmeta Îngilîz serxwebûna kurdan dabîn bike.

2- Komîte ji bo gihastina vê armancê dê li ser sînorên xwe yên neteweyî û di nav welatên biyane yên ku munasib bibîne şaxan veke û pirtûkçe û ewraqan çap bike.

3- Her yek ji şaxên ku di listeya Nîzamnameya Hundirîn de hatine nîşandan gava zorker êrişek biçûk jî bibin ser herêma ku ew şax tê de ye divê li hember vê êrişê nerazîbûna xwe nîşan bide û protesto bike û ji bo ku dinyayê bi vê meseleyê bide hesandin çî ji destê wê bê bike.

4- Di herêma kê de serhildanek şoreşî derkeve holê dê Komîte heya ku ji destê wê bê alîkariya wan bike; bila dixwazî Komîte derbarê vê serhildanê de berê nehatibe agahdarkirin jî.

5- Gava komîteyên din yên siyasî û ne siyasî di herêmên şaxên Komîteyê de bîn avakirin dê mirovên ewlemend bîn helbijartin, van mirovan têkevin nav wan komîteyan û derbarê armanc û çalakîyên wan de Komîteyê agahdar bikin.

6- Girtina biryarên siyasî wezîfeya "Komîteya Navendî" ye. Lê di rewşên naçarî de yên di rêza duyemîn de jî bi şertê agahdarkirina Komîteya Navendî dikarin biryarên wusa bigirin.

7- Komîteyê Kurdistan kiriye sê qisim:

**Qismê yekem:** Kurdistan Tirkîyeyê û Bakûrê Sûriyeyê.

**Qismê duyem:** Kurdistan Iraqê.

**Qismê sêyem:** Kurdistan Îranê.

8- Dê ji bo Komîteyê daîrekî sereke hebe û ji daîreya sereke re jî

\* Daîreya Giştî ya Sicîlan, Wezareta Hewagerî ya Brîtanya , 23 / 412, Qism:2, Eks / Em 4583

daîreyêndî rêza duyem de hebin. Van daîreyan dê şaxên Komîteyê îdare bikin û ji bo hêsankirina îdarekirina şaxên dûr tedbîrên taybet bigirin. Komîsyona Rêvebirnê ya daîreya sereke û daîreyên di rêza duyem de dê ji van çar kesan pêk bê: Serok, nivîsyar, jimêryar (muhasib), saloxgêr (endamê îstîxbaratê). Lê di şaxan de ji sê kesan pêk tê: Serok, nivîsyar û saloxgêr. Her kesê ku di komîteyê de ye xwediyê rayek tenê ye.

9- Dê şaxên Komîteyê nîzamnemeyên daîreyên di rêza duyem de bi rê ve bibin û encaman rapor bikin. Daîreyên di rêza duyem de jî divê bi vî hawayî tevbigerin. Divê her şaxek Komîteyê piçûk-mezin hereketên ku Komîteyê eleqedar dike qeyd bike û bigîjîne şaxên havîdorên xwe. Eger bûyerên girîng çênebin dê her şax di dawiya her mehê de rapora xwe ya derbarê çalakîyên xwe û encamên van çalakîyan de pêşkêş bike.

10- Dê her şax ji bo vekirina şaxên nû li havîdorên xwe xebatê bike.

11- Her şax gava bixwaze endaman helbijêre divê pêşekiyê bide mirovên desthilat (bibandor), serokên eşîran û rewşenbîran.

12- Mirovên ku bên helbijartin divê xwediyê van şertan bin: Zana bin, biesl bin, berjewendiyên neteweyî di ser berjewendiyên xwe yên şexsî re bigirin.

13- Daîreya sereke piştî ku bawer kir ku ew kesê ku dixwaze bibe endam şertên endamtiyê tê de hene divê li ser bergehên wî bisekine, eger hewce bike divê wî bide sondê, wezîfeyên wî pê bide zanîn û paşê wî wekî endam bide naskirin. Divê ev endamê nû kesên ku di meclîsa sondê de ne tenê bibîne, endamên din nas neke.

14- Endamên ku sirên Komîteyê aşîkar bike an jî li hember xalên bernamêya wê xiyaretê bike dê cezayê mirinê lê bê birîn; bila dixwazî ev xiyaret di bin îşkenceyên mezin de jî hatibe kirin.

15- Wezîfeya endaman ev e ku ji bo berjewendiya giştî xebat bikin û çalakîyan pêk bînin. Loma divê ji bo bihêzkirina yekîtiya kurdan û geşkirina hestên kurdaiyê çî ji destê wan bê bikin.

16- Divê her endam li gor dahata xwe du mehane barbû (aîdat) bide.

17- Her şax mafê xwe heye ku gava hewce bike çaryeka dahata xwe xerc bike. Ji bo vî karî lazim nîne ku muraceetî daîreya sereke bike, lê di dawiya her mehê de divê rapora xwe ya dahat û mesrefan pêşkêşî Daîreya Bilind a Îdareker bike.

18- Dê daîra sereke û yên di rêza duyem de di demên cûrbecûr de hesabên şaxan, hejmara endamên wan û xebatên wan kontrol bikin. Sûistimalên malî û leyistika bi hesaban ji aliyê kê ve hatibe kirin dê cezayê mezin lê bê birin.

19- Kesên ku di dema bicîhanîna wezîfeyên xwe de bikevin xeterê ji bo alîkirina wan divê tevê gavan bîn avêtin. Mirovên ku bi vî hawayî têkeve xeterê dê îhtiyacıyên wî û malbata wî ji aliyê Komîteyê ve bîn te'minkirin.

### Civîn

20- Civîn di cihê ku ji aliyê daîreya sereke ve û li gor fermana vê daireyê bê diyarkirin salane tên çêkirin. Ji bo beşdarbûna van civînan dê ji her şaxek mirovek bê helbijartin û di van civînan de xebatên daîreyên di rêza duyem de, rewşa dahat û mesrefan û xebatên ku di salên pêşîn de bîn kirin bîn nîqaşkirin. Paşê ji bo çûyîna Meclîsa Giştî dê sê kes bîn helbijartin.

21- Dê daîreya sereke paşê li cihekî munasib civînek taybet çêke, wê endamên ku ji aliyê komîsyonan ve hatine şiyandin beşdarî vê civînê bibin û tê de xebatên daîreya sereke û dahat û mesrefên wê nîqaş bikin û bernameya wê ya sala pêşîn diyar bikin.

22- Gava meclîs pêdivî bibîne serok û endamên Komîsyona Rêvebirinê tên guhartin.

# Kurdperwerekî Sînornenas: Necmedîn Buyukkaya (1943-1984)

M. Şefîq ONCU

Necmedîn Buyukkaya yek ji wan kurdperweran e ku jiyana xwe bo serxwebûna welatê xwe, azadîya milletê xwe feda kiriye. Necmedîn Buyukkaya ew kes bû ku sînoren ku bêyî îradeya milletê kurd welatê wî parçe kiribûn, nas nekir û bo van sînoren ku ji kurdan re bibûn qeyd û zincîr bişkîne rabibû ser piya. Necmedîn ji bo me hinekan leheng e, ji bo hinekan kurdek bênav e.

Helbet nasandineke objektîf a şexsîyetên ku di dîroka Kurdistanê de bûne xwedîyê ciheke taybet neasan e. Lê hebûna destnîvis, rojnîvis û serpêhatîyên Necmedîn rê dide ku mirov ji devê wî û qelema wî, wî nas bike.



Necmedîn Buyukkaya

## Kurtejiyana wî

Necmedîn Buyukkaya di 1943 de li navçeya Sêwregê, li gundê Qerexanê ji

dayik bûye. Ew ji neh xwişk û birayan, yê sêyemîn e. Malbata wî ji eşîra Qerxanîya ye.

Jiber ku xwendegeh li gundê wan nîne, Necmedîn weka gelek zarokên gund, diçe mizgeftê û li ber destê meleyê gund fêrî Quranê dibe. Mela di dersdana Quranê de têdighêje ku Necmedîn zarokêkî zîrek û bîdeb e, ji hogirên xwe zûtir fêr dibe. Ji bavê wî dixwaze ku wî bişîne dibistanê. Bavê wî jî bi ya mela dike û Necmedîn ji bo xwendinê dişîne gel xalê wî yê ku li Sêwregê dijî. Di sala 1954 de Necmettin bi derengî dest bi xwendinê dike û êdî xwendekar e.

Necmedîn xwendina serate û navîn li Sêwregê diqedîne lê ji ber ku lîse li Sêwregê nîne, vê carê diçe Amedê û li lîseya Ziya Gokalp xwendina xwe berdewam dike. Necmedîn piştî salekê ji sebebê xizaniyê nikare pereyê bo razan û xwarinê bide lîseya Ziya Gokalp û mecbur dimîne ku dev jê berde. Necmedîn piştî Amedê diçe Edenê li wê hem dixebite û hem jî lîseyê dixwîne. Ew dema li Edenê dixwîne, eşêfê dike, pembo berhev dike, di dermanxaneyekê de dixebite û herweha salekê jî di kargehekê de bi şev kar dike û bi roj jî diçe dibistanê. Ew di sala 1965 de lîseyê diqedîne, di îmtihana bo zanîngehê biser dikeve û di Zanîngeha Stanbolê de beşê Hiqûqê qezenc dike.

Necmedîn bo xwendinê diçe Stanbolê lê xizani li wê jî dev jê bernade û mecbûr dibe li alîyekî bixebite û li alîyekî xwendina xwe bidomîne. Ew li Stanbolê di kargeha kabloyan de ji xwe re karek dibîne, bi şev dixebite û bi roj jî diçe zanîngehê. Ev rewş heta ji sebebê pîrsgîrêk navbera karker û karmendan de, ji kar tê avêtin, dom dike.

Salên xwendina li Adenê bo Necmedîn dibin sebebê naskirina pîrsgîrêkên civakî, lê salên Stanbolê dibin destpêka beşdarbûna xebat û têkoşîna birêxistinî. Necmedîn di sala 1966 de dibe endamê **Civaka Xwen-dekarên Xwendegeha Bilind a Sêwregê** (Siverek Yüksek Tahsil Talebe Cemiyeti), **Civaka Xwende-karan a Rihayê** (Urfa Talebe Cemiyeti) û **Civaka Xwendekarên Fakulteya Hiqûqê ya Stanbolê** (İstanbul Hukuk Fakültesi Talebe Cemiyeti).

Ew di heman salê de dibe endamê **TÎPê** (Türkiye İşçi Partisi) û piştî salekê jî dibe endamê **FKF** Fikir Kùlùpleri Federasyonu). Bi endamtîya TÎPê jiyana Necmedîn a siyasî dest pêdike, Necmedîn ji endamtîya TÎPê ber bi bîrpirsiyariyên di nava tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê ve diçe û têkoşîna wî bêrawestan heta 22. 01. 1984 dewam dike.

Necmedîn di xebatên xwe yên siyasî, name û nivîsên xwe de ev nav bikar anîne: Neco, Selah, Zerdest, Rober, Rober Suwar, Selaheddîn Zerdest, Ferman û Bakûr.

Bi navên Serdil û Elya du keçên wî hene.

### **Cih û Rola Necmedîn Buyukkaya di Nava Tevgera Rizgarîxwaz de**

Necmedîn hê dema xwendina lîseyê ji pîrsgîrêk û nakokîyên civakî haydar e, lê armanca wî ya sereke xwendin e. Di dema xwendina bilind a li Stanbolê digihêje wê qenaetê ku divê ew li hemberî pîrsgîrêkên heyî bêdeng nemîne,

alîgir be û bo çareserîyek li ser esasê heqaniyetê xwedî helwest be. Sebeb ev e ku Necmedîn êdî hewldanên siyasî û lêgerîna bo xebata bi rêxistinî dike armanca xwe ya sereke, di vê demê de xwendin bo Necmedîn di dereca duyem û sêyem de ye. Ew têdighêje ku xebata komelan bo çareserîyê têr nake, meyla xwe dide ser xebata siyasî û ya bi rêxistinî.

Necmedîn bi bîr û ramanên xwe çepgir e, dema di nava **FKF**ê de ye nêzî Deniz Gezmiş e. Di wê bawerîyê de ye ku pîrsgirêkên civakî û çînî di pêşengîya tevgera çîna karker de dikarin bîn çareserkirin, bo vê yekê jî dibe endamê **TÎP**ê.

Di heman demê de rewşenbîrîyek kurdî jî li bajarên mezin ên wek Stenbol û Anqerê dest pêkirîye û zilm û zordestîya dewletê li ser kurdan zêde dibe; rayedarên tirk bi gotin û daxuyanîyên xwe kurdan rûmetşikandî dikin. Rewşenbîr û xwendekarên kurd ên li Stenbol û Anqerê jî dikevin nava hewldanan û li rê û rêbazên xwebirêxistinkirinê digerin. Di encama van lêgerînan de, di qada xebata legal û demokratîk de **DDKO** (Devrimci Doğu Kültür Ocağı/ Ocaxa Çandî û Şoreşgerî ya Rojhilatê) derkete holê.

Di navbera salên 1969 - 1971 de li Anqere, Stenbol, Amed, Erxenî, Farqîn, Batman û Hezo (Kozlîx) jî alîyê rewşenbîr, mela û xwendekarên kurd ve **DDKO** tîn damezrandin. Necmedîn Buyukkaya jî li gel grûbek ji rewşenbîr û xwendekarên li Stenbolê dijin di 27ê gulana 1969an de **DDKO**ya Stenbolê dadimezirîne û dibe serokê wê.

Xebatên bo damezrandina **DDKO** û

avakirina wê di pêwendîyên Necmedîn de pêvajoyek nû vedike. Necmedîn êdî berpirsek tevgera kurd a demokratîk e û di destpêka pêwen- diyên bi tevgera siyasî ya Kurdistanî de ye. Ew di vê demê de bi lehengî, çelengî û dilsozîya xwe hem bala dijmin, hem jî bala birêvebirên tevgera siyasî dikşîne.

Di 12ê adara 1971ê de artêşa tirk bi darbeyekê tê ser hukûm. Li Tirkîyeyê û Kurdistanê Bakûr orfî îdare tê îlan kirin û li gel hemû sazîyên siyasî û demokratîk **DDKO** jî tîye qedexekirin. Gelek berpirs, damezrêner û birêvebirên wê tîn zindankirin. Necmedîn yek ji wan kesan e ku her roj navê wî di radyoyê de tê xwendin, resmên wî li avayîyên hukûmetê, îstasyonên tren û garajên otobusan tê daleqandin.

Mecala mayîna Necmedîn li Tirkîyeyê û Kurdistanê Bakûr nemabû. Di rojnivîsên xwe de dibêje; ew di 26ê hezîrana 1971ê de derbasî Kurdistanê Başûr bûye.<sup>1</sup>

Necmedîn di îfadeya xwe ya li gel polisê Sûrîye dibêje; ew di 10. 07. 1971 de bûye endamê **Partî Demokratî Kurdistan li Tirkîya**.<sup>2</sup> Dîsa ew di rojnivîsên xwe de dinivîsîne ku wî di heman rojê de sonda partîyê xwarîye. Di her du belgeyan de eşkere dibe ku Necmedîn piştî derbasî Başûr dibe, dibe endamê **PDKa Dr. Şivan**.

Dema Necmedîn li Başûr e pîrsgirêka navbera Dr. Şivan û Saîd Elçî

<sup>1</sup> Buyukkaya, Necmedîn, *Kalemimden Sayfalar*, Weşanxaneya APEC-TRYCK, 1992 Swêd, r. 140

<sup>2</sup> Buyukkaya, Necmedîn, *Kalemimden Sayfalar*, Weşanxaneya APEC-TRYCK, 1992 Swêd, r. 140

rûdaye. Di nava partiyê de; yanî di nava her du partîyan de gengeşiyên nexweş derdikevin meydanê. Piştî demekê diyar dibe ku serokê PDKa Tirkîyê Saîd Elçî hatiye kuştin, demeke kin piştî kuştina wî jî ji PDKa ku Necmedîn jî endamê wê ye sekreterê partiyê Dr. Şivan (Saîd Kirmizitoprak) û du endamên buroya siyasî bi gumana kuştina Saîd Elçî tîn girtin. Berpirs û endamên din ên partiyê jî bi destûra PDKa Îraqê li wê dimînin an bi rêdana wê ji wê vediqetin.

Necmedîn di rojnîvisên xwe de dibêje: "Ew ê heta rewşa partiyê bi temamî fam bike, bisekine, lê ew ê wek ku di nava hin kesên tesadufî hatine gel hev de ye, tev bigere."<sup>3</sup>

Ew di rojnîvisên xwe de dibêje ew di 22ê sibata 1972 de ji Bamerneyê li gel Kurdo (Omer Çetîn) û Cudî (Omer Ozsokmenler) veqetîyaye û di 26ê sibatê de gihîştîye Qamişloyê.<sup>4</sup>

Dema Necmedîn li Kurdîstana Sûrîyê ye, li mala Ekrem Cemîl Paşa dimîne û bi rewşenbîr û siyasetmedarên kurd re dikeva nava pêwendîyan. Necmedîn jî aliyekî dixwaze bo xebata pêserojê zemînek bo pêwendîyan ava bike û jî aliyekî jî, ji jiyan, xebat û tecrubeyên kurdperwerên weke Ekrem Cemîl Paşa, Dr. Nûrî Dêrsimî têgehan derxîne. Agahî ev e ku Necmedîn, Ekrem Cemîl Paşa îqna kirîye da ku ew bîranînên xwe bînvîsîne û nusxeke orjinal a bîranînên wî di arşîva Necmedîn a taybet de ye.

<sup>3</sup> Buyukkaya, Necmedîn, *Kaleminden Sayfalar*, Weşanxaneyê APEC-TRYCK, 1992 Swêd, r. 141

<sup>4</sup> Jêdera berê, r. 147

Necmedîn di 22ê îlona 1972 de ji Sûrîyê derdikeve û diçe Pragê. Ew li Pragê jî bi kurdên li wê dijîn pêwendîyan datîne û armanca wî ev e ku ji Pragê derbasî Swêdê bibe. Ew di 06. 10. 1972' de ji Pragê ber bi Swêdê dikeve rê û li wê bo penaberîyê serî li swêdîyan dide.

Piştî ku Necmedîn mafê penaberîyê werdigre û pasaportê distîne êdî sekin jê re nîne. Ew bo biserhevanîna tevgerê rojek li Almanya Rojava, ya din li ya Rohilatê, roja dinê li Sûrîyê yan li Lubnanê ye.

Necmedîn li Ewropayê bi derûdorên siyasî, rewşenbîrên kurd re dikeve nava pêwendîyan. Ji aliyekî ve dixwaze bûyera her du Seîdan ronî bike û jî aliyê din jî dixwaze bi hin hevalên xwe re careka dinê partiyê reorganîze bike.

Necmedîn di 02. 04. 1974 de dizivire bo Şamê û jî wê jî derbasî Beyrûdê dibe. Li Beyrûdê ew, Omer Çetîn, Omer Ozsokmenler, Nazmî Balkaş (Soro) û çend kesên din bi hev re ne. Ji destnîvisên Necmedîn diyar dibe ku ew, Omer Çetîn û Soro ji bo nivîsandina program û destûra partiyê (partiyekê) li Lubnan û Sûrîyê ketina nava hewldanan. Dîsa di heman demê de Necmedîn jî di nav de bo pêwendîyên neteweyî û navneteweyî bi gelek hêz û partiyên parçeyên din ên Kurdistanê û yên ereb re hevdiîtinan pêk tînin.

Piştî seferên di navbera Ewropa, Sûrîyê û Lubnanê de, ew di sibata sala 1975 de vedigere welat. Li Tirkîyeyê efûyek giştî derketîye û Necmedîn jî ber bi efûyê ketîye.



Necmedîn yek ji wan kadroyên sereke ye ku piştî vegera ji dervayî welat xebatên xwe yê bo biserhevanîna tevgera kurdî didomîne. Di dereceya yekê de armanca Necmedîn bi-serhevanîna PDK-T a Dr. Şivan e. PDK-T di sala 1975 de xwe ji nû de organîze dîke û Necmedîn jî yek ji pêşewayên vê partiyê ye. Necmedîn heta ji partî- yê vediqete di nava xebatek bêrawestan de ye.

Di sala 1977 de di navbera Necmedîn û birêvebirên partiyê de nakokî dertên, pêşî li van nakokîyan nayê girtin û dibin sebeb ku Necmedîn ji partiyê veqete.

Bi qasî ji name û destnivîsên wî têye famkirin, sebebên ji partiyê veqetandina Necmedîn; têkilîyên partiyê bi YNKê (Yekîti Nîştîmanî Kurdistan) re û şeweyên xebata kadroyên birêvebirîya partiyê ne. Gazin û îddîayên Necmedîn ev in ku partî, sozên xwe li hemberî YNKê bi cih nayîne û bo vê yekê jî hem prestîja partiyê kêm dibe û hem jî YNK û şoreşa Kurdistanê Başûr zêrêrên mezin dibîne. Ji aliyê dinê Necmedîn jî birêvebirîya partiyê dixwaze ku li gora erk û armancên partiyê tevbigerin û ne her kes bi qasî dikare, lê her kes li gorî ku pêwîst e wezîfeyan wergire û bixebite. Necmedîn di vî derbarî de li danişîna 04. 01. 1977 de raporek berfireh pêşkêşî civîna Komîteya Navendî ya partiyê dîke. Lê raman û pêşniyarîyên wî maqul nayên dîtin.

Îddîayên birêvebirîya PDK-Tê jî ev in ku Necmedîn bi serê xwe sozên dide YNKê û ji dêvla xebatên partiya xwe, bêtir karê YNKê dimeşîne û hin endam



Necmedîn ligel Mam Celal e

û kadroyên partiyê jî weke ku biryara partiyê be, mecbûrî van karan dîke.

Piştî ku Necmedîn ji partiyê vediqete temamê bal û enerjîya xwe bo alîkarîya YNKê bikar tîne. Ked û xebata Necmedîn ji YNKê re dibe alîkarîyek mezin. Di derbaskirina pêşmergeyan de, di peydakirina alav û pêdivîyên wan de Necmedîn roleke taybet dileyîze. Ev dibe sebeb ku di derheqî wî de tawanbarîyên wek "qaçaxçî (mişextvan) an jî celalî" bînin kirin. Pêwendîyên Necmedîn bi YNKê re ewqas xurt in ku dibe sebebê îddîaya ku Necmedîn di nava birêvebirîya YNKê de ye.

Hin nameyên wî van îddîayan piştrast dîkin. Ew di nameyeke xwe ya di

08.11.1977 de behsa kuştina Hesên Xoşnav dike û dinivisîne; “Ev darbe bo me gelek giran bû, ez dikarim bêjim ku tevger terpiland”.<sup>5</sup>

Weke ku Necmedîn van îdîayên derbarê xwe de zanibe, di nameyeke xwe ya dinê de weha dinivisîne.

“Wan xebatên ku tu dizanî, ez bi zehmetiyên gelek mezin didomînim. Ew xebatên ku ez wan wek xebata sereke bi nav dikim, şehtë li xebatên min û hevalên min ên li Kurdistanê Tirkîyeyê ku em wan wek xebatên esasî bi nav dikin, dide. Lê ew ê şaşiyek mezin be ku em vê alîkarîya pêwîst red bikin. Ewên ku min rexne dikin û êrîşî min dikin, an nizanin an jî naxwazin bibînin ku dê têkoşîna çekdar a di pêşengîya *Yekîti Nîştîmanî Kurdistan* de, bêtî alîkarîya me tîk bibe.”<sup>6</sup>

Necmedîn di adara 1978 de tevî komek hevalên xwe **KAKê (Komeleya Azadiya Kurdistan)** didamezirîne û dibe sekîterê wê. Lê hem xebata wan û hem jî birêxistinbûna wan teng e, di dereca kadroyan de ye û alîkarîya şoreşa Başûr jî wan re armanca sereke ye. Ew piştî sala 1980 bala xwe zêdetir dide Kurdistanê Bakûr û dikeve nava hewldanên avakirina rêxistineke nû. Di heman demê de di nava xebata êkîtiya siyasî de ye. Bi hin kom û rêxistinên Kurdistanê Bakûr re dixwaze yekîtiyekê pêk bîne. Li gora agahîyan KAKê di vê demê de tê feshkirin û jî dêvla wê **KKP (OK)** (Komîteya Damezrandinê ya Partiya Komunîst ya Kurdistanê) tê damezrandin.

<sup>5</sup> Buyukkaya, Necmedîn, *Kaleminden Sayfalar*, Weşanxaneyê APEC-TRYCK, 1992 Swêd, r. 59

<sup>6</sup> Jêdera berê r. 75.

Lê li Bakûr şert dijwar bûne. Leşker hatiye ser hukûm, bi hezaran kadroyên şoreşger û welatparêz hatine girtin, ewqasê wan jî welêt terikandine. Armanca Necmedîn ev e ku ji grûb û kadroyên ku ji aliyê îdeolojîkî nêzî hev in partîyeke nû ava bike lê bi ser nakeve û di roja 15. 04. 1982 de li Amedê di mala xwe de têye girtin.

### Hizr û Ramanên Necmedîn

Necmedîn bi hizr û ramanên xwe çepgir e, lê ew ne ji wan çepgirana e ku xwebirêxistinîkirina kurdan red dike, têkoşîna rizgarîxwaz a Kurdistanê bi tevgerên çep ên welatên dagirker ve girê dide. Necmedîn, Kurdistanî ye û ne tenê rîzaqariya parçeyek Kurdistanê, rizgarîya 'emû parçeyên Kurdistanê di heman dereceyê de girîng dibîne.

Ew di nameyekê ku di roja 27. 04. 1976 de ji birayê xwe Şerwan re nivisandîye weha dibêje:

“Tîştê ku ji me têye xwestin ev e, ku em li ser esasa hevkarîya çîna karker ku berjewendiyên wê yên esasî di rizgarîya welatê me de ye û çîna gundîtiyê bi pêşengîya îdeolojîya Marksî û Lenîmî, pêk binin, şertên xwe rast binirxînin û di qada siyasetê de bingeha heza xwe ya pêşewan (partîyê) saxlem bikin.”<sup>7</sup>

Necmedîn di vê nameyê de bi berdewamî weha dinivisîne:

“Di dema me de bo serkevtina şoreşên neteweyî û despêkirina serhildanê hin şertên esasî hene:

<sup>7</sup> Jêdera berê r. 41

1. Partîyek pêşevan a proleter û bi disîplînek weka pola
2. Di pêşengîya partîya çînî de bereyêke welatparêz
3. Daxwaza hemû çîn, tebeqe û hêzên neteweyî bo şerê li dijî mêtîngerî û zilmê.”<sup>8</sup>

Ew di nameyeke xwe ya dinê de, ber-nameya şoreşê bi nav dike û dinivîsîne:

“Programa me ya mînimûm şoreşa demokratîk a neteweyî, ya maksîmûm jî bi naveroka xwe şoreşa sosyalîst e. Necmedîn di heman nameyê de behsa artê-şêke şoreşger a gel jî dike.”

Di xusûsiyetên Necmedîn ên ramanî hene ku balkêş in. Yek ev e, ku ew di wê bawerîyê de ye, li kîjan parçeyê Kurdistanê şoreş dest pêbike, divê kadroyên parçeyên dinê di xizmeta wê de bin û a din jî hizrê li çar parçeyên Kurdistanê damezirandina partîyeke hevbeş e.

Necmedîn di nameyeke xwe ya ku li roja 17. 01. 1978 hatiye nivîsandin de behsa vê mijarê dike û weha dinivîsîne:

“Hewldanên me yên bo li seranserê Kurdistanê damezrandina partîyeke komunîst û pêşevan, dom dîkin... Bi vê munasebetê min hin pêwendî danîn. Lê divê ez destnîşan bikim ku di hizrê partîyeke merkezî li seranserê Kurdistanê de, bi ser neketin. Ji çewtîya vî fikrî wêdetir ez difikirim ku hê zû ye... Lê dê pêşketinên Kurdistanê yên dîrokî vê rastîyê bîne rojevê, ez di vê qenaetê de me.”<sup>9</sup>

Piştî Necmedîn têdighêje ku damezrandina rêxisitîneke weha neasan e, hewl dide ku li Kurdistanê Bakûr rêxisitîneke wek YNKê ava bike. Tête zanîn ku ew li gel Ala Rizgarî demeke dirêj di nava vê hewldanê de ye. Ew heta girtina xwe jî vê hêviya xwe diparêze.

Di name, destnivîs û gotarên wî de diyar e ku Necmedîn hemû rûdan, bûyer û pêşketinan bi perspektîveke îdeolojîk dinirxîne. Pîvan û terminolojîya wî çep e û bo vê yekê jî hem pozîsyona şexsiyetan û hem jî cihê grûb û rêxisitinên siyasî di nava tevgera rizgarîxwaz de, bi “îdeolojîya çîna karker” dinirxîne û ne kêmanî caran jî sebebê vê perspektîfa teng, neheqîyek ramanî li derûdora xwe dike.

Di nameyekê ku berîya ji PDK-T veqete nivîsandîye de, derheqê birêvebirîya partîya xwe de weha dinivîsîne:

“Navbera min û hevalên min ên zarokên çîna serdest her diçe xera dibe. Bi ya min ev ji karakterên xwe yên çînî durûtîya xwe nîşan didin. Ev durûtî, tirsonekî û opurtînîstîya wan, her ku şîxul ciddî dibe, bêhtir berbiçav dibe... Her çî ew bêjin ew marksîst in jî, çîna serdest, çîna serdest e.”<sup>10</sup>

Yek ji diyaredeyên ku Necmedîn bi perspektîfa îdeolojîk li rûdanan dinêre jî, şerê navbera Yekîtiyê û Qiyada Miweqet e. Ew ne tenê di şerê li hemberî baasîyan herweha di nakokî û şerê Yekîtiyê û Qiyada Miweqet de jî alîgirê Yekîtiyê ye û helwesta wî wek ya kadroyek YNKê ye.

Necmedîn li ser pîrsa; “çima têko-

<sup>8</sup> Jêdera berê, r. 42

<sup>9</sup> Jêdera berê, r. 72

<sup>10</sup> Jêdera berê, r. 54

şîneke nû?" jî weha dinivîsîne:

"PDK-T û DDKD, DHKD (PSKT), ASKDER (KOMAL) her yek ji wan wek rêxistîneke sîstemê bûn. Dê wan nikaribûya pîrsgirêkên KHKH (Tevgera Rizgarîxwaz a Gelê Kurdistanê) çareser bikirana û nekirin jî. Pêwist bû ku KHKH bibûye xwediyê rêxistînen têkoşer."<sup>11</sup>

Ji aliyê dinê Necmedîn; bi şeweyek bêşînor fedekar, biryardar, jixwebawer di siyaseta de bêtawîz û hişk bû. Ne dûrî aqila ye ku evan xusûsiyetên wî di kar û xebatên wî yê siyasî de bûbin sebêbê alozî û astengîyan.

### **Necmedîn Giringîyeke Mezin Daye Ziman û Berhevkirina Belgeyan**

Bi qasî tê zanîn Necmedîn bi xwe pirtûk nivisandîye. Sebeb ev e ku wî piraniya dema xwe bi karên pratîk ve derbas kirîye. Lê Necmedîn bi gelek sebaiban nivisandîye. Mijarên wan hema hema hemû siyasî, gelek name û gotar nivisandîye. Wî herweha serpêhatiyên xwe nivisandîye û kar û barên xwe, çûn û hatinên xwe di rojnivîsan de nivisandîye. Hin ji gotar, serpêhatî û nameyên wî, xebata wî ya li ser ferhengeke zazakî-tirkî di pirtûka bi navê *Kalemimden Sayfalar* hatine berhevkirin. Pirtûk ji aliyê birayê wî Şerwan ve hatiye amadekirin.

Wî, name, rojnivîs, rapor û gotarên xwe bi tirkî, kurmançî û zazakî nivisandîye. Ligel gotar, rapor, name û ser

pêhatiyên xwe car caran çîrok, metelok û îdyomên kurdî (kurmançî/ zazakî) jî berhev kirine.

Necmedîn ji bira, dost û hevalên xwe dixwaze ku ew fêrî kurdî bibin, bixwînin û binivîsin. Ew bi xwe jî hewl dide ku kurdîya xwe her pêş ve bibe. Di nameyek bo Mîr Kamûran Bedirxan de weha dinivîsîne:

"Em keçek û xortekî kurd in. Niha li Swêdê dixwînin. Ji me, ya keç navê wê Xendan û bi xwe Kurmanc e. Ê xort Neco ye û bi xwe Zaz(ay) e. Sêwregî ye. Em bi xwe li gund mezin bûne. Lewra weke gundîkî be jî em bi kurdî dipeyivin. Lê heyf wek diyar e, em nikarin durust û xweş binivîsin. Me bihîst ku hun mîrên me dibin alîkar ji bo zaro(y)ên Kurdan ku dixwazin zimanê xwe hîn bibin. Ger diqede û ji bo we ne bar be, pirtokên xwe yê li ser ziman û li ser edebîyata me ji me re bi rê kin. Em dê zor sipas bikin. Berî her tiştî me biborînin ku em we diwestînin. Lê piştî ku pirtok bighêje destê me, em dê ji dil û can li ser zimanê xwe ê şîrîn bixebitin.....

15. 11. 1974, Swêd, Xendan Jamil û Neco B.Kaya"<sup>12</sup>

Necmedîn bi sernivîsa *Qissebendê Zazakî-Tirkî* jî 4000 zêdetir peyvên zazakî berhev kirine. Dîsa hin destnivîsên Necmedîn hene ku destnîşan dike ku ew li ser gramera zazakî jî xebitiye.

Necmedîn ligel zaravayên kurmançî û zazakî, soranî jî dizane û hewl daye zimanê welatê ku li wê derê diji fêr bibe. Dema ew li Swêdê ye di

<sup>11</sup> Jêdera berê, r. 312

<sup>12</sup> Jêdera berê, r. 30

demek kurt de bi qasî karibe dest bi zanîngehê bike, fêrî swêdî dibe, dîsa di her fersendê de diçe kursa erebî û xwe fêrî erebî dike. Necmedîn bi qasî dîkare bixwîne û binivîsîne fêrî erebî jî dibe.

Necmedîn girîngîyeke taybet daye belgeyên dîrokî jî. Dr. Kemal Fuad di pirtûka xwe bi navê Kurdistan *The First Kurdish Newspaperê (Kurdistan. Yekemîn Rojnameya Kurdî)* dinivîsîne ku Necmedîn ev nusxeyên orjînal ên Kurdistanê berhev kiriye û bo li ser bixebite daye wî. Dr. Kemal Fuad tevî wêneyek Necmedîn pirtûka xwe diweşîne û di pêşkêşa wê de weha dinivîsîne: "Be giyanî şehîdê nemir Necmedîn Buyukkaya (Neco) ke ev rojnameya li fewtan rizgar kir û bo belavkirinê ragihand min."<sup>13</sup>

Necmedîn di rojnivîsa xwe ya di 15.09.1976 de li Serê Kanîyê di vê derbarê de weha dinivîsîne:

"Memdûh Selîm Beg di 25. 07. 1976 de wefat kiriye... Min xwest kitêbxaneyaya wî bikirim. Lê jîna wî hinek entîqe derket, min çar hezarên sûrî tê da, neda... Min pirtûkên partîyê anîn li nik Îsmet hiştin. Min ew xistine nav çanteyek mezin... Ev çante bi rastî wek xezîneyekê ye. Ez çûm Helebê li vir min *Diwana Melayê Cizîrî* û hema hema bi temamî rojnameyên *Wicdan*, *Hurriye*, *Kurdistan* û kovara *Hetawî Kurd* anîn".<sup>14</sup>

Tê zanîn ku Necmedîn ji bo orjî-nalaye yekemîn rojnameya kurdî *Kurdistanê* bi dest bixe çûye heta Qahîreyê.

Dîsa Necmedîn ji bo çapkirina ser-pêhatîyên Dr. Nurfî Dêrsimî, xanîma wî Ferîde Xanê teşwîq dike û soza alîkarîyê dide wê.

## Necmedîn Kurdperwer û Şoreşgerekî Sînornenas bû

Em ji destnivîs, name û ser-pêhatîyên wî têdîghên ku Necmedîn li her çar parçeyên Kurdistanê gerîyaye piştevanîya tevgera azadîxwaz li wan parçeyan kiriye, bi destkevtîyên wan şa bûye, bo çareserîkirina pîrsgirêkên wan serê xwe êşandiye.

Beşek ji çûnûhatên Necmedîn di name û rojnivîsên wî de weha hatine destnîşankirin:

- 26 gulan 1971: Terka Îstenbolê
- 28 gulan 1971: Hîlwan
- 26. 06. 1971: Kurdîstana Başûr, Dîşêş
- 27. 11. 1971: Bamernê (Kurdîstana Başûr)
- 26 sibat 1972: Qamişlo
- 22 îlon 1972: Prag
- 06. 10. 1972: Swêd
- 22. 03. 1974: Almanyaya Rojava
- 28. 03. 1974: Almanyaya Rojhilat
- 02. 04. 1974: Şam
- 14. 04. 1974: Bêrûd
- 02. 06. 1974: Şam
- 03. 06. 1974: Qamişlo
- 17. 06. 1974: Amûdê
- 29. 06. 1974: Berlîn
- 06. 10. 1975: Şam
- Payîza 1975an: Sûrîye
- 30. 01. 1975: Şam
- Havîna 1976an: Şam
- 26. 01. 1976: Bêrûd
- 26. 02. 1976: Şam
- Çirîya Paşîna 1976an: Bakûr

<sup>13</sup> Fuad, Dr. Kemal, *The First Kurdish Newspaperê*, 1998 Sulaimaniyêç

<sup>14</sup> Buyukkaya, Necmedîn, *Kalemimden Sayfalar*, Weşanxaneyaya APEC-TRYCK, 1992 Swêd, r. 233

30. 04. 1976: Şam  
 01. 06. 1976: Qamişlo  
 03. 06. 1976: Amed  
 04. 06. 1976: Qilaban (Uludere)  
 11. 06. 1976: Kurdistanî Başûr  
 12. 06. 1976: Sêwreg  
 26. 06. 1976: Şam  
 28. 06. 1976: Qamişlo  
 14. 07. 1976: Dêrika Hamo  
 03. 08. 1976: Serê Kanîyê  
 07. 08. 1976: Bakûr  
 30. 08. 1976: Qilaban (Uludere)  
 15. 09. 1976: Serê Kanîyê  
 19. 11. 1976: Sirûc  
 29. 11. 1976: Sûrî  
 04. 09. 1977: Kurdistanî Başûr  
 25. 04. 1977: Ji Nisêbînê derbasbûna Bakûr  
 03-05 nîsana 1977an: Anqere  
 05. 05. 1977: Îstanbul  
 03. 07. 1977: Kurdistanî Başûr  
 12. 07. 1977: Garê (Başûr)  
 14. 07. 1977: Bakûr  
 18. 07. 1977: Îstanbul  
 23. 09. 1977: Şam  
 16. 10. 1977, Gever (Bakûr)  
 27. 10. 1977: Sûrîye  
 Sibat, 1979: Mehabad (14)  
 18. 07. 1980: Şam  
 Tebax, 1980: Londra  
 12. 02. 1981: Heleb  
 27. 06. 1981: Şam  
 .....  
 15. 04. 1982: Girtîgeha Leşkerî ya Amedê

Jiyana Necmedîn heta girtina wî di rêya tevgera rizgarîxwaz de bi vî awayî dewam dike. Hewceyî gotinê ye ku ev çûnûhatinên Necmedîn hemû bo erkên wî yên birêxistîni ne û her yek bo bicîhanîna wezîfeyê girîng e ku di nava wan de hevdiştinên bi berpirsên

rêxistinên parçeyên dinê, temsîla partîya xwe di komcivînên partîyên bira û dost de, organîzekirina derbaskirina alav û pêşmergeyên YNKê, organîzekirina hevdiştinên berpirsên YNKê bi rêxistinên Kurdistanî Bakûr e. Necmedîn di vê demê de bi caran bi sekreterê giştî yê YNKê Celal Talebanî û berpirsên YNKê sereke ên wek Dr. Fûad Maşûm, Omer Mistefa û Elî Eskerî re têye ligel hev.

### **Hobîyên Necmedîn Buyukkaya**

Necmedîn di jiyana xwe ya taybet de mirovekî sosyale. Ji her çîn û tebeqeyên civakî heval û dostên wî hene. Bi biçûkan re jî bi mezinan re jî dide û distîne. Dîsa têye zanîn ku wî qedrek mezin daye zarok û malbatên şehîdan, heta ji destê wî hatîye wî li wan pirsîye û alîkarîya wan kirîye.

Hevalên nêzî wî dibêjin, Necmedîn bê makîneya xwe ya resman û teyba xwe nedîçû cihekî. Wênekişandin, hevpeyvîn û denggirtina navdar û şexsiyetên kurd hobîyên wî yên sereke ne. Li gora agahîyan di arşîva wî ya taybet de bi hezaran wêne hene ku hin ji wan ên şexsiyetên kurd in. Dîsa di arşîva wî de hevpeyvînên bi gelek kurdên navdar re hene ku nehatine weşandin.

Necmedîn ji nivîsandin û xwendina helbestan jî hes dike. Kurtehelbestek wî weha ye:

*Dewlemend e welatê me,  
 Lê îro roj wêran e... talan e...  
 Xebatkar in pale û gundîyên me,  
 Lê îro roj tazî ne... birçî ne...  
 Jîr e gelê me, wek hemû gelan,  
 Lê îro roj gēj kirine... bê keys xistine....*

Hin kasetên wî ku di wan de helbest xwendine jî hene.

Necmedîn ji muzîkê jî hes dike û bi taybetî li hunermendên wek Mihemed Şêxo, Kawîs Axa, M. Arif Cizrawî û Şivan Perwer guhdarî kirîye. Ewqas ji kilama Bavê Fexrîya hes kirîye ku di gelek sohbetên dost û hevalan de bi xwe strîyaye.

Dema Necmedîn li Swêdê ye fêrî danseka swêdî ya gelerî dibe, di her şert û mercî de spor dike û hay ji xwarin û vexwarina xwe heye.

Necmedîn bi bejn û bedewîya xwe ve jî balkêş e, di çek û bergên xwe de hesas e û hewl dide xweşik li xwe ke. Tê zanîn ku hevaltiyek wî bi derhênerê navdar Yilmaz Guney re heye. Tê gotin ku bejnûbala wî ewqas tesîr li Yilmaz kirîye ku rojek jê re gotiye were di filmeke min de rol wergire. Necmedîn bi nazîkî vê teklîfa wî red dike.

## Di Girtîgehê de Necmettin Buyukkaya

Necmedîn di 15ê nîsana sala 1982 de li Amedê tê girtin. Îşkenceyên giran lê têne kirin lê ew li hemberî dijmin serî natewîne. Gelek kes di îşkencexaneyê û girtîgehê de dibin şahidê lehengîya wî. Hin ji wan bersîva pirsên min weha didin.

**Zulkuf Ozel:** Ez û vî mêrxasê kurd di nîveka meha nîsana 1982 de li girtîgeha eskerî ya Amedê, li odayeke lêpîrsînê leqayî hev hatin. Em her du jî ji doza **KÎP-DDKDê** hatibûn girtin. Dema min wî dît piir metîn bû. Awir û helwesta wî biryardar û bawermend bû. Di her fersendê de bi dengê xwe, bi jest

û mîmîkên xwe, bi girtîyan re dikete têkilîyê û manewîyeta wan bilind dikir. Destê xwe dikir kulm, bilind dikir û ji derûdora xwe re digot: Xwe sist mekin! Guh nedin kesên din, di berxwe bidin! Dê ev roj jî derbas bibin. A rast ev bû ku ev helwesta wî tesîreke mezin li me dikir. Ez dikarim bêjim ku gelek heval bi saya wî li ser pîya man, zer-areke mezin bi saya wî rû neda.

Kek Necmedîn bû muxatabê îşkenceyên gelek hov. Lê serî wî her bilind bû, devliken bû, bi helwesta xwe pîrskeran (îşkencekeran) dîn û har dikir. Di lêpîrsînê de pîrrayî ji Necmedîn navên hevalên wî, pêwendiyên wî yên bi rêxistinên Kurdistanê Başûr re, anîn û birina çekan û derbaskirina ji sînoran dihate pîrsîn. Piştî 90 rojî Necmedîn birin qawîşa 5an, em jî hev veqetîyan, lê me di mahkemê de hevdu didît. Helwesta wî ya di mahkemê de jî cihê bû, gotina xwe qet venedîşart û tiştê ku rast bidîta, digot.

**Selim Çurukkaya:** Heger ez ne şaş bim, Necmedîn jî di 1982 de anîn hucreya ku em lê diman. Berîya ku Necmedîn were, cuntaya 12ê îlonê bi zext, gef, lêdan û îşkenceyan hewl dabû ku me teslîm bigre. Di nav me girtîyan de du meyl rû dabûn. Meyla yekê digot, em daxwazên eskeran bi cih bînin, ew ê îşkence li me nekin. A din jî digot; 12ê îlonê bo me ji holê rake hat ser hukûm, ji bilî qaydeyên normal ên girtîgehê divê li gorî tu qaydeyên dinê tevnegerin.

Em kesên ku li gor qaydeyên ji wan dihate xwestin li qawîşên xwe man û ên din jî xistin hucreyan. Lêgera berxwedaneka nû ya piştî têkçûna

berxwedana 7 mehan dom kiribû, di vê demê de dest pêdikir. Di rewşek weha de Necmedîn anîn hucreya me. Me rewş jê re got. Qe teredut nekir û got a rast berxwedan e, herçi ên serî bitewî-nin zêde bibin ê zext ji zêde bibin.

Bi vî helwesta wî min fam kir ku Necmedîn ne weka serpekên partiyên kurd ên ku girtî ne. Wî ev yek di berxwedana sala 1984an ku me wê wek 'şerê barîqatê' binav kiribû îspat kir. Bêzuman yek ji pêşengvanên vê berxwedanê Necmedîn Buyukkaya bû. Me 2500 girtîyî ranzayên xwe şikandibûn û wan dabûn ber derîyan, di destê her yekî ji me de çov ji hebû û me xwarin nedixwar, ev yek tam 24 rojan dom kir. Ji bo ku pirsgirêk çareser nedibûn, çavê her kesî li qawîşa Necmedîn bû. Necmedîn bêtirs û bi dengê xwe yê bilind talîmat dida, ew li paş barîqatan serokê bihezaran serhildêrê destbiçov bû. Necmedîn her diqîrîya, digot: *Meîr-sin! Bi serîewandinê careka din wê cehe-nnemê nejin! Ji dêvla jiyanêke bîrûmet, em ê bikaribîn bîrûmeta xwe bimrin!*

Barîqat rabûn, avêtin ser qawîşan, girtî birin 'hemamê'. Wî serî netewand, li ser soza xwe ma û bi ser ket ku bi şerefa xwe bimre.

Paşa Uzunê ku demeke dirêj ew û Necmedîn di girtîgehê de bi hev re ne, dinivîsîne ku ji derva peyama xwe pîr nede pêş, em hewl didin ku bi rêyekê te bidin berdan ji Necmedîn re dihat.<sup>15</sup> Paşa bi berdewamî dinivîsîne ku ev peyamên ji derva dihatin li ba Necmedîn dibûn sebebê dudilîyê lê di encamê de wî terciha xwe bo hest û ramanên xwe kir û weha tevgerîya.

## Necmedîn Dizanibû ku dê Ew Bête Kuştin

Paşa Uzun di pirtûka xwe ya bi navê *O Bir Dağ Çiçeği* di de dinivîsîne:

"Necmedîn tevî Mehmet Şener yek ji koordînatore berxwedanê bûye. Ew bi xwe, bi dengê xwe biryarên girtîyan radigihîne hemû qawîşan. Birêvebirîya girtîgehê jî bi vê yekê dizane. Armançek din ya Necmedîn jî ev e ku îşkence, lêdan û bûyerên kuştina girtîyan, ji devê şahid û qurbanîyan berhevke û wek belge pêşkêşî mahkemê bike. Necmedîn piştî zehmetîyên di vî karî de bi ser dikeve û belgeyan pêşkêşî mahkemê dike.

Berpirsê ewlekariyê ê girtîgehê esferê bi navê Abdullah ku serpel e (yuzbaşı); li pey Necmedîn e. Paşa dinivîsîne ku Yuzbaşı Abdullah ji girtîyan û herweha ji Necmedîn re jî gotiye; bo em cil û bergên weka hev, li we kin, pêwîst be em ê we bikujin jî. Necmedîn jî weha jê re dibêje: "Hûn dikarin me bikujin, û em ê bibin şehîdê şoreşê, dê sibê zarokên me bi vê yekê serbilind bin. Lê zarokê we? Ew ê bi mîrkuji û îşken-cekariya bavên xwe dilxweş bin?"<sup>16</sup>

Parêzerê wî Cemşît Bilek jî dibêje:

"Rehma xwedê lê be, Necmedîn Buyukkaya di mahkemê de rabû û daxwaza axavtinê kir. Got; dibe ku ez di mahkemeyeke din de, ne li jiyane bim. Bira haya we jê hebe, her tim

<sup>15</sup> Uzun, Paşa, *O Bir Dağ Çiçeği*, Weşanxaneya APEC-TRYCK, 1990 Swêd, r. 91-92

<sup>16</sup> Uzun, Paşa, *O Bir Dağ Çiçeği*, Weşanxaneya APEC-TRYCK, 1990 Swêd, r. 120



min tehdît dîkin. Paşê dê bêjin, ji dil çû, nizanîm ji çi çû, ê protokolên weha sexte bigrin û min bikujin. Lê weka hûn dibînin tenduristîya min gelek baş e". Bi rastî jî berîya mahkeme-ya pêşîya me hate kuştin.<sup>17</sup>

Paşa û girtî dibêjin di roja 23. 01. 1984 de ji bo ku bi zorê cil û bergên weka hev li girtîyan bikin wan qefle bi qefle birine hemam û sînemayê. Wî jî dibin hemamê. Dema Necmedîn dibin, Yuzbaşı Abdullah û cîgirê wî Ali Osman Aydın jî li wran ne. Ew lêdan û îşkenceyan îdare dîkin.

Paşa Uzun xwe dispêre girtîyek bi navê Î. Tekînê ji doza Rizgarîyê de girtîye û ji devê Tekînê weha dinivîsîne: "Min bi çavê xwe dît ku bi daran li serê wî dixistin. Derbên kuştinê li serê wî didan. Min dît ku piştî derbek li serê wî ket, hemû laşê wî weka ku elektrîk pê bigre, ricifî, piştî wê derbê nelivîya."<sup>18</sup>

Necmedîn û gelek girtîyên dinê dikevin komayê, wan radîkînan qawîşa nexweşan.

Girtîyên li vê qawîşê û birîndar û nîvrihî ne, fam dîkin ku rewşa Necmedîn dijwar e, bo vê yekê jî doza doktorek dîkin, lê kes di hawara wî de nayê. Doktorek girtî mudaxele dike lê êdî dereng e. Necmedîn di 23. 01. 1984 de şehîd dikeve.

Kuştina Necmedîn di çapemenîya Kurdistanî û Swêdî de cihek berfireh girt. Li ser wî nivîs hatin weşandin.

Buroya siyasî ya YNKê li ser kuştî-



Gora NECmedîn Buyukkaya

na wî broşûreke taybet weşand û ev broşûr di radyoya Yekîtîyê de jî hate belavkirin. Dîsa YNKê bo wî afîşek belav kir.

### **Bi Çavê Malbat û Hevalên Wî Necmedîn Buyukkaya**

Ji bo em Necmedîn qencîr nas bikin, min Necmedîn ji xanima wî Cemîle Xan û hin hevalên wî pirsî, wan jî weha bersîv da.

#### **Cemîle Buyukkaya:**

Min Necmedîn di dema DDKOya Anqerê de nas kir. Salên 1970-1971 bûn. Şexsiyeta wî gelek tesîr li min

<sup>17</sup> Mavioğlu, Ertuğrul, *Radikal*, Rojnameya Rojane, Stambol, hejmara 10.10. 2003

<sup>18</sup> Uzun, Paşa, *O Bir Dag Çiçeği*ydî. Weşanxaneyê APEC-TRYCK, 1990 Swêd, r. 123

kiribû. Mirovek dirust, binamûs, bika-  
rekter û biryardar bû. Li gor cih û rew-  
şê carna rûgeş carna ciddî bû. Pêşiyê em  
hevalê hev bûn, paşê jî hestên dilîniyê  
dest pê kir. A rast ev bû ku min jê hes  
kir. Ev evîneke gelek mezin bû.

Ez nizamim bê ew hevserok (mêr)  
çawa bû. Em di wan 9 salên ku em bi  
hev re zewicibûn, di zikhev de 9 mehan  
bi hev re neman. Zewaca me ne wek  
zewaca însanên dinê bû. Bo vê yekê ez  
nikarim bêjim ku Necmedîn hevserok  
îdeal bû. Bawerîya min ev e ku şoreş-  
gerok baş, nikare bibe hevserok baş,  
hevserok baş jî nikare bibe welat-  
parêzok, şoreşgerok îdeal.

Wî xwe bi her awayî bo têkoşîna  
gelê xwe feda kir. Bi qasî ku karibe di  
vê rêyê de bimre, wêrek bû. Dema ew  
di zindana Diyarbekirê de bû û ez di-  
çûm dîtina wî, ji min re digot: Ji dêvîla  
jiyanêke bêrûmet, mirineke birûmet  
tercîha min e. Di encamê de li ser soza  
xwe ma.

Divê em neheqîyê lê nekin û tenê  
behsa êş û kulan nekin. Necmedîn ji  
her tiştê xweşik hez dikir, ji gerê, xwar-  
inê, vexwarinê, ji sohbetê. Gelek dost û  
hevalên wî hebûn, heta ji destê wî dihat  
her bi wan re di nava pêwendîya de bû.  
Ji welatê xwe, ji dîrok û kultura welatê  
xwe, ji însanên welatê xwe hez dikir. Ji  
derew, bêrûmetî û îxanetê nefret dikir.

Dema ku hate kuştin, keça me ya  
mezin 8 ya biçûk jî 4 salî bû. Mixabin  
nehiştin ku wazîfeya xwe ya bawitî bi  
cih bîne. Sûcê van zarokan ev bû ku  
zarokên bavekî welatparêz û şoreşger  
bûn. Zehmet e, em zarokan têbîghînin  
bê mirin çî ye. Wan qet fam nedikir bê  
çima mirov ji ber ramanên xwe tîn  
kuştin û îşkence li wan dibe.

Hin hevalên wî yên kevn hatibûn  
girtin û navê wî dabûn. Li ser vê yekê  
polîs min taqîb dike û şevokê ew li mal  
hate girtin.

### Îbrahîm Guçlu:

Heger ez Necmedîn Buyukkaya  
bi çend gotinan tarîf bikim, ez dikarim  
bibêjim ku Necmedîn Buyukkaya,  
leheng, dozkarê Kurdistanê bû. Li  
hemû beşên Kurdistanê xebat kirin, ji  
bona wî tiştê gelek xwezayî bû. Wî  
xwe bes mirovê her beşê Kurdistanê  
binav nedikir, lê bi çand û helwest jî li  
wî dihat. Profesyonelekî tevgera  
Kurdistanê bû. Ew bi xwe xwediyê  
riyeke taybetî ya xwe bû. Mirovekî  
qerardar, azad, otonom, bixwebawer,  
dirust bû. Ew di refa serokên  
Kurdistanê de bû. Xwediyê baweriyeke  
xurt bû, ji bona bawerîya xwe ya kur-  
dîtî, şoreşgerî, sosyalîzmê mirin da ber  
çav. Serhişk bû, bi xwe re, bi heval û  
doza xwe re dirust bû. Serhişkiya wî,  
carna mirov dişikand, lê gelek pîrs jî  
çareser dikirin. Di navbeyna min û wî  
de gelek minaqeşeyên girîng, ciddî,  
hişk hatin holê. Lê ev minaqeşeyên di  
navbeyna me de ez kêfxweş dikirim.

### Serpêhatiyeke Mûsterek...

Serpêhatiyeke me yê mûsterek gelek  
in. Lê xuya ye ku ez ê bes hebeke  
pêşkêş bikim.

Beriya 12ê îlona 1980 ez û  
Necmedîn Buyukkaya li Şamê bûn.  
Mam Celal jî li Şamê bû. Mehmed  
Uzun jî ji Swêdê hatibû Şamê. Me wek  
Ala Rizgariyê bi Necmedîn  
Buyukkaya re, ji bona avayîyeke hev-  
beş ya rêxistinî xebatekê dimeşand.  
Min, Mehmed Uzun û Necmedîn, me

li ser yekîtiyê du rojan civîn pêk anî. Pêşniyarên Necmeddîn ji bona me realist û rasyonel nedihatîn pejirandin. Lê disa jî, ji bona ku em gav bavêjin me biryar da ku gor pêşniyarên Kek Necmeddîn xebatê bimeşînin û konferanseke hevbeş ya ku piralî beşdar bibin, amade bikin. Lê me dizanî ku ew pêşniyarên Necmeddîn pêkanîn zehmet e û ev pêşniyaran dê me dereng bixin.

Pişt re me biryar da ku em Mam Celal bibînin. Em çûn cem Mam Celal. Wî ji me pirsîya, me jî cihê û cihê bersîv da, bîrûrayên xwe me anîn ser zimên. Mam Celal piştî axiftina me piçek rawestîya û bi ken got: "Gor bîrûrayên min pêşniyar û rîya Kek Necmeddînê Delal ne di cih de ne. Lê baş e ku we biryareke mîsterek daye. Ez baş dizanim ku birayê min ê dimilî Necmeddîn serhişk e. Serhişkiya wî ji dimilitiya wî tê. Lê bes ew jî neyê. Hûn dizanin, xoşnaviyên û kurmancan yek textên wan kêmin, dimiliyan du textên wan kêmin in: Kek Necmeddîn sê textên wî kêmin in."

Piştî ev heneka Mam Celal em bi hev re bi deqîqeyan kenîyan. Helbet Necmeddîn disa jî dev ji rîya xwe berneda.

### Ziya Avci:

Ew sîfetên ji bo hemî şehîdên Kurdistanê ku tîn bikaranîn, Necmeddîn hemîyan heq kirine û hîn zêdetir jî. Belkî bi gotineke hinek mehellî be jî, lê ez dibêjim: Xwezî ji mîrê heft xwezîyan re îro Necmeddîn sax bûya. Ji bo çi? Ji bo ku ew kadroyek bû. Di welatên wekî yên me de, kadroyek 30-40 salan ancax çêdibe û dikemile. Mîlîtan gelek in. Mebesta

min ji vê, qîmetnedan an biçûkdîtina mîlîtanên nîn e. Belê, bêtî ez vê vekim, ez bawer im dê bê fehimkirin.

Ez hêvîdar im, di demeke nêzîk de, ne tenê di vî warî de, di gelek warên ku ez şahidê wan ên dîrokê me de, ez ê wezîfeya ku dikeve ser milên xwe bicîh bînim. Ji ber ku ev mesûliyetek e, mecûrîyetek e û deyneke di stûyê me de.

### Saîd Aydogmuş:

Bi qenaeta min xusûsiyeta herî berbiçav ya Necmeddîn, dilêrî û mîrxasiya wî bû û wî vê xusûsiyeta xwe bi tîgeheke şoreşgerî dixist xizmeta milletê xwe.

Min Necmeddîn di sala 1969 de wek mîlîtanek ku 24 saetên xwe dida tîkoşînê nas kir. Di salên em bi hev re xebitîn û salên piştî wan, heta roja di zindana Amedê de hate şehîdkirin, Necmeddîn vê profesyonelîya xwe domand.

Wî ji birêvebirîya partîya ku çend sal piştî Dr. Şivan û hevalên xwe di encama wê bûyera trajedîk de şehîd bûn, ji nû ve hat damezrandin, jî profesyonelîyek weha xwest. Wî vê mijarê di her civîna ku ez jî amade bûm, wek pîrsek bingeşî, anî rojevê. Bi ya wî bêtî ku hîn birêveberên partîyê ên sereke, bibin profesyonel, ew ê nikaribin bighêjin tîgeha karibe tîkoşîna rizgarîya neteweyî û civakî bimeşînin, ew ê nikaribin rîskan bidin ber xwe û bighêjin mîjû û şeweya jîyanê ku dê vê tîkoşînê bi ser bixe. Her çî veqetandina Necmeddîn ji partîya wî ya ku di damezrandina wê de tayînkêr bû, wek pêwendîyên bi YNKê tîn binavkirin jî, di eslê xwe de ev tiştên jorîn bûn.

Xwebirêxsitinkirina piştî Dr. Şivan ne wek ku tê zanîn, lê di eslê xwe de bi

saya Necmedîn pêk hat. Ji bo ku Necmedîn zêde çalak bû û ji rîskan nedirevîya; ji hêla maddî û manevî gelek rûmet derxist holê. Lê bi operasyonêk 'bêzerar' û bi asanî ji partiyê hate bidûrxistin. Hewldanên Necmedîn ên siyasî ên paşiyê ji a pêşiyê bêtir biserneketî ne. Bi qenaeta min li gel xusûsiyetên wî ên erênî, ev jî qisûr û kêmasiyên wî bûn.

Hin mînakên ji jiyana wî û dema em agahiyên di pirtûka bi navê Kalemimden Sayfalar dixwînin zelaltir têdigihêjin, bê çawa Necmedîn milîtanek bêtirs bû û çawa ji rîskan nedirevîya. Lê di heman demê de ev diyardeyên bê çima wî nikaribû derûdora xwe profesyonel bike jî dertên holê. Enerjî û riskwergirtina wî ewqas di dereceyek bilind de ye ku ji kesek din re karek nahêle. Dema em *Kalemimden Sayfalarê* dixwînin, em dibînin ku cihek ku li parçeyên Kurdistanê ew neçûbe nema ye, şexsiyet an siyasethedarek ku wî şexsen an xiyaben nas nekirîye nîne.

Di sala 1976an de bû, ji sebebê bûyerekê ji me re du 'alav' lazim bûn. Ew li Sêwregê bû û me bi telefonê jê xwest ku ew ji me re tedarik bike. Necmedîn piştî du seatan bêtir ku ji kesî alîkarî bixwaze, tevî 'alavan' hate Diyarbekirê.

Pêwendiyên me ên bi YNKê re ku ji sala 1975 dest pê kiribûn û di sala 1977 de bi dawî bibûn, tê zanîn ku bi hezaran pêşmergeyên YNKê û alavên wan ji aliyê me dihatin derbas kirin. Organîzatorên van derbaskirinan Necmedîn bû. Lê ew ne tenê organîzator, dema pewist dibû, bi xwe hemalîya vî karî jî dikir.

Bi qasî tê bîra min di sala 1976 de bû. Ji pêşmergeyên YNKê ku dixwestin derbasî Başûr bibin, 'alav' lazim bûn. Alavên wan li hêla Colemêrgê bûn û diviya bihata anîn. Necmedîn li gel lidi-

jderketina komîteya herêmî ya partiyê, bi serê xwe alavan li romorka traktorekê dike û ew jî li ser, alavan ji pêşmergeyan re dibe.

Necmedîn vê helwest û tempoya xwe heta roja dawî jî domand. Pratîka wî ya milîtanî û şoreşger bo doza neteweyî bû sebebê gelek qezencan. Lê ne tenê wî bedêla xebatên xwe bi jiyana xwe da. Herweha dê û bavê wî, keçên wî, dayîka wî, hemû malbata wî jî ew bedêl da û ji vê yekê haydar bû û li ber diket.

Milletê kurd ê vê lehengê xwe heta bi heta dê ji bîr neke û wî bi giramî bibîr bîne.

# Ji Bo Mela Ebdulkerîm Kurdistan Di Ser Her Tiştî Re Bû...

Îbrahîm GUÇLU  
ibrahinguclu@gmail.com

**Berjewendiya neteweyî di  
navenda jiyana wî de bû...**

Mela Ebdulkerîm, bi jiyana xwe, bi têkoşîn û xebata xwe nîşan da ku ew berjewendiya neteweya kurd û Kurdistanê di ser her tiştî re digre. Her kesê ku Mela Ebdulkerîm nas dikin bi gelemperî dipejîrînin ku ew welathez û aşiqê kurdan bû. Ez bawer nakim ku ew kesên ku Mela Ebdulkerîm nas kiribin bibêjin "*nexêr, Mela Ebdulkerîm ne yekî wisan bû.*"

Heta gelek kesên çavvekirî û berjewendîperest ên ku di nav tevgera kurd de bûn, Mela Ebdulkerîm û kesên wek wî fedekar, dozkar û welatparêz, wek kesên bêaqil û ehmeq şirove dikirin!

Dema ku min jî Mela Ebdulkerîm nas kir, min dît ku ew welat û Kurdistanê di ser her tiştêkî re digre.



Ebdulkerîm CEYHAN

Hemû kar û xebata xwe, jiyana malbata xwe ya şexsî û malbatî li gorî berje-

wendiya neteweya kurd bi rê dixê. Dema ku mirov bi Mela Ebdulkerîm re rûdinişt, wî ji derveyî kurdayetî, ji derveyî Kurdistanê, ji derveyî azadiya neteweya kurd hîç tiştêk ji te re qise nedikir. Henekên wî, çîrokên wî jî li ser bingeha kurdayetiyê bûn. Wî tim qala serok, lehêng û şervanên Kurdistanê dikir.

### Dozkarê miletê kurd bû...

Di dîroka neteweyî ya Kurdistanê Bakur ya nêzîk, ya piştî salên 1960î de jî, gellek dozkarên fedekar, dilsoz, zana, derketin qada têkoşîna neteweyî. Ew dozkar, xwediye hejmareke gelek zêde ne. Beşeke wan a mezin me wînda kiriye. Ji navê wan yek bi yek behskirin, dê dehan rûpelan tijî bike. Lê di nava wan dozakaran de hejmarek heye ku ew pirr diyar in, "ji derveyî rêzê ne", ew kes xwediye taybetiyên gelek cuda ne. Mela Ebdulkerîm CEYHAN yek ji wan kesên sereke bû.

### Di nav xwendevanên kurd yên li metropolê de jî bi nav û deng bû..

Dema ku min/me di TÎPê de kar dikir, helbet guhê me li ser Kurdistanê bû jî. Min dixwest ku ji Kurdistanê jî rasterast agahdarî bigrim, ew kesên li Kurdistanê ji bo doza kurdayetî û doza sosyalîzmê kar dikin nas bikim. Beşek ji wan kesan ji bona ku endamên serokatiya partiyê bûn, her dem dihatin Anqerê. Dr. Tarîk Ziya Ekinci, Dr. Naci Kutlay, parêzer Kemal Burkay, Mehdî Zana, M. Ali Arslan beşek ji wan kesan bûn. Beşek siyasat-

van û rewşenbîrên kurd jî li bajarên metropolan diman: Edîp Karahan, Orfî Akkoyunlu, Seyda M. Emîn Bozarslan, Musa Anter, Canîp Yıldırım, Ziya Acar. Girêdayî gelek wesîleyan/sedeman naskirina min û wan bi awayekî çêbibû. Lê min zêdetir ew kesên li Kurdistanê ji bo doza kurd û Kurdistanê xebat dikirin meraq dikir û bala min diçû ser wan. Ji bona vê jî min ji hevalên xwe yên li zanîngehê derbarê wan de pirsîyarîyan dikir. Di encama wan agahdariyan de 4-5 kesên ku li Kurdistanê doza kurdayetiyê dimeşand, zêdetir bala min çûbû ser wan. Ew kes Sait Elçi, Mela Ebdulkerîm Ceyhan, Feqî Huseyn, Tahsîn Avcî bûn. Mela Ebdulkerîm û Feqî Huseyn zêdetir ji bona min balkêş bûn. Mela Ebdulkerîm li Farqîna Amedê, Feqî Huseyn li Tatwana Bidlisê dima.

Dema ku ji Mela Ebdulkerîm Ceyhan û Feqî Huseyn dihat behskirin, derdiket holê ku ji bona wan doza kurd û Kurdistanê girîng e. Doza çepîti û sosyalîzmê, ji bo wan, ji bona doza kurd û Kurdistanê heye. Feqî Huseyn di destpêkê de sosyalîzmê jî nepejirandibû. Mela Ebdulkerîm ji bo doza kurd û Kurdistanê bi aktîfî di nav TÎPê de kar dikir. Feqî Huseyn piştî girê TÎPê bû.

Dema ku ji dîr ve min ew naskirin, taybetmendîya wan ya balkêş, li her derê bi kurdî axiftina wan bû. Ji wan re dihat gotin ku, ew şovenîst û nîjadperestên zimanê kurdî ne. Zor didin ku her xwendevan û rewşenbîrêkî kurd kurdî bi axife. Ew di heman demê de bi çêkirina peyvên

kurdî dihatin naskirin. Ji bona ku ew bi mirovên kurd, bi xwendevan û rewşenbîrên kurd re kurdî qise bikin, ji bona xwe taktîkek dîtibûn. Ew bi kîjan kurdekî re rûniştina, peyvên li herêma wan dipirsîyan. Ev pirs jî dibû sedem ku ew her kesî bi kurdî ve girêbidin.

Helbet dema ku ez li Anqerê bûm, min Mela Ebdulkerîm bi nakokiyên wî û şerê wî yê bi kadroyên TÎPê yên li Kurdistanê re jî nas dikir. Ew li Farqînê û pişt re li Diyarbekirê her çiqas bi Niyazi Tatlıcı, Mehdi Zana, Dr. Tarık Ziya Ekinci, Dr. Naci Kutlay, parêzer Tahsin Ekinci re di nav TÎPê de dixebitî jî, di navbera wan de nakokiyên bingeîn hebûn. Mela Ebdulkerîm kurdperwer bû, ew çep û sosyalîst bûn. Ji bona Mela Ebdulkerîm doza kurd û Kurdistanê li pêş bû, sosyalîzm ji bona azadî û rizgariya Kurdistanê wasiteyek bû. Ji bona wan kesên din, sosyalîzm li pêş bû. Wan digot ku, dema sosyalîzm li Tîrkiye ava bibe, dê kurd jî azad bibin. Lê azadiya wan dê di kîjan çarçoweyê de bibe ew ne diyar bû. Lêbelê tişteki vekirî ji bona wan hebû ku kurd wek neteweyekê dê nebe dewlet.

Di wê merhaleyê de dema ku bi munasebeta civîneke TÎPê Mela Ebdulkerîm Ceyhan hat Anqere, min rûbirû wî nas kir. Ne demeke dirêj be jî derfet çêbû ku ez jî bi hevalên xwe yên din re bi wî re rûnim. Ji bona ku wî daîmî kurdî qise dikir, min jî kurdiya Kurdistanê baş nedizani, min hîç qise nekir, min tenê lê guhdarî kir. Di wê hevdîtina me de min tespît kir ku taybetmendiyên derbarê Mela

Ebdulkerîm de dihatin gotin, tev rast bûn.

Ew ne tenê bi kurdiya xwe mirovekî taybet bû, her wiha, di destpêkê de xuya dikir ku mirovekî gelek zan-  
yar, jîr, karîzmatîk û dilsoz e jî. Taybetiyên serokbûnê û dozkarîyê di wî de hene. Helbet min jî di wê hevdîtî-  
nê de bi taybetmendîya xwe ya kur-  
dên li Anetolya Navîn bala wî kişand. Êdî dema ku min û wî jî me hevûdu  
dît û bi şûn de, min wî, wî jî ez  
şopandim. Me ji dûr ve hevûdu zêde-  
tir di kar û xebatên DDKO de nas kir.  
Pişt re min wî li Kurdistana Başûr, wî  
jî ez li hepisxaneyê leşkerî ya Amedê  
dişopandim.

### Min, Mela Ebdulkerîm di hepsê de ji nêzik ve nas kir...

Ez di meha îlona 1970 de li Anqerê, di encama operasyoneke fireh a li dijî DDKO de bi Mumtaz Kotan, Sebrî Çepîk, Nezîr Şemmîkanlı, Seyda M. Emîn Bozarslan, Dr. Tarık Ziya Ekinci, Canip Yıldırım û Musa Anterî re hatim hepiskirin. Seyda M. Emîn Bozarslan, Dr. Tarık Ziya Ekinci, Canip Yıldırım, Musa Anter di demeke kurt de hatin berdan, lê em 4 hevalên din di hepsa Anqerê de man. Di danîşîna 1. de, ji bona ku di navbera me û heyeta dadgehê de gen-  
geşiyên tund û xurt rûdan, em nehatin berdan.

Di 12ê adara 1971ê de dema ku leşkeran îxtar pêşkêşî hukûmetê kir û desthilatdarî girtin destê xwe, em di hepsê de man. Dema biryar hat dayin ku hemû kesên kurdî dê li Dadgeha

Leşkerî ya Amedê bên dadgehkirin, di hezîrana 1971 de me jî hildan birin hepisxaneya leşkerî ya Diyarbekirê.

Ez cara yekemîn di dema Kongreya 4. ya TÎPê de, ji bona ku pêşniyarek di derbarê pirsê kurd de bête gengeşkirin û bête pejirandin çûbûm Amedê. Hezar mixabin, roja ku ez gihîştim Amedê ji bona min biryara girtinê hatibû dayin. Ji bona vê, min him nikarîbû ez beşdarî civînê bibim, him jî min derfet nedît ku Amedê û civata kurd bi giştî li Kurdistanê nas bikim. Hepisxaneya Amedê ji bona min firsend û derfeteke mezin bû ku ez civata Kurdistanê; axa, beg, şêx, gundî, xwendevan û kadroyên welatparêz ji nêzik ve nas bikim.

Ji bona ku ez van birrên civata Kurdistanê nas bikim, min dixwest ku bi hemû kesan re pêwendiyê xurt pêk bînim. Lewra, ji gelek bajarên Kurdistanê girtî hebûn. Ji Farqînê jî berpirsiyar, endam û hevalbendên DDKO û TÎPê hatibûn hepiskirin. Bi grûba Farqînê re derfeta min çêbû ku ez derbarê Mela Ebdulkerîm Ceyhan, Mela Mehmed Okutucu, Muhterem Biçimli agahdarî bigrim. Lewra ev her sê mirovên hêja ku her sê jî bi qezayên trafîkê jiyana xwe winda kirin, li Kurdistanê Başûr bûn.

Hezar mixabin dema ku kuştina sekreterê giştî yê PDKT û PDK li Tirkîyeyê, Sait Elçi û Dr. Sait Kırmızıtoprak kete rojevê, wê demê zêdetir jî navê Mela Ebdulkerîm hat behskirin. Lewra dihat zanîn ku Mela Ebdulkerîm li dijî helwesta Dr. Sait Kırmızıtoprak derketiye. Di heman demê de wezîrê karê derve yê



Ji milê çep ve: Muhterem Biçimli, Ebdulkerîm Ceyhan, Mehmed Okutucu

Tirkîyeyê jî bi belavokekê navê wan diyar kiribû.

Agahdariyên ku grûba Farqînê di derbarê Mela Ebdulkerîm de dida, gelek erênî bûn, her farqînîyekî Mela Ebdulkerîm wek mamosteyê xwe, wek serokekî civakî û neteweyî yê herêmê didît. Her dem ji taybetmendiyên wî yên baş, ji axiftina wî ya bi kurdî behs dikirin. Ji feqirîya wî û malbata wî behs dikirin. Ew jî di wê bawerî û nêrînê de bûn ku ji bo Mela Ebdulkerîm welat, Kurdistan û berjewendiya neteweyî di ser her tiştî re ye.

Diya bi agahdariyên grûba Farqînê



ez gihêştîm wê qenaetê ku di navbera Mela Ebdulkerîm û grûba çep ya TÎPê de nekokîyeke mezin heye, grûba çep ya TÎPê ji wî hez nake. Bi helwest û nêrînen wan jî ew gelek êşkere derdiket holê.

### "Bila welat sax be..."

Di jîyan û lîteratura Mela Ebdulkerîm de gotina "bila welat sax be" gelek girîng û bingeîn bû. Mela Ebdulkerîm her çi tiştêkî xerab jî biqewimiya wî li hemberî van bûyeran metanet nîşan dida û digot "bila welat sax be." Ev gotin ji bona wî gotina xêrê, dewlemendiya ruhî, gotineke rehabilitasyonê bû. Dîsa ev gotin di navbera kurdperweran de nîşanek bû; ferq û cudayetiya kurdên nasyonalîst û kurdên çep ku kurdayetî ji bona wan di dereceya duyemîn de bû.

Bi taybetî jî rehmetî Niyazî Tatlici ji vê gotina Mela Ebdulkerîm gelek aciz dibû. Pêwendî û polemîkeke Niyazî Tatlici û Mela Ebdulkerîm di derbarê vê gotinê de gelek balkêş e.

Mela Ebdulkerîm û Îbrahîm Ramanlî bi motorsîkletê belavoka xwepêşandanê belav dikin, qezayeke gelek xerab derbas dikin û birîndar dibin. Wê demê Mela Ebdulkerîm li Batmanê rûdine. Niyazî Tatlici jî wê demê li Farqîne terzîtiyê dike. Niyazî Tatlici û hevalên din yên li Farqînê biryar didin ku biçin seredaniya Mela Ebdulkerîm. Dema ku ber bi Batmanê dimeşin, Niyazî Tatlici ji hevalên xwe re dibêje "em ê niha biçin seredaniya Mela Ebdulkerîm. Emê ji Mela Ebdulkerîm re bibêjin ku, bila derbasî

be û Xwedê xweşiyê bide te. Ewê li me vegerîne bibêje ku "bila welat sax be." Mela li ber mirinê jî dev ji vê gotinê û welat bernade. Mela Ebdulkerîm jî dema ku dibihîze ku Niyazî Tatlici tê seredaniya wî, ew jî li hemberî wî senaryoya xwe amade dike. Ew tiştên Niyazî Tatlici tîne ser zimên, bi awayekî din tê bîra wî jî.

Niyazî Tatlici pêşî dikeve hundir, Mela Ebdulkerîm di rewşeke xerab de ye û hal têde nemaye. Niyazî Tatlici dibêje, "Mela Ebdulkerîm, derbasî be." Mela Ebdulkerîm jî, wek her carê lê bi dengêkî bilind bersîv dide û dibêje "bila welat sax be." Ev seramonî dubare û heta ku şebare dibe. Wê demê Niyazî Tatlici gelek aciz dibe û dibêje ku "gelo tu li ber mirinê yî. Tu hîn dev ji welat bernadî. Bila q... kerê sax be." Bersîva Mela Ebdulkerîm dîsa li hemberî Niyazî Tatlici "bila welat sax be" ye.

### "Şevbaş û rojbaş..."

"Şevbaş û rojbaş" jî wek gotin diyar e ku wê demê simbol û parolayeke kurdperweran bû. Ev gotin zêdetir ji aliyê Mela Ebdulkerîm ve dihat bikaranîn. Ev gotin ji bona vê, zêdetir li wî dihat. Dema ku gotina "şevbaş û rojbaş" di wan salan de û heta piştî mirina wî jî, ew dianî bîra mirov. Heta gotina "bila welat sax be" û "şevbaş û rojbaş" di van şertên ku kurdayetî bi gelek kêr enstrumanan dihat îfadekirin, bibû felsefeyeke netewperweran.

Li ser vê gotina kurdperweran "şevbaş û rojbaş"ê jî gelek bûyer qewimîne. Heta mirov dikare bibêje ku ev gotina ji bona girtina TÎPê di Dadgeha Zagona Bingeîn (Anayasa

Mahkemesi) de ji aliyê Niyazî Tatlici ve wek sedemê jî hatibû nîşandan.

TÎPê di sala 1970 de li kongreya giştî ya 4. encama xebat û pêşniyara DDKO û nûnerên kurd yê kongreyê di derbarê neteweya kurd de biryarek girt. Piştî ku biryara kongreyê di Dadgeha Zagona Bingeîn de ji bona TÎPê doz vebû. Di encama dadgehkirinê de partî hat girtin. Piştî ku partî hat girtin, ew kurdên çep yê di nav partiyê de kurdên çep yê di derceya yekemîn de nedîtin, gelek aciz bûn. Ji bona vê jî wan kurdperweran di girtina partiyê de wek berpirsiyar didîtin. Lê pir-raniya wan, ji ber şik û hesabên siyasî, wê hizra xwe bi awayekî vekirî nedianîn ser zimên. Rehmetî Niyazî Tatlici, ji derveyî hesabên siyasî kesekî ku bîrûrayên xwe gelek bi azadî dianî ser zimên bû. Niyazî Tatlici, gelek vekirî digot "şavbaşî û rojbaşî" bûn sebeb ku "partiya me" bête girtin û qedexe bibe. Helbet dema Niyazî Tatlici van bîrûrayan dianîn ser zimên, bi gelek gotinên nexweş dixemiland jî.

Piştî salên 1974an jî, ev gotina "şevbaşî û rojbaşî" bibû gotineke gelek populer. Heta dikarim bibêjim ku vê gotinê, du îdeoloji, du stratejî, Kurdistana serbixwe yan jî kurdên bi tirkên re entegre bibin nîşan dida. Li ser van stratejiyên cihê, girêdayî van du îdeolojiyan, rêxistinên cuda û xwedî-vîzyonên cihê hatin avakirin. Rê û rêbazên cihê derketin holê.

### **"Kurdperwerên Çiyacî/Çiyayî û Mela Ebdulkerîm..."**

Li salên 1960î di çareserkirina pirsê kurd de ji aliyê metod û awayê têkoşîn

û xebatê de jî gengeşiyê xurt û esasî hebû. Wê demê jî, beşek kurdperweran îddîa dikir ku ji derveyî şerê çekdarî neteweya kurd nikare mafê xwe ji dewleta tirk werbigre. Beşek kurd jî, bi taybetî jî kurdên Tirkîyeci, rîya siyasî û aşîtiyê diparastin. Lewra wan serxwebûna Kurdistanê nedianîn bîra xwe.

Wan kurdperwerên ku berevanîya şerê çekdarî dikirin, gelek bi xwezayî diyar dikirin ku bila şer li ser çiyayên Kurdistanê bi awayê pêşmergetiyê çêbibe. Ew beşa ku li dijî şer bû, ji wan kurdperwerên ku şerê çekdarî diparastin bi "çiyacî" bi nav dikirin. Mela Ebdulkerîm jî yek ji wan çiyacîyên li rêzên pêş bû.

### **"Bila sînorên Kurdistanê ji Siwasê vir de bin, yan ji Melatîyê vir de bin?..."**

Mela Ebdulkerîm kurdperwerek wisan bû ku li hemû Kurdistanê û bi taybetî li Farqînê gelek navdar û berbiçav bû. Lewra wî kurdayetî û bîrûrayên xwe tu dem, li tu cihî venediştart. Li her derê propagandaya kurdayetiyê dikir û siyaseta dewleta tirk li her derê deşîfre dikir.

Mela Ebdulkerîm ne tenê ji aliyê gel ve, ji aliyê desthilatdarên civata kurd jî dihat hezkirin û gotinên wî dihatin guhdarîkirin.

Rojekê Mela Ebdulkerîm ji bo karekî diçe dadgeha (edliye) Farqîne. Piştî ku karê xwe diqedîne, derdikeve. Wê demê rastî Mahmut Kepoglu tê. Mahmut Kepoglu gelek bi ihtîram û rêzdarî hal û xatirê wî dipirse. Pişt re dîsa dipirse û dibêje, "Seyda, gelo li

dadgehê çi karê te hebû?" Mela Ebdulkerîm bersîv dide, dibêje "Axayê min, tu dizanî di navbera me û tirkan de ji bona doza Kurdistanê pirsgirêkeke mezin heye. Piştî gengeşî û xebata me, niha dewleta tirk biryar daye ku ji Kurdistanê re bibeje "Erê". Lê em di mesela sînora de li hevûdu nakin. Tirk dibêjin, "bila Sêwas li derveyî sînorên Kurdistanê bimîne. Em qebûl nakin. Ez ji bona vê çûbûm dadgehê."

Piştî ku Mehmûd Axa Mela Ebdulkerîm guhdarî dike, bersîv nade û ditirse, bi lezûbez ji wî dîr dikeve.

Di sala 2002 de ez û grûbek dost, em bûn mêvanê mala Mahmut Kepoglu. Min vê bûyera hanê ji keça wî re behs kir.

### **Xwepêşandanên Kurdistanê û operasyona komandoyan: bi lingê tazî meş...**

Di dîroka siyasî ya nêzik a Kurdistanê de xwepêşandanên salên 1967-1969 gelek girîng in. Wek tîye zanîn, neteweya kurd ji hemû mafên xwe yên neteweyî bepar, di bin zilm û zordariya mêtinkariya dewleta tirk de ye. Hemû hewildanên neteweya kurd yên di destpêka sedsala 20. de di encama zor û şiddeta leşkerî ya dewletê de şkest xwaribûn. Serok, pêşeng, karbidest û têkoşerên neteweya kurd ji aliyê dewleta tirk ve hatibûn kuştin. Piştî serîhildanên neteweyî yên li Kurdistanê neteweya kurd di qetliaman re derbas bibû. Rêvebirên civata kurd û Kurdistanê ji bona ku civat bêser û bêrêber bimîne hatin sirgûn-kin. Bajar û gund hatin şewitandin.

Ji bona ku civat bêserî û bêrêvebir bimîne, rêvebir û karbidestên civata kurd û Kurdistanê yan ji holê hatin rakirin, yan bêfonksiyon hatin kirin, yan jî ji bona ku ew ji dewletê re bibin heval li ser wan planên gelek qirêj û xerab hatin meşandin. Encama vê yekê civat û neteweya kurd bi dehan salan dengê xwe dernexist.

Li Kurdistana Bakur, di salên 1950î de xwendevan û ronakbîrên kurdan li Kurdistanê û li metropolan dema ku xwestin kar û xebatên çandî û siyasî bimeşînin pêşiya wan hat girtin, ew hatin hepiskirin. Piştî ku li Kurdistana Başûr tevgera neteweyî li pêş ket, li herêmê û li dinyayê tesîra xwe nîşan da û tîrejên xwe dan ser tevahiya Kurdistanê. Li Tirkîyeyê jî, ji derveyî burjuvazî û desthilatdarên dewleta tirk li ser navê xebatkaran partiyeke çep a sosyalîst, ango TÎP ava bû. Li dinyayê tevgerên civakî, neteweyî, çep û sosyalîst xurttir bûn û tesîra xwe bi awayekî li ser Tirkîyeyê jî nîşan dan. Xwendevan, ronakbîr û Melayên Kurdistana Bakur ji bona ku mafên neteweyî yên gel biparêzin, li çareyan geriyan. Di encama van lêgerînan de, dest pêkirin li salên 1967-69 de xwepêşandan lidarxistin û di van xwepêşandan de ji bona ku mafê neteweya kurd bête ser zimên uslû-beke taybetî dîtin. Ev xwepêşandan li gelek bajarên Kurdistanê bi girseyî hatin lidar xistin. Dema ku ev xwepêşandan dihatin lidar xistin, kesên rêber gelek kêmbûn. Bariya van xwepêşandan gelek kêmbûn insanan bar girtibûn ser milê xwe. Mela Ebdulkerîm jî yek ji wan kesan bû.

Di sala 1970 de dema ku operasyonên komandoyên dewleta tirk li herêma Farqînê, Hezo û bajarên din dest pêkirin, Mela Ebdulkerîm Ceyhan jî wek kesekî berpisê TÎPê û wek kesekî pêşeng yê herêmê li dijî van operasyonên komandoyan bi xurtî û bi milîtanî derket. Ji bona ku ev operasyon li Tirkîyê deşîfre bibin, ji bona ku tîrsa gel bête şikandin, wî, Mela Mehmed Okutucu, Muhterem Biçimli û Mehdî Zana û kurdperwerên din xebateke gelek xurt û bi fedekarî meşandin.

Ji bona ku operasyonên komandoyan deşîfre bibin, gelê kurd û xelkên din ên herêmê hîşyar bibin, li rê û rêbazan dihat gerandin. Di encama vê lêgerînê de gelek pêşniyar dihatin holê. Pêşniyara Mela Ebdulkerîm gelek balkêş, sivîl û li gorî wê demê gelek nûjen bû. Mela Ebdulkerîm pêşniyar kiribû ku bi lingên tazî ji Diyarbekirê peya bimeşin ta Farqînê, operasyon û zilma komandoyên dewleta tirk protesto bikin.

Vê yekê jî derxist holê ku Mela Ebdulkerîm wek dozkarê neteweya kurd serê xwe diêşand. Ji bo rê û rêbaza neteweyatîyê xwediyê çandeke dewlemend bû. Ev pêşniyara wî, pêşniyara dozkar, rewşenbîr û lehengê mezin Edîp Karahanî ya di derbarê siyaseta Ecevit li hemberî birayên me yên li Kurdistanê Başûr wekhev bûn.

Piştî şerê 1975 dema ku Otonomîya Kurdistanê hilweşiya û pêşmergeyên Kurdistanê mecbûr man ku ji Kurdistanê derkevin. Hukûmeta Ecevit destûr neda ku pêşmergeyên Kurdistanê derbasî Kurdistanê Başûr

bibin, sînor li ber wan girt. Em hemû kurd gelek aciz bûn, ji bona ku ev siyaseta dewlet û hukûmeta tirk bête protestokirin, em di nav lêgerîna rê û rêbazan bûn. Dozkarê mezin Edîp Karahan pêşniyar kir ku xwendevanên zanîngehê li Stenbolê xwe li ser kolana mezin a Wetenê (Vatan Caddesi) xwe dirêj bikin û ji bo trafîkê kaosê çêbikin. Ev jî bibe sedem ku ev siyaseta qirêj ya dewletê û Ecevit deşîfre bibe.

### **TÎP, PDKT, DDKO û Mela Ebdulkerîm...**

Mela Ebdulkerîm, çepekî kurd bû. Lêbelê ji bona wî doza miletê kurd û neteweyatî beriya îdeolojiyan dihat. Ji bona vê jî çepitîya wî, ji bo azadiya neteweya kurd û serxwebûna Kurdistanê bû. Wî neteweyatîyê her demê li pêşîya çepitî û îdeolojiyan digirt. Ji lewre, dema ku TÎP li Tirkîyê ava bû û şaxa xwe li Amedê vekir, wî û hevalên xwe Mela Mehmed Okutucu, Muhterem Biçimli, Mehdî Zana, Niyazî Tatlici, Şeyh Mehmed Yeşil jî li Farqînê TÎPê bi rê xistin.

Mela Ebdulkerîm Ceyhan aktivîstekî TÎPê bû û çalakvan bû. Wî dixwest bi riya TÎPê tevgera kurdîyatîyê pêş bikeve, xurt bibe, gelê kurd hîşyar bibe.

Ji ber ku ew çepgir bû, bi kadroyên Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkîyê (PDKT) re bi tevayî li hevûdu nedikir, nebû endamê PDKTê. Lê dema ku ne endamê PDKTê bû jî, wek kadroyekî çepgir yê ji "Grûba Rojhilatê" ku di bin pêşengiya Dr. Tarîk Ziya Ekinî de dihat meşandin, li dijî PDKTê nebû, bi wan re dost bû.

Piştî ku DDKO li Anqerê û Stenbolê ava bû, îcar ew piştgirekî xurt yê DDKOyan bû. Dema ku li Kurdistanê hewldana avakirina DDKOyan dest pê kir, Dr. Tarîk Ziya Ekinci û grûba wî li dijî avakirina DDKOyan li Kurdistanê derketin. Mela Ebdulkerîm, Mela Mehmed Okutucu û Muhterem Biçimli ji wê hewldana me re piştgiriyeke

xurt nîşan dan. Gelek vekirî diyar kirin ku ew amade ne ku DDKOyan li Kurdistanê ava bikin.

Di havîna 1970 de dema ku grûbên DDKOya Anqerê û Stenbolê li Kurdistanê dest bi xebat û lêgerînê kirin, Mela Ebdulkerîm li Amedê, li Sêrtê piştgirekî wan yê xurt bû. Havînê, encama xebata grûbên me derket holê, ji bona ku DDKO li Kurdistanê ava bibin derfet hene, şert jî kemilîne. Hezar mixabin jî bona ku Dr. Tarîk Ziya Ekinci û hevalên wan li dij bûn, em lihevkişînekê digeriyan, ji bona vê li Amedê û li bajarên din yên Kurdistanê avakirina DDKOyan bi derengî man. DDKO di dawîya sala 1970 de li Kurdistanê dest bi avakirinê kir.

Mela Ebdulkerîm, Mela Mehmed Okutucu, Muhterem Biçimli, Şêx Mehmed Yeşil û hevalên wan yên mela û xwendevan li Farqînê DDKO ava kirin. Piştî ku DDKO li Farqînê ava bû, bû rêxistineke bi nav û deng û çalak.

### Çûyina wî ya bo Kurdistanê Başûr

Dozkariya Mela Ebdulkerîm di her



Ji milê rast ve yên li pêşiyê: M. Ebdulkerîm  
û Derwêşê Sado

merhaleyê de û li hemberî hemû bûyeran bi helwesta wî ya xurt derdiket holê. Ew di pîrsa neteweya kurd de mirovekî biryardar û gelek pratîk bû. Her dem di wexta xwe de biryar dida. Dema ku biryarên xwe dida, hesabê berjewendîya xwe ya şexsî, malbatî nedikir, Wî her demê berjewendîya giştî ya neteweya kurd dida ber çav.

Piştî sala 1969 dema ku DDKO ava bûn, ji bona tevgera neteweyî ya Kurdistanê bihara yekemîn dest pêkiribû. Ji bo tevgera kurdîyatî derfetên nû çêbibûn, kulîlkên nû derketibûn ser erdê, lêgerîna fikrên mezin û mezintir hatibûn holê.

Di wan dem û şertan de komek kes di bin serokatîya Dr. Sait Kirmızıtoprak (Dr. Şivan) de bi alîkariya PDKT û mirovê hêja Sait Elçi biryar didin ku biçin li Kurdistanê Başûr xizmeta Otonomîya Kurdistanê bikin û di heman demê de hêzeke pêşmergetîyê ava bikin.

Ji bona vê, dema ku pêşniyar ji Mela Ebdulkerîm re jî tê kirin, ew gelêk bi hêsanî û cesûrane biryar dide ku beşdarî vê xebatê bibe. Bi rastî jî ew bi vê biryar û helwesta xwe diyar dike ku

ne bi gotinê, bi rasteqînî ew "çiyacî" ye.

Dema ku biryar têye dayin ku partiyeye nû ya îllegal û çekdar ava bibe, ew jî dibe yek ji damezrênerên PDK ya li Tirkîyê.

**Vegera wî ji Kurdistanê Başûr:  
Bûyera trajîk a Sait Elçî û Dr.  
Sait Kırmızıtoprak (Dr.Şivan)..**

Dema ku Mela Ebdulkerîm li Kurdistanê Başûr bû, bûyera trajîk a du serokên kurd, ya du Seîdan (Sait Elçî û Dr. Sait Kırmızıtoprak), qewimîbû. Mela Ebdulkerîm wek damezrêner û berpirsiyar û endamê navenda PDK ya li Tirkîyê di nava vê bûyera trajîk de bû. Beriya ku ew û hevalên xwe vegerin Kurdistanê, li ser bûyera her du Seîdan û li ser helwesta kesên jî spekulasyonên gelek mezin û cihê hebûn.

Beriya ku Mela Ebdulkerîm vegere Kurdistanê zêde ne zelal be jî, dihat qalkirin ku Mela Ebdulkerîm li dijî kuştina Sait Elçî ye. Ji bona vê jî, di navbera wî, Dr. Şivan û hevalên Şivan de nakokî û nexweşî pêkhatine. Helbet wê demê jî bona ku kadroyên pêşeng di hepsê de bûn, rêxistinên derbeyên mezin xwaribûn û xebatên xwe yên rêxistinî dabûn rawestandî, lewma jî li Kurdistanê Başûr çî qewimîbû, çima Sait Elçî û pişt re Dr. Şivan, Çeko, Brûsk hatibûn kuştin, bi teferaruat nedihat zanîn. Lewma jî helwesta kesên jî nêzik ve nedihat zanîn.

Mela Ebdulkerîm jî, piştî "Efûya Giştî ya 1974" vegeriya Kurdistanê Bakur. Min jî li Kurdistanê kar û xebatên siyasî û rêxistinî dimeşand.

Piştî vegera wî di navbera min û wî de jî nêzikî ve pêwendî çêbû. Dostanîya me pêş ve çû. Min derfet dît ku di derbarê Kurdistanê Başûr, Otonomiya Kurdistanê, serokatiya Kurdistanê Başûr, bûyerên du Seîdan de jî wî agahdarî bigrim. Dîsa min bi wî re derbarê PDKa Tirkîyeyê û avakirina PDK ya li Tirkîyeyê de agahdarî girt. Min, bîrûrayên wî bi teferuat guhdarî kirin.

Ew, ji serokatiya Kurdistanê Başûr xwediyê gîlî û gazinda bû, di derbarê Kurdistanê Başûr de rexnegir bû. Lê bi giştî ji serokatiya Kurdistanê Başûr memnun bû û siyaseta millî ya ku li wira dihat meşandin, wî erê dikir û digot "ji ber ku PDKa Tirkîyeyê çep nebû, ji bona ku têkoşer û çalakvan nebû, bi gel re xwediyê pêwendiyeye xurt nebû, di xebata rêxistinî de lawaz û qels bû, ji bona ku derbarê paşerojê de ne xwediyê projeyeke diyar û çekdar bû, me PDK ya li Tirkîyeyê ava kir."

Ev bûyera trajîk ya Sait Elçî û Dr. Şivan wî bê hêvî nekiribû, lê wî westandibû. Piştî vegera wî ya ji Kurdistanê, ev pêwendiyên sar di navbera wî û hevalên wî de, diyar dikir ku ew wek helwest di pirsgerêka Sait Elçî û Dr. Şivan de jî hevalên xwe cihê difikire.

Wî nedixwest derbarê pirsê Sait Elçî û Dr. Şivan de dîrûdirêj qise bike û agahdarî bide. Bes wî digot ku "ev bûyera hanê di dîroka Kurdistanê de bûyereke gelek girîng û trajîk e. Min hê fam nekirîye ku mirovek û serokekî wek Dr. Şivan vê şaşîya hanê kirîye. Ew bû sedem ku mirovekî dilsoz û kurdperwerekî bijarte wek Sait Elçî bête kuştin. Ev jî bona pêşeroja me

felaketek e. Ev bûyer di navbera kurd-perweran de dê gelek nexwaşîyan pêk bîne. Sait Elçî û Dr. Şivan du wendayîyên me yên mezin in. Divê em vê bûyerê zêde tevnedin û bila ev bûyer nebe sedem ku di navbera me de nakokiyên mezin pêk bîn.

Ez wê demê ji van nerînên wî gihîştîm vê encamê ku Sait Elçî ji aliyê Dr. Şivan û hevalên wî ve hatiye kuştin. Lewra heta wê demê ez di wê baweriyê de bûm ku her du Seîd di encama planeke musterek ya PDKa Îraqê de hatine kuştin.

Di salên 1980î de dema ku belgeyên PDK ya Li Tirkiyeyê bi wasîteye Necmeddîn Buyukkaya li Qamişloyê min xwend, wê demê jî min tespît kir ku Mela Ebdulkerîm li dijî kuştina Sait Elçî bûye, ji bona vê jî di navbera wî û hevalên wî de nakokî qewimîne.

### **Bi wî re li ser deklerasyona Rizgarî danûsatandin...**

Piştî "Efûya Giştî ya 1974" hemû girtiyên kurdperwer yên ku ji aliyê dadgehên leşkerî ve hatibûn cezakirin, ji hepsê derketin. Dema ku em di hepsê de bûn, li hemberî desthilatdariya hepsê, li hemberî dadgehê bi hev re parastina DDKOyê ya siyasî û parastina mafên xwe yên şexsî, neteweyî û parastina mafên neteweyî yên gelê kurd û di pirsê rêxistinî ya serbixwe ya gelê kurd de di nav grûbek heval de hevbeşiyek pêkhat. Ez jî di nav vê grûbê de bûm. Ev grûb bi navê "Komuna DDKO" dihat binavkirin.

Em kesên di "Komuna DDKO" de bûn, beriya ku em ji hepsê derkevin,

me biryar dabû ku li Kurdistanê kar û xebatên musterek ên siyasî û rêxistinî bi hev re bîn meşandin. Ji bona vê, em li ser sê (3) projeyan gihîştin encamê û di heman demê de me li ser van sê (3) projeyan dest bi xebatê kir. Ev sê proje, avakirina komeleyeke sîvîl û demokratîk ya girseyî bû, avakirina weşanxaneyekê û weşandina kovarekê bû. Ji avakirina DDKD re alîkarî, avakirina weşanxaneya Komalê û weşandin/avakirina kovara *Rizgarî*, encama van xebat û projeyên Grûba Komûna DDKO derketin holê.

Helbet weşandina kovara *Rizgarî* di wê merhaleyê de ji bo Tevgera Kurdistanê Bakur bûyereke gelek girîng bû. Me dixwest ku bi riya kovara *Rizgarî* îdeolojiyê neteweyî ya Kurdistanê ava bikin. Kovara *Rizgarî*, bi kurdî û tirkî vê wezîfeyê pêk bîne.

Me, di kovara *Rizgarî* de zimanekî vekirî bikaranî. Ev zimanê ku me di *Rizgarî* de bikaranî hem jibera (ezber) siyasîmedar û entellektuelên kurd û hem jî jibera desthilatdarên tirk xirab û tevlîhev kir. Ji bona vê me ev merhale wek "merhaleya avakirina îdeolojiyê" binav kir.

Beriya ku em kovara *Rizgarî* biweşînin, me biryar da ku em bi grûb û kesên kurdperwer re li ser pîvan û konseptê *Rizgariyê* danûstandinê bikin, bi wan re yekîtî û hevbeşiyekê ava bikin. Ji bona vê, di destpêkê de me deklerasyonê amade kir. Piştî ku me deklerasyon amade kir, me biryar girt ku em deklerasyonê pêşkêşî grûb û kesên kurdperwer bikin, bi wan re li ser deklerasyonê lihevkerinekê pêk bînin.

Ji bona vê xebatê, me di nav xwe de

wezîfe parve kir. Li Diyarbekir, Mêrdîn, Sêrt, Ruha û Xarpêtê min ê bi kurdperweran re hevdîtînê pêk-baniya. Ji ber ku Mehmet Uzun li Anqerê akincî bibû, dema ku ew li Kurdistanê be, wî yê jî bi me re beş-darîya danûstandinan bikirana.

Min li van herêman bi dehan kesan re danûstandin kir. Dema ji bona kovara *Rizgarî* min danûstandin dikir, ez gelek ciwan (26 salî) bûm. Di hep-isxaneyê de bi parêznameya siyasî û helwesta me ya li hemberî cuntaya leşkerî bo me îtibarekê ligel xwe anîbû. Ev îtibara me dibû sedem ku em gelek bi hêsanî bi wan kesên kurd-perwer re danûstandinê bikin û baw-erî bidin wan. Ji bona vê, di wan danû-standinan de kurdperweran qedr û qîymeta me dizanîn.

Min, ji bo kovara *Rizgarî* û dek-lerasyona Rizgariyê, li Farqînê bi Mela Ebdulkerîm re jî hevdîtîn û danû-standin kir. Ji bona vê ez şevekê li mala Mela Ebdulkerîm Ceyhan bûm mê-van. Dostên min yê nêzik Mamoste Salim Çelîker ku niha li Swêdê dijî, ew û çend dostên ku jî aliyê Mela Ebdulkerîm ve hatibûn gazîkirin jî, beşdarî civînê û hevdîtina me bûn.

Di vê hevdîtînê de bi taybetî li ser deklerasyona Rizgariyê, ji derveyî dek-lerasyonê em li ser rewşa Kurdistanê Başûr, pirs û pirsgrêkên din yên tevgera Kurdistanê Bakur rawestiyân. Bi taybetî jî li ser yekîtiya neteweyî ya tevgera Kurdistanê Bakur rawestiyân. Min ji wî û wan re qala hevdîtina xwe ya ligel Ömer Çetin, Ahmet Karlı û Necmettin Büyükkaya jî kir.

Di encama danûstandinê de wî ji xebata me re dilsozî nîşan da. Got, "ez

ê li gorî şertên xwe alîkarê we û hemû kurperweran bibim. Ez di wê baw-eriyê de me ku hûn karekî baş dikin. Em kurd hewcedarî fikrên nû yên kurdî ne. Hûn jî dibêjin ku, em ê bi Rizgarî xizmeta avakirina îdeolojiya neteweya kurd bikin. Ev karekî hêja û pîroz e. Ez di wê baweriyê de me, dema ku we ev karê pîroz meşand, her kurdek dê ji we re bibe alîkar. Helbet beriya ku hûn kovara *Rizgarî* biweşî-nin, bi hemû kurdperweran re danûs-tendina we, bi grûbên siyasî yên kurd-perwer re li yekîtiyê be, ev helwest di cih de ye. Ez/em hevdar in ku hûn di nav xwe de yekîtiyekê ava bikin."

### **Xwepêşandana Farqînê û Mela Ebdulkerîm...**

Mela Ebdulkerîm piştî ku ji Kurdistanê Başûr vegeriya, pêwendî-yên wî yên rêxistinî qediyabûn. Ew endamê tu rêxistinekê nebû, bi hemû rêxistin û grûbên siyasî yên Kurdistanê re dostanî dikir. Ji bona ku rêxistin û grûbên siyasî yên Kurdistanê karên baş bikin, zerar nedin gel pêşniyarên dikir, xwedîtî li pêşniyarên xwe jî dikir.

Têye zanîn ku piştî sala 1974 kurd-perwer di encama Efûya Giştî de ji hepsê derketin, kurdperwerên ku li derveyî welêt bûn, vegeriyan welêt. Ji bo tevgera Kurdistanê Bakur pêva-joyeke nû dest pêkir: Bihara 2. qewî-mî; Tevgera Kurdistanê Bakur bi gelek rengên xwe ve ji nû ve gul veda. Kovar hatin weşandin, weşanxane ava bûn, rêxistinên siyasî ava bûn. Rêxis-tinên siyasî yên ku jiyana xwe didomandin, xwe ji nû ve organîze kirin.



Li Kurdistanê tevgereke girseyî, xwepêşandanî dest pêkir. Li gelek bajarên Kurdistanê xwepêşandan hatin lidarxistin. Xwepêşandana yekem li Wêranşarê, piştî ku 11 gundiye kurd yê qaçaxçî hatin kuştin, hat lidarxistin. Vê xwepêşandana yekem dewletê gelek tirsand. Lewra dewlet di wê baweriyê de bû ku ew komunîst-kurdcîyên ku ji hepsê derketine, dê li Wêranşarê provaya/cebandina şoreşekê bikin. Ji bona vê jî, li hemberî xwepêşandanê tedbîrên leşkerî yê gelek mezin hatibûn girtin. Bi tankan/debaban hewirdora xwepêşandanê hatibû girtin, di ser re helikopterên leşkerî difiriyên. Mela Ebdulkerîm jî yek ji wan kesan bû ku beşdarî vê xwepêşandanê bibûn.

Piştî xwepêşandana Wêranşarê li Mêrdînê, piştî Mêrdînê jî li Farqînê xwepêşandan hat lidarxistin. Dema ku xwepêşandana Farqînê hat lidarxistin şertên hîn taybetî hatibûn holê. Di nav tevgera Şivancîyan de cudayeti çêbibû, Maoçîtiyê rûdabû. Li Farqînê her du teref jî xurt bûn û di navbera wan de jî hevrikiyeke/reqabeteke gelek dijar, nexweş û dijminatî derketibû meydana. Helbet ji aliyê din ve jî dewlet êrîşker bû û dixwest di nav van tevgerên kurd de provakasyonê çêbike, wan bera hev de.

Dema ku li Farqînê xwepêşandan dihat lidarxistin, ji hemû bajarên Kurdistanê û ji metropolên kurdperwer û berpirsiyarên dezgehên kurd hatibûn da ku ji bo xwepêşandana Farqînê xebatê bikin. Vê yekê li Farqînê rewş û atmosfera siyasî gelek germ kiribû û kelandinek xistibû

Farqînê. Helbet Mela Ebdulkerîm û Muhterem Biçimli jî aktorên sereke yê vê xwepêşandanê bûn.

Ez li mala Muhterem mêvan bûm. Ez û gelek heval, em li mala Mela Ebdulkerîm rûdiniştin û li wira civînên me pêkdihatin.

Dema ku ez çûm Farqînê di destpêkê de kêmasiyek, heta ez dikarim bibêjim ku xeteriyek, ji aliyê min ve hatibû tespîtkirin. Ev xeterî û kêmasî di tespîtkirina spîker û rêvebirê xwepêşandanê de derdiket holê. Ata Şen ê Mîdyadî wek spîker û rêvebirê xwepêşandanê hatibû tespîtkirin. Ata Şen yekî Maoçî û muxalîfê Şivancîyan bû. Wek karakter jî xwediyê teybetmendiyêke provakatorîyê bû.

Min di destpêkê de bîrûrayên xwe di derbarê rêvebirê xwepêşandanê de ji Mela Ebdulkerîm re diyar kir. Wî bîrûreyên min ecibandin û em gihîştin wê biryarê ku bila rêvebirê xwepêşandanê bête guhertin. Pişt re me bi hev re van bîrûrayên xwe ji Muhterem Biçimli re pêşkêş kirin. Wî jî bîrûrayên me yê di derbarê rêvebirê xwepêşandanê de di cih de dît û got ku "min Ata Şen pêşniyar kiribû ku bibe rêvebirê xwepêşandanê. Heta ku min bi xwe ew tespît kiribû jî. Ez niha dikarim wî jî rêvebiriyê bigrim." Me jî metod û pêşniyara Muhterem Biçimli re îtiraz kir. Me pêşniyar kir ku pêşiyê em bi wan kes û berpirsiyarên grûbên ne Maoçî re vê pîrsê bi axivîn û bi hev re di vê pîrsê de biryarekê bigrin, pişt re vê pêşniyarê ji Ata Şen û hevalên wî re pêşkêş bikin. Muhterem jî ji van nêrînan me re got "erê."

Me li mala Mela Ebdulkerîm civî-

na xwe pêkanî û ji derveyî Maociyan hemû kes beşdarî civînê bûn. Me ji bona xwepêşandanê biryarên hevbeş girtin. Di civînê de ji bona guhertina rêvebirê xwepêşandanê jî biryar hat girtin. Ev biryara me ji aliyê Muhterem Biçimli û du hevalên din ve ji Ata Şen, Ferit Uzun û hevalên wan re hat pêşkêşkirin. Ferit Uzun û hevalên wî ji vê biryarê gelek aciz bûn, lê axir di encamê de wan jî biryarê pejirandin, anga "erê" kirin.

Ji bona ku rêvebirê xwepêşandanê bête diyarkirin, civîn pêkhat. Di civînê de min pêşniyar kir ku Mela Ebdulkerîm bibe rêvebir û spikerê xwepêşandinê. Lewra kurdiya Ebdulkerîm gelek xweş, delal, zelal û baş bû. Ew axiftvanekî baş û ajîtatorekî xurt bû. Bi axiftina xwe bi gelek hêsanî li ser beşdarvanên xwepêşandanê bandor çêdikir. Hezar mixabin, hevalên Şivancî tu sedem nîşan nedan li dijî pêşniyara min derketin. Lê min jî, Mela Ebdulkerîm jî, hevalên ji derveyî Şivanciyan jî sedema vê yekê baş dizanî. Mela Ebdulkerîm ji bona ku di bûyera Seîdan de xwediyê helwesteke zelal, li Dr. Şivan û hevalên wî rexnegir bû, hevalên Şivancî vekirî nebe jî, li hemberî Mela Ebdulkerîm xwediyê helwestekê bûn.

Ji bona rêvebiriya xwepêşandanê Muhterem xwe pêşniyar kir, ez li dijî derketim. Sedema wî jî ne ku min nedixwest ku Muhterem bibe rêvebir. Ji bona ku Muhterem mirovekî germ û ji provakasyonê re vekirî bû, ez li dijî rêvebiriya wî bûm. Wî jî, ji bona ku ez nuh ji hepsê derketibûm û ez zerar nebînim, nedixwest ku ez bibim rêve-

birê xwepêşandanê. Di encamê de biryar hat girtin ku Muhterem xwepêşandanê bi rê ve bibe, ez jî, ji wî re bibim alîkar û wî kontrol bikim.

Ji gelek bajarên Kurdistanê bi hezaran kes beşdarî xwepêşandanê bûn. Xwepêşandan di ciyekî gelek teng û xeter de pêk hat. Leşkeran hewirdora xwepêşandanê girtibûn. Di xwepêşandanê de provakasyona ji aliyê Maociyan ve hat lidarxistin, xeteriyeke mezin pêkanî. Dema ku provakasyon derket holê, ji bona ku mirov zerar nebînin me hewldaneke xurt nîşan da. Mela Ebdulkerîm yek ji wan kesan bû ku pêşya firehbûna provakasyonê girt.

Mela Ebdulkerîm piştî xwepêşandanê ji min re diyar kir ku "ez ji kuştina dewlet û dijmin natirsim. Ew wek mirovên doza Kurdistanê ji kuştina dijmin re amade ne, minneta me ji wan tune ye. Tîrsa min a mezin ew e, ku em kurd xwe bi xwe hevûdu bikujin. Destê me bi xwîna birayê me gunehbar bibel!"

Hezar mixabin piştî ku ew çû dîlovanîya xwe, rêxistinên Kurdistanê Bakur jî hevûdu gelek welatparêz kuştin.

### Ew evîndar û mîsyonerê zimanê kurdî bû...

Mela Ebdulkerîm aşiqê zimanê kurdî bû. Zimanê kurdî zimanê wî yê fermî, gelêrî, melatî û yê kolanê bû. Ji bona ku dewleta tirk neteweya kurd nas nedikir, digot "kurd tune ne û kurd tirk in", wî li hemberî siyaseta dewletê zimanê kurdî wek çekekê bikardianî. Ji bona ku li dijî asîmîlasyonê dewletê jî derkeve kurdî qisekirin,

gelek girîng, jiyân û wek bêtaetîyekê li hemberî siyaseta dewletê dipejirand.

Ji bona vê taybetmendiyeke wî hebû ku wî her dem bi gel re kurdî qise dikir, bi rewşenbîr û xwendevanên kurd re kurdî qise dikir. Xwendevanên kurd ji bona ku zêde kurdî nedizanîn wî bi vê helwesta xwe xwendevanên kurd dixist rewşeke nexweş. Xwendevan teşwîqî kurdî qisekirinê dikir.

Wî dema ku bi mirovê tirk re jî qise bikira, wî di destpêkê de bi her kesî re bi kurdî qise dikir. Dema ku mirov ji Mela Ebdulkerîm pirs dikir ku "gelo tu çima bi mirovê tirk re kurdî qise dikî?", bersîva wî amade û hêja bû: "Mirovê tirk dema ku min kurdî qise kir, ew tiştên ez dibêjim, fahm nake. Mecbûr e ku ji min bipirse ku tu bi çi zimanî qise dikî û tu çi dibêji. Wê demê ez jî bersîva wî didim. Hingê ew têdigihîje ku neteweya kurd û zimanê kurdî heye. Feqet ji aliyê dewletê ve hatiye qedexekirin."

Ew dema ku beşdarî civînan dibû jî kurdî qise dikir û dema ku navê wî bihata xwendin, her kesî digot "ben buradayim", wî digot "ez li vir im." Mela Ebdulkerîm di wan şertan de bi vê helwesta xwe ya rast û dirust, di serê mirovê tirk de jî bi awayekî pirs ava dikir. Qismek kes bi aciziya xwe, qismek kes bi meraqa xwe, qismek kes jî ji bona fêrbûnê nîyeta xwe ya paqij, bi pirsê kurdî re eleqedar dibû. Mela Ebdulkerîm bi vê helwesta xwe di serê mirov de pirs û pirsgirêkên mezin çêdikir.

Mela Ebdulkerîm bi vê helwesta xwe dixwest ku zimanê kurdî dewle-

mend jî bibe. Ji bona her tiştêkî, ji bona gotinên felsefî, civakî, aborî, çandî û hwd. peyv, bêje û gotin çêdikir. Niyazî Tatlici ji bona vê, ji wî re digot ku "tu nîjadperestê kurd û zimanê kurdî yî." Dema ku Niyazî Tatlici ji wî re wusa digot, ew hîç aciz nedibû û bi van gotinên Niyazî Tatlici gelek kêfxweş dibû.

Wî digot ku, mala Kenediyên Amerîkayî jî kurd in. Lewra navê mala wan ji, "ken nedî" tê.

### **Wî cilûbergên kurdî lixwekirin wek bêtaetîyê şirove dikir...**

Baş têye zanîn ku qedexekirina kinc û libasên herêmî û neteweyî ji aliyê Atatirk ve hatibûn qedexekirin. Sebebê vê qedexeya Atatirk, bi taybet cilûbergên kurdî bûn.

Ji bona vê Mela Ebdulkerîm lixwekirina cilûbergên kurdî wek helweste neteweyî li hemberî siyaseta dewleta tirk bêtaetî dihesiband. Ji derveyî vê yekê, Mela Ebdulkerîm bi vê helwesta xwe ji gundiyên kurd re jî nîşan dida ku ez jî yek ji we me, lixwekirina cilûbergên kurdî ne şerm e, heta şeref e.

Cilûbergên kurdî jî gelek xweş li wî dihatin, bi wan re dibû mirovekî gelek çeleng û xweş.

Baş têye bîra min ku, ev helwesta Mela Ebdulkerîm li ser gel û xwendevanên kurd tesîr û bandoreke mezin çêdikir. Wan ji bona xwe bişibînin Mela Ebdulkerîm û taybetmendiyeke nîşan bidin, cilûbergên kurdî li xwe dikirin.

**Sê Leheng: Mela Ebdulkerîm  
Ceyhan, Mela Mehmud  
Okutucu, Muhterem Biçimli...**

Çi beriya salên 1970yî û çî jî piştî salên 1970yî, dema ku ji navê Mela Ebdulkerîm dihat behskirin, ji navê du kesên din, ji navê Muhterem Biçimli û Mela Mehmud Okutucu jî dihat behskirin. Mela Ebdulkerîm, navê wan jî dianî bîra mirov. Ev yek ne ku bi plan çêbibû, bi xwezayî hatibû holê.

Ew sê kes, di çav û baweriyayê gel de, di nav tevgera Kurdistanê de sê leheng bûn. Ew dibistana kurdî û kurdayetî bûn. Gelê Farqînê û kurdperwerên Farqînê ji wan gelek tişt fêr bibûn.

Wan li Farqînê kurdayetî û kurd-bûn kiribûn çandekê. Kurdayetî wek tîye zanîn, wê demê bes li bajarên Kurdistanê û Diyarbekirê di nav beşek xwendevan de hebû, xwediyê qîymetekê bû. Li Farqînê kurdayetî, kurdperwerî, bi girseyî û gelêrî bû, babeteke jiyane bû. Ev taybetmendî ne ku xwe bi xwe, bi xebata van her sê lehengan û ligel wan bi xebatê kurdperwer û rewşenbîrên din ava bibû, çêbibû.

Tiştêkî gelek balkêş e, ku dawîlehatina jiyana van her sê lehengan jî, xwezayî nebû. Di encama qezaya trafikê de bû. Mirov dikare bibêje ku qedera van sê lehengan bi hev re hatibû nivîsandin. Wan çawan ku di jiyana kurdperwerî de demekî dirêj ji hevûdu veneqetiyay, di mirinê de jî ji hevûdu veneqetiyay.

Heta ez dikarim bibêjim ku Muhterem Biçimli, mirina xwe û awayê mirinê xwe jî, di pêşî de zanîbû û roja ku Mela Ebdulkerîm çûbû ser dîlovaniya xwe îlan kiribû.

Roja ku Ebdulkerîm Ceyhan li Diyarbekirê çû ser dîlovaniya xwe, me ew bir Farqînê. Dema ku em çûn Farqînê Muhterem li Farqînê amade nebû. Pişt re bihîstibû ku Mela Ebdulkerîm çûye ser dîlovaniya xwe, bi lez hat Farqînê. Omer Çetîn jî bi wî re bû. Em jî li ber mizgeftê bûn. Muhterem gelek xemgîn bû û digirîya, nedikarî bi rehetî qise bike. Ji me re got ku "ez jî dê bi qezayê bimirim." Her çiqas me ji vê raya wî re îtiraz jî kiribe, wî vê nêrîna xwe dubare dikir. Rastî jî, gotina wî derket. Ew jî di encama qezaya trafikê de li nêzikî Xarpêtê, li ber gola Xezerê çû ser dîlovaniya xwe.

Vê yekê jî diyar kir ku Mela Ebdulkerîm û Muhterem Biçimli gelek nêzikî hevûdu bûn û ji hevûdu hez dikirin. Her çiqas demekê navbera wan girêdayî pirsgrêkên siyasî baş nebe jî, wan her demê ji hevûdu zêde hez dikir.

**Mirina wî li ser tevgera kurd û  
kurdperweran, li ser ciwanên  
kurd û gelê Farqînê tesîreke  
mezin kir..**

Piştî ku Mela Ebdulkerîm çû ser dîlovaniya xwe û ji nav me koç kir, ez ji nêzik ve bûm şahid ku mirina wî tesîreke mezin ya negatîv li ser tevgera kurd û bi taybetî jî li ser tevgera kurdî ya li Farqîne kirîye. Nemaze piştî ku Muhterem jî ji nav me koç kir, tevgera kurd li Farqînê derbeke mezin xwar.

Heta mirov dikare bibêje heger Mela Ebdulkerîm û Muhterem bijiyana, ew karesat û qetlîamên ku piştî

salên 1980yî li Farqînê pêkhatin, dê neqewimîyana.

Lewra wan û hevalên wan ên li Farqînê bi xebateke gelek dûrûdirêj, bi fedekarî, bi dilsozî û bi dozkariya netewayetîyê Farqînê kiribûn dibistanana weletperwerî, kurdayetî û Kurdistanîbûnê. Ew rêvebir û îdeologên tevgera kurd a li Farqînê bûn. Dema ku wan ji nav me koç kirin, dibistana kurdayetî ya li Farqînê bê mamoste ma. An jî ciyê wan, bi mamosteyên ne ehil hate dagirtin. Dema ku dibistanek bê mamoste bimîne yan jî bikeve destê mamosteyên ne ehil, ew dibistan zêde berhemdar nabe, rola xwe nalîze.

Ew di heman demê de ji bo kurdayetî bi her awayî, bi cilên xwe, bi rabûn û rûniştina xwe, li hemberî desthilatdarên dewletê û herêmê bi helwesta xwe ya mêrane jî, model û rêber bûn. Dema ku ew çûn ser dîlovaniya xwe, gelê Farqînê, welatperwer û xwendevanên welatperwer ên Farqînê ew model û rêberên xwe wenda kirin, nikarîn zêde pêşiya xwe bibînin, li hemberî desthilatdaran li ber xwe bidin.

Mela Ebdulkerîm, di nav kurdperweran û gelê Farqînê de rola yekîtiyê, lihevkerî, çarserkirina pirsan dilîst. Wî ji hîç kesekî weletperwer re acizî û nerehetiya xwe diyar nedikir. Ew mirovekî gelek dîlfireh, bi tolerans û rûnêrm bû. Ew li hemberî her kurdekî gelek bi merhemet bû. Ew di wê baweriyê de bû ku dê hemûyê kurdan rojekê bêne ser riya kurdperwerîyê. Ji bona vê jî wî digot ku divê li hemberî hîç kurdekî dijminatî nebe, ji bo her

kurdekî riya hevbeşî, dostanî, riya rehmê vebe.

Ew gelperwer û gelhez bû. Ji bona vê jî, ew bi rewşa gel ya feqîrtî dilêş bû. Ji bona vê jî, wî jî wek gelê feqîr jiyana xwe didomand. Ev helwesta wî, ji sosyalîstbûna wî nedihat. Ew helwest û awayê jiyana wî, ji hezkirina gelê kurd û Kurdistanê dihat. Ev awayê jiyana wî bû sebeb ku tu dem ew bi dû maldariyê de neçe. Dema ku wî ji vê dinyayê koç kir, ew mirovekî gelek feqîr bû.

Ciwanên Farqîn û Kurdistanê jî, ji Mela Ebdulkerîm gelek hez dikirin. Wî xwe hevalên ciwanan didît, bi ciwanan re radibû û rûdinişt. Wî dixwest ku ceribandî û zanyariya xwe bide ciwanan û bi wan re parve bike. Ciwanan jî dixwest ku bi awayê jiyana xwe wek Seydayê xwe bibin: Wek wî dilsoz, dîlfireh, leheng bin.

### Kurtejiyana wî...

Mela Ebdulkerîm CEYHAN, li Farqînê hatiye dinyayê. Li Amedê Farqîn, li hemû deman wek cîwarekî taybet hatiye şirovekirin. Çûnke bi rastî jî Farqîn cîwarekî taybet e. Bi rastî dema ku ji Farqînê têye behskirin, di hafîzaya/bîra kurdan de, xwe bi xwe (spontane) dewleteke kurd a dîrokî tê hiş û bîra mirov. Ji bona vê li Farqînê hatina dinyayê, bi serê xwe ji aliyê hestên millî ve taybetiyek e. kurdperwerên Farqînê jî, xweser wê taybetîyê nîşan didin.

Helbet ev tiştên ku ez niha behs dikim, mumkûn e ku ne objektîf bin. Lêbelê qet nebe, ez her dem wisan hizirîme.

Mela Ebdulkerîm CEYHAN, li gorî nasnameya xwe ya fermî di sala 1937 de hatiye dinyayê. Hevalên wî yên nêzik, bo numûne, wek Şêx Mîsbah dibêjin ku, ew 4-5 salan piçûktir hatiye qeydkirin. Çünke malbatên kurdan ji bona ku ji leşkeriya tirkac aciz in, ji leşkeriyê ditirsin, dixwazin ku zarokên wan dereng biçin leşkeriyê, lewma jî salên wan piçûk dinivîsînin. Heger ji bo dayikbûna wî sala 1937 rast be, ew di şertên Serîhildana Dersîmê de hatiye dinyayê. Heger roja dayikbûna wî 1932 be, di nav Serîhildana Çiyayê Agirî de hatiye dinyayê. Her du bûyer jî di jiyana miletê kurd de xwediyê taybetmendiyeke ne.

Dema ku ez taybetî û karakterê Mela Ebdulkerîm CEYHAN şirove dikim, ji bo min baweriyêke wişa çêdibe ku Mela ji wan bûyerên dîrokî wek genetîk taybetmendiyeke xwe wergirtine.

Mela Ebdulkerîm CEYHAN, di 30. 09. 1976 de, di encama qezeyeke trafîkê de, li nêzikî Diyarbekirê çû ser dîlovaniya xwe: Di ser koçkirina wî re 31 sal derbas bûne.

Navê bavê wî Mehmûd e, navê diya wî Fatma ye. Ew xwediyê pênc zarokan e. Ji van çar lawik in: Ciwanroj, Azad, Zagros, Rojhilat. Yek jî keçik e. Dema ku Mela çû ser dîlovaniya xwe, keçika wî Eşyan di zikê dayika xwe de bû.

Dewleta tirk her çiqas qedexa jî kiribe, Seydayê Mezin vê qedexeya dewletê guhdarî nekiriye, navê zarokên xwe bi kurdî daniye. Helbet zarokên wî ji ber van navên xwe kurdî



Ciwanroj di hemêza bavê xwe de û dayika M. Ebdulkerîm

gelek tade dîtine.

Mela Ebdulkerîm ji bona ku bi xurtî li dijî asîmilasyon û navguhertina gundan, bajaran, çîyan, zozanan, deştan û hwd. bû, wî her demê navên kurdî bikar dianî.

Lewra wek min li rêzên jorîn jî anîbû ser zimên, ew evîndar û mîsyonerê zimanê kurdî bû.

### Bi giştî taybetiyên wî...

Mela Ebdulkerîm CEYHAN li medrese perwerde bûye. Dema ku di medresê de perwerde bibû, dest bi kurdayetîyê kiriye. *Dîwana* Melayê Cizirî, klasîka kurdî ya edebî *Mem û*

Zîna Ehmedê Xanî û eserên din yên kurdî li wir xwendine, helbestên Cegerxwîn li wir jiber kirine. Dema ku min wî ji nêzik ve nas kir, min dît ku ew bi sedan û heta bi hezaran helbestên kurdî jiber dizane.

Ligel viya Mela Ebdulkerîm CEYHAN xwediye zanîneke giştî ya ilma pozîtîv, dîroka Kurdistanê û zimanê kurdî bû. Wî li mal, li kolanan, li ciyê karê xwe û di civînan de her dem bi kurdî qise dikir: Dema ku ew li Batmanê xwediye aşxaneyê bû, navê xwarinan jî, li gorî xwe, bi kurdî dianî digot. Bo numûne digot "serê çivîkê", "zikqelaştî", "tevlîhev"... Bi qasî ku ez dizanim û min guhdarî kiriye, wek navê xwarinan di destpêkê de ji aliyê wî ve hatine karanîn. Kurdiya wî gellek zelal bû. Ji bona ku xwendevan û kurdperwer kurdî qise bikin, her tim di nava hewldanê de bû. Wî xwendevan û kurdperweran li mala xwe pirralî perwerde dikir; dersên zimanê kurdî dida wan.

Mela Ebdulkerîm Ceyhan derwêşê doza kurd û Kurdistanê bû. Heta roja ku çû ser dilovaniya xwe doza kurd û Kurdistanê karê wî yê merkezî û di dereceya yekem de bû. Roja ku çû ser dilovaniya xwe jî, ji bona civîneke kurdî dihat Amedê. Wî tu dem li mal û milkê dinyayê nefikirî. Dema ku çû ser dilovaniya xwe jî, di şertên feqîrî de bû.

Mela Ebdulkerîm CEYHAN, ji aliyê gel û kudperweran ve gelek zêde dihat hezkirin, hurmet û rêza wî dihat girtin. Mirovekî gellek fedekar bû, bi derd û êşên gel re xwe diêşand û bi qasî ku ji wî dihat ji gel re dibû alîkar.

Her kurdperwerekî ew mamosteyê kurdayetî û mamosteyê xwe dizanî. Ji bona vê, bi salan e, dema ku ez ji Farqînê behs dikim, navê wî, navê Muhterem Biçimlî û navê Mehmed Okutucu di serî de tê bîra min. Wê demê jî ez medresebûna kurdayetî ya Ferqînê tînim bîra xwe; ez Mela Ebdulkerîm CEYHAN û hevalên wî jî, mamostayên mezin yên wê medreseya herêmî û Farqînê, ya kurdayetîyê binav dikim.

Mela Ebdulkerîm CEYHAN, qîymeteke mezin dida xebata rêxistinî jî. Ji bo berjewendiyên bala yên neteweya kurd û ji bona ku tevgera kurd pêş bikeve, li Farqînê bû yek ji damezrenê û berpirsiyarê TÎPê. Dema ku di TÎPê de xebata kurdayetî dimeşand, di heman demê de bû endamê PDK ya li Tirkîyeyê û di Komîteya Merkezî de berpirsiyarî kir. Dema ku berjewendiya kurdayetî di DDKOyê de dît, di eynî wextê de bû damezrêner û berpirsiyarê DDKOyê.

Mela Ebdulkerîm CEYHAN, di nav gel de xwediye metod, rê û rêbazên taybetî û serkeftî bû. Ew, birêxistinî û bêrêxistinî her dem bi gel re xwediye pêwendiyêke baş bû. Ew kes û axayên ku birûrayên wî nedipejirandin jî, ji wî hez dikirin û ji wî re rêz digirtin. Pêxwasên Farqînê jî ji wî re rêz digirt, her demê digotin ku "em di xizmeta te de ne". Lê wî ew her demê ji bo başiya wan û başiya gel û kurdayetîyê fikir dida wan.

Ew aktivîstekî kurdperwer û propagandîstekî gelek baş bû. Ew li Kurdistanê û li Farqînê beşdarî kar û xebatên gellek girîng bûye. Beşdariya wî yê "Xwepêşandanên Rojhilatê", li

Farqîne li hemberî Operasyona Koman-doyan xebat kirin, ji van xebatên wî yên girîng, du xebatên wî bûn.

Dema ku leşkeran di 12ê adara 1971 de li Tirkîyeyê dîktatoriya xwe vekirî ava kirin, ew jî wek sedan welat-parêzên kurd wek qaçax hat îlankirin û dest pêkirin li wî gerîyan. Wê demê wî, Muhterem Biçimli û Mehmed Okutucu biryar dan ku biçin li Otonomiya Kurdistanê cihûwar bibin: Lewra hevalên wan jî li wir bûn û li wir perwerde dibûn. Ew di sala 1974 de piştî derketina efûya giştî vegeyiran bo Kurdistanê Bakûr. Piştî vegeyandî ew her çiqas xwediyê rêxistinekê jî nebû, kar û xebatên xwe yên kurdîtiye gor awayê xwe meşand. Piştî sala 1974 dema ku xwepêşandana giresyî li Farqînê hat lidarxistin, beşek xebata wê xwepêşandanê li mala wî hat meşandin, ez jî beşdariya wê xebatê bibûm, wî di wê xebatê de roleke mezin lîst.

Ebdulkerîm CEYHAN, kurdekî çep yê nasyonalist û Kurdistanî bû, Tirkîyeyî nebû. Ew di TÎPê de li hemberî Tirkîyecitiya "Grûba Rojhilatê" bû ku Dr. Tîrîk Z. Ekinî pêşengîya wê dikir.

Ew li Kurdistanê kesekî bi nav û deng bû.

Dewleta tirk baş dizanîbû ku Ebdulkerîm CEYHAN di Doza Kurd û Kurdistanê de mirovekî qerardar e. Ji bona vê jî biryar da ku E. Ceyhan bidin kuştin. Hem jî xwestin wî bi destê birayê wî bidin kuştin. Dema ku Ebdulkerîm CEYHAN jî vê yekê agahdar dibe, birayê xwe bi zehmetî û bi zîmanekî şîrîn, ji bo ku ji vî karê xirab vegeyîne, qanî dîke.

Mela Ebdulkerîm bi her kesekî û her beşeke civatê re gelek bi hêsanî danûstandin dikir. Ji her kesekî û her beşeke civatê tiştêk digirt, di heman demê de tiştêk dida wan. Lê ew her dem wek xwe bû, ew xwediyê rîyeke taybetî ya xwe bû. Tu dem wek kesên din nedibû. Serxwebûn û azadiya xwe diparast.

### Bîranîn û bînavbûna wî...

Ew kesê bi nav û deng, piştî mirina xwe bînav bû. Tu hêzek û rêxistineke Kurdistanî jê re xwedî derneket. Helbet li Kurdistanê gelek dozkarên bînav hene. Pêwîst e ji bona ku hafîzaya neteweyî xurt bibe, çanda neteweyîyê dewlemend bibe û bikarîbe hewzekê çêbike, divê em ji van dozkarên bînav yên doza Kurd û Kurdistanê re xwedî derkevin.

Pêwîst e her kurdek û her dezgehên kurd bibin alîkar ku dozkarên bînav, bînav bikin: Dest bidin hev, xebateke bi plan û bi bîrname bimeşînin.

Ji bona vê, me li ser navê komîteyekê, di 30. salvegera koçkirina wî de (2006), bi civîneke çapemenîyê li Amedê û li Farqînê, li ser mezelê wî, me ew bîbîr anî.

Kurdistan/Amed, Nîsan 2007



# QANATÊ KURDO (KÛRDOYÊV)


Tosinê Reşîd

*"Ziman bingeh û binaxa yekîtiya endamên millet e,  
çeka serbestî û serxwebûna wî ye."*

*Qanatê Kurdo*

Bi sedsalan dagirkeran rê li pêşîya pêşveçûna gelê kurd girtine, her tişt kirine, wekî ew ji dîrok, ziman û çanda xwe bêpar bimîne. Lê dîsan jî kurda her firsend, îمكانên heyî bi kar anîne ji bo parastin û pêşvebirina kelepora xwe ya netewî. Di vê pîrsê de nimûna kurdên Yekîtiya Sovêta berê balkêş e. Her çiqas jî jimara wan ne mezin bû, lê dîsan jî li gor îمكانên heyî, di demeke kurt de ji nav wan gelek zanîyar, nivîskar û siyasîmedarên naskirî peyda bûn ku gelê xwe û çanda wî xwedî derketin. Ji wan navdarên kurd yek jî doktor, profêsor Qanatê Kurdo (Kûrdoyêv) bû, ku seranserê jîyana xwe da lêkolîna ziman, dîrok, etnografîya û wêjeya kurdî, amadekirina kadroyên kurdnasîyê.

Qanatê Kurdo 12ê Îlonê sala 1909an li gundê Sûsîz, qeza Dîgorê, devera Qersê, di malbeteke kurdên êzdî de ji dayik bûye.



Qanatê KURDO

Di salên Cenga Cihanî yê Yekemîn da, malbata Qanatê Kurdo jî mîna bi hezaran malbatên kurdên êzdî mal û milkê xwe, welatê kal û bavên xwe dihêle û ji ber zilm û zora Roma Reş koç dike Ermenistana îroyîn. Lê Ermenistan bi xwe wêrankirî û bi peneberên ermenî ve tijî bû û malbata Qanat ji wir jî diçe Tilbîsê.

Sala 1921ê bavê Qanat diçe ser diloaniya xwe, dayika wî jî didine mêr û Reşîdê (bavê min-T.R.) pismam xweyîtiyê Qanat dike.

Qanat xwendina xwe sala 1922an dest pê dike. Wê salê bi înisyatîva nivîskar û hinermendê kurd Ahmedê Mîrazî (Ahmedê Şewêş) li bajarê Tilbîsê ji bo zarokên kurd, dûarojê mezinan jî, dibistana kurdî tê vekirin, ku yek ji mamostayên wê Lazo bû. Qanat qutabîkê wê dibistanê bû.

Sala 1928an bi berpeyvka Erebe Şemo, Komîta Navendî ya Partiya Komûnîst a Ermenistanê 8 xortên kurd ji bo xwendinê dişîne Leningradê (Sankt Pêtêrbûrga niha); ji wan xortan yek Qanatê Kurdo bû.

Ji ber ku xwendina wî ya navîn ne tam bû, ew berê dikeve Fakûlta Karkeran, ya Înstîtûta Zimanên Rojhilatê ye, ku zimanê kurdî jî li wir dixwendin û piştî temamkirina wê xwendina xwe li Zanîngeha Dîrok, Felsefe, Ziman û Wêje berdewam dike. Li zanîngehê Qanat ber destê rojhilatanên bi nav û deng Nikolay Marr, Îosîf Orbêlî, Alêksandr Frêyman û çendekên mayîn zanîbûnên xwe di hêla îrannasîyê û kurdnasîyê de kûr dike.

Êdî sala 1933an, gava Qanat hê xwendkarê zanîngehê bû, ew bi Erebe

Şemo û Îsahak Tsûkêrman ve du gotarên zanîyarî li ser pirsên zimanê kurdî çap dike. Nîrxê wan gotaran, ê zanîyarî gelek mezin bû, ji ber ku cara yekemîn di kurdnasîyê û îrannasîyê de katêgoriya cinsan (qismên nêr û mê) di zimanê kurdî de (zaravê kurdmancî) dihat destnîşan kirin.

Gerek bê gotin, wekî ew gotar bi tam ser hizir û boçûnên Qanatê Kurdo hatine nivîsar. Lê ji ber ku rûsîya wî hingê ne ser rada ji bo nivîsara gotarên zanîstî bû, ew Î. Tsûkêrman ji xwe re dike heval. Erebe Şemo jî rêya weşandinê dibîne û bi vî teherî gotar bi sê navan li kovara *Nivîsar û Şorîş* tete weşandin.

Qanatê Kurdo wan salan bi xwendina înstîtûtê re tevayî, usan jî di Fakûlta Karkeran de mamostayê zimanê kurdî bû.

Piştî temamkirina Zanîngeha Dîrok, Felsefe, Ziman û Wêjeyê ew li Zanîngeha Leningradê ya dewletê çawan aspirant (xwendkarê doktorîyê) tê hildan û têza xwe ya doktorîyê (Ph.D) bi mijara "*Çêbûna kirdarên bargiran di zimanê kurdî de*" sala 1941ê pawan dike û çawan doktor li Înstîtûta Êtnografîyê ya zanîyariyê lêkolînên xwe ên kurdnasîyê didomîne.

Salên Cenga Niştîmanîyê ew bi riza dilê xwe dikeve cêrgên Artêşa Sor û heta dawîya Cengê şer dike. Ji bo mêraniya di şêr de ew hêjayî ordêna 'Stêrka Sor' û gelek mîdalyan dibe.

Piştî ji şêr vegeerê, ew li Zanîngeha Leningradê dibe mamostê zimanê kurdî. Çend şagirtên wî, ên wan salan (M. Rûdênko, R. Sabolov), wê dûarojê bibin kurdnasên nasîkirî

Sala 1946an ew pê xwe davêje beşa Lênîngradê, ya Înstîtûta Rojhilatnasîyê û heta dawîya jîyana xwe di wê navenda rojhilatnasîyê ya bi nav û deng de kar dike.

Çiqas jî kevneşopî, tradîsyona kurdnasîyê li Rûsîya dewlemend bû, dîsan jî heta wan salan kurdnasî wek beşekî îrannasîyê dihat dîtin û zêde cîh ne didanê. Lê gava sala 1958an di destûra komara Îraqê de hinek mafên kurdan hatin naskirin, li Yekîtiya Sovêtê pîrsa kurdan bi carekê ve kete rojavê, giringîya kurdnasîyê mezin bû. Berê li Lênîngradê û Yêrêvanê, paşê jî li Moskovayê, li Înstîtût û beşên Rojhilatnasîyê parên kurdnasîyê hatin vekirin. Li Bakû, Taşkênt, Tilbisê, Samarkand û hinek bajarên mayîn jî lêkolînên ser kurdan berfireh bûn.

28ê Sibatê sala 1959an, bi fermana serokê Beşa Lênîngradê ya Înstîtûta Rojhilatnasîyê Hovsêp Orbêlî, kurdnasîya ku heta hingê dikete nav beşa Îrannasîyê, bi navê "Kabinêta Kurdnasîyê" dibe beşekî serbixwe. Rojhilatnas û kurdnasê nav û deng, dostê gelê kurd Hovsêp Orbêlî, bi xwe dibe yekemîn serokê wê beşê. Lê piştî çend heyvan Qanatê Kurdo cîhê wî digre, ku heta dawîya jîyana xwe seroketîya wê ocaxa kurdnasîyê kir.



**Prof. Qanatê Kurdo**

Profêsor Zera Ûsiv, ku niha seroka wê beşa kurdnasîyê ye li beşa Sankt Pêtêrbûrgê ya Înstîtûta Rojhilatnasîyê, dinvise ku ew beş bi seroketîya Qanatê Kurdo "dibe navenda lêkolînên kurdî

ya pêşikêşê di seranser cihanê de." Seva rola Qanatê Kurdo di wî karî de ew dinvîse: "Qanatê Kurdo yek ji wan kesan e ku bingehê kurdnasiyê li welêt (Yekîtiya Sovêt-T.R.) danîn."

Pênûsa Qanatê Kurdo gelekî bi adan bû, wî sedî zêdetir pirtûk û gotarên zanîyarî çap kirin. Ew berhemên wî hema bêjî beşên kurdnasiyê gişkan hildigrin nav xwe. Lê Qanatê Kurdo berî gişkî zimanzan bû. Çawa doktor, profêsoza zimanzan, Zera Ûsiv dinvîse; "*Di çareserkirina pirsgirêkên rêzimana kurdî yên mezin da, Qanatê Kurdo yê yekmîn e.*"

Sala 1934an Q. Kurdo li Yêrêvanê beşdarî yekemîn konfêransa kurdnasiyê dibe û gotara "Bingehên rêzimana kurdî" dixwîne. Lê sala 1960î ew peşdarî duyemîn kongra rojhiltnasî ya navnetewî dibe (Moskva). Dûarojê ew bi gotarên ser pirsên kurdnasiyê ên cûr bi cûr beşdarî gelek konfêrans û sîmpozûman bibe.

Sala 1936an ew yekemîn pirtûka xwe, "*Gramatika/Rêzimana Zimanê Kurdî, a Kurt*", bi zimanê kurdî çap dike.

Wan salan li rûpelên rojnama *Rîya Teze* çend gotarên wî ser pirsên zimanê kurdî çap dibin.

Ew usan jî ji bo dibistanên Ermenistanê pirtûkên rêzimana kurdî çap dike û ji sala 1949an dest pê kirî, heta hevberdana Yekîtiya Sovêtê zarokên kurd bi pirtûkên wî ku amade kirî fêrî rêzimana zimanê kurdî dibûn.

Sala 1957an Qanatê Kurdo pirtûka "*Rêzimana zimanê kurdî (kurmançî)*", ya akadêmî, bi zimanê rûsî çap dike. Çawan Dr. Ebdirehmanî Hacı Maruf

dinvîse "Bo yekem car le Sovêt û le mējûy kurdnasî da le ser şeweyekî zanistî kitêb le barey zimanî kurdiyewe belakirayetewe, belko sereray eweş tiwanra le dû kitêbe da gelêk karî aloz û naaşkira le rêgeyekî zanistiyewe xawbikrêtewe û aşkira bikirê, wek: dozînewey **nêr** û **mê** û dabeşkirdinî naw be seryanda; xawkirdinewey hendê alozî le regî kirdar û le pêşgir û paşgir da; şewey kirdarî (transitive) le katî rabûrdû da; hereweha gelêk meseley girîngî tir ke ta derçûnî em du berhemey mamosta Kurdo baş lêyan nakolrabûwe".

Kurdnasê zimanzan, doktor Îsahak Tsûkêrman seva wê pirtûkê dinivîse "Serketîna vê pirtûkê ew e, wekî bi şeweyekî zanistî hatîye nivîsar. Q. Kurdo ne tenê lêkolîna zimanê kurdî kirîye, lê usan jî rêya lêkolîn û fêrbûnê destnîşan kirîye".

Cihê wê ye ku bête gotin, wekî Qanatê Kurdo di wê pirtûka xwe de yekemîn car li Yekîtiya Sovêt şîrên Cegerxwîn çap dike.

Çiqas jî ji sala 1944an alfabeya li ser bingeha tîpên Kîrîlî ji bo kurdên Yekîtiya Sovêtê ya fermî bû, Qanatê Kurdo sala 1952an di lêkolînên xwe ên zanîyarî da tenê alfabeya mîr Celadet Bedirxanî ya li ser bingeha tîpên Latînî bi kar tîne. Ew piştevanê wê alfabe ê bû. Bi bawariya wî alfabe a bi tîpên kîrîlî bi zor stuyê kurdên sovêtê pêça bûn û çiwaz zû ji wê rizgar bibûna, ewqas baş bû.

Ew sala 1960î "*Ferhenga kurdî (kurmançî) - rûsî*" çap dike, ku 34 000 peyvên kurdî hildigire nav xwe. Seva wê ferhengê zimanzan Î. Tsûkêrman

dinvîse; "Mezintirîn berhema zanyarî ye di kurdnasiya Sovêtê da".

Salên 50mîn, bi rêya kurdnasê rûsî bi nav û deng Vladîmîr Mînorskî kovar û rojnamên kurdî bi zaravê kurmançîya jêrîn (soranî) dikevin destê Qanatê Kurdo û ew dest bi fêrbûn û lêkolîna zaravê kurmançîya jêrîn (soranî) dike.

Ser bingehê lêkolîn û himberî hev kirina zaravên kurmançî û soranî ew sala 1965an, çawan têza doktorîyê (D.S.C.), berhema "*Rêzimana zimanê kurdî ser bingehên zaravên kurmançî û soranî*" dinvîse. Ew berhem sala 1978an ji aliyê weşanxana Akadêmîya Yekîtiya Sovêtê ya Zanîyarîyê ve bi zimanê rûsî tê çap kirin.

Qanatê Kurdo usan jî karê amadekirina ferhengên kurd-rûsî didomîne û sala 1983 bi Zera Ûsiv re "*Ferhengî kurdî (soranî) - rûsî*" çap dike.

Berhemên Qanatê Kurdo *Rêzimana Zimanê Kurdî (kurmançî)*, ya Akadêmî 1957, "*Rêzimana Zimanê Kurdî Ser Bingehên Zaravên Kurmançî û Soranî*" 1978, "*Ferhenga kurdî (kurmançî)-rûsî*" 34 hezar peyv, 1960, "*Ferhenga Kurdî (soranî)-Rûsî*" bi Zera Ûsiv ve, 25 hezar peyv, 1983, di zimanzanîya kurdî de berhemên bingehîn (fûndamêntal) in.

Hêjayî gotinê ye, wekî piraniya pirtûk û gotarên Q. Kurdo ji aliyê Dr. Abdûrehman Hacî Maruf, Dr. Kurdistan Mukryanî, Dr. Şukriye Resûl, Profêsor Maruf Xeznedar, Dr. Cemşîd Heyderî, Dr. Îbrahîm Ezîz, Dr. Enwer Qadir Mihemed û Şukir Mistefa de bi zimanê kurdî (kurmançîya jêrîn) hatine wergerandin û li başûrî Kurdistan û Bexda çap bûne.

Sala 1957an Q. Kurdo gotara "Kurd" çap dike. Di wê gotarê de dîroka kurd û Kurdistanê bi kurtî, lê bi şêweyekî zanyarî tê raber kirin. Ev gotar ji bo nasandina gelê kurd û ênografiya wî, gaveke hêja bû.

Q. Kurdo di pîrsa amadekirina kadroyên kurdnasiyê de karekî bê hempe kir. Mîrov dikare bêje wî bi tenê karê zanîngehekê kirîye. Dor bîst kurd-nasan bi seroketîya wî têzên xwe, ên doktorîyê amade kirine. Nav şagirdên wî de kesên ji başûr, rojhilat û rojava Kurdistanê, usan jî ji Tûrkmênistanê, Azarbaycanê, Ermenistanê û Rûsiya hebûn. Xên ji wan kesên wî bi xwe seroketî lê dikir, wî usan jî bi şêwr û şîretên xwe alî aspirantên kurdnasên mayîn dikir. Kesên ber bi wî biçûna tu caran destevala venedigerîyan.

Bi seroketîya Q. Kurdo "Kabînetê Kurdnasiyê" li beşa Lêningradê, ya Înstîtûta Rohilatnasiyê, ji aliyê amadekirina kadroyên kurdnasiyê de bû navenda kurdnasiyê, ya herî navdar li seranser cihanê.

Pispora dîroka gelê kurd, doktor, profêsor Yêv. Vasîlêva di derheqê karê Qanatê Kurdo yê zanyarî de dinvîse: "Dijwar e di karê profêsor Q. K. Kurdoyêv (Qanatê Kurdo) de wan problêman cihê bikî, ku ji bo wî bêtir balkêş bin. Zanîyarê bi birewerîya ênsîklopêdistê, temamiya jîyana xwe da lêkolîna aloztirîn pîrsên zimanê kurdî û zimanzanîyê, lê pê ra jî dîrok û dîroknûsiya kurdî ji demên lape kevn heta demên nûtir ji goveka balkêşîya wî, ya zanîyarîyê, der neman".

Q. Kurdo baş zanibû, wekî ji bo pêşvebirina zimanê kurdî û avakirina

zimanekî standart lêkolînên berfireh, ên zaravên kurdî gelek girîng in.

Ji salên 50 emîn, bi seroketîya Q. Kurdo li "Kabînetê Kurdnasîyê" dest bi lêkolîna zaravên kurdî, ên Başûr-Rojhilata Kurdistanê dibe. Di wê pîrsê de bi taybetî doktor, profesor Zera Ûsiv (Yûsûpova) karekî hêja dike. Lê ji salên 80emîn Qanatê Kurdo êdî pîrsa lêkolîna zimanê peykarên nivîskî datîne, bi taybetî ên bi zaravên hewramî û goranî.

Wan salan ew usan jî pîrsa lêkolîna êl û hozên kurdan û amadekirina ferhenga *Rûsî-Kurdî* datîne.

Qanatê Kurdo karekî hêja kirîye ji bo lêkolîn û nasandina wêjeya kurdî û yekemîn gotara wî bi wê mijarê sala 1952an çap dibe. Bi gelek gotarên zanîyarî re tevayî, ew *Tarîxa Edebyeta Kurdî* amade dike, ku weşanxana *Roja Nû* bi du cildan salên 1983 û 1985î çap kirine.

Gîyanê Qanatê Kurdo bi kurdîyê-tîyê va tijî bû, kurdîyêti jî wî dibarî! Ew ji bo wî "nexweşîke înfeksiyon" bû û ew "nexweşî" pir lez jî wî derbasî xelkên dorê, şagird, dost û hevalên wî dibû.

Şayîrê bi nav û deng, Ebdela Peşêw seva Qanatê Kurdo dinvise; "Mamosta Qanatî Kurdo yekêke le pyawe herre mezinekanî kurd. Çi wek kesayetî, çi wek zana, çi wek niştimanperwarekî Kurdistanî, cêpencey be ser dîroknamewe diyare û ta bê zêtirîş derdeke-wê." Ebdela Pêşew berdewam dike:

"Her li yekem hevdiîtan da germîyek kewte nêwanmanewe, eger çî min le hemû rûwêkewe hemîşe xom be şagirdêkî ew dezanî û îstaş her heman

hestim heye.

Ew "Şoreşger" nebû, bellam xeter-tirîn sengerî hellbijardibû: Sengerî berxodanî gîyanî, sengerî parastinî nas-name".

Q. Kurdo piştevanê nasîyonalîzma kurdan bû bi xwebêja vê peyvêye pêşverû. Wan salan li dewleteke wek Yekîtiya Sovêtê, nasîyonalîzma usa mêranî dixwest û Qanatê Kurdo xwedîyê wê mêranîyê bû.

Sîyasetmedarê kurd Hemreşê Reşo dinivîse: "Qanatê Kurdo mirovekî yek-car welatparêz bû. Ji bo wî pîrsgirêka Kurd û Kurdistanê li ser her raman û bîrûbawerîyekê re dihat. Ew dilsozê yekîtiya kurdan bû. Wî di yekîtiya kurdan de rizgarîya gelê Kurd û Kurdistanê didît".

Li sala 1961ê gotarên Qanatê Kurdo di kovar û rojnamên kurdî yên dervayî Yekîtiya Sovêt de çap dibin. Ev yek jî ne karê her kesî bû.

Dostanîke wî ya baş bi mezinên kurda Mistefa Barzanî, Cegerxwîn û Kamûran Berdixan re hebû.

Piştî peymana 11ê Adarê sala 1970î, li Îraqê Akadêmîya Kurdî (Korî Zanîyarî Kurd) tê damezirandin. Q. Kurdo yekemîn zanîyarê ji Îraqê der bû, ku çawan endemê wê yê karê hate hîlbijartin. Wan salan usan jî li Silêmanîyê Zanîngeha kurdî vebû û ji bo xwendina kûrseke ser zimanê kurdî Q. Kurdo vexwendin Silêmanîyê.

Gelekî şa bibû, armanca wî ya salan, ku di zanîngeheke kurdî de ser zimanê kurdî kûrsekê bixwîne, pêk dihat. Demeke dirêj xwe amade dikir. Lê berî çend rojan, wekî gerek biçûya, jê ra gotin, wekî destûra çûyîna wî nedane. Wî zanibû, wekî ji bo kurdper-

warîya wî rê nedanê here Kurdistanê û ew yek ji bo wî derbeke pir giran bû. Wî, ku heta hingê tu caran cigare hilnedida destê xwe, dest bi kişandina cigarê kir. Çend meha usa di xwe de ponijî bû, kêr dipeyivî, kêr di cîya de diçû. Teherêkî ketibû xudîkê.

Wan rojan wî ji min re usan jî got, wekî piştî Cengê Cihanî yê Duyemîn, gava artêşa Yekîtiya Sovêtê li rojhilata Kurdistanê bû, wî pir dixwest ji bo berevkirina matêriyalên ser zimanê kurdî here Kurdistanê. Lê hingê jî rê dane çend kesên mayîn, lê nadine wî.

Qanatê Kurdo komûnîst bû û wî yekemîn armanca xwe çawan komûnîst di xizmetkirina gelê kurd, yek ji bindesttîrîn gelên li rûbarê cihanê de didît.

Bîranînke wî pir balkêş bû. Piştî Şorişa 14ê Temûzê sal 1958an li Îraqê, kome kurdên başûr çawan aspirant (xwendekarên doktorîyê) têne Yekîtiya Sovîet û berî gişkî Qanatê Kurdo ziyaret dikin. Piştî civîna wan temam dibe û ew ji bal Q. Kurdo derdikevin, yek ji wan bi şûn ve tê û jî Q. Kurdo re dibêje:

"Mamosta, ew gişk nasîyonalîst in, tenê ez im komûnîst."

Q. Kurdo bersiva wî bi kurt dide:

"Ez jî nasîyonalîst im."

Q. Kurdo di meydana kurdnasîyê da xebatkarekî bê westan bû. Wî tu caran di pîrsa kurdan de bi tu kesî re serî danenî. Di temamiya jîyana xwe de ji bo parastina berjewendîyên gelê kurd, ziman, dîrok û çanda gelê kurd bi mêranê xebat kir.

Çi rojhilatnasên nav û deng, çî kurdnasên wek O. Vîlçevskî, Î. Tsûkêrman, G. Akopov û yên mayîn,

eger di pîrsên kurdnasîyê de şaşî biki-rana, dijî berjewendîya gelê kurd bin-vîsîyana, gişka zanibû, wekî tenê Q. Kurdo ye, wekî wê wan şaşîyan derxe meydana û rexne bike.

Qanatê Kurdo dor 50 salî bi mêranî rastîya ziman, dîrok, wêje û çanda gelê kurd parast.

Ji bo wê xebata wî sal bi sal jimara xêrnexwazên wî zêde dibû, li pêş wî gelek asêgeh çê dikirin, bi her teherî dixwastin wî hêrs bikin, jîyana wî jehrdadayî bikin. Gelekan dixwast wî zanîyar û kurdperwarê mezin şikestî bibînin, wî bînine rayê, lê ji tu kesî re ew yek li hev nehat.

Sala 1984an, ji bo 75 salîya jidayîk-bûyîna Q. Kurdo li beşa Lêningradê, ya Înstîtûta Rojhilatnasyê AZ ya Yekîtiya Sovetê civîneke pîrozbahiyê ya mezin hat bi dar xistin. Rojhilatnasên bi nav û deng, heval û hogirên wî ên salên dirêj, bi dilgermî ew pîroz dikirin, kar û berhemên wî carekê jî dinirxandin. Lê gava dora wî hat û gişk bendê bûn wê spasîyên xwe bêje, wî bi tûndî seroke-tîya Înstîtûta Rojhilatnasyê rexne kir, wekî baş guh nadin pişka kurdnasîyê, kadroyên kurdnas ên nû amade nakin, wekî Yekîtiya Sovetê di sîyaseta navnetewî de giranîyê nade rewşa gelê kurdê bindest.

Ez dixwezim li vir bûyarekê jî bîr bînim. Payîza sala 1963an min ji wî re têlêfon kir û got, wekî me li Yêrêvanê komela xwendekarên kurd bi nehînî ava kirîye. Pir şa bû. Wî ji min re got, wekî wê baş bibe em kovarekê jî çap bikin, bi xwe wê ji me re binvîse. Gelek mirovên hevçaxên wî, piranîya rewşen-bîrên kurda xwe dîrî me digirtin,

ditirsyan, ji me re digotin tiştên usa nekin. Lê tîrsa Qanatê Kurdo tunebû.

Qanatê Kurdo mirovekî bînfîreh û nefsbîçûk bû, bi zara re zar bû, bi mezina re mezin. Di pêwendîyên xwe de pir vekirî bû, çi di dilê wî de hebû, ew jî ser zarê wî bû.

Ji her çar perçên Kurdistanê, ji komarên Yekîtiya Sovêt, ji Avropa, bi sedan name ji wî re dihatin û wî tu name bê bersiv nedihîşt, xwedîyê namê kî dibû, bira bibûya.

Xwendekarên kurd ji her çar parçên Kurdistanê ku li Lenîngradê dixwendin, tim caran dibûn mêvanê wî, ew jî carna diçû jûrên wan ê biçûk. Û ew mêvandarî tu caran bê stran û govend ne dibûn. Wî bi xwe govend digirt û distra.

Di keysetê wî de zarotî heta dawîyê jî ma. Ji her tiştî bawer dikir, bi her gotineke baş şa dibû. Her tiştê di dilê wî de ser dêmê wî nivîsar bû, nikaribû ne şabûn, ne hêrs, ne jî dilmayîna xwe veşêre.

Wî jî xortan hiz dikir. Bi mirovên hevçaxê xwe re sebra wî ne dihat. Lewma jî li dora wî timê xort bûn. Bi wan re şa dibû, bi wan re distira, bi wan re govend digirt.

Xarin pir germ dixwar, çay hema kele-kel vedixwar. Qey bêjî di temamîya jîyana xwe de dilezand, ditirsiya tiştêkî pê re negihîne. Rêvaçûna wî jî bi lez bû.

Navê kaltîyê tu caran ne dianî ser xwe.

Seva wî mal, hebûn, dirav, tu nîrxên wan tune bûn.

Gava ew ji Cengê Cihanî yê Duyemîn vedigere, Akadêmîya Artêşa

Sovêtê wî dawet dîkin û dibêjin were ji me re kar bike, em ê xanî bidine te (xanîyê wî dema cengê wêran bibû) û mehê pênc hezar rûbil mûçe (maaş) bidine te. Lê dibêjin tu gerek terka kurdnasiyê bidî. Ew berpeyvka wan napejirîne, ji ber ku zane wekî bêyî kurdnasî nikare bijî. Û bi mûçe mehê hezar hevsid rûbil (dewsa pênc hezaran), di jûreke xanîkî de karê xweyî kurdnasiyê berdewam dike.

Ew bengîyê karê xwe bû. Berbanga zû ji xewê radibû. Radibû, ser çavên xwe dişûştin û dest bi karê xwe dikir. Paşê, hela neferên malê di xewê de bûn, ji xwe re taştê çêdikir, dixwar û dîsan karê xwe didomand.

Dema bi karê xwe ve mijûl bû, te bombe jî li kêleka wî biteqanda, texmîn ne dikir, serê xwe bilind ne dikir.

Di navbera min û wî de pêwendîyên taybetî hebûn. Havîna sala 1955an wî çend şîrên Cegerxwîn li ser daktîloyê lêxistî ji min re şandin û ji min xwest, wekî heta hatina wî (piştî du heyva), ez wan ezber bikim. Hingê bawar bikî ji kurdên Sovêtê tenê çend kesan navê Cegerxwîn bihîstibûn, îcar ku ma şîrên wî bixwînin.

Ew nivîsarên kurdî yên bi tîpên latînî, yên yekemîn bûn ku ketin destê min. Bi wan şîrên Cegerxwîn ez fêrî kurdîya bi tîpên latînî bûm. Wan şîra ber min rêya kurd û Kurdistanê vekir. Heta niha jî ez wan pelên kaxezê wan êdî zer bûyî, wek nivîstên pîroz diparêzim.

Cara yekemîn sala 1955an wî ez bi xwe re birim Lîenîngradê. Lê ji sala 1959an dest pê kirî heta ew xweş bû, sal tune bû, wekî ez qet na carekê neçûma mêvanîya wî.



Sohbetên me pir carana heta nîvê şevê didomiyên.

Ji dostaniya wan salên dirêj min tiştê bal wî texmîn kir; te dikaribû her kes û her tişt rexne bikira, tenê ne Mistefa Barzanî û Cegerxwîn. Wî bi tam bawariya xwe van herdu mezinên kurda dianî, di her pirsê de piştgiirtina wan dikir.

Havîna sala 1984an bizîşka bal wî şêrpence (kansêr) dît. Gotibû heta Tosin neyê, ez destûra niştegeriyê (emeliyete) nadim. Ez ber serê wî bûm gava niştegerî kirin. Lê wê jî alî nekir, 31ê Cotmehê (Oktobir) sala 1985an dilê wî mirovê mezin, kurda: bi nav û deng rawestîya, wî kiras guhêrî.

Qanatê Kurdo ji gelê xwe re mîrateke mezin hîşt; dor bîst kadroyên kurdnasîyê, navendeke kurdnasîyê, ku seranser cihanê hatîye şkirin, sedî zêdetir pirtûk û gotarên zanîyariyê. Lê ji ber ku baştirîn pirtûk û gotarên wî, ên zimanzanîyê bi zimanê rûsî çap bûne, heta gelek zimanzanên kurd jî agaha wan pê tune.

Rast e piraniya berhemên wî bi kurmancîya jêrin hatine wergerandin û weşandin, lê bi kurmancîya jorîn, ku piraniya berhemên Q. Kurdo ser rêzimana wî zaravî ne, kêmtir hatîye çap kirin.

Çend bernemên wî jî; "*Lêkolîna zaza*", "*Dîroka kurdnasîya Rûsîya û Yekîtiya Sovêt*", "*Êzdîxane û Êzdîtî*", "*Nivîstokên lêgerîna folklorê kurdî*" û hinekên mayîn hê jî çap ne bûne. Piştî hevberdana Yekîtiya Sovêtê îmkânên çap kirinê neman.

Baştirîn rêya rêz girtinê ji bo zanîyan, çapkirina berhemên wan e. Em

hêvîdarin Hukûmata Herêma Kurdistan, Korî Zanîyarî Kurditan, zanîngehên Kurdistanê û weşanxanên kurdî wê îmkânên çapkirina van berhemên Qanatê Kurdo bibînin.

# İHSAN NURİ PAŞA (1893-1976)

Nezîrê CİBO

“Devlet, senin rahat ve mutluluğun için her şeye hazırdır... Hangi ülkeyi istiyorsan, oraya atayalım. Pasaport verelim, istediğin ülkede yaşamını sürdür. Maaşını al. Tebriz konsolosu bizzat getirip pasaportunu teslim edecek.”

Ağrı Direnişinden vazgeçirmek için vaatlerde bulunan Türk heyetine ve sözcüsü İbrahim Tali Bey'e İhsan Nuri Paşa şöyle cevap veriyordu:

“Benim yurdum burası ve hiçbir ihtiyacım yok. Devletin vereceği sözlerle güvenmiyorum.. Ben Hoybun askeri lideri ve Kürt silahlı kuvvet-



İhsan Nûrî û hevîna wî Yaşar Xanim

lerinin genel kumandanıyım. Bu görevde Hoybun'un emriyle bulunuyorum ve Hoybun'un mensubu olmaktan şeref duyuyorum. Görevim Türkiye'nin, Kürdistan'ın bağımsızlığını tanınmasına ve onun ordularından boşaltmasına dek

savaşı yürütmektir.. Hoybun'a yapmak istediğiniz siyasi teklifleriniz varsa onları Hoybun'a takdim ederim. Muhtelif şahıslara para ve mevki vaatleriyle müracaatlarda bulunmak faydasızdır. Çünkü çözümlenecek sorun şahsi bir sorun olmayıp ulusal bir sorundur.”

( G. Sasuni, *Kürd Ulusal Hareketleri ve 15. yy Günümüze Kürd-Ermeni İlişkileri* )

İ. Nuri Paşa'nın, sunulan rahat ve huzurlu yaşamı reddedip, kendisini Kürt davasına adanmış olduğunu söyleyebilmek için sanırım, yukarıdaki sözleri yeterli bir kanıttır. İhsan Nuri Paşanın ismi anılınca kuşkusuz akla gelen ilk şey Ağrı İsyanıdır. O isyanın askeri komutanı ve lideridir. Yaşam öyküsünü derli toplu ele almak ve ird etmek aynı zamanda söz konusu tarihi kesitin berraklaşmasını da sağlayacaktır. Bu anlamda konu oldukça önem arz eder. Amacımız; bir dergi yazısının elverdiği ölçülerde konuya parmak basmak ve küçük de olsa bir katkı sağlamaktır.

İhsan Nuri Paşa geleneksel Kürt liderlerinden farklı bir portre çizmektedir. Sahip olduğu misyon ve kariyerini ne mensubu olduğu aşiretten ne de dini bir otoriteden almaktadır. O her şeyden önce Osmanlı ordusunun eğitilmiş bir subayıdır. Yaşamının



İhsan Nûrî bî cilûbergên fermandarî  
digel hevîjna xwe Yaşar Xanim

büyük bir bölümünü savaş alanlarında geçirmiş, defalarca ölümcül yaralar almış bir asker ve gerilla lideridir ama bundan da öte aydın, yazar ve diplomat kişiliğiyle de tanınır. Kent kökenli, entelektüel bir kişiliktir. Geleneksel, kimi Kürt liderlerinden farklı olarak Kürt meselesini, bölgesel veya aşiretsel sınırlara hapsedmeden, ulusal bir çerçevede ele almış bilinçli, ilkeli bir dava ve örgüt adamıdır.

Çok kısıtlı imkânlarla rağmen Kürt tarihi, folkloru, kültürüyle ilgili oldukça değerli çalışmalar yapmıştır. Zorlu ve çileli bir yaşama rağmen ideallerinden taviz vermemiş, yılmaz bir savaşçısıdır.

Yine bu çileli ve zorlu yaşama rağmen, en kötü anlarında bile yanından

ayırmadığı Türk kökenli eşi Yaşar Hanım'la olan birlikteliğini son nefesine kadar sürdürmüş, örnek bir aile babası ve aşk adamıdır.

Uzun boylu (iki metreyi aşkın), beyaz tenli, düzgün ve daima kısa tutulan bıyıklarıyla, güzel bir fiziğe sahiptir.

Oldukça çok yönlü ve çok renkli bu Kürt şahsiyetini daha yakından tanıma ve tanıtmaya çalışacağız ancak bir noktaya değinmeden geçemeyeceğim.

Paşanın yaşamını konu alan bu çalışmada amacımız iyi bilinen asker, gerilla lideri İhsan Nuri'nin yanı sıra, bilinmeyen sıradan İhsan Nuri'yi de araştırmaktır. Doğrusu kolay veri elde edeceğime inanıyordum. Ancak kısa bir araştırmadan sonra yanıldığımı anladım. Bu kadar tanınmış ve Kürt dünyasında çok haklı bir üne sahip kişiliğin yaşamının bu yanılla ilgili ulaşılabilir pek yeterli verinin olmadığını gördüm ve cahilliğime yandım. Mihemed Cemil Rojbeyan'ın *Bergeh* dergisinde kaleme aldıklarını hariç tutarsak onunla ilgili elimizde elle tutulur bir biyografik verinin olduğunu söylemek zor. Son dönemlerde başta Ağrı İsyanı olmak üzere, öncülük ettiği siyasi askeri etkinliklerle ilgili oldukça değerli çalışmalar yapılmıştır. Rohat Alakom'un *Hoybun Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, Yılmaz Çamlıbel'in *Gilidax Bêxwedî Nîn e*, M. Kalman'ın *Belge, Tanık ve Yaşayanlarıyla Ağrı Direnişi*, Kemal Süphandağ'ın *Ağrı Direnişi ve Haydaranlılar*, Cemil Gündoğan'ın *1924 Beytüşşebap İsyanı ve Şeyh Said Ayaklanmasına Etkileri* bun-

lardan bazılarıdır. Elbette hepsi de çok değerli ve yararlı araştırmalar. Ne var ki söz konusu araştırmaların hepsi onun bir yönünü, yani askeri ve siyasi yönünü konu almıştır. Doğal olarak bu çalışmalarda İ.Nuri Paşayı bir asker, bir gerilla komutanı, bir kahraman olarak görüyoruz. Oysa bu tiplerin dışında da bir İ. Nuri vardır. Bitlis'te doğmuş, o daracık sokaklarında oynamış, varlıklı bir Kürt ailesinin çocuğu, iyi eğitim almış aydın bir aile babası, özcesi sıradan İ. Nuri'yi de tanımak isterdik. Doğrusu politize olmayan, haması söylemden uzak yanılla tanışmak hem çok keyifli hem daha yararlı olurdu diye düşünüyorum. Ancak bu anlamda yeterli veriye ulaşamadık. Elimizdeki imkânlarla onu tanıtmaya çalışacağız.

### Çocukluk ve Eğitim Yılları

İhsan Nuri Paşa 1893'te Bitlis'te doğdu. Cibranlı Kürt Aşiretinin ileri gelenlerinden Ali Quli' nin oğludur. 'Quli' aynı zamanda aile ismidir. Kürtler arasında 'Mala Quli' olarak anılırlar. İlköğretimini Bitlis'te yaptı. Çocukluğu aile ismini taşıyan Quli mahallesinde geçti. İlköğretimini bitirdikten sonra Osmanlı Devletinin aşiret reislerinin çocukları için kurduğu Aşiret Mekteplerine gönderildi. Bu okullar önceleri Arap ve Arnavut gibi Osmanlı egemenliğinde yaşayan ulusların aşiret reisleri veya ileri gelenlerinin çocuklarını devşirmek ve devlete sadık "kullar" haline getirmek için

II. Abdülhamit tarafından kurulmuştu. Sonradan Kürt aşiret reislerinin

çocukları da bu okullara alınmaya başlandı. Amaç aynı. Kürt çocuklarını asimile etmek, devlete ve onun politik hedeflerine sadık memurlar olarak yetiştirmek ve böylelikle Kürt aşiretleri üzerinde etkili olmak. İhsan Nuri önce bu amaçla açılan Erzincan'daki okullara gönderildi. Burada askeri rüştiye mektebini başarıyla bitirir. Daha sonra İstanbul'daki Harp Okulunda eğitime devam eder. 1910 yılında yani 17 yaşında teğmen olarak harbiyeden mezun oldu. Artık Osmanlı ordusunun genç bir subayıdır. Mehmet Uzun, Paşanın yaşamının bu kesitini şöyle özetliyor:

“Cibrili İhsan Nuri Bey. Bitlisin eski mahallesi Ali Koli'de geçen güzel bir çocukluk, İstanbul “Harbiye”de, askeri okulda uçarı günleri ve Kürt davasıyla tanışma, özgürlük için beslenen umutlar... Ardından subaylık günleri...” (Mehmet Uzun, *Yitik Bir Aşkın Gölgesinde*)

### Osmanlı Ordusundaki Subaylık Yılları

İhsan Nuri'nin Harbiye'den mezun olduğu bu tarihlerde Osmanlı Devletinin “hasta adam” olduğu dönemdir. İmparatorluk sürekli toprak kaybetmekte, yüzyıllarca egemenlik altında tutulan uluslar artık özgürlük istiyor ve isyan etmektedirler. Özellikle balkanlar kaynamaktadır. Bu uluslardan biride Arnavutlardır. İşte kaderin bir cilvesi, daha sonra özgürlük isteyen bir ulusun isyancı lideri olacak genç İhsan Nuri'nin ilk görevi, özgürlük isteyen Arnavutluk isyancılarına

karşı gönderilen askeri birlikte yer almak olmuştur. Ardından Arabistan'da görevlendirildi. Burada da milliyetçi Arap etkinliklerine karşı bir Osmanlı subayı olarak mücadele etti. Özellikle Yemen'de kaldığı iki yılı aşkın bir süre zarfında bu tür olaylarla uğraşmak zorunda kaldı. Milliyetçi Araplar yer yer eylemler düzenlemekteler. Bu yıllar İ. Nuri'nin resmi devlet politikalarının etkisinde ve emrinde olduğu yıllardır. Yemen'de 33 ay görevli kalır. Buradaki görevi sona erince 93. Alay'ın yaveri olarak Beyzon'a yollanır. Bir süre sonra başlayan 1. Dünya Savaşında Doğu Cephesinde görev aldı ve Ruslara karşı savaştı.

İttihatçı Enver Paşa'nın ütopyik, Turancı emelleri uğruna on binlerce asker Kafkas dağlarında soğuktan, açlıktan ya da Rus saldırıları sonucunda kırıldı. Böylece Rus orduları Doğu Anadolu'da ilerlemeye başlar. Kısa bir süre sonrada Bitlis'e ulaşırlar. Fanatik Alman hayranı Enver Paşa, başkomutan sıfatıyla İstanbul'da ayak üstüne ayak atıp “zafer yakındır” diye keyif çatarken İhsan Nuri Paşa, Rus ilerleyişini durdurmaya çalışan birkaç subaydan biri olarak çarpışmaktadır. Bu çarpışmaların birinde (Nerman'da) yaralanır. Çarın orduları Erzurum'a varmak üzereyken, tedavi için cephe gerisine yollanır. Ancak bu yolculuk çok zorlu olur. Kargaburun yakınlarında şiddetli kar ve tipiden dolayı ayakları donma tehlikesi geçirir. Tedavi için Erzincan'a götürülür ve orada bir süre tedavi altında kalır. İyileştikten sonra 9. Orduda görevlendirilir. Bu orduya bağlı Gürcistan'ın



Ojorketi kentinde gezici bir jandarma birliğinin komutanlığını üstlenir. Aynı sıfatla bir süre kentin yönetimini ele alan komitede yer alır.

1. Dünya savaşının sona ermesiyle İ. Nuri İstanbul'a gelir(1918). Savaş sona ermiş ancak Osmanlı Devleti için felaket başlamıştır. Topraklarının büyük bölümünü kaybetmiş, elde kalan Anadolu toprakları yer yer işgal edilmiştir. Mondros imzalanmış, İstanbul fiilen işgal edilmiştir. Siyasi ortam çok karışıktır. Anadoludaki azınlıklar yer yer örgütlenmektedir. İstanbul'da bulunan Kürt aydınları da **Kürt Teali Cemiyeti** adıyla bir cemiyet kurmuşlardır.

İ. Nuri Paşa bu sıralarda Batı Anadolu'da ilerlemekte olan Yunan Ordusuna karşı Türk Ordusunun bir subayı olarak çarpıştı (1919). Bir süre sonra tekrar İstanbul'a görevli olarak döner. Garnizon Subayları Komutanı olarak atanır. Bu görevdeyken, Mondros Ateşkes Antlaşması'nın

hükümlerini uygulama taraftarı olan Osmanlı Yönetimine karşı tavır alır. Hükümet karşıtı subaylarla birlikte hareket eder. Yunan ilerleyişine karşı savaşmayı örgütleyen bu subayların oluşturduğu bir komitede yer alır ve komitenin sekreterliğini yapar. Bu komitenin görevi, Padişah yönetimine bağlı eski subayları görevden uzaklaştırılıp yerlerine genç ve M. Kemal liderliğinde başlayan direniş yanlısı subayları görevlendirmektir. Fakat bu çok riskli bir girişimdi. Komitede yer alan birçok subay geri adım atar ve padişah yönetimine doğrudan karşı koymaya cesaret edemez. Yalnızca İ. Nuri ve birkaç subay arkadaşı kararlıca davranır. Mondros hükümleri uyarınca İstanbul hükümetinin orduyu dağıtmasına karşı çıkar. Dağıtılmakta olan orduya alay komutanı vasfıyla 9. Orduya bir mektup yollayarak bağlılık bildirir. O sıralar Mondros şartlarına uymayıp dağıtılmayan, örgütlü kalan tek ordu 9. Orduydu. İ. Nuri Paşa,

komutasına aldığı alayla Anadolu'daki direniş hareketine karşı olan Damat Ferit Paşa hükümetine isyan eder ve hükümetin düşüşünü hızlandırır. Bu gelişme M. Kemal'in Anadolu'daki durumunu oldukça iyileştirmiş ve Sivas kongresini başarıyla toplamasına ortam hazırlamıştır. Kongreyi engelleme gücü bulamayan D. Ferit istifa etmek zorunda kalır. Doğal olarak İ. Nuri İstanbul'da sevilmeyen kişi ilan edilir. Çalışmalarından rahatsız olanlar onu şehirden uzaklaştırmak istiyordu.

Bu sırada Kemalistler de Sovyet'lerle ilişki kurma çareleri arıyorlardı. Anadolu'da başlatılan direniş hareketinin Sovyet desteğine ihtiyacı vardı. İşte bu isteklerini Sovyetlere bildirmek için onu Bakü'ye göndermek istiyorlardı. Ancak o memleketi Bitlis'e gitmek istediğini bildirdi. Türk komutanlar onun Kürdistan Teali Cemiyeti'yle ilişkilerini biliyor ve bu anlamda ona güvenmiyorlardı. Bunun için de Kürdistan'a gitmesini istemiyorlardı. O sıralar İtilaf Devletleri İstanbul'u resmen işgal etme hazırlıkları yapıyorlardı. Tam bu sıralarda İ. Nuri izin koparıp Bitlis'e hareket eder. Ancak Trabzon'a vardığında, bağlı olduğu 9. Ordu Komutanı Rüştü Paşa'nın emriyle Kızıl Ordu yetkileriyle görüşmek üzere Bakü'ye gönderilir. Görevi, Kızıl Ordu birliklerini Osmanlı - Rus sınırına kaydırmak ve böylece Anadolu'daki işgal güçlerine karşı sınır güvenliğini sağlama konusunda Sovyet yetkililerini ikna etmektir. Ancak o sıralar Azerbaycan'da henüz sosyalist yönetim kurulmamıştı. Bolşevikler bölgede gizli faaliyet

sürdürüyorlardı. İ. Nuri onlarla görüşmek için haber gönderip görüşme talebinde bulundu. Bu arada Azerbaycan'da iktidarda bulunan Musavvat Partisi yetkilileriyle de temaslar kurdu. Bu temaslar sonucunda yörede bulunan bazı İngiliz subaylarının tutuklanmasını sağladı. Bu tavrı Bolşevikleri fazlasıyla sevindirdi. Azeri sosyalistler Kızıl Ordunun yardımıyla iktidara gelince İ. Nuri ve başkanlık ettiği heyet nihayet onlarla görüşmelere oturabildiler. Bu görüşmelerden oldukça yararlı sonuçlar alındığı, Sovyetlerin Kemalist harekete daha sonra verdiği destekten anlaşılmaktadır.

Bolşeviklerle yapılan bu görüşmelerden sonra yanındaki heyet ve bazı Azerilerle İran'a oradan da Türkiye'ye geçti. Erzurum Hasankale'de kurulması tasarlanan 12. Ordu'nun kuruluş çalışmalarına katılır. Daha sonra kurulan aynı orduda görev alır. Bu ordu aslında Kazım Karabekir'e bağlı 15. Kolordunun bir devamıdır. Ermenilere karşı kullanmak için yeniden örgütlenmiştir. İ. Nuri bir süre sonra başlayan (Eylül 1920) Türk-Ermeni savaşına katılır. Çarpışmalar sırasında yine yaralanır ve tedavi için Sankamış'a gönderilir, orada tedavi edilir.

İhsan Nuri'nin bundan sonraki yeni görevi Çıldır (Ardahan) Alay Komutanlığıdır. Görev yerine ulaştığında Gürcü işgaliyle karşılaşır. Hemen Gürcü yetkilerle görüşür ve işgale son verilmesini söyler. Ancak, Çıldır'ın TBMM kararıyla Gürcistan'a verildiğini öğrenir. Bundan sonra yaptığı yoğun çalışmaların sonunda böl-

genin tamamen Gürcü işgaline girmesine engel olur. Bu arada Kürt ve Ermenilere karşı uyguladığı acımasız uygulamalarıyla tanınan Türk komutanlarından Deli Halit Bey de bölgede görevlidir. Halit Bey Ermenilerin yerlerinden sürülmesi ve yolda imha etme planlarına İhsan Nuri'yi ortak yapmak istiyor. Ancak o, "Hayatımda hiçbir zaman kadın, çocuk ve yaşlıların incinmesi, katledilmesi ve asılması olmadı, olmayacak" diyerek emirlerine karşı çıkar. Halit Bey'in eline geçen Gürcü ve Ermeniler anında katlediliyorlardı. İhsan Nuri'nin elinde bulunan Ermeni ve Gürcü esirler katledilmekten kurtuluyordu. Bu tutumla Ermeni ve Gürcülerin sevgisini kazanırken, Deli Halit'in nefretini kazanıyordu. Hatta üst rütbeli subaylar arasında yapılan bir toplantıda "Siz bana İhsan Nuri'yi verin, ben de size rütbelerimden birini vereyim" diyerek nefretini gizleyemiyordu. Ayrıca üstün emirlerine uymama gerekçesiyle askeri mahkemeye vermek istiyordu, Ancak Deli Halit'in tayini başka bir yere çıkınca, yargılanma olasılığı da ortadan kalktı.

Bir süre sonra Çıldır'daki birliği dağıtılınca, Osmanlı-İran sınırında bulunan Beyazıt'taki birliğin başına atanır. İşte burada yaşamının bundan sonraki bölümünü birlikte geçireceği can yoldaşı Yaşar Hanım'la tanışır. Bir süre sonra da evlenirler. Musul sorunu nedeniyle İngilizlerle yaşanan gerginlik baş gösterince, o zamanlar Diyarbakır'a bağlı Beşiri'de bulunan birliğin komutalığine atandı. Birlikler savaşa hazırlanıyordu. İhsan Nuri Bey,

bölgedeki askeri birliklere savaş üzerine konferanslar verdi. Beşiri'den sonra Silvan'a bölük komutanı olarak atandı. Bir ara Siirt'te Gezici Mitralyöz Teftiş Görevlisi olarak bulundu.

## Kürt Özgürlük Hareketine Katılışı

İhsan Nuri Paşa'nın Kürt milli duyguların yoğun yaşadığı bir aileden geldiği bilinmektedir. Aileden aldığı milli duygular okul sıralarında daha da olgunlaştı ve gelişti. Erzincan'daki Aşiret mektebinde yörenin en önemli aile ve aşiret reislerinin çocuklarıyla tanıştı. Ancak yaşamındaki asıl değişim İstanbul'a gelişiyle başlar. Yaşamını derinden etkileyen, düşüncelerinin şekillenmesini sağlayan birçok şahsiyetle burada tanışır, birçok tarihi kaynağı ve kitabı burada okuma fırsatı bulur. Batının milliyetçi, özgürlükçü düşünceleriyle burada, harbiyedeki öğrenim yılları sırasında haşır neşir olur.

I. Dünya Savaşı bütün insanlığı etkilediği gibi onun da yaşamını derinden etkiler. Görev nedeniyle İstanbul'dan uzaklaşmak zorunda kalır. Savaştan sonra geldiği İstanbul'da yine hayatının en önemli dönemeçlerinden birine girer; Kürdistan Teali Cemiyetinin (KTC) üyeleriyle tanışır. Bir yandan bu cemiyetin çalışmalarına katılırken diğer yandan işgal karşıtı faaliyetlerini Anadolu'da yoğunlaştıran M. Kemal yanlısı faaliyetleri destekler. Bu çalışmalarından rahatsız olan Osmanlı yöneticileri ve bazı komutanlar onu İstanbul'dan uzak-



laştırmak isterler. Bu nedenle Bakü'ye göndermeye çalışırlar. KTC ise onu memleketi Bitlis'e, cemiyetin çalışmalarını taşımak ve örgütlemek için göndermek ister. Bunun üzerine İhsan Nuri komutanlarına memleketine gitmek istediğini söyler. Ne var ki komutanları buna razı olmazlar çünkü onun KTC'nin hedefleri doğrultusunda çalışmalar yapacağından çekiniyorlar. Bu arada *Jîn* dergisinde yayınlanan bir makalesi komutanlarını iyiden iyiye kuşkulandırır. Onların kaygılarını gidermek isteyen İhsan Nuri, "Ben Kürdüm ve Kürt halkının ulusal demokratik haklarına kavuşmasını istiyorum. Ama Bitlis'e gitmeyeceğim" der. Bu sözlerine karşılık komutanı Kemalettin Sami Bey Kemalist hareketin Kürtlere karşı izlediği o bilinen, oyalayıcı ve hiçbir zaman yerine getirilemeyen vaatler içeren politikaya uygun bir söylemle; "Biz Kürt halkının haklarına karşı değiliz. Biz Kürtlerin temsilcileriyle görüşüp isteklerini kabul etmek istiyoruz. Fakat Kürdistan Teali Cemiyeti'nin yayın organı *Jîn*'de M. Kemal ve onun ulusal güçlerine çok sert eleştiriler var. Anlaşıyor ki onlar kendilerini bizden uzak tutmak istiyorlar." der. (M. KalmanBelge, *tanık ve Yaşayanlarıyla Ağrı Direnişi*) Bu sözler üzerine İhsan Nuri; "Eğer görüş ve inançlarınız böyleyse, ben iki güç arasında aracılık yapabilirim." diye karşılık verir. Hatta daha sonra *Jîn* dergisinde yayınlamak üzere bu konuyu ele alan bir makale yazar, ancak nedense bu makale yayınlanmaz. Ne var ki verilen sözlerin tutulmaması, böyle bir arabuluculuk

gerçekleşmediği gibi, İhsan Nuri'nin giderek Kemalistlere olan inancını da yitirmesine neden olacaktır. 1. Dünya Savaşı sırasında Doğu cephesinde bulunması, Kürtlere karşı izlenen politikaları yakından takip etme imkânını bulur. Savaş bitiminde yine aynı bölgede Ermenilerle yapılan savaşlara katılır. Sarıkamış'ta tedavi gördüğü sırada, onun gibi Kürtlere karşı izlenen politikalarından hoşnut olmayan ve Osmanlı ordusundan ayrılan subay ve askerlerle ilişkisi geçerek onları örgütlemeye çalışır. Ancak bunun 12. Ordu komutanlığına öğrenilmesi üzerine hakkında tahkikat başlatılır. Yapılan tahkikat sonucunda suç sayılacak bir kanıt bulunamaz. Böylece yargılanmaktan kurtulur.

Savaş sonrası Anadolu'da başlayan direniş hareketine katılır. Yunanistan'la olan savaş boyunca Kürtlere verilen yukardaki türden sözlerin savaş sonunda yerine getirilmemesi İ.Nuri Paşanın Kemalist hareketten tamamen kopmasına neden olur. Artık Kürt özgürlük hareketinin en ön saflarında yer alacak.

### **AZADİ ÖRGÜTÜNE GİRİŞİ ve BEYTÜŞŞEBAP İSYANI**

Birinci Dünya Savaşı yılları boyunca, Araplar ve diğer Müslüman uluslar, İngiliz ya da Fransızların yanında Osmanlılara silah çevirirken Kürtler hemen bütün cephelerde Türklerle birlikte savaştılar. Savaşın sonunda Anadolu'nun işgale uğramasıyla en büyük direnişi gösteren yine Kürtler oldu. İşgal güçlerin giremediği tek yer

Kürt illeri oldu. İşgale karşı Anadolu'da başlayan ulusal mücadele yıllarında Kürtler aynı vefayı göstermiş ve Türkleri yalnız bırakmamışlardır. Mücadele yılları boyunca "Bu mücadele Kürt ve Türk halklarının özgürlük mücadelesidir." "TBMM Kürt ve Türk halklarının meclisidir" diyen Kemalistler, Anadolu işgalden kurtarıldıktan sonra sözlerini unuttular. Artık Anadolu'da yalnızca Türk milleti vardı. Bırakın Kürt haklarını, Kürt diye bir etnik yapının bile olmadığını ileri sürmeye başladılar. Tüm bunlar Kürtleri hayal kırıklığına uğratiyordu ve giderek Kemalist Hareketten kopmaya başlıyorlardı. Bir süre sonrada kendi başlarının çaresine bakmaları gerektiğine inanmış ve örgütlenmeye başlamışlardı. Mondros'un imzalandığı sıralarda (1918), legal olarak faaliyet gösteren Kürt Teali Cemiyetini kurarak ulusal istemlerini dile getirmeye başladılar. Yunanların Anadolu'dan çıkartılması, saltanatın sona ermesi ve ardından Cumhuriyetin ilanıyla devam eden süreçte şartlar Kürtler için daha da zorlaştı. Artık legal mücadele imkânı da kalmadı. Cumhuriyetin ilanıyla gelen inkârcı yaklaşım ve baskılar Kürtleri daha ses getirici mücadele yöntemlerini seçmeye yöneltti. Erzurum'da Cıbranlı Halit, Bitlisli Yusuf Ziya Bey, Hasenanlı Halit, Hacı Musa vb. Kürt liderlerinin önderliğinde illegal olarak kurulan ve Azadi olarak da bilinen Kürdistan Bağımsızlık Komitesi işte böyle bir ortamda doğdu. Örgüt kısa zamanda Kemalistlerden umudunu kesmiş Kürt ulusalcı kesimlerin odağı

haline gelir. Kürt illerinin birçoğunda şubeleri açılır. **Azadi** örgütü, **Kürt Teali Cemiyeti**'nin ılımlı ve barışçı yöntemlerinden farklı olarak silahlı mücadeleyi esas almış ve Kürtleri bağımsızlığa kavuşturmayı hedeflemiştir.

<sup>23</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîn Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 102

bi pêwendîyîyen min digel Serokên Kurdên devera Maku heta wilayeta Mûsilê) agahdar bû, dîsan Çarîkov bi wan pêwendîyan dihesîya, ewên min digel Şêxê Barzan (Şêx Ebdulselam Barzanî) çêkirin.”<sup>24</sup> li cihek di Ebdurrezaq dibêje, “Demê wezaretê karûbarên derve ya Rus pirsîyar sebarek serhildana Bidlîsê (Hameş) û Şêxê Barzan ji min kir, min dîyar kir ku Şêxê Barzan kesayetê mezî e û hêjayî arîkariyê ye.” Dîsan biryar bû ku Şêx Ebdulselam Barzanî di şoreşa sala 1913 de, ew şoreşa Ebdurrezaq Bedirxan bo karkerî pişkdar bit.<sup>25</sup>

Hêjayî gotinê ye bêjin ku, ji ber pêwendîyên Ebdurrezaq Bedirxan yên ku bernîyas bi tîkel ya Rusî û digel Şêx Ebdulselam Barzanî, dewleta Osmanî di wî hizrî de bû ku bizava Şêx Ebdulselam girêdaneka bi serhildana Bidlîsê 1913 ve heye û li dûv (gor) jêderêkê Ebdurrezaq Bedirxan destê wî di berhevkirina serhildana navbihurî (Serhildana Bidlîsê) de hebû.<sup>26</sup>

Ji Pêwendîyên Ebdurrezaq Bedirxan digel Şêx Ebdulselam Barzanî dîyar dibit ku Ebdurrezaq Bedirxan hewl daye kesayetên bi hêz li Kurdistana Başûr tîkelî (tevlî) şoreşa kurdî bike. Dîsan merema her du serkirdêyên kurd (Şêx Ebdulselam Barzanî û Ebdurrezaq Bedirxan) li vir gihayek, ku ew jî qurtalkirina Kurdistanê ye, ji siyaseta dewleta Osmanî wek karê yekî (karê sereke), paşê qurtalkirina parçeyên din yên Kurdistanê.

Cihê gotinê ye ku, demê Ebdurrezaq Bedirxan li sala 1911 ber bi Parîsê ve çûyî pêwendîyên wî ligel Şerîf Paşa xurt bûn. Ji vê gotina Ebdurrezaq Bedirxan ya li xwarê dîyar dibe ku berîya niha pêwendî di navbera wan de hebûn. Ebdurrezaq bi vî rengî behsê pêwendîyên xwe ligel Şerîf Paşayî dike, “Pêwendî di navbera min û Şerîf Paşê de hebû, wê serdemê ewî kovara parta radîkalî ya ku bi navê “Meşrûtiyet” derdixist... Min jimarên vê kovarê û belavokên wî bi rêya Îranê dihinartine Kurdistanê.”<sup>27</sup>

Ebdurrezaq Bedirxan pêwendî digel hindê kesên din yên Kurd hebûn, mîna Seyîd Taha yê Nehrî. Sebarek vê pêwendîyê Ebdurrezaq bi vî rengî dîyar dike, “Li îlona sala 1912 Seyîd Taha yê Nehrî neviyê Şêx Ebdullah li Tîblîsê serdana min kir. Merema serdana wî ew bû, ji bo xurtkirina karê xwe hevdu bigrin.”<sup>28</sup>

Li vir dîyar dibe ku pêwendîyên Ebdurrezaq digel Seyîd Taha yê Nehrî di çarçoveya alîkariya xebatê de bû ku armanca her duyan azadiya Kurdistanê bû. Bi aweyekî din, bizava her duyan ji pêxemet Kurdistaneka yekgirtî pêwendî di navbera wan de xurt û mukum kirîye.

<sup>24</sup> Berhema navborî, r. 109

<sup>25</sup> David McDowall, *A Modern History of The Kurds*, 2000 London r. 99

<sup>26</sup> Dr. Osman Elî, *Deraset fil Hareketûl Kurdîye 1833-1946*, 2003 Erbil, r. 241

<sup>27</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîn Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 104

<sup>28</sup> Berhema navborî, r. 102

Ebdurrezaq Bedirxan, wî ji bo pêştegêrkirina projektên xwe yên şoreşeke kurdî xwe gehandiye şêxên ayînî (dînî; olî) li Kurdistanê. Wî li gor raporta cîgirê konsolê Brîtanî li bajarê Wanê, kongreyeke kesayetîyên ayînîyê îslamî li sala 1913 li Kurdistanê hebûye û ev kongre ji bo pêşkêşkirina arîkarîya şoreşa kurdî bûye ku meram jî, şoreşa Ebdurrezaq Bedirxanî ye.<sup>29</sup> Herçend jêderên dîrokê behsa vê kongreyê nekirîye. Lê li vir dîyar dibe ku Ebdurrezaq pêwendî digel hinek kesayetîyên ayînî li Kurdistanê hebûn, mîna şêxên êzdîyan û kesayetîyên Kurdistanê û ji wan Mar Şîmûnî. Dîsan jêder behsê encamên kongreyê kesayetîyên ayînî musulman nake ku vê kongreyê arîkarîya bizava Ebdurrezaq Bedirxanî kiribit. Reng e, kesayetîyên îslamî ji ber pêwendîyên Ebdurrezaq Bedirxan digel Rusya xwe ji arîkarîya wî dûr kirine. Her li wê demê ji dewleta Osmanî propagandayê mezî di nav kurdan de dikir ku dewleta Rusî dewleteke bêol e, û heta propaganda dijî Ebdurrezaq Bedirxanî dikir ku xwe gihandiye dewleteka ne musulman û di rojnameya Osmanî jî de gelek behsê vê babetê hatiye kirin. Rojnamegerîya Osmanî Ebdurrezaq Bedirxan bi mirovekî derketîyê ji ola îslamê li qelem daye. Dîsan daxwaz ji kurdan kiriye ku hemberî kar û têkilîyên Ebdurrezaq digel Rusya bêdeng nebin.<sup>30</sup> Û dibêrê vê propagandayê kartêkirina xwe li ser hestê kesayetîyên ayînî yê îslamî hemberî Ebdurrezaq Bedirxanî kiribit.

Her dîsan careke din cîgirê konsolê Brîtanî li Wanê dîyar dike ku Ebdurrezaq û hevalên xwe dibêjin li wextê şoreşê li dû me dê 100 hezar leşker hebin.<sup>31</sup> Bêguman ev jimara leşkeran gelek bi taybet e li wê wextê û karekî gelek bi zehmet e, 100 hezar leşker kom bibit. Belê ya girîng li vir ew e, ku Ebdurrezaq Bedirxan dişêr bi rêya têkilî û pêwendîyên xwe leşkeran kom bike.

Hêjayî gotinê ye bêjin ku, têkilîyên Ebdurrezaq Bedirxanî digel kurdan projektê destpêkirina şoreşa kurdî geştir lêkir û jêderên taybet bi bizava Ebdurrezaq Bedirxanî dîyar diken ku ewê li sala 1914 nexşê destpêkê yê şoreşê daniye û ev nexşe yê pêkhatî bû ji çend karên leşkerî li ser sînorê Îranê û ewleta Osmanî û li dûv nexşê navbihurî Seîd Beg (yek ji serokhozên kurdan e li ser sînorê di navbera Îran û dewleta Osmanî de) dê bi karekî leşkerî dijî leşkerên Osmanî li devera "Arçax" rabite, ku meram jê dûrkirina leşkerên Osmanî ji devera navbihurîye. Û Seyîd Tahayê Nehrî jî dê bi serkêşîya leşkerekî di ber bi devera Başqeale biçête û hêza Simkoyê Şekakî dê ber bi devera Serayê ya sînorê biçête û Ebdurrezaq li dûv nexşê şoreşê dê merema wî azadkirina devera Botan bit.<sup>32</sup>

Ji bilî arîkarîya Simko û Seyîd Taha î Seîd Begê hinek kesên din dê arîkarîya şoreşê biken, mîna Musa Beg û Xêyredîn Barzanî û Kor Hûsên Paşa û sebarekî karê Seîd Begê, Ebdurrezaq dîyar dike ku karê wî ew e dê ber bi Îranê diçêr

<sup>29</sup> Dr. Osman Elî, *Deraset fil Hareketîl Kurdîye 1833-1946*, 2003 Erbil, r. 241

<sup>30</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrad El-Sakafîye We'l-Qawmîyye Fî Nîhayetî'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayetî'l-Qarnîl-Îşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 108 -109

<sup>31</sup> Dr. Osman Elî, *Deraset fil Hareketîl Kurdîye 1833-1946*, 2003 Erbil, r. 254

bo bicihanîna nexşê dumahîyê yê şoreş.<sup>33</sup> Ji bo vê şoreşê dîsan Ebdurrezaq Bedirxanî palpiştîya xwe bi kurdên di nav leşkerê Osmanî de dîyar kirîye, û li dor vê yekê dîyar dike, "Hinek ji kurdên di nav leşkerên Osmanî de digel me ne."<sup>34</sup>

Di nexşê vê şoreşê de, dîsan Ebdurrezaq hej dikir ku bi rêya dîrkerîna leşkerên Osmanî rezamendiya Îranê bal xwe ve bikêşet û sebarekê yê yekê dibêje, "Eger Îran daxwaza min bi cih neîne, ez dê bi karekî leşkerî bajarên Selmes û Urmîyê bigrim pişt re dê nameyekê bo şahê Îranê hinêrim û dê dîyar bikem ku li jêr fermanîya wî dê leşkerê Osmanî ji Îranê dîr bikem û ev kar li ser dê hemî li jêr çavdêriya konsolê Rusî bit."<sup>35</sup>

Nexşê şoreşa Ebdurrezaq Bedirxanî bo şoreşa kurdî bi cih nehat. Çünke Dewleta Rusî razî nebû û Ebdurrezaq her tim dîyar dikir ku ev şoreş li jêr çavdêriya wî ye u Rusya dîyar kir ku ji ber têkdana pêwendîyên xwe digel Osmanîyan razî nabit li ser vê şoreşê, dîsan Rusya dîyar kir ku ev şoreş dê bête egerê nerazibûna ber pirsên Osmanî û Îranê.<sup>36</sup>

Piştî Rusya dijê projektê Ebdurrezaq yê sala 1914 rawestîya, Ebdurrezaq hinek pêkolên din kirin, ji wan daxwaz ji Rusya kir ku arîkarîya wî biken. Wî wek serokê rêvebirê îdarî yê devereke kurdî li Îranê destnîşan biken. Belê Rusya her ji ber egerên berê ku niha me dîyar kirin, dijî vî çendî rawestîya.<sup>37</sup>

Li dîmahîyê Rusya biryar da ku Ebdurrezaq ji Bidlîsê ber bi Tebrîzê ve biçet û propagandaya Rusî di navbera kurd û ermenan de belav biket.<sup>38</sup>

Her çend dewleta Rusî bizav û karê Ebdurrezaq dorpêç kirîye, belê navhatê bizav û têkilîyên xwe digel kesên kurd xurtir lê kirin.<sup>39</sup> Dewleta Rusî mifa (fayde) ji pêwendîyên Ebdurrezaq digel kurdan dît, nemaze demê şerê cihanê yê yekem (1914-1918) dest pêkir, wî çaxê Ebdurrezaq Bedirxan li bajarê Maku bû û ji bo arîkarîya Rusya. Di vî şerî de biryar ji aliyê Rusya ve hate dayîn ku pêdivî ye Ebdurrezaq di navbera kurdan de kar bike û kurdan razî biket ku alîkarîya leşkerê Rusya biket û ev yek bi cih hat. Demê Ebdurrezaq û bi arîkarîya kurdan de vera Abax sitend û pişt re 300 siwarî ji hoza Heyderanlî ya kurdî û

<sup>32</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>33</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 236-241 / Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafîyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayetî'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayetî'l Qarnîl-İşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 107

<sup>34</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 236

<sup>35</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 236-237

<sup>36</sup> Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan fi Seneva'il Harb el-Aleminiyet'ilula*, Wergerandin: Mihemed Mela Ebdulkerîm, 1984 Bexdad r. 56 / Dr. Osman Elî, *Deraset fil Hareketul Kurdîye 1833-1946*, 2003 Erbil, r. 255 - 257

<sup>37</sup> Sebarek vî çendî binêre li Hirorî, Dr. S. S. Hirorî, *Ebdurrezaq Bedirxan (1864-1918) Jîyan, Têkilîyên Sîyasî, Xebata Çandî*, 2005 Silêmanî, r. 62 - 63

<sup>38</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 339

<sup>39</sup> İsmail Heqî Şawes, "Peyawemezînekani Gelê Kurd: Mîr Ebdurrezaq Bedirxan", Kovara Rojî Kurd, Hj. 7, Sal: 11, Teşrînê yekem 1960, r. 51

hinekên din, ji hoza Milan komkirin û bi rêya van her du hozan gelek ji dever û gundên dewleta Osmanî girtin.<sup>40</sup>

Dîsan hizra leşkerî ya kurdî ewa li jêr serokatîya Ebdurrezaq Bedirxanî arîkarîya leşkerê Rusya li deverên derdorên Wan û Tebrîz û Urmîyê kiribû.<sup>41</sup>

Ji gotina serî dîyar dibe ku Ebdurrezaq Bedirxanî têkilî digel hozên Heyderanlî û Milanê yên kurdî hebû û ev her du hoz (eşîr) li Kurdistanê Bakur hozên kurdî yên bi nav û deng bûn û bi alîkarîya van her du hozan dîsan xizmeta leşkerê Rusya kiribû.

Dîsan têkilî û pêwendîyên Ebdurrezaq Bedirxanî digel kurdan arîkarîya wî kirîye, ku xwe bigihîne wan bi rêya belavkirina danezan û beyannameyan ji bo razikirina wan ku alîkarîya leşkerê Osmanî dijî Rusya neken û di van danezan de hatîye gotin: "Merema me ji pêwendîyan digel Rusya ew e, ku berê çekê xwe bidene enîya leşkerê Osmanî." Dîsan vê danezanê daxwaz ji kurdan kirîye ku alîkarîya Almanya neken. Çünke alîkarîya Almanya wek dewleteke ne musulman derketine ji ayînê îslamê.<sup>42</sup>

Li sala 1915 leşkerê Rusya enîya rojavaya bakurê Îranê tuşî hinek şikestinan bû û hinek ji ber pirsên Rusî egerên vê yekê ji zivirandine bo arîkarîya Ebdurrezaq û kurdan bo Osmanîyan.<sup>43</sup>

Ji ber vê yekê hinek berpîrsên Rusî daxwaz dikir ku Ebdurrezaq Bedirxan ji çeperên şer dûr biken. Belê serkirdên leşkerê Rusya careke din vê projekte gêro kir. Û pişt re hizr bo wî çendî hate kirin ku careke din Ebdurrezaq bo Kurdistanê bihête rewankirin ji bo çekirina pêwendîyên digel Kurdan.<sup>44</sup> Ji ber vê yekê jî dema leşkerê Rusya sala 1915 ber bi bajarên Erziromê û Bidlîsê ve hatin careka din Ebdurrezaq arîkarîya Kurdan bo leşkerê Rusya dîyar kirin.<sup>45</sup>

## Têkiliyên Ebdurrezaq Bedirxanî yên Sîyasî Ligel Rusya

Ebdurrezaq Bedirxanî mîna gelek ji sîyasetvanên kurd pêwendî û têkilî digel Rusya hebûn.<sup>46</sup> Merema Ebdurrezaq Bedirxanî ji vê pêwendîyê ev bû ku bi rêya alîkarîya Rusya bigihêje armancên xwe yên netewî. Rusya jî ji alîyê xwe ve hewl daye pêwendîyan digel kurdan mukum biket.<sup>47</sup> Nexasme li salên berîya

40 Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'90, 1999 Duhok, r. 103 - 113, 110 - 114

41 Berhema navborî, r. 103-113, 110-114

42 Berhema navborî, r. 110 - 111

43 Lazarêf, *El-Mes'ellet'l Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacî, 1991 Beyrûd, r. 464-466

44 Berhema navborî, r. 464-446

45 Research Department, *foreign Office, (The Kurdish Problem)* FO 371/40219, 1944 Persia

46 Numûneyên van sîyasetvanên kurd yên ku pêwendî ligel Rusya peyda kirin, Yezdan Şêr, Ubeydulla Nehrî û Şêx Ebdulselam Barzanî bûn.

47 Sebarete pêwendîyên Rusya digel kurdan binêre li Kemal Mezher Ehmed Kurdistan fi Senevat'il Harb el-Alemîyet'ilula, Wergerandin: Mihemed Mela Ebdulkerîm, 1984 Bexdad r. 25-27



gerê cîhanê yê yekem û li dema desthilatdariya Almanya di nav dewleta Osmanî de berfireh bûye, her ji bo vê meremê Rusya gelek ji dîplomasîyên xwe hinartine Kurdistanê ji bo çêkirina pêwendîyan digel serokhoz û malmezînan kurdan.<sup>48</sup>

Dîrokvan û nivîsaran egerên hewldana kesên sîyasî yên kurd ji wan Ebdurrezaq Bedirxanî ji bo çêkirina pêwendîyan digel Rusya behs u şîrove kirine. Mîna Micer Noelê yê ku bi vî rengî xuya dike: Kurdan di şeyan de nebû bê alîkariya dewletên bîyanî jî bigihêne armancên xwe yên netewî. Lewra daxwaza alîkariya Rusya ji bo vê meremê kirîye.<sup>49</sup>

Celîlê Celîl li dor vê yekê dîyar dike ku, "Sîyaseta Osmanîyan li hemberî kurdan û alîkariya Rusya bo milletan belku ji bo rizgarkirina wan deran ji desthilatdariya Osmanîyan, kurd paldarî ne ku daxwazîya alîkarîyê ji Rusya biken."<sup>50</sup> Dîsan Dr. Kemal Mezher piştgirîya boçûna Celîl diket û xuya dike ku, "Gelek ji kesayetên Kurd piştgirîya hizra daxwaza alîkarî ji Rusya dikir. Ew jî ji ber zîlm u zordariya dewleta Osmanî bû, ewa li ser kurdan sepandî."<sup>51</sup>

Bêguman hîlbijartina Ebdurrezaq Bedirxanî dewleta Rusî wek dewletek ku daxwaza alîkarîya wî bike. Dizîvirêt wî hevkarîya di navbera dewleta Rusî û Osmanîyan li dor deverên sînorê her du dewletan û Ebdurrezaq Bedirxanî mifa ji vê derfetê dîtiye daxwaz alîkarîya Rusya kirîye. Ji bo bi dest ve anîna armancên xwe yên neteweyî û avakirina dewleteke kurdî û bi alîkarîya Rusya. Çûnke dewleta Rusî dewleteke nêzîk bo Kurdistanê, lewra Ebdurrezaq Bedirxanî daxwaza alîkarîya tu dewletên di wek Brîtanya nekirîye. Herçend Ebdurrezaq Bedirxanî bawerî bi Brîtanya nebû ku alîkarîya wî bike. Çûnke Brîtanya palpişt Osmanîya dikir, ew jî ji ber berjewendiyên xwe yên di nav dewleta Osmanî de.<sup>52</sup>

Destpêka pêwendiyên Ebdurrezaq Bedirxanî digel Rusya dizîvirin destpêka salên nodî ji çerxê nozdehê dema Ebdurrezaq wek karmend li wezareta derve ya dewleta Osmanî û bi taybetî demê balyozxana Osmanî li Sn. Petersburgê wek sekreterê duyê hatîye destnîşankirin.

Ebdurrezaq li Sn. Petersburgê fêrî zimanê Rusî bû. Her dîsan Ebdurrezaq ji nêzîkî ve gelek ji rewş û serûberê sîyasî û çandî bo wî dîyar û eşkera bûn. Dîsan ji ber hevaline wî digel kesayetiyên Rusî, dewleta Rusî dîyarîyek ku bi navê Stanîslav bo terxan kiribû.<sup>53</sup>

<sup>48</sup> Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan fi Seneva'il Harb el-Alemîyet'ilula*, Wergerandin: Mihemed Mela Ebdulkerîm, 1984 Bexdad r. 25-27 / Kemal Elî, *Kurtîyek li Xebatê Ebdurrezaq Bedirxanî*, Kovara Çiwarçîra, hj. 2, sal:1, Swêd r. 50

<sup>49</sup> Edward W. Ç. Noel, *Yaddaştekanê Mîcer Noel Li Kurdistan*, Wergêrandin: H. E. Caf û O. Nêrgescarî, 1984 Bexdad, r. 194

<sup>50</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetul'-Ekrad El-Sakafîyye Wê'l-Qawmîyye Fi Nihayetî'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayetî'l Qarnîl-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 137 - 138

<sup>51</sup> Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan fi Seneva'il Harb el-Alemîyet'ilula*, Wergerandin: Mihemed Mela Ebdulkerîm, 1984 Bexdad r. 94

<sup>52</sup> Kemal Elî *Kurtîyek li Xebatê Ebdurrezaq Bedirxanî*, Kovarê Çiwarçîra, hj. 2, sal:1, Swêd r. 50 / Ebdulfetah Elî Yehya, "Ebdurrezaq Bedirxan el-Botanî Neşatâtîn Sexafîyî we Sîyasîyî", kovara Karwan, Hj. 65, 1988 Erbil, r. 140

<sup>53</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetul'-Ekrad El-Sakafîyye Wê'l-Qawmîyye Fi Nihayetî'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayetî'l Qarnîl-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 142-144

Ji ber pêwendîyên Ebdurrezaq digel Rusya dewleta Osmanî ew bo balyozxana Osmanî li Tehranê wek sekreterê duyê hate veguhastin, belê berê Ebdurrezaq ber bi Tehranê biçit sultanê Osmanî Ebdulhemîdê duyemîn biryar da ku ew Îstanbulê vegerit, Ebdurrezaq li dor vî biryarê neçû, belku bi alîkarîya karmendên balyozxana Rusî li Tehranê li îlona sala 1892 berê xwe da axa Rusya. Sebaret vê yekê Ebdurrezaq dibêje, "*Dema min zanî ku serûberê malbata min li jêr hukûmeta Osmanî re ne baş e û metirsî li ser jiyana min heye, min rêya xwe ber bi Bidlîsê guhart, pişt re min berê xwe da bajarê Êrîvanê ku nêzîkî Kurdistanê bû.*"<sup>54</sup>

Li vira dîyar dibe ku dema Ebdurrezaq Bedirxanî karmendê balyozxana Osmanî li Sn. Petersburgê pêwendîyên baş digel kesayetîyên rusî hebûn. Lewra vî yekê alîkarîya wî kiriye ku ber bi Rusya ve biçit demê ew û malbata xwe tuşî sîyaseta Osmanîyan bûne.

Gihîştina Ebdurrezaq bo Rusya, bo cihê dilnexweşîya sultanê Osmanî. Lewra sultan bi rêya karê dîplomasî dewleta Rusya qail kir ku Ebdurrezaq ji axa xwe dûr bike. Û ev yek bi cih hat, dema Ebdurrezaq bo bajarê Batum (dikevite Corcîya li ser Deryaya Reş) hatîye dûr kirin.<sup>55</sup> Wusa dîyar e ku Ebdurrezaq Bedirxan neşîya li Rusya bimînit yan bi rêya dostên xwe yê Rus biryara hukûmeta Rusya bicih neêne. Lewra ber bi Brîtanya çû, li wir Ebdurrezaq pêwendî digel komel û rêkxwarên ermenî çekirin.<sup>56</sup> Belê Ebdurrezaq hate Îstanbulê, ew jî ji ber givaştinên sultanê Osmanî li ser babê wî Necîb Paşa kirîye. Pişt re sultan, Ebdurrezaq li koçka xwe wek cîgirê serokî pêşwazîyan destnîşan kir. Merema sultan ji vî yekê ew bû ku her tim Ebdurrezaq di bin çavdêriya wî de bit. Dîsan di vê qonaxê de gelek caran jiyana wî ketîye metirsîyê, heta gelek caran ji mirinê qurtal bûye, weke wî ev çend vegêrayî.<sup>57</sup>

Ji gotina jorê dîyar dibe ku Ebdurrezaq ji ber pêwendîyên xwe digel Rusya bûye cihê çavdêriya polisên sultanê Osmanî Ebdulhemîdê duyemîn. Her ji ber vî çendî Ebdurrezaq bi rêyeka nepenî daxwaz ji balyozê Rusî li Îstanbulê Zînuffî kir ku alîkarîya wî bike da careke dî ber bi Rusya ve biçît, lê balyozê navhatî bi vê yekê razî nebû. Çûnke ewî hîzr dikir ku ev kar dê bête egerê têkçûna pêwendîyên Rusî û dewleta Osmanî. Her li wê wextê balyozê navhatî (Zînuffî) dîyar kir ku ew dê babetê serederya Osmanîyan li hemberî Ebdurrezaq digel sultan behs bike.<sup>58</sup> Belê piştê hinkî li wî dîyar bû ku sultan û dewleta Osmanî sîyaseta xwe li hemberî Ebdurrezaq neguherandîye.

Sultanê Osmanî Ebdulhemîdê duyemîn kuştina Ridwan Paşayê serokê polisê

<sup>54</sup> Berhema navborî, r. 88

<sup>55</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrad El-Sakafiyye We'l-Qawmiyye Fi Nihayeti'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayeti'l-Qarnil-İşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 89

<sup>56</sup> Berhema navborî, r. 104

<sup>57</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 89

<sup>58</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'l Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 118

Osmanî li sala 1906 li Îstanbulê bi derfet zanî ku Ebdurrezaq û mamê wî Elî Şamil bi vê kuştinê guhehbar bike, pişt re her du ber bi Tirablusê (li Libya) ve hatine surgûnkirin. Dewleta Osmanî Ebdurrezaq û mamê wî Elî Şamil biryar bi darvekirinê hukûm kirin. Belê ji ber nav û deng û cihê malbata wan hukmê bi darvekirinê hate guherîn û bi hukmê her û her hatine zindankirin. Hêjayî gotinê ye ku rojnamevanîya Rusya ya wê serdemê dengûbasên dadgeha Ebdurrezaq û serederîya Osmanîyan digel wî belav dikir.<sup>59</sup> Bêguman girîng pêdana rojnamevanîya Rusî bi dengûbasên dadgehkirina Ebdurrezaq û pêwendîyên wî digel kesayetî û nav û dengên wî li Rusya dizvire.

Hêjayê gotinê ye bişên ku, Ebdurrezaq ta sibata sala 1910 di zindanê de mabû û ew lêborîna ji hukûmata Îtihadîyan (Îtihad we Teraqî piştê kutabûna sala 1908 hukûmeta xwe ya bi navê Îtihad damezrandibû) ji Ebdurrezaq û Elî Şamil negirtibû. Elî Şamil li Trablusê çûbû ber dilovanîya Xwedê û li Îstanbul hate veşartin.<sup>60</sup>

Ebdurrezaq Bedirxan dema vegerîya Îstanbulê siyaseta hukûmeta tirk (ku wê serdemê Îtihadî li ser hukmê bûn) hemberî wî û malbata Bedirxanîyan nehate guherîn. Ebdurrezaq bi xwe behsê vê yekê dike û wiha xuya dibêje "Ku serederîya hukûmeta nû ya tirkî li hemberî wî û malbata wî sersederîyek ne baş e."<sup>61</sup>

Ji ber vê serederîyê Ebdurrezaq careke di xwe gihande Çirkov ku wî çaxê balyozê Rusî li Îstanbulê bû û bi alîkarîya wezaretê derve ya Rusî xwe gihande Tîblîsê, li vir diyar dibe ku Ebdurrezaq pêwendîyên mukum digel Çirkov hebûn. Çirkov daxwaz ji hukûmeta xwe kiribû ku alîkarîya Ebdurrezaq Bedirxan bihête kirin da bigihête Rusya û di nameyekê de ku Çirkov bo wezaretê derve ya Rusya hinartibû, daxwaz kiribû ku Ebdurrezaq Bedirxanî bigihêne Erîvanê û nasnameya Rusî ji bo wî bihête amadekirin û berê bersiva Çirkov bihête, Ebdurrezaq Bedirxan ji Îstanbulê derket û ber bi Erîvanê çû. Her li wê demê Çirkov nameyeke di bo Kaxanuveskî cîgirê Rusî li Qafqazê hinart (şand) û diyar kir ku Ebdurrezaq digehête Rusya û pêdivî ye pêşwazîyeka baş lê bihête kirin û digel wê nameyê kurteyek ji jîyana Ebdurrezaq şandibû.<sup>62</sup>

Ebdurrezaq Bedirxan li 8ê kanûna yekê ya sala 1910 gihîşte Tîblîsê û ji ber pêwendîyên wî yên baş digel kesayetîyên siyasî yên Rusî li roja yekê ji gihîştina wî bi germî hate pêşwazîkirin. Mîna wan kesayetîyên pêşwazîya wî kirin ev bûn: Mîr Ziwuv, Mîr Yemanuv û Zibîlûv.<sup>63</sup>

Wek me xuya kirî, ku Ebdurrezaq Bedirxanî diviya li bajarê Erîvanê bimîne.

<sup>59</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafîyye Wel-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayeti'l Qarnil-İşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 146

<sup>60</sup> *Kurd Teavun ve Teraqî Gazetesi*, Hj. 16, 12 Kanûnê Pêşî 1908, r. 19 / Nazmî Sevgen, *Doğu ve Güneydoğuda Türk Beylikleri Osmanlı Belgeleri ile Kürt Türkleri Tarihi*, 1982 Ankara r. 130,

<sup>61</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîr Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Diyar Doskî, Hj. 2, a'90, 1999 Duhok, r. 100

<sup>62</sup> Berheima navborî, r. 149

<sup>63</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafîyye Wel-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayeti'l Qarnil-İşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 151

Çunke dê nêzîkî deverên kurdî be. Lê ev Rusya çendî nedivîya û li demê Ebdurrezaq gihîştîye Tîblîsê nivîsgeha cîgirê Qafqazî xwest bîr û boçûna parêzgerê Erîvanê bizane sebarete hebûna Ebdurrezaq li bajarê navhatî. Parêzgerê navhatî dijî vê yekî bû. Lewra Ebdurrezaq daxwaz ji Kaxanuveskî kir ku ber bi deverên kurdî yên li jêr bandora Rusî ve biçê, mîna Xoy û Selmas û Urmîyê.<sup>64</sup> Ebdurrezaq sebarete vî çendî dibêje, "Merema min ew bû ku di navbera gund û hozên kurdan de bigerim."<sup>65</sup> Li cîhekî di Ebdurrezaq dibêje, "Ulîvirêv nameyekê bi rêya wezareta karûbarên derve bo Împarator nihartibû û egerên hatina min bo Wanê dîyar kiribûn. Dîsan xuya kir ku hemî bizavên min ji bo rizgarkirina Kurdistanê ye ji zilma tirkan, û avakirina Kurdistaneke Otonom li jêr (bin) çavdêriya Rusya."<sup>66</sup>

Li vîr dîyar dibe ku Ebdurrezaq Bedirxan divîya li deverên Kurdistanê Îranê bimîne ji bo encamdana programê xwe yê siyasî û avakirina Kurdistaneke azad li deverên Kurdistanê Îranê. Belê Hukûmeta Rusya alîyekî di berê xwe dida hebûna Ebdurrezaq li deverên navhatî ew jî mîfa wergirtin ji Ebdurrezaq Bedirxanî ji bo belavkirina desthedarîya Rusya li van deveran.

Hinek ji siyasetsvanên Dewleta Rusya mîna Kaxanuveskî (cîgirê Rus li Qafqazê) divîya Ebdurrezaq Bedirxan ber bi deverên kurdî li Îranê biçê. Çunke ewan divîya Ebdurrezaq ji bo belavkirina desthilatdariya Rusya li deverên navhatî kar bike û di nameyekê de ku Kaxanuveskî bo Çirkov hinartibû dîyar dike ku çûna Ebdurrezaq bo Îranê pêngavek baş e ji bo çekirina pêwendiyên mukum digel kurdan û zanîna serûberê giştî li Kurdistanê. Dîsan Kaxanuveskî di vê nameyê de pêda diçe û xuya dike ku Ebdurrezaq dîyar kirîye ku ew dêhandet kartêkirinê li ser kurdên Îranê û Tirkîya bike da hembêrî karên Tirkîya yên dijî Fures û Xirîstanîyan rawestî.<sup>67</sup> Anku Rusya mîna ji nav û dengîya Ebdurrezaq wergirtin ji bo armancên xwe yên siyasî li deverên Kurdistanê Îranê.

Li destpêka adara sala 1911 Ebdurrezaq Bedirxan dest bi karê xwe yê siyasî li deverên Kurdistanê Îranê kir. Wî serdana çendîn bajar û deverên kurdî li Îranê kir mîna Maku, Xoy, Qutur. Dîsan heta serdana wan deverên kurdî li Kurdistanê Tirkîya jî bi xwe ve girtibûn mîna bajarê Wanê, ku li vî bajarî desthilatdariya tirk kar ji bogirtina wî kiribû. Belê Ebdurrezaq şîya xwe qurtal bike û egerên hatina xwe bo bajarê navhatî dîyar kir ku ewê li ber xwe bo parlemanê tirkî bihilbijêre. Li deh rojên Ebdurrezaq li Wanê borandin, çendîn kesayetiyên kurd nexasme yên dijî desthilatdariya Osmanîyan dîtin. Her wusa Ebdurrezaq

<sup>64</sup> Lazarêf, *El-Mes'etel'î Kurdiye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 235 / Celîlê Celîl, *Ezhetu'l-Ekrah El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarni't-Tasî Azer we Bidayeti'l Qarnil-İşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 150 - 151

<sup>65</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'90, 1999 Duhok, r. 101

<sup>66</sup> Berhema navborî, r. 101 - 102

<sup>67</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarni't-Tasî Azer we Bidayeti'l Qarnil-İşrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 151

Bedirxanî bi Ewlêrêyiv ê konsolê Rusî ketibû û Ebdurrezaq programê xwe yê sîyasî bo konsolê navhatî eşkera kiribû.<sup>68</sup>

Li deverên Kurdistanê Îranê bi taybetî deverên Maku, Xoy û Qutur dîsan Ebdurrezaq çav bi kesayetiyên kurd yên digel Rusya ketibû, mîna van kesayetîya Simkoyê Şikakî bû ku palpiştê programa sîyasî yê Ebdurrezaq Bedirxanî bû.<sup>69</sup> Hêja ye bêjin ku desthilatdariya Osmanî li deverên Kurdistanê Îranê kar ji bo girtina wî kir. Bi taybetî li bajarê Urmîyê konsolê Osmanî Sadullah Beg hewl da Ebdurrezaq bigre. Belê Ebdurrezaq xwe li konsolê Rusya parast.<sup>70</sup>

Cihê gotinê ye bijên ku karmend û sîyasetvanên Rusî bi bîr û boçûnên cuda temaşeyê xizmeta Ebdurrezaq bo Rusya dikir. Bo numûne Makluveskî balyozê Rusî li Tehranê bawerî bi xizmeta Ebdurrezaq nedêna û hizr dikir ku ew yê li wan deveran destkêşiyê bo dewleta Osmanî dike.<sup>71</sup> Belê karmendên Rusî li Qafqazê dijî hizra navhatî bûn û bawerî bi xizmeta Ebdurrezaq bo Rusya dikir, mîna van kesan Kaxanuveskî.<sup>72</sup>

Belê wusa dîyar bû ku hizra duyemin ya bi hizr bû. Lewra Ebdurrezaq Bedirxan li dûv biryara Rusî û li jêr parastina leşkerê wî gihîşte Tebrîzê. Piştî li gulana sala 1911 ber bi Tîblîsê ve hate rewanekirin.<sup>73</sup>

Desthilatdariya Rusya biryar da ku Ebdurrezaq Bedirxan li Tîblîsê bimîne û tu karên sîyasî neke. Nexasme karên sîyasî yên dijî dewleta Osmanî.<sup>74</sup> Ebdurrezaq Bedirxan dema li Tîblîsê dimîne bi razemendîya Rusya ber bi Parîsê ve diçe û çav bi Şerîf Paşa dikeve.<sup>75</sup> Di vê qonaxê de Ebdurrezaq Bedirxan dibête kêşeyeka germ di navbera Rusya û dewleta Osmanî de, bo numûne, li destpêka sala 1912 wezîrê derve yê dewleta Osmanî Asim Beg bo balyozê Rusî li Îstanbulê dîyar kir ku ew li ser parastina Rusya bo Ebdurrezaq Bedirxan ne

<sup>68</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 101-102 / Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 236 / Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrad El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fî Nihayeti'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayeti'l Qarnîl-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 153

<sup>69</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 101

<sup>70</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 102-103 / Lazarêf, pirtuka navbihurî s.238

<sup>71</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 238

<sup>72</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrad El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fî Nihayeti'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayeti'l Qarnîl-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 151

<sup>73</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 104; Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 239 / Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrad El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fî Nihayeti'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayeti'l Qarnîl-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 155

<sup>74</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>75</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrad El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fî Nihayeti'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayeti'l Qarnîl-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 152

dirazine dîsan xuya kir ku pêdivî'ye ew bidene dest Hukûmeta Osmanî. Ji aiyekî din ve dewleta Osmanî gelek rêk ji bo kuştina Ebdurrezaq Bedirxan bikarênan yan hinek caran Ebdurrezaq Bedirxan wek mirovekî guman lê kir nîşan daye, û li hindek carên din rojnamevanîya Osmanî Ebdurrezaq mirovek ji ol derketî di nav rûpelên xwe li qelem daye. Belê dewleta Rusî ji alên xwe ve û bi taybetî nûneratîya Rusî li Qafqazê hemî pêkol kirîye ji bo parastina jiyana wî. Her dîsan Ebdurrezaq Bedirxan û kesaîyên kurd alîkarîya Ebdurrezaq Bedirxan dikir da ku ji metirsîya Osmanî dûr bibe.<sup>76</sup>

Di navbera salên 1911-1912 programê Ebdurrezaq Bedirxan yê sîyasî û civakî ji bo rêxwestina serhildaneke kurdî bû li Kurdistana Tirkîyê û ev serhildan bi arîkarîya Rusya be. Ebdurrezaq Bedirxan vê yekê şîrove dikir dema digel berpîrsên rusî kom dibû. Bo numûne, konsolê rusî li Wanê dibêje, "Di yekemîn hevdişîna min digel Ebdurrezaq Bedirxan de, min ji bo wî diyar kir ku ez dê guhê xwe bidim daxwazên wî. Her çendî ez ne digel nexşê wî yê sîyasî bûm. Belê ewî bi eşkera nexş û bîr û boçûnên xwe bo min eşkera kirin."<sup>77</sup> Careke dî Ebdurrezaq bo konsolê navbihurî, "Xuya kir ku bi serkeftina Rusya li Asyaya Piçuk dê serbixweya min bicih bit."<sup>78</sup>

Her wusa Ebdurrezaq Bedirxanî di navbera salên 1912-1913 de bizaveke çandî li bajarê Xoy encam daye û ev bizav dîsan bi arîkarîya Rusya bû. Di vê bawerîyê de Ebdurrezaq Bedirxan Komelaya Cîhanzanî û Qutabxana Kurdî li bajarê Xoy damezrand.<sup>79</sup>

Li vir wusa xuya dibe ku Ebdurrezaq Bedirxanî bawerîyeke mukum bi arîkarîya Rusya hebûye û di wê hîzrê de bû ku Rusya dê arîkarîya programê wî yê sîyasî bike. Nexasme eger serhildaneke kurdî dest pêbike, belê wek diyar e, gelek ji berpîrsîyarên rusî ne digel vê yekê bûn û ji ber pêwendîyên xwe digel dewleta Osmanî û Îran û dewletên Ewropî behsê vê babetê ne dikir û bi tenê li dûv berjewendîyên xwe berê xwe didan bizava Ebdurrezaq Bedirxanî.

Jêderên taybet bi bizava Ebdurrezaq Bedirxan diyar dikin ku ewê li sala 1913 nexşê destpêkê yê şoreşê dayne û ev şoreş li Kurdistana Îranê bibe, yan jî Kurdistana Îranê bibe bingeha vê şoreşê.<sup>80</sup> Û ev nexşeyê pêkhatibû ji çend karên leşkerî li ser sînorê Îranê û dewleta Osmanî û li dûv nexşê navbihurî Seid Beg

<sup>76</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafîyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayeti'l-Qarni'l-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 157 - 159

<sup>77</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafîyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayeti'l-Qarni'l-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 160

<sup>78</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Diyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 109

<sup>79</sup> Dr. S. S. Hirorî, *Ebdurrezaq Bedirxan (1864-1918) Jiyan, Têkilîyên Sîyasî*, Xebata Çandî, 2005 Silêmanî, r. 51-60

<sup>80</sup> Celîlê Celîl, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafîyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayeti'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayeti'l-Qarni'l-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 164 - 165

(yek ji serokhozên kurda ye li ser sînore di nêvbera Îranê û dewleta Osmanî de) dê bi karekî leşkerî dijî leşkerê Osmanî ji devera Arçax rabbit ku merem jê dûrkirina leşkerê Osmanî ji devera navbihurîye. Seyîd Taha yê Nehrî jî dê bi serkêşeya leşkerekî di ber bi devera Başqe biçe û hêza Simkoyê Şikâî dê ber bi devera Seraya sînor ve biçe. Ê Ebdurrezaq li dûv nexşê şoreşê dê merema wî azadkirina devera Botan be.<sup>81</sup>

Ji bilî arîkarîya Simko û Seyîd Taha û Seîd Beg hinek kesên din dê arîkarîya şoreşê bikin. Mîna Musa Beg û sebarek karê wî Ebdurrezaq diyar dike ku karê wî ew e, dê ber bi Îranê biçe bo bi cihanîna nexşê dumahîyê ji bo şoreşê.<sup>82</sup> Ebdurrezaq Bedirxan têkilî digel hinek kesên di hebûn. Belê jêderên dîrokê rengê vê têkilîyê xuya nakin, mîna van kesan Xeyredîn Barzanî û Kor Husên Paşa.<sup>83</sup>

Ji bo vê şoreşê dîsan Ebdurrezaq Bedirxanî palpiştîya xwe bi kurdên di nav leşkerê Osmanî de diyar kirîye û li dor vê yekê diyar dike ku "Hinek ji kurdên di nav leşkerê Osmanî de digel me ne."<sup>84</sup>

Di nexşê vê şoreşê de dîsan Ebdurrezaq Bedirxan rola Îranê diyar nekirîye û Ebdurrezaq hez dikir ku bi rêya dûrkirina leşkerê Osmanî rezamendîya Îranê bal xwe ve bikişîne û sebarekê wî yekê dibêje, "Eger Îran daxwaza min bi cih neîne ez dê bi karekî leşkerî bajarên Selmas û Urmîyê bigrim. Pişt re dê nameyekê bo Şahê Îranê hinêrim û dê diyar bikem ku li jêr fermanîya wî dê leşkerê Osmanî ji Îranê dûr bikem û ev kar dê hemî li jêr çavdêrîya konsolê rus be."<sup>85</sup>

Nexşê şoreşa Ebdurrezaq Bedirxanî bo şoreşa kurdî bi cih nehat. Çûnke dewleta Rusî razî nebû û Ebdurrezaq her tim diyar kir ku ji ber têkdana pêwendîyên xwe digel Osmanîyan razî nabe li ser vê şoreşê dîsan diyar kir ku ev şoreş dê bête egerê nerazîbûna berpîrsên Osmanî û Îran û Almanya.<sup>86</sup> Hêja ye bêjin ku hinek egerên din jî ji bo serneketina projektên Ebdurrezaq Bedirxanî hene:

1. Hevnegrîna serok û serkirdeyên kurdan.
2. Hêza dewleta Îranê ya leşkerî ku Ebdurrezaq hîzr dikir hêzeke lawaz e û ev yek dê arîkarîya wî bike. Belku hemberî vê hîzrê Îranê alîkarîya Osmanîyan kir li dijî projektên Ebdurrezaq yên siyasî.
3. Ebdurrezaq hîzr dikir ku kurdên Îranê jî digel wî ne. Belê ji ber ku dewleta Osmanî dewleteka sunnî bû u bi rêya propagandaya Komkara îslamê (el-

<sup>81</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>82</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 236

<sup>83</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Min Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Diyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 107 / Lazarêf *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>84</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>85</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>86</sup> Kemal Mezher Ehmed, *Kurdistan fî Seneva'lî Harb el-Alemîyeyî'lula*, Wergerandin: Mihemed Mela Ebdulkerîm, 1984 Bexdad r. 56

Cema'etul Îslamîye) pahra pirtir ya kurdan digel wî bûn. Ebdurrezaq Bedirxan û Simkoyê Şikakî ne yek hizr bûn. Çünke Ebdurrezaq divîya pahrên Komala Cîhansazî bo şoreşê be û Simko digel vê yekê nebû.<sup>87</sup>

Piştî Rusya li hemberî projektên wî yên siyasî rawestan Ebdurrezaq ber bi Petersburgê çû, û berê bigihête cihê navbihurî li Tiflîs digel cîgirê qeyser ê li Qafqazê Furennusf Daşkov kom bû û dîyar kir, eger palpiştîya Rusya bo projektên wî nehête kirin dê neçar bêt arîkarîyê ji Almanya yan dê hewl bide aştiyê digel Tirkîya bike. Wusa dîyar bû ku vê yekê kartêkirin li ser cîgirê qeyserê li Qafqazya kirîye. Lewra ev yek bo wezîrê derve yê Rusya bi lib kir.<sup>88</sup>

Her li dor vê yekê Ebdurrezaq Bedirxanî daxwaz ji cîgirî kir ku alîkarîya wî biken û li Îranê wek serokê rêveberîyek destnîşan biken û cîgirê navbihurî palpiştîya vê yekê kir û dîyar kir ev yek wê arîkarîya me di rêxistina kurdên Îranê bike. Nexasme li paşerojê.<sup>89</sup>

Ebdurrezaq Bedirxan li Petersburgê digel Sazanuv ê wezîrê derve yê rusî û Kalim serokê pişka Rohhilata Navîn kom bû. Û piştî berpîrsên navbihurî nexşê Ebdurrezaqî yê siyasî zanî, ewan dîyar kir ku pêdivî ye hevaltiya kurd û ermen ji aliyekî ve kurd û asurîyan ji aliyekî din ve, wusa dîyar e ku Ebdurrezaq di vê bawerîyê de kar kir û bi vê rêyê pêwendî di navbera kurd û milletên di xweş bûn.<sup>90</sup>

Li vir xuya bû ku ew merema Ebdurrezaq, bo çûye Petersburgê bi cih nehat û berpîrsên rusî berê wî dan deverên Tebrîzê û ji bo belavkirina propagandaya rusî di navbera kurd û ermenan de kar bike. Anku Ebdurrezaq bi encamdana propagandaya siyasî ya kurdî çûbû Petersburgê. Belê bi karekî propaganda zîvîrî deverên Kurdistanê Îranê. Ebdurrezaq li dor vê yekê dîyar dike ku hukûmeta rusî pêşniyar kir ku ez li şên û başurê Urmîyê bimînim û kurdan qail bikem li digel Rusya bimînin.<sup>91</sup>

Ev yek li ser hatî di nameyên di nêvbera Kalim û berpîrsên rusî li Qafqazê dîyar û eşkera dibe. Kalim ji van nameyan di yekê de dibêje, "Destnîşankirina Ebdurrezaq Bedirxanî li deverê Îranê wek karmendekî îdarî dê nerazîbû na Tirkîya bêt û ev yek dê bête egerê têkçûna pêwendiyên me digel dewleta Osmanî."<sup>92</sup> Ebdurrezaq bi xwe vê yekê dîyar dike demê ez ji Petersburgê

<sup>87</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 237 - 238 ; Dr.Osman Eli, *Pirtuka navbihurî*, s.255 - 257 / Kemal Eli, *Kurtîyek li Xebatê Ebdurrezaq Bedirxan*, Kovarê Çiwar Çira, hj. 2, sal:1, Swêd r. 47 - 48

<sup>88</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>89</sup> Berhema navborî, r. 241 / Celilê Celil, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayet'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayet'l Qarnil-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 160

<sup>90</sup> Berhema navborî, r. 241 / Celilê Celil, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayet'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayet'l Qarnil-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 160

<sup>91</sup> Celilê Celil, *Safahat Mîn Nidali Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, 1 j. 2, a.90, 1999 Duhok, r. 108

<sup>92</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 241 / Celilê Celil, *Nezhetu'l-Ekrah El-Sakafiyye We'l-Qawmîyye Fi Nihayet'l-Qarni't-Tasî Aşer we Bidayet'l Qarnil-İsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 160



zîvirîm biryar ji alîyê Rusya ve hate dayîn ku ez ê ji sînore Tirkîya dûr bim. Ew jî ji ber propagandaya Almanya û Tirkîya di dijî Rusyayê de.<sup>93</sup>

Her çend Ebdurrezaq Bedirxanî ti mifayên siyasî ji serdana xwe bo Petersburgê newergirtin, belê, di warê çandî de Ebdurrezaq Bedirxanî çendîn zanayên rusî dîtin. Nexasme zanayên ku girîngî diden ziman û edeba kurdî, mîna vê yekê ji Urbîllî û çendên din.<sup>94</sup>

Lazarêf wusa dîyar dike ku Ebdurrezaq Bedirxan roleke girîng di hazirîya serhildana Bidlîsê de hebû.<sup>95</sup> Û li dor vê rolê dibêje, "Ebdurrezaq Bedirxan û Yusif Kamil Bedirxan berê sê sal ji destpêkirina serhildana Bidlîsê hazirî bo dikir."<sup>96</sup>

Dewleta Rusî careke di tîkîlîyên xwe digel Ebdurrezaq Bedirxan mukum kirin. Nemaze demê şerê cîhanê yê yekemîn (1914-1918) dest pêkiri vê çaxê Ebdurrezaq Bedirxan li bajarê Maku bû û ji bo arikariya Rusya di vî şerî de biryar ji alîyê Rusya ve hate dayîn ku pêdivî ye Ebdurrezaq di navbera kurdan de kar bike û kurdan razî bike ku alîkariya leşkerê Rusya bike û ev yek bi cih hat, demê Ebdurrezaq û bi arikariya kurdan de vera Abax sitandî û pişt re 300 siwarî ji hoza Heyderanlî ya kurd û hinekên din jî, ji hoza Milan kom kirin û bi rêya van her du hozan gelek ji dever û gundên dewleta Osmanî girtin.<sup>97</sup>

Dîsan hêza leşkerî ya kurd ewa li jêr serokatîya Ebdurrezaq Bedirxan alîkariya leşkerê Rusya li deverên derdorên bajarên Wan û Tebrîz û Urmîyê kiribû.<sup>98</sup> Dîsan Ebdurrezaq Bedirxan çendîn danezan û beyannameyan di navbera kurdan de belav kirin ji bo razîkirina wan ku alîkariya leşkerê Osmanî li dijî Rusya şer neken û di van danezanan da hatîye gotin ku: "Merema me ji pêwendîyan digel Rusya ew e ku, berê çekên xwe bidine enîya leşkerê Osmanî." Dîsan vê danezanê daxwaz ji kurdan kirîye ku alîkariya Almanya neken. Çunke alîkariya almanan derketina ji ayînê îslam e.<sup>99</sup>

Li sala 1915 leşkerê Rusya li enîya rojava bakura Îranê tuşê hinek şikestinan bû û hinek ji berpirsên Rusî egerên vê yekê jî zîvirandine bo alîkariya

<sup>93</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîn Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 112

<sup>94</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacî, 1991 Beyrûd, r. 241 / Celîlê Celîl, *Nezhetî'l-Ekrad El-Sakaîyye Wê'l-Qawmîyye Fî Nîhayetî'l-Qarnî't-Tasî Aşer we Bidayetî'l Qarnîl-Îsrîn*, Wergerandina ji rusî: Bavê Nazê û Dr. Welato, 1986 Beyrûd, r. 160

<sup>95</sup> Celîlê Celîl, *Întifadat-ûl Kurdî Fil-Bidlîs*, Wergerandin: Ebdurrehim Ebdulkerîm, kovara Metîn, Hj. 53-54, 1996 Duhok r. ...?

<sup>96</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacî, 1991 Beyrûd, r. 241

<sup>97</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîn Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 103 - 113, 110 - 114

<sup>98</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîn Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 103 - 113, 110 - 114

<sup>99</sup> Celîlê Celîl, *Safahat Mîn Nîdalî Ebdurrezaq Bedirxan*, Wergerandin: Dîyar Doskî, Hj. 2, a'.90, 1999 Duhok, r. 110 - 111

Ebdurrezaq û kurdan bo Osmanîyan.<sup>100</sup> Ji ber vê yekê hinek berbirsên rusî daxwaz dikirin ku Ebdurrezaq Bedirxan ji çeperên şer dûr biken. Belê serkird-eyên leşkerê Rusya careke dî ev projekte gêro kir û pişt re hizr bo wî çendî hate kirin ku careke dî Ebdurrezaq bo Kurdistanê bihête rewankirin ji bo çêkirina pêwendîyan digel kurdan. Ji ber vê yekê jî demê leşkerê Rusya ber bi bajarên Erzirom û Bidlîsê li sala 1915 hatin careke dî Ebdurrezaq arîkarîya kurdan bo leşkerê Rusya diyar kiri.<sup>101</sup>



<sup>100</sup> Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 464 - 466

<sup>101</sup> Research Department, Foreign Office, *The Kurdish Problem*, FO 371/40219, Persia, 1944 / Lazarêf, *El-Mes'ele'lî Kurdîye (1917-1923)*, Wergerandin: Dr. Ebdî Hacı, 1991 Beyrûd, r. 464 - 466

# Edîp Karahan: Rewşenbîrekî Têkoşer, "Mirovekî Bi Tenê" û Dozkarê Kurdistanê

Îbrahîm GUCLU  
ibrahîmgucclu21@gmail.com

Weşanxaneya Komalê di sala 1976 de ji bona Edîp Karahanî pirtûkek amade kir. Di pêşgotina pirtûkê de Edîp Karahan wisan têye terîfkirin: "... Ew merîvekî berxwedêr, wêrek û şer-  
van bû; bi şerokî dijiya, jiyanekî gûrr û çalak dijiya", Rastî jî ev rêza edebî û exlaqî ya bi tirkî, Edîp Karahanî gelek baş û bi gelek aliyan ve tarîf dike. Mirov di çarçoveya vê rêzê de ji bona jiyan û karaktera Edîp Karahanî dikare çend pirtûkan binivîsîne.

Min Edîp Karahanî di xortaniya xwe de, dema ku ez xwendevanê zanîngehê bûm, nas kir. Lê wê demê ji nêzikî ve naskirina min û wî pêk nehat. Gava min ew rûbirû dît, bi rabûn û rûniştina xwe, bi helwesta xwe, bi bîrûrayên xwe, kurdekî balkêş bû. Min Edîp Karahanî di qon-  
axa cuntaya ya sala 1971 de li hepisx-  
aneyê leşkerî ya Amedê ji nezik ve nas kir. Ew di hepisxaneyê de îdolê



ciwanên kurd, serokê dîwana hepisx-  
aneyê, pêşeng û rêvebirê girtiyan û  
hepis-xaneyê bû. Ew leheng û kelemê  
çavê dadgehê bû.

Piştî hepisxaneyê, bi Edîp Karahanî re pêwendîya min û berpirsiyarên *Rizgarî* gelek baş bûn. Mirina wî ji her kurdekî zêdetir, em xemgîn kirin û êşandin. Lewra mirina Edîp Karahanî bo tevgera kurd, bo rewşenbîriya kurd, bo siyaseta û edebiyata kurd derbeke mezin bû. Wî valahîyeke mezin çêkir. Me xwest ku ji bona wî karekî xuyayî û neyê jibîrvekirin çêbikin. Ji bona vê di derheqê wî de me bi riya Weşanxaneya Komalê pirtûkek amade kir. Di amadekirina vê pirtûkê de min roleke sereke anî cih. Lewra dema ku Edîp Karahanî ji nav me koç kir, ew li Amedê rûdinişt. Ez jî li Erxenîyê rûdiniştim. Bi malbatî jî eleqeya me gelek baş bû. Dema ku em pirtûkê amade bikin, derfet çêbû ku ez bikevim arşîva wî. Helbet wê jî derefet/ firsend da min ku ez dinyaya Edîp Karahanî hîn ji nêz ve nas bikim.

Di amadekirina pirtûka di derheqê Edîp Karahanî de xizmet û rola Orhan Kotan mezintir bû. Wek berpirsiyarê Komalê û kesekî ku jî teknîka çapê fam dikir Orhan Kotan bû. Gelek bi dilsozî û bi heyecan vê pirtûka Edîp Karahanî amade kir. Dema ku ev pirtûk amade bû, ji aliyê teknîkî, zan-yarî û madî ve şertên me gelek qels bûn. Hezar mixabin Orhan Kotan dema ku çû ser dîlovaniya xwe, derfet her çiqas zêdetir bû, di derheqê wî de, me, wek tevgera Kurdistanê nikarî pirtûkekê amade bikin.

Di van salên dawiyê de dema ku min, birayê wî Enver Karahan û Selahattin Bulutî biryar da ku em di derheqê jiyana Edîp Karahanî de pirtûkekê amade bikin, min jî dest bi

nivîsandinê kir. Min di encamê de dît ku pirtûkeke piçûk derket holê. Ev tiştê ku min nivîsandibû, beşeke piçûk ji jiyana Edîp Karahanî bû.

Ez niha jî dixwazim di çarçoveya 10-12 rûpelan de Edîp Karahanî tarif bikim û bidim nasandin. Ez baş dizanim ku ev zehmet e. Lê berpirsiyarên kovara BÎRê wisa biryar dane, ez jî nikarim derkevîm derveyî vê biryarê.

### Bi Kurtî Edîp Karahan kî ye?

Ew li gorî cuzdanê xwe yê dewletê di sala 1930 de li Dêrika Çiyayê Mazî hatiye dinyayê. Ev şertên Kurdistanê yên ku Edîp Karahan tê de çêbûye, şertên gelek taybetî ne. Piştî ku tevgera millî ya 1925 hatiye temirandin, li Kurdistanê rewşeke gelek xirab û zilmeke neditî hatiye meşandin. Malbata wî di encama temirandina tevgera 1925 de ji bona ku ew jî beşdarî serîhildana 1925 bûne, hatine sirgûn-kirin. Wê demê êdî li Kurdistanê kela serîhildana Agiriyê xwe dide nîşan.

Edîp Karahan mensûbekî eşîreta Mehmûdan e û Mehmûdan li Dêrikê eşîreke bi nav û deng e. Serokê eşîrê Reşo bû. Piştî Reşo lawê wî Osman dikeve şûna wî. Piştî wî jî malbat wek "mala Osmanê Reşo" tên naskirin. Osmanê Reşo li hemberî Brahîm Paşayê Milî serî natewandiye. Edîp Karahan neviyê Osmanê Reşo û lawê Cemîlê Şêxmûs e.

Piştî Osmanê Reşo, apê bavê wî Elas Efendî dibe serokê êla Mehmûdiyan. Elas Efendî Mekteba Ruştiye xwendiyê û li Dêrikê dibe serokê Klûba Kurd. Elas Efendî beş-

darî tevgera 1925 dibe. Piştî temirandina tevgera 1925 jî, bi Mala Cemîlpaşayî re pêwendiyên wî dewam dikin. Ji bona ku beşdarî serîhildana Agiriyê bibe, di sala 1927 de derbasî Rojavayê Kurdistanê dibe. Piştî re jî, ji bona ku beşdarî serîhildana Agiriyê bibe, tê Çiyayê Mazî. Li çiyayan digere, eşîretên din ji bona ku ji wî re nabin alîkar, dîsa vedigere rojavayê Kurdistanê.

Ev helwesta eşîra Edîp Karahanî ya kurdî dibe sedem ku di navbera wan û eşîretên din de nekokî çêbibe. Lewra eşîretên din li cem dewletê cih digrin. Piştî ku serîhildana 1925 li Kurdistanê Bakur bi zora dewletê hat temirandin, malbata wî jî hat sirgûnkirin. Malbata wî ji bona ku di salên 1925 û 1927 de zilmekî mezin dîtibû, nedixwestin ku careke din vê zilmê bijîn, ji ber vê sedemê jî, ji tevgera kurd dûr ketin. Ji bona vê, dema ku Edîp Karahanê ciwan dest bi kurdayetî dike, bavê wî Hecî Cemîl Beg dibêje "*Êdî lawekî min ê bi navê Edîp tune!*"

Edîp Karahanî jî vê helwest û rewşa malbata xwe aciz nedibû. Lewra wî sedema vê helwestê baş dizanibû. Wî dizanibû ku dewleta tirk (roma reş) zilmeke bêmentiq û nemirovî anîbû serê wan kes û eşîrên ku beşdarî tevgerên neteweyî yên Kurdistanê bûne. Piştî tevgera 1925, yan jî piştî yên din, di encama zilmeke nedîtî de ne ku tenê eşîr û malbata Edîp Karahanî, gelek malbat û eşîrên kurd ên din jî ji tevgera Kurdistanê dûr ketibûn.

Piştî temirandina tevgerên Kurdistanê, gelê Kurdistanê ji bona ku

ji doza xwe dûr bikeve zilm û zordarî hat kirin; gund û bajar hatin şewitandin, bi deh hezaran kes hatin qetilkirin. Lê dîsa jî rewşenbîrên welatparêz dixwestin ku tevgera neteweyî ji nû ve geş bikin, hêzeke welatparêz derxin holê, li hemberî dewleta kolonyalist li ber xwe bidin. Ev e, Edîp Karahan jî yek ji van kesan bû. Dema ku wî jî dest bi xebata kurdayetî kir, baweriya neteweyî di nav gel de gelek qels bû, tevgera kurdayetiyê ne girseyî bû, tu rêxistineke penî û yan jî nepenî li holê nîn bû. Hejmara rewşenbîrên welatparêz jî gelek kêr bû, ew jî li bajarekî yan jî li herêmên cihê bûn û belavbûyî bûn.

Edîp Karahan jî, kesekî ku bi serê xwe li herêma Mêrdîn û Dêrikê xebata welatparêziyê dimeşand. Ew, kesekî pêşeng û bijarte bû. Ew bi tena serê xwe rêxistinek bû.

Edîp Karahanî dezgeya axatî û şêxîtiyê li Kurdistanê li pêşîya tevgera Kurdistanê û avabûna Kurdistanê wek astengiyekê didît. Wî him wek mirovekî welatparêz û him jî wek mirovekî sosyalist dixwest ku sîstema axatî û şêxîtiyê jî hilweşe. Ji bona vê, Edîp Karahan her çiqas lawê axayekî û eşîreke mezin bû jî, wî wek xwendevanên din ên kurd nedikir. Ew, him bi fikir li dijî axatiyê bû û him jî bi helwesta xwe ya pratîkî jiyaneke ji axatiyê dûr didomand. Li Dêrikê bi kesên feqîr û belangaz re xwedî pêwendî bû û bi wan re hevaltîyê dikir

Xortên ku wî nas dikirin û an jî nas nedikirin di bin tesîra wî de diman. Ew xortên ku ji nêzik ve wî nas nedikirin jî, bi navê wî şiyar dibûn,

dibûn welatparêz. Malbatan ji bona ku xortên wan di bin tesîra Edîp Karahanî de nemînin, hewl didan xwe da ku xortên wan bi Edîp Karahanî re danûstandinê nekin. Ji bona vê jî, nedikarîn rasterast li dijî Edîp Karahanî derkevin, bi awayekî nerm vê siyaseta xwe dimeşandin. Malbatan ji xortên xwe yên xwende re digotin "Edîp şaşiyane dike! Di jiyana xwe ya xwendevanîyê de divê ewqas xwe deşîfre neke. Heger dibistana xwe xelas bike, wek parêzer dikare zêdetir ji gel re bibe alîkar." Lê ev helwesta malbatan nedikarî pêşiya xortên Dêrikê bigre. Xortên Dêrikê di encama vê helwesta hanê de hê bêhtir xwe nêzikî Edîp Karahanî dikirin.

Edîp Karahanî li Stenbolê di destpêkê de beşa Felsefeyê xwend, lê dû re dest bi zanîngeha huqûqê kir. Heta sinifa dawî hat, ji bona kar û xebatên xwe yên kurdîyê û siyasî û edebî nikarî sinifa dawî biqedîne. Di sala 1976 de, piştî ku ji Kurdistanê Başûr vegeriya û Herêma Otonom ya Kurdistanê hilweşiya, ji bo ku dîsa xwe ya dawî biqedîne çû Stenbolê. Dema ku li Stenbolê bû li otêlê dima û di gulana 1976 de ji nişkê ve nexweş ket. Ew li Nexweşxaneyê Grubayê raza. Hezar mixabin ku, di encama nexweşiya dil de çû ser dilovaniya xwe. Edîp Karahan dema ku li Kurdistanê Başûr dima jî, carekê krîza dil derbas kiribû.

Edîp Karahan du car zewicibû. Hemsera wî ya pêşî, ji tirkên Bulgarîstanê bû; hemsera wî ya duyem ji Dêrikê bû. Sedema du car zewaca wî, malbat û nebûna zorekên wî bû. Ew ji vê yekê wek rewşenbîrekî

gelek xemgîn bû û ji bona xwe kêmasiyek dihesiband. Jiyana xwe heta dawî, hemsera xwe ya yekem re derbas kir. Gava ku wî wefat kir, bi navê Turcel, Welat û Şiyar sê zarokên wî li pişt wî mabûn.

Min di sala 2005 de lawê wî Welat ji nêzik ve nas kir. Min gava ku di destpêkê de lawê wî Welat dît, wek ku ez birayê xwe yê mezin Edîp Karahanî bibînim, ewçend kêfxweş bûm. Pişt re ji gelek xemgîn bûn. Di nav demê de ew çû-hat mala me. Lewra em û wî li Yeniyola Amedê, cîranê hevûdu ne. Dema ku min Welat nas kir, dîsa derfet çêbû ku em di derheqê Edîp Karahanî de biaxifin.

### Aliyê Wî yên ku Nayên Zanîn..

Edîp Karahan di sala 1957 de ji xebatkaran û ji sosyalîzmê re dest bi piştgirî kiriye. Ji bona vê di derbarê komunîzmê de, di sala 1957 de hatiye dadgehkirin. Dîsa piştî cuntaya leşkerî ya 27ê gulana 1960, di sala 1961 de Talat Aydemirî hewil da xwe ku darbeyeke leşkerî ya din pêk bîne, desthilatdariya siyasî bigre destê xwe. Lê ev darbe bi ser neket, Talat Aydemir û hevalên wan her çiqas di hewldana yekem de hatin efûkirin jî, lê di hewldana duyemîn de hatin dadgehkirin û îdamkirin. Piştî vê darbeya neserketî, Edîp Karahan jî tê dadgehkirin.

Lê derbarê van her du dadgehkirinên wî de agahdariyeke fireh tune ye. Zêde jî ev aliyê Edîp Karahanî nayê zanîn. Bes di derbarê vê dadgehkirina wî de, di nivîsarên wî yên ku nehatina çapkirin û di raporên MÎTê yên ku di

derheqê wî de hatine amadekirin de, di doznameya dozgeran de agahdariyên gelek kurt hene.

Edîp Karahan di nivîseke xwe de dibêje, "... ez jî di bûyera Talat Aydamir û Fethi Gürcan de hatim hepiskirin. Di nav wan kesên girtî de endamên TÎPê jî hebûn. Beriya ku em bîn girtin, çapemeniya burjuvaziyê di derheqê me de dest bi kampanyayê kir. Wê demê serokê TÎPê jî li dijî me beşdarî vê kampanyaya çapemeniya burjuvaziyê bû û li Entabê li dijî me birûrayên gelek dijwar anîn ser zimên." (Komal kolektîf, *Bir Kürt Devrimcisi*, Weşanxaneya Komal, 1976, Ankara, r. 2003)

Ev bûyer jî nîşan dide ku Edîp Karahan her ji mêj ve muxalîfekî xurt ê dewletê ye.

### **Edîp Karahan û kovara *Dicle-Fırat* : 1962**

Kovara *Dicle-Fırat* di sala 1962 de dest bi weşanê dike. Kovara *Dicle-Fırat* piştî cuntaya leşkerî ya 27ê gulana 1960î û li gorî şertên qanûna bingehîn ya nû de tê weşandin. Têye zanîn ku ew şert şertên taybetî bûn. Her çiqas cuntaya leşkerî bi xwe ne demokrat bû û li dijî mafên gelê kurd be jî, piştî cuntaya, girêdayî şertên hundir û derva atmosfereke azadiyê li Tirkîyeyê dest pêkiribû. Ji derveyî îdeolojiya resmî ya kemalîst birûrayên nû, sosyalîzm, bi awayekî kurdayetî ketibû qada fikrî ya Tirkîyê.

Kovara *Dicle-Fırat* wek rojnameyeke fikrî ya mehane bû, di navbera 01. 11. 1962 û 14. 05. 1963 de hate weşandin. Kovar, wek platformeke neteweyî di jiyana çapemeniyê de cih

girtibû. Lewra hîn di hejmara xwe ya yekem de, di nivîsa "*Em çima tên weşandin?*" de diyar dike ku kovar ji hemû beşên civaka kurd re dê vekirî be. Heşt hejmarên kovara *Dicle-Fırat* hatin weşandin. Hejmara 9. dema ku di çapxaneyê de di çapê de bû, dewletê dest danî ser. Edîp Karahan û 23 hevalên xwe hatin girtin.

Di kovara *Dicle-Fıratê* de bêhtir nivîsên Edîp Karahanî bûn. Edîp Karahan di hemû hejmarên kovarê de bi çar navên cuda nivîsan dinivîse. Nivîsên editorê kovarê bi navê Edîp Karahanî û Edîp Osmanoglu; nivîsên li ser siyaseta hundir bi navê Hamit Mazıdağlı, li ser siyaseta derve bi navê Mehmut Bayraktar dinivîse. Dema ku meriv bala xwe bide ser nivîsên wî gelek bi hêsanî tê tespîtîkirin ku nivîsarên wî zindî, girêdayî jiyana civata kurd, siyaseta rojane, edebî ne. Di nivîsarên xwe yên di derbarê siyaseta derve de wek dîplomatekî û pisporekî siyaseta derve ye.

Di tevayiya kovarê û nivîsarên Edîp Karahanî de peyva Kurdistanê nayê bikaranîn, lê dema ku li nivîsandina hûr mêze bikî, avakirina nivîsaran ji çav derbas bikî û şirove bikî, gelek bi rehetî tê tespîtîkirin ku ji pirsîgîrêkên neteweya kurd û welatên wan ji Kurdistanê tê behskirin.

Di sala 1962 de kovara *Dicle-Fıratê* di entellektulîya kurdî de, di xebata fikrî û çandî ya kurd de gaveke gelek girîng û dîrokî bû. Edîp Karahan berpirsiyarê vê kovarê bû û di kovarê de basîret û qabîliyeteke entellektuelî nîşan dida. Di kovarê de cur bi cur nivîs; nivîsarên edebî, siyasî, felsefî

dihatin nivîsandin. Di *Dicle-Fîratê* de bi fikrên nû û bi fikrên li dijî sistema kolonyalistî ku mafên neteweya kurd xesp kirîbû de bi mêrxasî dihat nivîsandin. Ew di kovara *Dicle-Fîratê* de him editorekî baş bû, him çîroknûsekî jêhatî, siyasetvanekî jîr û leheng bû.

Edîp Karahanî di kovara *Dicle-Fîratê* de bi tirkî û kurdî nivîsandiye. Kurdiya wî nûjen, paqij û xweş e. Di kovarê de diyar dike ku ew parêzerekî doza neteweya kurd e, hevalbendê sosyalîzmê û xebatkarane.

Kovara *Dicle-Fîratê* di wan şertan de rojeva kurdan tespît dikir û nîqaş dikir. Kovarê ji dinyaya fikrî ya kurdan re dewlemendiyek da qezenckirin. Di kovarê de **Sait Elçî, Musa Anter, Dr. Sait Kırımsıztoprak, Nazmi Balkaş, Ahmet Aras, Şevket Epözdemir, Enver Aytekin, Feqî Huseyn** û gelek kesên din nivîsîne. Ew kesên ku di kovara *Dicle-Fîratê* de nivîsandin, di heman demê de di dîroka tevgera Kurdistanê ya nêzik de bûn aktorên gelek girîng û balkêş. Sait Elçî di sala 1966 de û Sait Kırımsıztoprakî di sala 1970 de ji partiyên Kurdistanê re serokatîyê kirin.

Kovara *Dicle-Fîratê* di rojnamegeriya kurdî de jî xwediyê ciyekî diyar û girîng e. Piştî serîhildana 1938 ya Dêrsimê heta 1948 li bakurê Kurdistanê bi her awayî bêdengiyek çêbû. Her çîqas ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve *Hawar* (15 gulan 1932-15 tebax 1943) û *Ronahî* (1 nîsan 1942 - 27 gulan 1946), ji aliyê Kamuran Bedirxan ve *Roja Nû* (3 gulan 1943 - 1946) hatin weşandin jî, ev kovarên li derveyî welêt bûn. Bes di sala 1948 de li

Stenbolê *Dicle Kaynağı* (*Çavîya Dicleyê*) hat weşandin. Piştî van kovarên kurdan dev ji xebata weşanê berda. Di sala 1950 de dîsa li Stenbolê *Şark Mecmuası* (*Kovara Rojhilatê*) û *Şarkın Sesi* (*Dengê Rojhilatê*) hatin çapkirin. Jiyana van kovaran jî kurt bû. Di sala 1958 de li Amedê bi navê *İleri Yurt* (Warê Pêş) rojnameyekê dest bi weşanê kir. Jiyana wê jî heta payîza 1959 dom kir.

Piştî *İleri Yurtê* kovara *Dicle-Fîrat* dest bi weşanê kir. Ev yek li hemberî sistema kolonyalist têkoşîneke nû û bêtaetkariyeke diyar bû. Ji ber vê yekê jî ev gaweke gelek girîng bû.

## **Hepsîbûna Wî ya ji ber Komunîzmê: 1953**

Têye zanîn ku di sala 1950 de Şoreşa Çînê çêbû. Encama vê yekê ji bona ku sistema sosyalîst ava bibe, derfet û şert çêbûn. Piştî vê, di navbera sistema sosyalîst û demokrat-kapîtalîst de hem li gelekê herêman şerê germ, û bi tevayî jî li dinyayê şerekî sar dest pêkir. Wî şerê sar rasterast li ser Tirkîyeyê jî tesîr kir, dewleta unîter û neteweyî li hemberî komunîstan şer îlan kir. Makartîzmê xwe bi her awayî nîşan da.

Her çîqas di sala 1946 de Tirkîye di bin tesîra bayê Şerê Cîhanê yê Dûyemîn de xwestiyê pêvajoya demokrasiyê bide destpêkirin jî, li Tirkîyeyê ligel partiya kemalîst a totalîter CHP partîyeke din, ango DP (Partiya Demokrat) hatibû danîn. Tirkîyê karakterê xwe yê otorîter, totalîter û olîgarşîk parastibû. Îro jî ev karakterê wê dom dike.

Tirkîye ji bona ku tevgera çep,



kesên sosyalîst û komunîst tasfîyê bike, gelek metodên faşîst û totalîter bikaranîn. Li Tirkîyê di sala 1952 de li hemberî berpirsiyar û endamên Partiya Komunîst û rewşenbîrên sosyalîst pêleke hepiskirinê dest pêkir. Xuya ye ku kurd jî, ji vê pêla xurt ya faşîzan ya di wê merheleyê de jî xelas nebûne.

Mirov dikare bibêje ku ji bo raya giştî ya kurd hepisbûna Edîp Karahanî ya balkêş e. Ew hepisbûna wî ya di sala 1953 de, dema ku Edîp Karahan 23 salî bû pêktê. Sedema hepisbûna wî, komunîzm e.

Ev hepisbûna Edîp Karahanî jî diyar dike ku rewşenbîrên kurd, di dîrokeke kevin de bi bîrûrayên çepgir, sosyalîst û komunîst re xwediyê pêwendiyekê ne. Ji wan fikran sûd wergirtine û xwestine ku bi riya sosyalîzmê kurdayetîyê bikin û mafên neteweya kurd ji bona ku bête qezenckirin, riya sosyalîzmê bi kar bînin.

### **Hepsîbûna Wî ji Ber Kovara Forum : 1957**

Edîp Karahan cara duyem di sala 1957 de dema ku 27 salî ye hepis dibe. Sedema hepisbûna wî ya vê demê, nivîsarên ku di kovara *Forumê* de nivîsandibûn.

Edîp Karahan cara duyem 6 mehan di hepsê de dimîne. Derbarê vê hepisbûna Edîp Karahanî de belgeyên ciddî di destê me de tune ne. Heta her çiqas Edîp Karahan 6 meh hepis jî radikeve, pişt re ceza girtiye û an jî beraat kiriye, naye zanîn. Hepsîbûna Edîp Karahanî di sala 1957 de, li gorî bawerîya min, wek destnîşana tevgirtina sala 1959 ya

bûyera 49 kesên rewşenbîr û xwendevanên kurd e.

Edîp Karahan yek ji wan kurdan e ku di wan salan de hepis bûye.

Edîp Karahan di salên 60î de ji çend caran hatibû hepiskirin.

### **Hepsîbûna ji Bûyera Talat Aydemir û Fethi Gürcanî : 1963**

Wek têye zanîn piştî cuntaya 1960î ew nerehatiya di nav leşkeran de neqediya. Lewra di nav leşkeran de jî grûbên cihê, dijiyatiya desthilatdarî hebû. Ji bona vê Talat Aydemir û Fethi Gürcanî li hemberî desthilatdariya siyasî darbeyeke leşkerî pêk anîn. Lê biserneketin û hatin îdamkirin.

Di wan şertan de Edîp Karahan jî tê hepiskirin. Ev di derheqê vê hepisbûna xwe de di nivîsara xwe ya "*Di Sosyalîzmê de Rexne û Xaverexnekirin*" de qal dike. Hezar mixabin ji derveyî vê gotarê di destê me de tu belge ji bo vê dadgehîkirinê tune ne.

### **Hepsîbûna Wî ji Ber Rojnameya Dicle-Fîrat : 1963**

Kovara *Dicle-Fîratê* dema ku hat hejmara 9. û li çapxaneyê bû, Edîp Karahan ji ber wan nivîsarên wî yên ku di kovarê de cih girtibûn, ku li gorî îddiaya dewletê cudaxwazî dikirin, hat hepiskirin. Ev beriya bûyera 1963 ya girtina 23 kesan pêkhat.

Ew ji vê hepisbûna xwe gelek kêfxweş bû. Ev kêfxweşîya xwe jî her dem diyar dikir. Lewra ew jî berhemke hêja, ji rojnameya *Dicle-Fîratê* hatibû hepiskirin.

Wî, ji zarokên xwe zêdetir ji roj-nameya *Dicle-Fîratê* hez dikir. Ji bona vê jî, wî li hemberî dadgehê rojnameya xwe bi kefxweşî û bi serbilindî parastîye.

Di dadgehîkirina *Dicle-Fîratê* de munaqeseyên di navbera wî û qadîyê/hakimê çapemeniyê de derbas bibûn, gelek bi kefxweşî û bi henekî pêşkêş dikir.

## **Doza Kurdistanî û Girtina 23 Kesan : 1963**

Wek tîye zanîn piştî serihildanên Kurdistanê di 17ê çîleya pêşîn a 1959 de 49 kurdên xwendevan û rewşenbîr, ji bona ku kurd bûn û mafê kurdan dixwestin hatin girtin. Ev hepiskirina kurdan, piştî cuntaya ya 27ê gulana 1960î jî dom kir. Vê yekê jî diyar kir ku, dema ku li Tirkîyeyê bi tevayî ji demokrasîyê jî bê behskirin, ji bo neteweya kurdan demokrasî nabe.

Piştî doza 49 kurdan doza girseyî ya kurdî di sala 1963 de hat holê. Di vê dozê de 23 kurd hatin dadgehkirin. Edîp Karahan jî ji yek ji van girtiyan bû. Dema operasyona girtina 23 kurdan dest pêkir, hejmara 9. ya kovara *Dicle-Fîratê* li çapxaneyê bû û li çapxaneyê hat qedexekirin, îzîn nehat dayin ku belav bibe.

Kurdên di **Doza 23an** de cih girtibûn, ne tenê kurdên Bakur bûn, ji beşên din yê Kurdistanê jî xwendevan û welatparêzên kurd di nav vê dozê de cih girtibûn. Ji bona vê, **Doza 23an** jî hemû dozên din cihêtir, Dozeke Kurdistanî ye.

Doza 49 kurdan çawa ku li dadge-

ha leşkerî hat domandin, "**Doza 23an**" jî li dadgeha leşkerî dom kir.

23 kurd, di 29ê hezîrana 1963 de hatin hepiskirin. Wê rojê di rojnameyên tirkî de di rûpela yekem de behsa vê dozê hat kirin. Di rojnameya *Hürriyetê* de, di rûpela pêşîn de hat nivîsandin ku "*Kurdî Hatî Têwqîf-kirin*". Di eynî nûçeyê de ji nasnameya girtiyan tê behskirin, belgeyên ku hatibûn derdestkirin û wêneyên wan kesian dihatin pêşkêşkirin. Helbet vê komployê bi hewldana Senatorê CHP Hıfzı Oğuz Bekata dest pê kiribû.

Doznameya 23 kurdan, di 17. 10. 1963 de ji aliyê sererkaniya Komara Tirkîyê ve hat amadekirin. Di doznameyê de dihat îddiakirin ku van 23 kurdan ji bona ku yekîtiya dewletê ji holê rabe xwestine beşek ax ji bin bandora dewletê veqetînin. Bi kurtî 23 kurdan xwestine ku Kurdistaneke serbixwe ava bikin.

Di doznameyê de, navê 23 kesên tê diyar kirin: Edîp Karahan (Bakurê Kurdistanê), Abdûlsettar Hamawendî (Başûrê Kurdistanê), Doğan Kılıç (Bakurê Kurdistanê), İbrahim Mamxîdir (Başûrê Kurdistanê), Gazî Dizeyî (Başûrê Kurdistanê), Nejat Remzî (Başûrê Kurdistanê), Fuad Derwêş (Başûrê Kurdistanê), Talat Şerîf Muxtar, Seîd Ebdurrehman, Cemal Alemdar (Başûrê Kurdistanê), Firûz Felahat (Rojhilata Kurdistanê), Musa Anter (Bakurê Kurdistanê), Ziya Şerefhanoglu (Bakurê Kurdistanê), Enver Aytekin (Bakurê Kurdistanê), Medet Serhad (Bakurê Kurdistanê), Yaşar Kaya (Bakurê Kurdistanê), Ergün Koyuncu (Bakurê Kurdistanê), Ergün Anagür (Bakurê Kurdistanê), Kemal Bingöllü (Bakurê

Kurdistanê), Mehmet Bilgin (Bakurê Kurdistanê), Fettullah Kakioglu (Bakurê Kurdistanê).

Beşek ji van 23 kesan di **Doza 49an** de ji hatibûn dazendin.

Di derheqê 23 kurdên xwendevan û rewşenbîr de doznameyeke gelek fireh û bi tefferuat hatiye amadekirin. Edîp Karahanî ji nivîsarên xwe yê di kovara *Dicle-Fîratê* de tê tawanbarkirin ku Edîp Karahan bi hevalên xwe re dixwaze Kurdistaneke serbixwe ava bike û pêwendiya wan jî bi şoreşa Kurdistana Başûr û serokê şoreşê Mele Mistefa Barzanî re heye.

Di vê dozê de Edîp Karahanî li hemberî dadgehê çî gotiye û çî parastin kiriye ne diyar e. Lê ev pirs-girêkeke giştî ye û parêznameyên kesên din jî nayên zanîn.

## Doza Heqaretê li Serokê Komara Tirkîyê

Edîp Karahanî jî di organîzekirina "Xwepêşandanên Rojhelatê" de roleke gelek girîng lîst. Di xwepêşandanên de axiftinên gelek hêja kir. Di Xwepêşandana Diyarbekirê ya ku li sala 1967 pêkhatibû de -di xwepêşandanê de kovara *Ötükenê* hat protestokirin- jî axiftinek kir. Di vê axiftina xwe de serokê komara Tirkîyê Cevdet Sunay rexne kir. Ew rexneyên wî jî aliyê dozgerê komarê ve wek sûc liat hesabandin û derheqê wî de doz hat vekirin.

Di encama dadgehkirinê de Edîp Karahanî sal û nîvek (1,5) ceza girt û neh mehan di hepsê de ma.

Edîp Karahanî di dadgehê de

parastineke siyasî û huqûqî ya teknîkî ku gelek balkêş bû, pêşkêş kir. Di cîyekî parêznameya wî de bîrûrayên ku têne îfadekirin, ji bona ku her tiştêkî tarîf û îfade dike ez dixwazim wê beşê werg-e-rînim kurdî û pêşkêş bikim.

Edîp Karahanî ji bersivekî serokê komarê, statuya Tirkîyê, helwesta dewletê li hemberî gelê kurd qiset dike û dibêje,

"Birêz dadger beg, ji bona ku ez wexta we ya bi qîymet zêde negrim, ez dixwazim axiftina xwe wek xulaseyekê û bi kurt pêşkêş bikim. Lê beriya ku ez dawî li vegotina bîrûrayên xwe bînim, ez mecbûr im ku li ser noqteyê gelek girîng rawestim. Ez dibêjim ku, divê birêz serokê komarê her tim xwe ji polemîkan dûr bigre, divê qedr û qîymeta meqamê xwe bizane, bêtêref be, bawerî bide hemû hemwelatîyan. Ger ew berovajîya vê helwestê tevbigere, çawan ku di encama îdeolojiya psîkopatik a tûranîstîyê de Partiya Îttîhad we Teraqîyê bû sedem ku ew împaratoriya mezin a Osmanîyan hilweşe, bi vî awayî helwestên ne di cihê xwe de jî dê bibin sedem ku zû û an jî dereng Tirkîyê parçe bike."

(Komal kolektîf, *Bir Kürt Devrimcisi*, 1976- Ankara, r. 123)

## Serokbûna Wî ya bo Partiya Karkerên Tirkîyê (TÎP) Şaxê Taxa Emînonu ya Stanbolê...

Edîp Karahan, helbet ji bona ku xizmeta neteweya kurd bike, ew jî li Stenbolê bû endamê Şaxa Eminönü ya Partiya Karkerên Tirkîyê. Piştî demekê di nav partiyê de xebatên

gelek balkêş pêkanîn, di nav partiye de bû mirovekî bi navûdeng. Encama vê jî, piştî demekê bû serokê rêxistinê.

Dema ku ew endamê partiye bû, di navbera wî û navenda partiye de jî gelek bûyer qewimîn û ew li hemberî navenda partiye rexnegir bû. Li hemberî navenda partiye gelek rexneyên nivîskî him pêşkêşî navenda partiye û him jî ya reya giştî kirine. Partiye gelek caran dixwest ku ji wî xelas bibe. Lewra partî, jî kurdûna wî û ji doz-kariya wî ya neteweya kurd aciz bû. Partî di wê baweriyê de bû ku kurd-bûyina wî ya tûj dê zerarê bide partiye.

Dema ku ew serokê şaxa Emînonuyê bûye, bûyereke gelek balkêş diqewime. Edîp Karahanî vê bûyerê li hepisxaneya leşkerî ya Amedê, di sohbetên xwe yên li hewirdora sobayê anîbû ser zimên.

Dema ku Edîp Karahan dibe serok, Yorgancî Yorgo jî dibe endamê komî-teya birêvebir û di heman demê de dibe berpirsiyarê malî. Yorgancî Yorgo her roj wek muwazîfêkî (memurêkî) serê sibehê tê partiye, partiye paqij dike, çayê çê dike, heta êvarê li partiye rûdine, bi endaman re pêwendîyeke xurt dimeşîne. Di destpêkê de, ne pişt re, rewşa Yorgancî Yorgo bala wî dikşîne. Edîp Karahan xwe bi xwe dibêje "Însanên Rojhilata Navîn û Tirkîye wulo bi disîplîn û profesyonel nîn in. Gelo çima Yorgancî Yorgo wulo bi disîplîn e û bi profesyonelî kar dike?" Ji bona xwe piştî çavênîrîna xwe digihîje encameke wisan ku Yorgancî Yorgo mirovê îstixbaratê (MÎT) ye. Wê demê jî dixwaze ji Yorgancî Yorgo xelas bibe. Feqet hevalên wî naxwazin pîrsgirêkê fehm bikin.

Wê demê Edîp Karahan biryar dide ku bi navenda partiye re qise bike. Rojêkê diçe Anqerê û ji bona wî derfet çêdibe ku ew vê pîrsgirêkê bi pîrsgirêkên din re bi serokê giştî Mehmet Ali Aybar re qise bike. Di danûsatan-dînê de rewşê pêşkêşî serokê giştî dike. Serokê giştî gelek bi xemsarî û gelek xwezayî bersîvê dide Edîp Karahanî û dibêje "gelo baş e ku Yorgancî Yorgo mirovê îstixbaratê ye. Dewlet dê bi riya wî bizane ku em li dijî qanûnan xebatê nakin."

Edîp Karahan jî bersîva M. Ali Aybar gelek aciz dibe û bersîvê dide: "Serok, wê demê baştir e ku em tabelaya navendê li MÎTê bi dar xin."

Piştî vê bûyerê, Edîp Karahanî girêdayî vê pîrsê û nakokiyên din dev ji partiye ber dide û bi serê xwe xebata xwe didomîne. Lewra eleqeya wî û Grûba Rojhilatê ya di nav TÎPê de jî baş nebû. Ez di wê baweriyê de me ku îstifaya Edîp Karahanî him navenda partiye û him jî grûba kurd memnun kiriye!

## DDKO, Doza DDKO û Hepisxane û 8 sal ceza bo wî...

Piştî ku li Anqerê û li Stenbolê DDKO ava bûn, ji bo avakirina DDKOyan li Kurdistanê jî daxwazeke xurt hate rojevê. Hezar mixabin di destpêkê de grûba kurd ya ku di nav TÎPê de xebatê dikir, Dr. Tarîk Ziya Ekîncî û hevalê xwe nedixwestin ku DDKO li Kurdistanê ava bibin. Edîp Karahanî piştigirê avakirina DDKOyan li Kurdistanê bû. Ji bona vê jî li hemberî grûba kurd ya di TÎPê de ji bona

DDKOyan xebat dikir. Hezar mixabin dema ku DDKOya Amedê avabû, ji bona ew ne li Amedê bû, nebû himdarê DDKOyê.

Lê piştî ku DDKO li Amedê ava bû di nav DDKO de xebat kir û semîner pêşkêşî endam û hevalbendên DDKOyê kir. Di heman demê de xebata xwe ya serbixwe jî didomand. Li gorî rapora îstixbaratê, di DDKOyê de li ser mijara "Şoreşa Demokratîk û Millî" semînerêk pêşkêş kiriye. Xweser li ser mijara "Li Iraqê Şerê Rizgariya Millî ya Kurd û Serfermandeyê Wê Mela Mistefa Barzanî" belavokek nivîsandiye, di nav gel de bi giştî belav kiriye.

Di dema cuntaya ya 1971 de li dadgeha leşkerî ya Amedê di derheqê wî de him ji bo DDKO û him jî ji bo PDKa Tirkîyeyê doz hat vekirin. Pêşî doza wî di çarçoveya DDKOyên Amedê û navçeyên Amedê de vebû, pişt re doza wî bi Doza DDKOyên Anqere-Stenbolê re bû yek.

MÎTê di derheqê wî de raporên gelek balkêş amade kiribûn. Di wan raporên de behsa kovara *Dicle-Fîratê*, girtina 23 kurdan û ya wî, pêwendiyên wî yên fireh tê kirin.

Encama dagehkirina wî, 8 sal ceza girt û sal û nîvekê di hepsê de ma, pişt re çû li herêma otonom ya Kurdistana başûr akincî bû.

**Parêznameya wî:** Edîp Karahanî him di lêpîrsîna destpêkê de û him jî di parêznameya xwe ya bingeîn de bîrûrayên gelek balkêş û îlmî di dadgehê de anîn ser zimên. Di dadgehê de parêznameya xwe bi nivîskî pêşkêş kir. Parêznameya Edîp Karahanî di pirtûka

Komalê de ciye xwe girtiye. (*Bir Kürt Devrimcisi*, Weşanxaneya Komal, Rûpel: 155-172). Ez dixwazim tenê beşa dawî ya parêznameyê bo kurdîya kurmancî wergerînim û pêşkêş bikim.

Edîp Karahan di dawîya parêznameya xwe de dibêje,

"... ne hewce ye ku zêde bête dirêjkirin. Hewldan û fîkrê me ev e, ku em dixwazin pêşî li şerê xwînî yê di navbera kurd û tirk de derkeve, bigrin. Çareserkirina pîrsê bi metoda demokratîk pêkbînin. Şerê tu gelfî yê ji bo maf û azadiyan heta dawiyê pêşî lênehatiye girtin. Divê neyê fikirin ku her şerêk jî, dê wek şerê kevn bi hilweşandinê encam be. Civat dikevin û radibin, di encamê de bi şerdikevin. Îro di vê merhaleyê de Împaratoriya Amerîka nikare zora miletekî feqîr yê wek Vîetnamê bibe.... Diyar e, dema ku wext û têgihîştin çêbû, hiç hêzek nikare pêşîya tevgerên pêşverû bigre. Tîrsa min ew e ku, burjuvayên tirk yên ku bi berjewendiya xwe re girêdayî ne, yanî nasyonalîst û kapîtalîstên tirk di navbera kurd û tirk de pevçûn û şer derxin. Lêbelê rûpelên dîrokê bi hilweşandina kapîtalîstan ku ji bona xwe dibêjin em nasyonalîst in, dagirtiye. Nasyonalîzm kapîtalîzm e, wekî din nayê tarîfkirin. Her bijî yekîtî û biratiya gelê kurd û tirk. Bimre faşîzm, şovenîzm û nijadperestî."

**Li hepisxaneyê berxwedana wî û Dîwana Serokatîyê:** Piştî darbeya leşkerî dewletê bi giştî biryar girtibû ku ew kesên kurdayetî kiribûn û dikirin, endam û damezrêner û berpîrsiyarên DDKOyan û Partiyên

Demokrata Kurdistanê li dadgeha leşkerî ya Amedê û Sêrtê bêne dadgehkirin. Li gorî baweriya min ev biryareke dîrokî bû. Vê biryarê cudabûyîna neteweya kurd û tirk vekirî derxist qada siyasî û civakî.

Em jî li Anqerê li hepisxaneya sivil radizan. Biryar hat girtin ku em jî, ji Anqerê bêne Amedê, li wira dadgeh bibin. Beriya ku em (ez, Mumtaz Kotan, Sebrî Çepîk, Nezîr Şemîkanlî) bêne Amedê, bi sedan kurdperwer, damezrêner û berpirsiyarên DDKOyan, endam û berpirsiyarên TÎPê û endamên Partiya Demokrata Kurdistanê û ji hemû beşên civata kurd kes hatibûn binçavkirin û hepisikirin.

Di hepisxaneyê de du kategorî girtî hebûn. Kategoriya yekemîn, kategoriya hepisikirî bû û kategoriya duyemîn jî yên binçavkirî bûn. Edîp Karahan bibû berpirsiyarê kesên hepisikirî û parêzer Şerefeddîn Kaya jî bibû berpirsiyarê kesên binçavkirî. Rastî jî bi taybetî di destpêkê de, di rewşa nexuyayî û neorganîzekirî de Edîp Karahanî roleke gelek mezin dianî cih û li hemberî desthilatdariya hepisxaneyê li ber xwe dida.

Edîp Karahanî di nav demê de ev berpirsiyariya xwe, wek dezgehekê binav kir. Dezgeha “Başkanlık Divanı (Dîwana Serokatîyê)” jî wir derket holê, di nav pêvajoyê de ji aliyê girtîyan û kesên binçavkirî de jî hat pejirand. Ji vê jî girîngtir, “Dîwana Serokatîyê” jî li aliyê berpirsiyarên hepisxaneyê û qadiyên dadgehan ve jî wek de-facto hat erêkirin. Bi xebata xwe “Dîwana Serokatîyê” ewqas bawerî dabû ku dema ku “Dîwana

Serokatîyê” bixwaze berpirsiyar û desthilatdariya hepisxaneyê nikarin tiştekî bikin, dikare girtîyan tehliye û azad bike, hemû hewcedariyên girtîyan dikare bîne cih.

“Dîwana Serokatîyê” dezgeheke gelek demokratîk bû û ji gelek kesan pêk hatibû. Serokê ku nedihat guherîtin û bêyî munaqase Edîp Karahan bû, cîgirê wî jî Mistefa Dişineklî bû. Li gorî karan jî “wezîrên” wî hebûn. Piştî ku ew ji hepsê derket, wê kevneşopiyê dom kir.

**Li hemberî belavokên konseya leşkerî belavok belavkirin:** Edîp Karahanî wek berpirsiyarê hepisxaneyê, li hemberî konseya sererkaniya Tirkîyê jî muxalefetê dikir. Edîp Karahanî ji bona xwe kiribû edet ku li hemberî her belavokeke serokatîya cuntayê belavokekê belav bike. Naveroka van belavokan helbet bêmunaqase rexne-kirina belavokên serokatîya cuntayê bû. Wî bi taybetî, dema ku derî li ser girtîyan dihat girtin, bi dengê bilind vê belavoka xwe dixwand, serokatîya cuntaya mehkûm dikir. Hemû girtîyan jî, ji wî re li çepikan dida.

**Komiserên Sosyalîzmê:** Min cara yekem li hepisxaneyê peyv û gotina “Komiserên Sosyalîzmê” jî wî bihîst. Edîp Karahanî ev peyva hanê ji bo wan kesên kurd yên di Partiya Karkerên Tirkîyê de di dereceya yekem de qiymet didan sosyalîzmê, ew kurdên ku diparastin ku “dema sosyalîzm ava bû pîrsgirêka Kurdistanê dê çareser bibe”, “pîrsa çînî ji pîrsa neteweyî û millî girîngtir e” re digot. Helbet ji wan kesan re jî Dr. Tarik Zia Ekîncî

serokatî dikir. Sedama vê peyvê û an jî jêdera vê, ji helwesta Dr. Tarik Zîya Ekîncî û hevalên wî li dijî Edîp Karahanî bû.

Dr. Tarik Zîya Ekîncî û hevalên wî ji bona ku organîzekirî û xwediye îmkanan bûn, bi her awayî dixwestin ku pêşiya xebata Edîp Karahanî bigrin. Wek mînak, ji bona ku belavokên Edîp Karahanî nayên çapkirin, zorê li ser xwediye çapxaneyê Nazimê Berçavik dikirin.

Di navberê de piştî ku 20 sal derbas bûn, me gelek komîserên partiyên îlegâl û fîkrên dogmatîk nas kirin. Dikarim bibêjim ku ew tespîta Edîp Karahanî ya di derbarê komîseran de ji min re bû rêber.

**Bûyera Sileyman Paşe û Reva Ustegmen:** Li hepisxaneyê li dijî neheqîyan muxalefetê kirin, ji bona Edîp Karahanî wek çandekê bû. Ji bona vê gelek bûyer li hepisxaneya leşkerî qewimîn. Ez dixwazim ji vana du bûyeran pêşkêş bikim.

Rojekê diya Edîp Karahanî jî hati-bû seredaniya wî. Edîp Karahanî bi diya xwe re kurdî qise dikir. Me jî li baxçeyê volta diavêt. Di vê navberê de berpirsiyarê Kolorduya 7. ya Amedê jî bi grûbek esker re teftîş dikir. Wê demê dît ku Edîp Karahan bi diya xwe re kurdî qise dike û ji Edîp Karahanî pirsîye ku “gelo tu bi çi zimanî qise dikî?” Wî jî bersîv da ku “ez bi kurdî qise dikim.” Berpirsiyarê Kolorduyê bi dengê bilind got, “gelo tu nizanî ku di hepisxaneyê de kurdî qisekirin qedexeyê?” Wê demê Edîp Karahan gelek zêde aciz bû, êriş bir ser Silêman Paşe û bi dengê bilind got ku “gelo tu jî nizanî ku ez û hevalên min em bo

kurdayetî hatine girtin? Kesên ji bo kurdayetî bîrê hepiskirin dê bi kurdî qise bikin.” Li hemberî helwesta Edîp Karahanî komutan gelek aciz bû û çû. Edîp Karahanî êrişa xwe bi dengê bilind, vê carê li hemberî leşkeran domand.

Rojekê jî ustegmenekî li eskeran heqaret dikir. Edîp Karahanî jî ew dît, êrişî ustegmen kir û got “gelo tu nizanî ku ev zarokên gel in, ew ne xulamên bavê te ne.” Helbet wê demê ustegmen ji wî re îtiraz kir. Edîp Karahan gelek aciz bû, êrişî wî kir. Ustegmen bazda. Hewa gelek germ bû, tayê bota ustegmen vekirî bûn. Dema ku bazda, Edîp Karahanî da dû wî, ew mecbûr bû ku postala xwe bihêle bireve.

**“Ez him mehkûm im, him parêzer im, him jî wergerê gelê xwe me”:** Edîp Karahanî li dadgehê bi gelek aliyan ve mudaxeleyî dadger dikir. Gelek êşkere bû ku ew mehkûm bû. Dema ku girtiyên nezan li dadgehê xeletî dikir, wî mudaxele dikir, şaşiyên wan rast dikir. Dema ku girtiyan li dadgehê bi kurdî qise bikira û wergeran şaş wergeranda, mudaxele dikir.

Rojekê girtiyek bi kurdî bîrûrayên xwe bi kurdî diyar dike. Mubaşîrê dadgehê wek werger, wergerîyê dike. Lê ji bona ku mubaşîr baş kurdî nizane Edîp Karahan mudaxele dike û şaşiyên mubaşîr rast dike.

Qadiyê dadgehê Fîl Hemdî Sevînc jî vê yekê gelek aciz dibe, ji Edîp Karahanî re dibêje ku “tu ji her tiştêkî re mudaxele dikî. Em nizanin tu mehkûm î, tu parêzer î, yan jî wergêr î?” Edîp Karahan jî bi acizî bersîva qadî dide û dibêje, “gelo te heta niha fehm

nekiriye ku ez him mehkûm im, him parêzer û him jî wergerê gelê xwe me, gelê kurd?"

Ev gotina hanê rastiyeke gelek balkêş bû. Him wê demê, him beriya wê demê û him jî piştî wê demê, welatparêzên xwendevan bi van sê sifetan vatiniya xwe anîn cih.

### **Çûyina Wî ya bo Kurdistana Başûr : 1972**

Di dema danişîna dadgehkirinê de Edîp Karahanî ji aliyê dadgehê hat texliyekirin. Pişt re jî 8 sal cezayê giran dan wî. Ew teslîm nebû, di sala 1972 de çû li herêma otonom a Kurdistana Başûr bi akincî bû.

Li gorî ku wî ez agahdar kiribûm û li gorî agahdariyên hevalê min ê hêja Eyub Alacabeg, navê wî li Kurdistana Başûr Azad û Mam Azad bû. Di kar û barên ragihandinê/çapemenîyê de di-xebitî. Dû re li Dadgeha Çomanê ya ku serokê wê Emer Debabe bû dadgeriyê dike.

Dema ku ew li Kurdistana Başûr bû, hevjinê xwe ya duyem û zarokên xwe birin cem xwe, li wir jî keçekê wî hat dinyayê. Hezar mixabin jiyana wê dirêj nebû, wî ew keça xwe li Kurdistana başûr kire gorê.

### **Vegera Wî ya bo Kurdistana Bakur : 1974**

Edîp Karahanî piştî "efûya giştî" ya sala 1974 vegeriya Bakurê Kurdistanê û li Amedê bû rûniştvan. Dema ku herêma otonom ya Kurdistanê di encama şerê 1975 de hat hilweşandin,

ew gelek xemgîn bû û ez dikarim bibêjim ku di çend rojan de kal bû. Dîsa ez dikarim bibêjim ku di mirina wî û krîza dilê wî de bandora hilweşandina herêma otom ya Kurdistanê, qetlîama li Kurdistanê, koçberiya kurdan ya girseyî û perîşaniya wan bando-rake mezin çêkir.

Ew gelek kêfxweş û serbilind bû ku beşeke Kurdistanê azad bibû, wî ew beşa hanê dîtibû û li wir jî xebat kiribû. Ji bona vê, dema ku wî dixwest wî bîranînên xwe yên gelek balkêş yê li Başûrê Kurdistanê, bi min re parve dikir.

### **Li rojnameyeke Anqerê û Yeni Ortamê nivîsandin...**

Piştî hilweşandina îdareya herêma otonom ya Kurdistanê, Edîp Karahan çû li Anqerê di rojnameyekê de xebat kir û maqele nivîsandin. Meqaleyên wî li ser rewşa Rojilata Navîn û Îraqê bûn.

Xwediyê rojnameyê ji bona ku dostê musteşarê çandî yê Îraqê bû, Edîp Karahan mecbûr bû ku dev ji roj-nameyê berde. Lê kêfxweş bû, dema ku dev ji rojnameyê berde bi berpirsi-yarên Îraqê rûbirû bibû, bîrûrayên xwe yên tehl û tûj li rûye wan gotibûn.

Edîp Karahanî pişt re carinan di rojnameya *Yeni Ortamê* de nivîsand.

### **Edîp Karahan mirovekî bêîtaet bû...**

Edîp Karahan mirovekî bêîtaet bû. Di awayê têkoşîn û xebatê de xwediyê pêşniyarên gelek balkêş bû. Di sala 1975 de dema ku kurd bi girseyî ji qetlîama Îraqê reviyar û ber bi Tirkîyê



hatin, hukûmeta Ecevit îzin neda ku kurd bikevin nav tixûbên Tirkîyê. Wî ji xwendevanên kurd yên li Stenbolê re pêşniyar kir ku ew li ser pişt li kolana Vatanê xwe dirêj bikin û krîza trafîkê derxin û bala gel bixşînin.

Edîp Karahanî li hemberî siyaseta û mentîqa kurdan jî serî nediçemand. Ji bona vê mirov dikare bibêje ku "ew mirovekî bi tenê bû." Ew ji tenêbûnê neditirsîya. Bi xwe gelek bi bawer bû.

Ew dozkarê kurd û Kurdistanê bû. Wî her tiştekî xwe dabû doza kurd û Kurdistanê.

Wî ji malê dinyayê re eleqe nîşan nedida, îtibara malê dinyayê nedikir. Ji bona vê jî di nav dewlemendiyê de jiyaneke jar dijîya.

Ew tu dem nebû endamê partiyên îllegal yên kurd. Ew mirovekî xweser bû. Kar û xebatên xwe yê kurdîyê û Kurdistanî bi awayekî xweser dimeşand.

Amed, Gulan-Hezîran 2007

# Hapishanedeki Edip KARAHAAN

Abdurrahman Demir

12 Mart 1971 Askeri darbesi sonucunda oluşan Diyarbakır-Siirt illeri Sıkıyönetim hapishanesinin "Divan Başkanı" Edip Karahan 1930 yılında Mardin'in Derik ilçesinde doğmuş, 1976 yılında Hukuk fakültesinden mezun olmak için İstanbul'da olduğu bir dönemde ani ve talihsiz bir kalp krizi sonucunda aramızdan ayrılmıştır. Yaşamı boyunca Kürt halkının yiğit yurtseveri ve bilge kişisi olarak hep saygıyla anılmıştır. Kürt halkının anti-sömürgeci ulusal demokratik mücadelesine beyni ve yüreği ile sunduğu katkılar asla unutulmayacaktır. 46 yıllık ömrünün ilk tutukluluğu 1953 yılında yani 23 yaşında başlamıştır. Bu tutuklanma ile ilgili bilgiyi, dönemin MİT müsteşarı Korgeneral Fuat Doğu'nun 17 Haziran 1971 yılında hazırlayıp Diyarbakır-Siirt illeri Sıkıyönetim askeri mahkemesine sunduğu rapordan öğreniyoruz. Tutuklanma gerek-çesi; komünizm propagandası yapmaktadır. Edip Karahan

ikinci kez 27 yaşında, yani 1957 yılında tutuklanıyor. Bu tutuklanma ile ilgili gerekli inceleme ve araştırma da 12 Mart muhtırasından sonra DDKO davasıyla tutuklanan ve kendisiyle birlikte Diyarbakır hapishanesinde uzun dönem yatmış olan ortak dostumuz İbrahim Güçlü'nün, Edip ağabeyin yaşamı ile ilgili yazdığı kitaptan öğreniyoruz. Ve yine bu kitaptan, Kürt ayaklanmalarının bastırılmasından sonra 1957 yılına kadar Kürtçülükten tutuklanan başka bir Kürt'ün olduğuna tanık olmadığımızı öğreniyoruz. Bu tutuklanma Edip ağabeyin Forum dergisine yazdığı yazılardan dolayıdır. Edip ağabeyin bu tutuklanması, aynı zamanda 1959'daki 49 Kürt aydını ve öğrencisinin tutuklanmasının habercisi oluyor. Yani üçüncü tutuklanması 1959'da oluyor. Tarihte "49'lar Hareketi" diye anılır. Bundan sonra dördüncü tutuklanması 1963 yılında Talat Aydemir ve Fethi Gürcan olayı ile ilgili oluyor. Dicle-Fırat aylık fikir

dergisinde yazdığı yazılardan dolayı tutuklandığı bu dava, kamuoyuna "23ler DAVASI" olarak yansımıştır. Son tutuklanması 12 Mart Muhtırası-ndan dolayı 1971 yılıdır. Büyük bilge, yürekli yurtsever Edip ağabeyimizin 46 yıllık yaşamının tümünü sosyal ve siyasal kişiliğinin ayrıntılarını yazmak sorumluluğunu elbetteki ben üstlenemem. Bunu üstlenecek ne bilgi birikimim ne de hakkım var. Elbetteki bu hakkı kendisinde bulacak olan Kürt aydını ve yurtsever yoldaşları olacaktır. Bu nedenle bu kısmı onlara bira- kıp sadece 12 Mart 1971 yılında Diyarbakır hapisanesinde kendisiyle birlikte kaldığım ve de bu hapis- hanede yaşadığım birkaç anektodu yazmakla yetineceğim.

### **Divan Başkanı Edip Karahan**

Edip ağabey, Diyarbakır askeri cezaevinde bizim hapisane yönetici- mizdi. O bu yöneticiliği Divan oluşturu- rarak "Başkanlık Divanı" diye yarı resmi bir kuruluş haline getirdi.

### **Başkanlık Divanının Oluşumu**

Ceza evinin bahçesinde bir çeşme vardı bir yaz günü o çeşmeye tutuklu- lar bir hortum takıp birbirini sularken, etrafta biriken su birikintisi çevreyi çamur deryası haline getirdi. Bu duru- mu engellemek için, Edip ağabey Silvanlı Akif Işık diye bir arkadaşına "Oğlum Akif bu hortumdan sen sorumlusun, kimse senden izinsiz kullanmasın" diye bir talimat verdi.

Bu talimata Akif Işık sıkı sıkıya sarıldı. O günden sonra Akif Işık hortum bakanı oldu. Yine hapisanede herke- sin tutukluluk durumu ile ilgilenen Erganili Bekir Erbatır diye bir ağabey- imiz vardı. Bekir Erbatır "çok son- raları vefatını duydum. Çok üzüldüm dürüstlüğü timsali bir ağabeyimizdi. Allah rahmet eylesin". Her sabah üşenmeden Nizamiye kapısına kadar gider oradaki yetkiliden kimin tahliye- sinin gelip gelmediğini sorup gelirdi. Ona bu merakından dolayı da Edip ağabey, tahliye Bekir ismini taktı; daha sonra da Tahliye Bakanı olarak Divana terfi ettirdi. Yine Siverekli bir ağabey- imiz; Mustafa Düşünekli bilge tavır- ları ile biraz dikkat çekici olduğundan Edip ağabeyimizin de dikkatini çekmiş olacak ki onu aynı zamanda da siyasi idareci işler bakanı ve Divan başkan yardımcısı olarak Divan'a atadı.

(Bu ağabeyimiz Edip ağabeyin tahliyesinden sonra Divan Başkanı olarak göreve devam etti.)

Parasal sorunlarla ilgili de Cemil Fazlı diye Vanlı bir ağabeyimizi eko- nomi bakanı olarak Divana atadı. Başkanlık divanı bu şekilde oluştuktan sonra ilk icraatını mahkeme salonunda şöyle sergiledi:

Bir gün mahkeme salonunda yar- gılanma esnasında, duruşma hakimi Hamdi Sevinç; Güney illerimizden birinde belediye başkanlığı yapmış bir ağabeyimize; "Evet Sabri Bey iddiana- meyi okudunuz; bir diyeceğiniz var mı?" diye sorunca sanık durumundaki Sabri ağabeyimiz; "Efendim bana iddi- aname gelmedi, dolayısıyla neden yargılandığımı bilmiyorum" dedi.

Duruşma hakimi; "Nasıl olur

burada sana tebliğ edildiğine dair yazı var" deyince tutuklular gülüşmeye başladılar . "Sanık tekrarladı; Efendim bana iddianame gelmedi". O ara olaydan haberdar olan bir tutuklu muziplik olsun diye, "Efendim Divan başkanına sorun deyince,

"Duruşma hakimi; evet başkan; Nedir bu iddianamenin akıbeti diye sordu, Edip ağabey ayağa kalkarak uzunca bir düşündükten sonra "Evet hakim bey böyle bir iddianame geldi. Başkanlık Divanı olarak iddianameyi okuduk (Tabi bu arada Divanı tek tek takdim ederek) ancak içindeki iddiaları çok doğru bulmadığımızdan olacak ki sanığa tebliğ etmedik. Bu cevaba hakim çok kızarak "Sayın başkan, siz nasıl böyle bir karar verebilirsiniz? Siz kendinizi ne sanıyorsunuz" gibi laflarla kızgınlığını belirtince Edip ağabey gayet pişkin bir tavırla;

"Canım koskoca Divan eşekbaşı değiller ya" deyip yerine oturdu. Gülüşmeler başlayınca hakim mahkemeye uzunca bir ara verdi. Bu arada Edip ağabey bir grup tutukluyla sohbet edince biz işin aslını öğrendik. Meğer o iddianamede sanık Sabri Vesek'in Molla Mustafa Barzani'ye bir kamyon un, bir kamyon yağ, bir kamyon şeker gönderdiği yazılmış.

(Tabi bu ara şunu yazmadan geçmeyeceğim, Edip ağabeyin Sabri Vesek ile ilgili yaptığı belirlemeyi o günün yoğun ideolojik çatışmaları içinde değerlendiriyorum. Yoksa sevgili dostum ve de ağabeyim olan Sayın Sabri Vesek'in yurtsever kişiliğine ve bu konudaki özverisine hep saygı duymuşumdur) Neyse biz yine Edip ağabeye dönelim. Edip ağabey o gün

sesiyle başladı anlatmaya kimse değil Sabri Vesek, Barzani'ye un şeker gönderecek. Bu mümkün mü? Sabri Vesek bu kadar namuslu mu? Celal Talabani gibi birine olsa belki derim Ama Barzani'ye asla. Yeri gelmişken şunu da belirtiyim. Edip ağabey ile ilgili bu anektodu 1977 Nevrozunda tiyatro olarak yazıp sahneye koyduk. Sahnede Edip ağabey rolünü Fevzi Yaşar diye bir arkadaşımız oynadığından uzun dönem Fevziye Edip ağabey diye hitap edildi.

Yine bir gün yargılanma esnasında Canip Yıldırım ağabeyimizin Avukatı rahmetli Edip Alınakar savunmasında "Benim müvekkilim, Canip Yıldırım, insancıl düşünen.hayatında bir karıncayı bile ezmek için çok şeyler feda edecek kadar duygu yüklü hümanist biridir. Onun komünizm, faşizm gibi totaliter rejimlerle asla alakası olamaz" dedi. Bunu üzerine Edip ağabey başladı söylenmeye "Be birader tam 30 yıldır ben Canip Yıldırım'ın komünist olmadığını, ancak iyi bir hümanist olduğunu söylüyordum, kimseye inandırmıyordum. Nihayet avukatı da beni doğruladı" deyince tutuklulardan kahkaha tufanı yükselmeye başladı. Çünkü o zaman Kürt aydınları arasında komünist olmamak suçlanıp horlanmasına yeterli bir nedendi. Tabi Canip ağabeydeki geniş hoşgörü ve büyük olgunluk, olayın büyüüp olumsuz bir mecraa akma-sına engel oldu.

Edip ağabeyin bir özelliği de uyurken çok fazla horlamasıydı. Hapishane iki büyük koğuştan ibaretti. Her koğuştan 100 civarında tutuklu kalıyordu. Edip ağabey bazen öyle acayip horlardı ki, iki koğuştan kalan

tutuklular uyuma güçlüğü çekebiliyorlardı. Kendisinin kaldığı koğuştan bir gece yine onun tabiriyle horlamanın dozu artmıştı. O gece benim yattığım ranzaya Mehmet Emin Bozaslan, rahmetli Mustafa Ramanlı, Dr. Ahmet Melik ve Feridun Yazar geldiler. Mustafa Ramanlı bana dönüp dedi ki; "Abdurrahmancığım, Edip ağabeyi ancak sen uyandırabilirsin. Biraz uyandır biz uykuya geçelim daha sonra horlasa da önemli değil" dedi.

Tabi Edip ağabeyi uykusundan uyandırmak her babayiğidin harcı değildi. Benim ayrıcalığım da hapishanenin en küçük tutuklusu olmamdan kaynaklanıyordu. O tarihte 16 yaşındaydım. Mustafa Ramanlı'nın ricası üzerine gidip Edip ağabeyi dürterek uyandırdım.

Uyandırırken de "Uyan be ne milleti rahatsız ediyorsun" dedim. Aniden uyanıp hırsıyla dönüp baktı ki benim; "Ulan fırlama sen olmayacaktın" dedi ve uyumaya devam etti. Sabah içti madan sonra beni yanına çağırdı. Ben de koşarak yanına gittim; "Buyrun sayın başkanım" dedim.

"Otur bakalım" dedi. Ben de yanına oturup büyük bir saygıyla onu dinlemeye başladım. "Bak beni iyice dinle, ben biliyorum seni kimlerin gönderdiğini, o Mehmet Emin Bozaslan mı?

Boz kaplan mı Feridun Yazar mı? Bozar mı? Mustafa Ramanlı mı? Kamanlı mı? Neyse onlar gönderiyor" dedi. Ben önce inkar ettiysem de o devam etti. "Bak bu akşam seni yine gönderecekler çünkü Edip Ağbeyin horlamanın dozunu artıracak, tabi sen bir şartla geleceksin

Ramanlı Mustafa Dunhul (Danil) tek başına içeriyor. 2 paket rüşvet isteye-

ceksin. Biri sana, biri bana oldu mu" diye talimatı alınca "tamam abi" dedim. Ve o gece gerçekten de horlamanın dozu o kadar arttı ki diğer koğuştan arkadaşlar dahi uyuyamadı.

Edip ağabeyin dediği gibi aynı ekip yine bana geldi. Ben de Mustafa Ramanlı'dan iki paket isteyince Ramanlı; "Tamam da niye bir değil de iki paket" dedi. Ben de; "Birini de ona vereceğim" deyince tutuklular bastılar kakhahayı. Neyse sonuçta Mustafa bey 2 paket getirdi. Ben de Edip ağabeyi uyandırmaya gittim. Karın boşluğunu dürtür dürtmez döndü bana; "Sigaralar tamam mı" diye sordu. Ben de; "Tamamdır ağabey" deyince "Horlama bitmiştir" dedi ve uyumaya devam etti. Sonraki geceler Mustafa bey artık bir şey demeden 2 paket sigarayı ranzanın üstüne atınca ben anlıyordum ki Edip ağabeyin uyandırılması gerekiyor.

Edip ağabeyin bir başka özelliği de, hapishanede tek başına gününün belli bir saatinde volta atmasıydı. Volta esnasında eğer keyfi yerindeyse, mutlaka Nazım Hikmet'in

"Yirminci asrın başında, adamın başını bir şalgam gibi koparmıyorlar sevgilim" dizeleri ile başlayan şiirini okurdu. Eğer canı bir şeylere sıkınsa "Derdim çoktur hangisine yanayım. Yine tazelandı yürek yaresi" türküsünü okurdu. Edip ağabey için yazılacak çok şeylerin olduğuna hiç kuşku olmadığı gibi, onun sevgili dostlarının da bu görevi yerine getireceklerinden de kuşku yoktur.

Sonuç olarak Kürt halkı bu yiğit evladını çok genç yaşta kaybettiği için;

"Başı sağolsun" ve unutulmasın ki bu yiğit yurtsever, bilge kişi bir önder olarak hep saygıyla anılacaktır.

# Kesayetîyeke Îdealîst û Rêxistinkar, Şoreşgerekî Çalak: Dr. Fuad (1887-1925)

Seîd VEROJ

*"Ji wê rabe here bêje Fuad beg;  
Şi kurmanca ra rêzanî tu bê şek.  
Qelem fêde dike îro tu rabe;  
Xewa şîrîn ji bo me pir ezab e."*

*Cîgerxwîn*

Dr. Fuad bi eslê xwe ji Çermûga Diyarbekirê ye û ji mala Hecîqadîran kurê Hecî Îbrahîm Efendî ye ku li Diyarbekirê berniyas bû. Xwendina xwe ya seretayî li Diyarbekirê dest pê idke, paşê jî li Stenbolê û piştî wê jî diçe Parîsê dixwîne û dibe doktor vedigere tê li Diyarbekirê bijîşkîyê dike. Doktor li ser pişeya xwe zor zana bû. Ji aliyê malbatî ve rewşa wan a aboriyê baş bû, wî gelek caran ji nexweşên xwe pere nedigirt û belê derman dida feqîr û xizanan. Ji ber vê yekê di dilê xelkê de text danîbû, ji aliyê xelkê ve gelek dihat heskirin.

Ew ji berê de bi rewşa gel re mijûl dibû û kar dikir ku wan hişyar bike, da ku xwe ji bin zîlm û dîlketinê rizgar



**Dr. FUAD**

bikin. Bo vê jî têkoşîneka dijwar û bi rêxistinî pêdivî bû. Bêşik ew bîrewerîya pê re çêbûyî, çareserkirina pirs-girêkên civakî û netewî ji rêxistinbûnê cuda neditît. Ji bo vê yekê digel hinek

hevalên xwe, di sala 1919 de şaxê Diyarbekirê yê Komela Tealî ya Kurdistanê birêxistin dikin. Qedri Cemîl Paşa di pirtûka xwe *Doza Kurdistanê* de wê pêvajoyê weha diyar dike:

"**Komela Tealî ya Kurdistan** di demekê kurt de li gelek deveran liqên xwe vekirin. Bi tenê li Diyarbekirê bi hezaran kes bûbû endamê Komelê. Di wê demê de Ganîzade Doktor Cewded Begê ku ji Stenbolê hatibû Diyarbekirê beşdarî vê Komelê bûbû. Doktor Fuad Beg jî endamê Komelê bû. Ji bo ji van kesên behremend û xwedan ezmûn mifayê werbigrin desteya rêveberiyê xwe ji kar kişand."

Piştî xwe hilkişandina rêvebirya berê, desteyek nû ya rêvebirinê tête dirustkirin, Dr. Fuad dibe yek ji endamên vê desteyê û digel hevalên xwe dest bi xebat û rêxistinê dikin. Qedri Cemîl Paşayê ku yek ji endamên wê desteyê bû dibêje:

"Li ser pirsê netewî me li gel Doktor Fuad, Bavê Tûjo, Cereîzade Fîkrî, Elî Lîcîyî civînek kir, me biryar da ji bo em rewşa Mehmed Berzencî fêr bibin û peywendiyekî li gel rêxistinê wî daynin, ji ber vê çendê jî pêdivî bi çûna Silêmanî hebû. Ji bo vî karî me di nav xwe de qura çêkir, kar kete ser milê Bavê Tûjo. Bavê Tûjo di nav çend rojan de bi rêka Rumanê gehiştê Mûsilê, lê di wê demê de îngilîzan li beramberî Mehmed Berzencî ketibûne bizavê û rê nedane Bavê Tûjo biçe Silêmanî û Bavê Tûjo girtin dan destê tirkan. Bavê Tûjo şandin Enqerê da ku dadgeha wî bikin, demekê li zindana Enqerê ma û paşê berdan û careka din vegeriya Diyarbekir."<sup>1</sup>

Piştî ku Komela Tealî ya Kurdistan parçe dibe û Serhildan Qoçgiriyê têk diçe, di nav grûbên rewşenbîr û rêxistinên kurdan de fikra yekbûn û rêxistineka nuh dertê holê. Di vê çarçovê de bi pêşengî û serokatiya Xalid Begê Cibrî û hevalên wî, bi navê **Komîta Îstiqlala Kurdistanê** rêxistineka nuh di şiklê bereya netewî de tête damezrandin, ku ji çendek grûban pêk hatibû. Bi vê awayê gelek rewşenbîr û grûbên siyasî yên kurd li dora Mîralay Xalid Begê Cibrî berhev bûbûn. Navê kurt ê vê rixistinê **Azadî** bû. Di bin rêvebiriya **Azadîyê** de

"şoreşger û rewşenbîrên kurd ji bo azadiya Kurdistanê kar dikirin da ku bikaribin karê şer rêk bixin. Ji efserên kurd Îhsan Nûrî yê Bidlîsî, Mulazim Îsmail Heqî Şaweysê Silêmanî, Xurşîdê Hertûşî endamên girîng yên vê rêxistinê bûn. Mulazim Îsmail Heqî Şaweysê Silêmanî li ser fermana ku ji navenda rêxistinê ya li Erziromê ye wergirtiye da ku li deverên din yên Kurdistanê karê rêxistinê pêk bihîne hatibû Diyarbekir. Bi beşdariya min, Cemîl Paşazade Qasim Beg, Dr. Fuad, parêzer Mihemed Efendî (Bavê Tûjo) ango Hecî Axtiyê navdar, Ekrem Cemîl û hindek hevalên din ve me tayekî (şaxek) vê rêxistinê li Diyarbekir vekir. Peywendiya tayê me û ya navenda Erziromê bi kodan (şîfre) li ser rêka serokê tayê Darahênê, Tayîb Elî yê fidekar ve çêdibû."<sup>2</sup>

Dr. Fuad mesûlê komîteya bajêrê Diyarbekirê bû. Her weha propagandîst û rêxistinkarekî jêhatî bû. Wî rêxistinê

<sup>1</sup> Qedri Cemîl Paşa, *Doza Kurdistan*, r. 58

<sup>2</sup> Qedri Cemîl Paşa, *Doza Kurdistan*, r. 78

nava bajêr û agadarî û peywendiya bi derva re pêk dianî. Her wiha, Dr. Fuadî bi kurdên başûr (Mûsil, Silêmaniye) û yên Binxetê re ji di nav têkiliyê de ye û berdewamî ji hev agadarî werdigrin. Ji vê yekê jî derdikeve holê ku Komîta Îstiqlala Kurdistanê, rêxistin û tekoşîna xwe li tevayî Kurdistanê dikir.

Dr. Fuad di nav vê xebat û tekoşînê de, rêxistinkarekî rewşenbîr û şoreşgerê netewî yê çalak bû. "Dr. Fuad kurdperwer û pêşengê doza kurd e, ji bo pêkanîna vê yekê amade ye her fedekariyê bike." Beriya ku serhildan dest pê bike dixwaze bi navê *Mezopotamyayê* rojnameyek derbixe. Wî "hemû jiyana xwe, zîrekî û ramana xwe bo çêkirina Kurdistaneke serbixwe serf kiriye." Wî dixwest bi her liv û tevger û helwêsta xwe ji gelê xwe ra bibe mînak û hişyariya netewî pê re peyda bike. Wek mînak, di wan deman de grûba endamên Komîta Îstiqlal wek helwêsteke netewî, ji bo propaganda û moraldayîna gel, cilûbergên kurdîherêmî li xwe dikir û bi vî awayî li nava sûka Diyarbekirê digeryan.

Ji gotar û gazindên kadroyên wê demê diyar e ku di têkiliyên navend û liqan de lawazî û alozî hebûye. Ekrem Cemîl Paşa vê yekê weha tîne ziman "Liqên Azadiyê yê girîng bi raya min yê Diyarbekirê bû. Serokên me li Eziromê serhildanek amade dikir. Lê mixabin me ji çî tiştekî agahdar nekirin. Çî tiştek di derbarî xeta bizavê de nîşan nedan. Ji me çî xizmet û karek nexwestin".<sup>3</sup>

"Di roja 8ê Sibata 1925ê de, demê pêzanîna kuştina leşkerên baregeha tirk yê Pîranê belav bû û me bihîst,

em wek endamên tayê Diyarbekirê ya rêxistina Azadî, tenegehiştin ev ji bo çî û bi çî armancê hatiye kirin. Ji ber ku serokê Azadî Xalid Begê Cibrî û endamên wê yên bi karîger girtibûn û hêj damezrandina rêxistinê nehatibû tamamkirin, me hizir nedikir ku ev bizav bi biryara rêxistinê ve hatiye kirin. Em di nav matmayîn û dudiliyekê de bûn. Ji bo em rastiya vê bûyerê fêr bibin, me mirovek şande cihê bûyerê, lê demê em hêviya hatina wî mirovê bûn ez û çend hevalên bi kurdîniya xwe ve berniyasin hatine girtin. Em di bin siriyêke leşkeran de, li zindana adliyê hatin hepiskirin. Hêrîş û teqînên ku li ser navenda Diyarbekirê çêdibûn, hevalên neteweperwer di zindanê de li ser wan şîroveyên cûrbicûr dikirin û bi mîraqekî li benda encamê bûn. Ev rewş bi qasî bîst rojan berdewam kir û heta ji Edenê firqa leşkerî hat û hêrîş bire ser şervanên ku Diyarbekir dorpêç kirine, hingê rewşa vî karî hate guhertin. Êdî me di zindanê de dengê çekan nedibihîst. Piştî ku ev bizave hate tepeserkerin me hinde jî hêvî nedikir ku dê karekî hovane û dirinde bihête kirin. Pêkhatên ku hindek fermandarên bêwijdan kirin, ne di demê Hulago û ne jî demê Nêron de hatine dîtin".<sup>4</sup>

Piştî ku serhildan şikest, Mehkema Îstiqlalê ya Şerqê li Diyarbekirê hate damezrandin, Dr. Fuad bi xwe jî wekî gelek şoreşger û rewşenbîrên kurd tête destgîrkin. Di destpêkê de dosyaya Dr. Fuad û Şêx Eyubê Sêwregî vekirin. Ji xwe Dr. Fuad, ji berê ve bi îddiaya xebata Kurdistanê serbixwe hatibû girtin û sucdarkirin, di mehkema êşkerî

<sup>3</sup> Ekrem Cemîl Paşa, *Kurtejiyana Min*, r. 44

<sup>4</sup> Qedri Cemil Paşa, *Doz Kurdistan*, r. 84



de doza wî dewam dikir. Dr. Fuad, di xebata binerdî (îlegal) de pîrr hasas û ketûm bû. Ji ber vê yekê di derheqê endametiya wî ya rêxistinê de, li ber destê mehkemê îsbatên şênber pîrr kêmbûn. Dadgeha Îstîqlalê ji bo cezakirina wî çî delîlek cidî peyda nekiribû. Hinek tiştên ku di çarçoveya huqûqê de nabin delîl, wek delîl dîrxistibûn pêş. Di rewşên wiha de çekirina sedeman û lihevanîna derewan ne zahmet e. Her wekî ku bi ser Hesên Xeyrî yê Dêrsimî ve hat, ew jî bi hinek îddîayên pîrr sivik û basîd sûcdar kirin: ku dibêjin “di dema serhildana Şêx Seîd de, tu bi cil û bergên netewî yên kurd di nav sûka Diyarbekirê de geryayî”; ya din, wî di lêpîrsîna xwe de gotibû ez Zaza me, ev gotin jî bo sêdaredana wî wek tewaneke (sûc) din hate pesendkirin; her weha, ew nameya ku Dr. Fuad ji bo merivekî xwe yê bi navê Ferîd Paşa ku li Stenbolê dijiya nivisandibû, ji aliyê mehkemê ve wek belgeyê têkiliya wî û Tевгера 1925an tete nîşandan, û dibe sedemê darvekirina wî. Di wê nameyê de derbarê rewşa herêmê û tevgera kurd de weha tete gotin:

“Şaxê Mûsil û Bexda yê Komîta Îstîqlala Kurd, ev çend meh e ku faaliyeteka cidî dimeşîne. Bi emr û nîşandana vê komîteyê, Şêxê Xînûsê Şêx Seîd Efendî dest bi serhildanê kiriye û hatiye ghiştiye Licê û Hêneyê. Vê gavê li bakûrê Diyarbekir û 8-9 seat li dûrê bajêr şer çêdibe. Xwedê dawîya wê xêr bike. Komîta Helebê jî bo heman armancê amadekariya xwe ya bo serhildana gelê kurd tewaw kiriye. Mûş û hawîrdora wî ketine destê hêzên eşîretan. Di dawiyê de dikarim vê bêjim, armanca fikra

Kurdistanê, hukûmetê mecbur kiriye ku bi ciddî li ser vê yekê bifikre. Em binêrin ka dê çî bibe?

Ez bi xwe, piştî dîtîna û bihûrandina rojên derbeder, li benda demê me.”<sup>5</sup>

Ew dem hat, di encama mehkemekirinê de yekemîn ceza darvekirinê bo Dr. Fuad û Şêx Eyubê Sêwregî tete birrîn.

“Vê biryarê, kenê rûyê kesayeta îdealîst, neteweperwerê kurd Doktor Fuad têk nekiribû. Bi helwesta xwe ve jî nîşan dida ku ew çî girîngiyê nade biryara sêdaredanê. Piştî biryara sêdaredanê, ji bo bi zêdeyî êşê bidin mehkûm sê rojan didane rawestandîna û paşan ev biryarê pêk dihanîn. Lê qaşo zeman didan ku ji bo ev biryar ji layê dozger ve bihête temyîzkirin. Lê dozger çî biryareka dadgehê temyîz nekiribû. Li gor gotina rêveberê zindanê Ezîz Efendî, doktorê me Fuad di nav van sê rojan de çî xemgîniyek nîşan nedaye, li ser xwe bûye û ji rêveber daxwaz kiriye ku li jûra rêveber bi xêzana xwe re tenê bimîne û di her sê rojan de jî bêyî ku avê bikarbihîne li gor pêdiviyên ayînî xwe paqij kiriye. Piştî biryara sêdaredanê ji bilî kurdan, kîjan takekesê gelê din dikare hinde li ser xwe be. Ji berhema vê peywendiyê zarokek kurî ji dayika xwe bû û navê bavê wî Mihemed Fuad lê kirin.”<sup>6</sup>

Dr. Fuad, di 17ê Nîsana 1925an de, roja îne di şefeqa sipê de wek yekemîn kadroyê Tевгера 1925an digel Şêx Eyub li meydana nizîkê deriyê Serayê tene darvekirin. Dema ku ew şoreşgerê netewî yê kurd dibin ber dara sêpiyê, ew serê xwe bilind dike û berê xwe dide bêdengiya beden û kolanên Diyarbekirê

<sup>5</sup> Uğur Mumcu, *Kürt- İslam Ayaklanması/Serhildana kurd-îslamî, têbînî* (239), r. 221

<sup>6</sup> Qedîr Cemîl Paşa, *Doz Kurdistan*, r. 85

û wê gavê ji me ra wisa tarîf dike:

*"Şevêk tarî ya hebû ya tune bû nîv;  
Deşt di xew da çiya digrî, ne hilate hîv"*

Û pişt re bersîva celadên xwe dide, dibêje:

*"Ji bo welatê xwe bi mêranî mirin,  
her gav di bîra min de bû. Ev axa ku  
îro em li ser têne darvekirin, bêguman  
dê rojekî alaya serxwebûnê li  
ser bête hilkişandin."*

Bila ruhê wî şad be.

Dr. Fuadî di dilê gelê kurd de text danîbû. Ew dilîniya wî ya hemberê gel, heman demî dilxwaziyeke bo wî çêkiribû di nav gel de. Lewma li pey darvekirina wî xelkê Diyarbekirê kila-man li ser wî dibêjin. "Li gorî ku Faruk Hatipoğlu ji devê Şevket Beysanoğlu dibêje, kilamek weha li ser wî hatiye gotin: *"Şûşeyên wî li her derê dibeiriqin / Bêje lo dîktoro, bêje lo Fuado! / Diyarbekir bo te digirî / Bêje lo dîktoro, bêje lo Fuado!"*

Piştî têkçûna Tevgera 1925an û darvekirina Dr. Fuad, ji aliyê dewleta komarê ve paşnavê "Erkmen" li malbata wan tete danîn. Lê pişt re ev paşnav ji aliyê kurê wî ve weke heqaret tete qebûl kirin û ji ber vê yekê tete guherîn. "Sê zarokên Dr. Fuad çêbûne; keçek û lawek ji jina pêşîn in û lawek jî ji jina duyemîn e. Kurê wî Muzafer ku ji jina pêşîn çêbûbû, ji bo bi bîranîn û bîrxistina neheqiya li bavê wî bûye, paşnavê xwe diguherîne dike "Öldürülenoğlu/ Kurêkuştî".

Muzafer ji Şaredariya Kadikoya Stenbolê teqawût dibe û di sala 1978ê de diçe rehmetê. Qîza wî Dicle Oldurulenoglu di Lîseyê Anatolya ya Kadikoyê de mamostaya zimanê îngilîzî ye. Kurê piçûk ê Dr. Fuad, Mehmed Fuad Erkmen jî, di sala 1949 de Koleja Huqûqê ya Stenbolê xelas dike û bo demeke kurt li Nîgdeyê dozgeriyê (savcı) dike û pişt re dev jê berdidê, dest bi abukatiyê dike. Ew ji sala 1955an vir ve li Îzmîrê abukatiyê dike."<sup>8</sup>

Îro jî li ser armañ û naveroka Tevgera 1925an gengeşî berdewam dikin. Di serî de berdevk û pêgirtiyên îdeolojiya fermî ya Dewleta Komarê, rayedarên wê demê yên Dewleta Sovyetê, gelek grûbên çepgir yên tirk û hinek kesayet û grûbên kurd jî dixwazin Tevgera 1925an û pêşengên wê, wekî hewldana oldar û kevneperestên li dijrabêrê Komara Tirkîyê û îradeya tevgerê jî wek halandan û tevdana hêzên emperyal yên derve nîşan bidin. Di vê çarçoveyê de, Kemaliyan bi hênceta Tevgera 1925an, Qanûna Teqrîrî Sukûn derxistine û xwestine bi vê yekê hem serê daxwazên meşrûyî yên gelê kurd bigre û hem jî oposiyona (muhafefta) nava xwe pêş kirin.

Rêvebirên Dewleta Sovyetê (Bolşewîk) jî, bi derewên mezin ên bê binyad Tevgera Rizgariya Kurd a 1925an, bi egera havkariya bi hêzên emperyal re, taybetî jî bi yê îngilîz û fransîzan re sûcdar dikin û miqabilê wê, piştgiriya kemaliyan dikin. Hukûmeta Kemalî, wek tevgerê "netewî û şoreşger" dibînin. Gotar û nivîsên ku di rojname-

<sup>7</sup> Naci Kutlay, *Bîranînên Min*, weş. Avesta, 1998, r. 171

<sup>8</sup> Uğur Mumcu, *Kürt- İslam Ayaklanması/ Serhildana kurd-îslamî, tîbînî (4)*, r. 222

yên tirk de darbarê Tevgera 1925an de têne belavkirin, pesend dikin û piştgirî didine wan. Raskolinîkof di nivîseka xwe ya di rojnameya *Pravdayê* (Moskova, 26.02.1925) de weha dibêje:

“Rojnameyên tirk ku dibêjin ev tevger bi piştgirî û halandana îngilîzan ve ji layê fêodal û muslumanên fanatîk ve hatiye rêxistinkirin rast e. Îngilîz bi tûrik û çewalî pare û destek didine wan... Dewleta nû ya Tirkîyê, berhema tevgereke rizgarî-xwaz e. Ev serhildan jî ji layê hêzên emperyal yê Îngilîz ve li herêmên Rojhelata Tirkîyê hatiye destpêkirin. Ji ber vê yekê, çîna karkerên dinyayê rêz li vê tekoşîna dewleta Anqerê digere, dê bi şûr û agir li hemberî emperyalîzma zordar ya dinyayê, piştgirî bide Şoreşa Netewî ya Tirkîyê.”<sup>9</sup>

Demegog û şarlantanên Bolşewîkan û dagirkeran di derbarê tevgera kurd de ji bo xapandina raya giştî ya دنیا û navxwe, çî derewan li hev tînin bila bînin, çî dibêjin bila bêjin, “roj bi bêjîngê nayê veşartin”. Agadartî û belgeyên berdest, gotar û daxuyanîyên wan ên bê bingeher derewîn derdixin. Heta rêvebirên wan bi xwe jî, ji aliyekî ve mecbur mane ku rastîyê mikur bibin. Mehkema Îstiqlalê ya Şerqê, di dawîya mehkemekirina rêvebir û beşdarvanên Tevgera 1925an de, digîje wê encamê ku armanca Tevgera 1925an damezirandina “dewletek serbixwe ya Kurdistanê” ye. Piştî 63 salan, serokwezîrê wê demê Îsmet İnönü jî, li ser naveroka tevgera 1925an di biranînên xwe yê ku di sala 1987an de çap bûne weha dibêje:

“Ez di vê baweriyê de me, dema ku

em sedemên serhildana Şêx Seîd dinirxînin divê baş bala xwe bidinê. Her hal divê em vê wek tevgereka netewî qebûl bikin.”<sup>10</sup> Her weha Îsmet Paşa di heman pirtûka xwe de, di derbarê Tevgera 1925an û têkiliya wî ya bi dewletên bîyanî re û bi taybetî jî bi dewleta îngilîz re weha dibêje: “Di van hemûyan û serhildana Şêx Seîd de tesîrê propagandaya ku bi salan e li welêt tete kirin hatiye dîtin. Tu delîlekî nehatiye dîtin ku serhildana Şêx Seîd rasterast ji aliyê îngilîzan ve hatiye sazîkirin yan jî piştgirî jê re hatiye dayin.”

Tevgera 1925an ji aliyê îdeologên Dewleta Tirkîyê û hevkar û hevpeymanên wan ve bi çî navî tete navkirin bila bête, di pişt wê de rêxistina Azadî (Komîta Îstiqlala Kurdistanê) û rêvebir û endamên wê yê şoreşger û fedekar hebûn. Di dawîya darezandina şiklî ya “Mehkemeyên Îstiqlalê yê Şerqê” de jî serhildan û hereketa 1925an bi vî awayê tete tarîfkirin:

“Serhildana li Şerqê; hem ji aliyê nasname û naveroka xwe, hem jî ji aliyê armanc û ruhiyeta rêxistinkaran ve, bêguman tevgerekî netewî ye û ji xeynî damezirandina dewlet û hukûmeteke kurdî tu aramaca wê nîn e.”

Belê Dr. Fuad jî şoreşgerekî çalak ê vê rêxistinê bû.

#### Çavkanî:

- Ekrem Cemil Paşa, *Kurtejiyana Min*
- Zinar Silopî, *Doza Kurdistan*.
- Uğur Mumcu, *Kürt İslam Ayaklanması...*
- Şevket Beysanoğlu, *Diyarbakır Tarihi*, cild: 3
- İsmet İnönü, *Hatıralar*, 2. kitap
- Naci Kutlay, *Biraninên Min*
- *Belgelerle Şêx Said Hareketi*, Bolşevîkler ve Kemalistlerin suç ortaklığı

<sup>9</sup> Binêr: *Belgelerle Şêx Said Hareketi*, Bolşevîkler ve Kemalistlerin suç ortaklığı, www.newroz.com

<sup>10</sup> İsmet İnönü, *Hatıralar* 2. kitap, Bilgi yay. Ankara 1987, s. 200

# Hecî Musa Begê Xwêytî û Seîdê Nuh Begî

Şakir Epozdemir

Hecî Musa Beg bi azatîya mureh-  
hes a Kongreya Erzirom û Sêwasê  
navdar e. Mistefa Kemal di van her du  
civînên dîrokî da Mîrê Motkan  
xwend, lê ne wî û ne şêx û axa û  
pêşkêşên din îtimada xwe bi paşayê  
Osmanî neanîn û bêşdarî van kongran  
nebûn.

Di zevtkirina Bedlîsê da Hecî  
Musa Beg serdarê giştî yê Hêza  
Milîsên Çekdar ên Kurd bû. Çi eşîr û  
şêx û malbatên şerê Uris dikiran bi vê  
serdarîyê va girêdayî bûn.

Hecî Musa Beg, bi revandina  
Guloya Babfile jî meşhur e û ev mese-  
la dilan wê demê ji çeteyên ermenan  
ra bû malzemeyeke sîyasî û dewletên  
mezin wek Înglîstanê midaxela vê  
bûyerê kirin. Siltan Hemîd mîrê kur-  
dan sirgun kir şand Erebaştanê û li  
Medîna Minawer midetek dirêj binecî  
bû. Belkû Hecîtiya Mîr ji vira dest pê  
dike.

Dostekî min ji Mala Cango, ji  
Tetwanê ku navê wî Minîr e û camê-  
rek qenc e, çend car behsa Hecî Musa  
Begî û hecîyên mamanan xwe kir.  
Min xwest ku kekê Minîr melûmatên  
Begê Xwêytê bêje min û ez binivîsîn-  
im. Eva gotinên kekê Minîr in:

"Ji malbata me, di wan salên ku  
Musa Beg li Erebaştanê sirgûn e, 4  
kes diçine hecê. Di berîya çûnê da  
irtibatêk bi mîr ra girê dane. Mîr  
gotîye 'ku Mala Cango hatin bila  
tişteki wisa bo min binin ku bîhna  
welat jê bê, van hecîyan ku Brahîm,  
Ereb, Nuredîn û Hesen Xan bûn, di-  
din aqilê xwe û tesbît dikin ku bîhna  
welat ji pûşîyê daran tê. Qederêk pû-  
şî dibin û diçin zîyareta dostê xwe.  
Musa Beg pir kêfxweş dibe û Cango-  
yîyan pîroz dike, ji ber teşxîsa wan a  
pûşî ku bi rastî bîhna welat jê tê."

Tiştê ku kek Minîr go û balkêş ev

e, ku Hecî Musa Beg ji alê aborîyê va di rewşeke gelek xweş da bûye. Pirsîne ka hikûmeta vê seltenetê çî ye. Musa beg dibê, rojekê yekê ereb hat cem min û gote min "Tu dikarî mêrxasîyek bikî, bi min ra bêyî derekê ku rîya mirinê bî û nepirsî ka mesele çî ye?" Musa Beg xwe dide ber, evê ereb çek û sîleh û hespên rehwan tînê, her du mêrxas bi tik û tînê siwar dibin, ji bajêr dertên û dikevin çolê, qederek diçin rastî posteya ku pereyên hikûmetê neqil dike, tî. Ew û heresan şer dikin, hemî mihafizan dikujin hevalê Hecî Musa Beg jî tê kuştin û poste dimînê jê tenê ra.

Ew jî wî pereyî tînê dike 3 beş, beşek dide walî, yek dide qazî û yek jî ji xwe ra hiltînê."

Ev çîroka 4 hecîyên Êza Tetwan, hecîyên Mala Cango û Begê Zirav e.

Kemal Paşa di sala 1916 da diçe Bedlîsê, Hecî Musa Beg û birayê wî Nuh Beg û zavayê wan yê qeymeqamê Motkan tîne zîyareta wî. Mistefa Kemal gelek bi himet û rûmet û stayîş van begzadan tîne zimân. Nuh Beg dixwazê canîyekî hespê bo paşa hedîye bike, lê paşa bi nezaket xelata Nuh Begî red dike. Nuh Beg dibêjê Kemal Paşa "Me divê hûn li Xerzan malbat û eşîra me cî û war bikin, cîyê me teng e." Paşa jî ji qeymeqamê Zoqê ra tewsiyenameyek dinîvîsîne. Piştî ku ji Sêrtê dadigere Zoqê, dîsa li Zoqê Musa Beg û Nuh Begî dibînin, 50 banqinot pere dide Musa Begî û dibê, "Ji îro pê da her heyv wê tu vî meaşî ji dewletê bistînî." (Mêze bikin, *Xatiratên Mistefa Kemal yên Rojanê*.)

Hecî Musa Beg ku bi wan serok-

hozên berîya 4 salan, ewên ku şerê uris kirin û di cebhê wî da cî girtin, wek Hezret, Simailê Mamê, Seyîdê Şêx Tahîr, Cemilê Çeto, Şêx Sadedîn û giregirên herêma xwe (ku ji terefê Kemal Paşa va hinêk ji van hatibûn xwendin) bibira Erzirom û Sêwasê, li ser navê kurdan giraniya xwe nîşan bida, belkî qedera me rengêk din bista.

Kurê Xalid Begê Cibrî Mehmed Beg di sala 1969 da li Tetwan li Mala Feqî Huseyn rastî min hat. Mehmed Beg wek prensek bû. Aqilmend, alîcenab û siyasetmedarek heja bû. Ji ber ku ez wan rojan ji Hepsa Antalya hatibûm berdan gelek nêzikayî nîşanî min da. Musa Beg, Nuh Beg, Kor Huseyn Paşa û ew bi xwe jî daxil, ji terefê dewleta Kemal Paşa va sirgûnê Qeyserîyê bibûn. Wî dîgo, "Di nava wan beg û paşa û axalera da tenê Nuh Begî mesela millî ya kurdan dîzanîya. Haya wanên din ji mesela kurdan tunebû."

Di saya serê Îhsan Nurî Paşa efûya kurdan di sala 1928 da derket, Musa Beg, Nuh Beg û Husên Paşa newêrîyan dagerîyana Serhedê, binxet bûn, çûn Surî. Li Surî Hecî Musa Beg bi nexweşîya qolerayê ket û çû rehma Xwedê, li Şamê hat veşartin, Husên Paşa, Nuh Beg û kurê Hecî Musa Beg Medenî ku li Medîna Minawer hatibû dinê, ji Surî derbazî Berzan dibin, diçin cem Şêx Ehmed Barzanî. Nuh Beg biraziyê xwe Medenî îqna dike ku di rê da Huseyn Paşa bikujê. Medenî bi gotina apê xwe dike, lê apê wî jî tê cezakin. Nuh Beg û bi hevalên xwe va ji vê dinyayê bar dikin.

Seîd Beg kurê Nuh Begî bû. Li

Tetwanê di Îşletmê da karker bû. Zilamekî bejindirêj, bedew û cindî bû. Gelek bi ber xwe diketa, bi fotêr û qrewat û berçavkê xwe wek prensa bû. Seîd ji azayê PDKT yê Tetwan Koma Cî bû. Di sala 1990 da li Tetwanê wefat kir. Babê Dr. Mirad e. Dr. Mirad niha li Bursayê ye. Mala Mîrza Beg jî niha belawela bûne.

Seîd jî wek hemî kurdan ji begîti û esilmendîyê ketîbû. Cumhurîyetê wî kiribû Seîd Sayilgan. Komara bê esl û estar pêşnavên tirkî dabûne kurdan ku wan bipişêfin. Wextê mezinê miletek bê esl û estar bin, hemî kesî jî kok û malbatên wan dîr dîkin. Bêeslî li bêbaban dixwe.

Kurê Mîrê Kurd bibû mozîkê kurapê xwe Medenî. Medenî dîya wî mar kiribû. Ne xelet bim Seîd xwarziyê Cewher Axayê Ertoşî bû. Ebubekirê Cewher Axa xalê wî bû.

Mamê wî Medenî Beg ji Seîd ra yeka laz anîbû. Ev xanima laz çend keç û Dr. Mirad da Seîd. Jineke şîrhelal û fidekar bû. Hemû zarokên xwe da xwendin û universîtan bi wan da qedandin. Lê Seîd dixwesta bi kurdek ra bizewicê. Di paşîya emrê xwe da ji Deşta Mûşê bi keçeka kurd ra daweta xwe kir û piştî midetekê mir.

Seîd Sayilgan di Îşletmê da, li ser Ferîbota Wanê dixebitî û kurdîti dikira. Wî sirgunî bajarê Îzmîrê kirin. Rojek li Îzmîrê, li Qonaxê û li Îskela Gemîyan min hew dît ku vapor hat û wa ye, Mîrê Zirav xalatan girê dide. Ez çûm li ber sekînim û bi dengê bilind min qîr kir, "Mîrê Kurdistanê tu bûyî qamerot?" Seîd gemîyê girê da, xwe rast kir û go "Kuro pêxas, Xwedê min kirîye qamerot, derdê te çi ye?" Min go

"Gazin ji min meke, ji bab û kalên xwe bike. Hûn rêvebirên me bûn, Osmanîyan we ji îqtîdarê dîr kir, we dawa îqtîdara xwe nekir we koletîyê pejirand." Go "Hooo qewet nebî ji te ra, pêxasê pêxas, min go dê moralê min xweş ke, hatîye dilê min reş dîke..."

Seîdê rehmetî kelîma "rûto" û "pêxas" pir dixebitanda, gelek şîrîn bû. Kes jê nedixeyîdîya. Ez û Seîd li îskelê bêhnek rûniştin. Min go "Niha Nuh Begê babê te mezinayîyê bida Husên Paşa, Huseyn Paşa bibûwa walîyê Bedlîsê babê te jî bikra qaymeqamê Mûşê, tu jî niha midûrê Îşletma Tetwanê bûyî, ne piştî te xûl û ne çavên te kor dibûwan, we mala xwe xira kir û ya me jî li ser danî." Seîd hinek ponijî û wiha gote min "Kuro pêxas, tu dizanî ka ez çiqa ji te hez dikim. Ez dizanim ku tu ji halê min ra digîrî û van ta'na ji kerba nava xwe didî rûwê min, lê ez çi bikim, ma min wê fersendê ji destê xwe berda? Fersenda babên me hat lê wan ji wê fersendê îstîfade nekirin." Min go, "Ez jî vî tiştî îfade dikim. Niha tu gunehê babê xwe dikşînî, babê te jî xwe qurbana ezeziyê û çavnebarîya meqaman kir. Ez dibêjim ku gava welatek bê avakirin li wî welatî bi hezaran meqam henin. Meqamên ji vî halê te qenctir û bilindtir bi mîlyonan tene jimarê."

Seîdê Nuh Beg încî pirseke bê henek ji min kir. Go, "Şakir, di zemanê Hecî Musa Beg û babê min da him fersend ketibû destê wan û him eşîr û merivên ku bikarîyan bi hezaran însanan rakiran hebûn; gelo bo çi van mîr û şêx û axa û pêşkêşan çareyek ji me kurdan ra nedîtin." Min go "Seîd

Beg, çîrokeke min heye, min navê ji te ra bêjim. Zêde dilê te li vî welatê xerîb naşkênim, îzna min bide ez ê biçim.” Go “Tu bi serê Mela Mistefa bikî tu bibêji. Ji te were ku dil bi min va maye. Ez xwe mirî dizanim pêxaso!...” Min xwe ji Seîd Beg xilas nekir û min vê çîroka Hecî Musa Beg jê ra go, “Dibêjin karwanê Bedlîsîyan di ber gundê Hecî Musa Begî ra di Xîfyan da borîye. Xurmêna def û zîrnê ye, xirpêna şahî û govendê, reqa-reqa tiving û demancan e, hawar ya Rebbî, qîyamet e. Serkarwan pirs dike ka ev çi şahî û dîlan e. Dibên, daweta qîza Musa Beg e. Evê Bedlîsî pîrsa zavayê mîr dike, dibêjin yekî tirk ê uzman çawîşê cendirman e. Evê Bidlîsî dîsa dipîrsê, “Niha ev Hecî Musa Beg, ewê Mirehhes Azayê Kongra Erzirom û Sêwasê ye?” Gundî dibên “Erê.” Mêrikê Bedlîsî xwe nagrê dibê “Kî... Ev Bega we Maçe Begî ye, Maçe Begî...” û ji gund dûr dikeve bi riya xwe va diçî.”

Seîd go “Wey babo, ev tu vê şermezariya me dizanî? Wey rûto wey. Pa bi Xwedê tiştê tu nezani tune. Lê ez ê vê çîrokê temam kim. Apê min keça xwe ya hêja da wî onbaşîkê Artwînî, ev kaça bedew rojêk di lehtîkek da hefir û eşêv dike, lehî radibe, lehtîkê bi keçîkê va dibe dixê Behra Reş. Hê diçe, hê diçe. Tu kesêk salixa prensesa kurd negirt.”

Seîd Sayilgan xwe malulen û mexdûren emeklî kir. Dagerîya welat û dest bi xeyalên xizne û defînan kir, çavên wî qels û serê wî sews bû, çû jinek ji xwe ra anî û kete pey dilê xwe. Di van navan da li Anqerê bi qasî

heftiyêk li min bû mêvan. Salên 1983-84an bû.

Destek kaxizên îskanbîl standibû bi koteka heya derengê şevê bi min ra dileyîsta û me dikenanda. Digo “Rûto! Niha xerîteyek ketîye destê min, ez ê xizne derînim. Ev xizne 14 kûp in, her kûpek barê kerek zêrên entîqa ne. 14 barên keran ji Stenbol anîne li gundekî Hîzanê. Xistine binê erdê. Ez dagerîm, ez ê biçim derînim û 100 hezar heb zerên giranbaha bidime te...”

Min digo “Seîd, kaxizê xwe bavê ka tu yê çi bawê yî? Bila ew 100 hezar zêrên te ji te ra bin, bila xeyala te sar nebî. Gawa tu mirî bi xwe ra bibe gorê...” Digo “Wîî!... Kuro ka werin li vî pêxasî mîzekin. Min digo ka bi aqil e, ez 100 hezar zêrên xwe didimê, lê hê ew naziyan dike. Heye ku bawer nake?...”

Min digo “Kuro mîrê bêmejî, ma ji Stenbol heya Hîzanê bi libta keran meriv salek naghêjê Hîzanê, baş e, eva keran fam nekirin salek meşîyan, lê ewên ku ketîbûne peyî karwanê keran jî qe erdek nedîtîn ku xizna xwe veşêrin û cewabê bidine Mîrê Zirav?”

Em heya derengê şevê dileyîstin û me van yarîyan dikir û em dikenîyan.

Wey Seîd Beg, tu çiqa hêja bûyî, Xweda rehma xwe li te bike. Bejna te ya bilind û fotêr û qrewet û girêdana te ya romane tim û daîm li ber çavê me û ew zarê te yê şîrîn di guhên me da ye. Ez ê ji te ra kilama KAFIR GULO bêjim:

*Eman Gulê, eman Gulê, eman Gulê*

*Eman Gulêêê... lê.. kêmaqilêêê..*

*Eman Gulê, bûka mala babê min ê lê, rabe rûneee, lê li ber pencerêêê..*

*Ramûsanên Gula Ermen xweştir in ji*

*mastê mîyan, qeymaxê gamêşan, goştê  
berxan Guloo...*

*Lê rojaa... xêrêê... Ez Hecî Musa Begê  
Xweytî, Reysê Motkan, serê heft eşîran  
keçê bêbabê, wey zalimê, ez ê çawa terka  
dinê Mihemed bikim lê lê lê... Bikevim  
dêrêê...?*

Gava di sala 1969 da em ji hepsa Antalyayê hatin berdan û PTT ez negirtim, ez çûm Tetwanê, da îşekî ticaretê bikim û aboriya malê temîn bikim. Ez mêvanê Feqî Huseyn im. Bi qasî heyvek li mala Feqî razam û xwarinên hevala wî Rebîa Xanimê min xar. Emega xwişka heja li ser min heye.

Bi qasî heyvek lê xebitîm heya min dikan girt, boyax û tenzîm kir û rihsatê xwe stand û dest bi firotina sebze û fêkiyê li ser hev (toptan) kir. Tam di vê esnayê da Seîdê Nuh Beg, li ba Mizgevtî Mezin rastî min hat. Şev e, eşa ye. Min bi kotekî bire mala xwe. Me telefonî mala Feqî kir û bûm mêvanê Mîrê Zirav. Wê şevê jina xwe ya laz û qenc, pir westand. Taze xwarin pehtin, anî setrincê danî ber min û xwest em kişikê bilêzin, ez dibêim kişik nizamim lê ew godariya min nake û ji ber min û xwe va dilîzê. Derengê şevê livînê min rast kir, min xiste nava cîyan û lembê tefand çû oda xwe. Birîna min, xwarina min, leystîka kişika min û razana min hemî fermî bûn. Weka ku protokolê dimeşanda mîrê kurdan.

Ez sibê zû rabûm min cilê xwe ji sing anî xwar mîzekir ku bi şev malîyan rakirîye, kincên min daye utikirin. Min destê xwe xiste cêba şalê xwe ku vaye 5 lireyên tirkî yê qermiçî û qetiyayî tê da ye. Min fêm kir ku Seîd cêbên min yoxleme kirîye û dîtiye ku yek quruş pereyê min tune,

bo xerclixê 5 banqinot kiriye berîka şalê min.

Seîd hat oda mêvana, xwirînî anî rast kir û emir kir, go “Rabe...” Min go “Seîd Beg, te bi çî însafî nivê şevê malîyên xwe şîyar kir û kincên min da utikirin, ev çî pere ye te kirîye berîka min?” Seîd go “Ez li cêbên şal û êlek û çakêtên te gerîyam yek quruş perê te tune. Min vî 5 lireyî bo tu heya nîvro pê îdare bikî, xiste cebika te. Ez ê niha biçim ba hevalan. Ez ê ji te ra pere berhev kim, bînim.” Min go “Seîd Beg! Ez di bextê namusa te, tu min rezîl nekî. Min heya vê sietê şexsîyeta xwe parastîye, niha piştî du sê rojan wê kurê apê min Minîrê Ebdila Efendî sermîyan bide min û ez ê dest bi ticaretê bikim. Sal çûye roj ma ye. Ji kesî ra vê yekê nebêje.”

Seîd, qenc guhdarîya min kir û go “Bi şertê ku tu vî sed panotî bigrî.” Min go “Bi şertê ku tu vî 100 panotî bi deyn bidî min ez ê bigrim. Ez naçim li qehwexanan û xwarinxanan nagerim ku şermezar bibim. Xema min meke.”

Min dikan vekir. Pere kar kir. Deynê Begê Zirav bi kotek û heşt bela dayê. Bila cîyê hemû Seîdên bê miraz û Şehîdên Behîştê rengîn û nava nûra Xweda be...

Em dîsa bêne ser mesela sirgûna Hecî Musa Begî.

Bi navê “Hacı Musa Bey Olayı” ji aliyê Doç. Dr. Musa Şaşmaz va hatîye nivîsandin û ev pirtûka hanê di sala 2004 da ji aliyê çapxana Bayrak ve hatîye weşandin.

Li gor dîtina vê lêkolînê, mîsyoner, konsolos û siyasêtgera îngilîzan bi alîkarîya Amerîka û bi hemû medya û meceleyên (kovar) wan dewletên



mezin va xezeba xwe rêtîne ser Hecî Musa Begê Xêwyî. Têrtîbek di heqê Begê Zirav da bi kar anîne. Xayeya wê komploşê mesela ermenî û kurdan e. Dewletên ecnebî bi taybet Îngilîz, Fransîz, Amerîka û dewletên din yên mezin dixwazin ku kurdan gunehkar bikin, xetakî rawa ji bo xwe bi dest bixin û armanca xwe bi fêr û fenokan bibîne serî. Li gor qerar û biryarên Berlînê ya sala 1978 ev dewlet garantorên ermenîyan in. Vî mafê Osmanîyan daye van dewletan. Ev jî dixwazin li ser axa kurdan Ermenîstanekê ava bikin.

Mîr, beg û rêvebirên kurdan hê ji sala 1850 va tîk çûne. Osmanîyan kurd hiştine li hêvîya nehye mudur û qeymeqam û walîyên wan yên bertilxwar. Ev dem dema eşîrtîyê ye. Dê ewladê xwe davêje! Çavê ermenîyan û piştgirên wan bar nabe ku însanekî ku pê av germ dibe li Kurdistanê bêhêlin. Senaryo ev e, ku pêşî mezinên wan û pişt re jî hemû kurdan ji Kurdistanê derînin û welatê kurdan bi destê ermenîyan va berdin.

Hecî Musa Beg kurê Mîrza Beg e. Mîrza Beg, qaymeqamiya Motkan û Xelatê kirîye û heyamek jî li Bedlîsê destdar e. Di sala 1885ê da ji terefê neyarên xwînî va hatîye kuştin. Musa Beg jî li der û berê Mûşê muduriyêti kirîye.

Hecî Musa Beg û babê wî Mîrza Beg, begên Motkan in. Ji nehya Xoytê ne û her du jî li wê nehyeyê hatine dinê. Ji şopa wan wisa tê hizirkirin ku malbata wan xwendevan bûye. Piştî tasfiyekirina mîran, dewleta Osmanî xanedanên piçûk an jî ji malên mezin

xwendevan kirine qaymeqam û mudurê nahîyeyan.

Musa Beg di sala 1855 de hatîye dinê. Di sala 1883 de bi şêlandina mîsyonerên ermenî ve ketîye rojevê û bal kişandîye ser xwe. Bi temamî 14 gunehbarîyan xistine stuwê wî. Musa Beg celbê Stenbolê kirine, 50 kes ji keşe û fileyên deşta Mûşê anîne Stenbolê. Dadgehek navnetewî danîne. Fila bi papaz û şahid û îddiayên xwe yên derewîn û parêzer û bi piştêmêrên xwe weke sefaret û konsolosên îngilîz, fransîz û hwd. tevî rojnamegerên wan, li ser serê Musa Beg kom bûne. Dinya li Musa Beg kirine tarê bêjîngê.

Musa Beg jî bê xwedî nîn e. Mutesarrîfê Uskudarê Behrî Paşa xalê wî ye. Sadrêazem Kamil Paşa merivê îngilîzan e, lê nazirê Edaletê Cewdet Paşa û mehkeme bê teref in. 2 parêzerên mîr jî hene.

Ew 14 doz û daweyên bê asl û astar yek ji ya di qirêjtir e. Îftirayên bê ser û ber in. Gava ku mirov li wan celsan dinêrê, dilê mirov ji fileyên Deşta Mûşê sar dibe û gunehê mirov bi wan tê ka çire ev dewleta gewre ya Brîtanya wan camêran di vê senaryoya çepel de dileyzîne. Ji îfadeyê wan kifş e ku pir feqîr û belengaz in. Dişibihine turkmenên ku van salên dawî bûne pêlîstîkên dewleta kevneperest.

Ya herî girîng, Hecî Musa Beg her dem bi Gulo ya babfile tê rojevê. Lê di nav her 14 îddiayên derewîn de ya ji hemîyan derewîntir ew îddîa ye.

Navê Gulo, Gulîzar e. Di sê dozan de, sê Gulîzar henin. Lê ew Gulîzara 14 salî ku dibêjin Hecî Musa Beg wê

bi kotekî revandîye û ji kêçanîyê xistîye û pişt ra xwestîye wî bi birayê xwe ra bizewicîne û Gulîzara çardeh salî bi xebera Musa Begî nekiriye û ji Mûşê revîyaye çûye Stenbolê, ev derewa hanê hîç cîyê xwe negirtîye û mehkemeyê qerarê bê tehqîqatê daye.

Dadgehê pêwîst nedîye ku vê dozê rawedar bike. Lewra ku ev derewekî bê esas e. Tu kes di dinya kurdan de ev yeka ha nekiriye ku xanedanekî kurd rabe vê yekê bike.

Hecî Musa Beg di îfada xwe da agahî daye ku 3 jinên wî hebûne. Du kur û dû keç, çar zarokên wî hebûne. Dema ku koçî Medîna Munewwer kirine kom û kifletên xwe jî tevî xwe birîye. Dewleta Osmanî hezar qurus maaş jê re girêdaye. Li sala 1895 da wî ji Medîna Munewwer anîne Şamê.

Di salên 1915ê da serfermandarê hemû hêzên Kurdistanê ye û dijê urisan tê û bi çeteyên ermenîyan re şer dike. Li sala 1919 da murehles azayê kongra Erzirom û Sêwasê ye. Piştî şerê Şêx Seîd Efendî bi îddîaya ku yek ji damezrenêrê rêxistina Azadî ye, tê gulhenkarkirin, wî sirgûnî Sokeya bajarê Aydinê dikan. Gava ku ji Sokeyê direvin Kor Husên Paşa jî ligel e. Hecî Musa Beg li Suriyê bi nexweşîya kolera yê dimirê û li Şamê tê definkirin.

Osman Sebrî ji devê Abdurrahmanê Elîyê Unis kitêba "Şerrên Sasonê 1925-1937" nivisandîye. Weşanxana Pêrî wê pirtûka hêja gehandîye destê me.

Nuh Begê birayê Hecî Musa Beg 1925an de bi 100 suwariyên xwe va li Motkan, Sason û Xerzan digere. Piştî şerê Şêx Seîd Efendî, hêja şerê Sasonê dest pê nekiriye.

Nuh Beg li Xerzan mewanê Cemilê Çeto ye. Qirpên li dengê topan dikeve û şerê Sasonê dest pê dike. Cemilê Çeto bi Nuh Begî re yekîtiyê girênade xwe nade binê barê serhildaneke netewî. Nuh Beg bi dilekî şikestî dizivire, dema ku xwe dighîne çîyayê Motkan dengê top û mitralyozan herî nêzik têne guhên wan. Îzzet Beg ji Nuh Begî ra dibêje "Wa ye, xelkê Sasonê serî hildane, divê em ji herin piştgirîya wan."

Nuh Beg waha bersive Îzzet Begî dide: "Hê nû welat xweş bû. Sasonî û tirk ketin gewrîya hev. Heya du salan serê hukumeta tirkan ji vî şerî xilas nabe, piştî du salan em binêrin ka çi dibe."

Nuh Beg li çîyayê Mazîkarê sê roj dimîne. Ji wir derbazî Xoytê dibe. Piştî sê heyvan taburekî esker di ser da digre û Îzzet Begê biraziyê wî, tevî şeş peyayên wî dikujin.

# QEDRÎ CEMÎL PAŞA

Ebubekir Çelebi

## Zarokatî û Keseyatiya Wî

Qedrî Cemîl Paşa li sala 1890, li Amedê ji dayik bû. Kurê Fuad Begê Cemîl Paşa ye. Xeynî Fuad Beg 10 kurên Cemîl Paşa yên din jî hebûn. Di nav maleke qalabalix û dewlemend de mezin bû. Zarokatiya xwe li Qonaxa Cemîl Paşa û bi pîrwerdeyê tîr û tesel derbas kiribû. Bi tevî heval û hemsalên xwe havînan li gundê Enbarê, zivistanê jî li nav Amedê diman. Di zarokatiya xwe de hem fêrî xwendin û nivîsandinê hem jî fêrî suwarîtiyê û leşkeriyê bû. Lê eleqeya wî zêde li ser pêwendiyên komelayetî bû. Apê wî Qasim Begî her çiqas qedexê dikir ku nerin nav odeya mezinan jî, wî tim hewl dida ku here ode û gudarî li sohbetên mezinan bike. Van sohbetan pêşiyê gelek bala wî dikeşand. Lê paşê hêdî hêdî wek tiştên



Qedrî Cemîl Paşa

vala didît. Heta 15-16 saliya xwe li Amedê jiya û xwendina xwe ya sere-tayî û navendî li vî bajarî temam kir.

Bingeha kesayatiya Qedrî Beg li Amedê li nav vê jiyane xwe girt.

Qedrî Cemîl Paşa roşinbirekî kurd e. Kesekî dilsoz û kurdperwer e. Li Stenbolê di nav 'Cemîyeta Hêvî' de, li Suriyê di nav 'Cemîyeta Xoybun' de xebatên xwe yên siyasî dike. Di her serhildaneke kurd de bi awayekî agahdar û pêwendîdar e. Lê bi min xizmetê xwe yê mezintirîn bo miletî kurd nivîsandina kitêba *Doza Kurdistan* e. Çünke di *Doza Kurdistan* de rewşa siyasî ya miletê kurd ya di destpêka sedsala 20. de û heta 1960 dixê ber çav. Mirov di *Doza Kurdistan* de dikare sebebên serneketinên kurdan bibîne. Dîsa di kitêba xwe de behsa dewletên din jî dike û mirov dikare dengê hêzên navnetewî yên wê wextê jî bibîne ku kurdan çawan xeta kirine, çawan nikarîne berjewendiyên xwe tesbît bikin û gorî wê jî hereket bikin. Bo wê jî mirov dikare bibêje ku *Doza Kurdistan* têgihîştina rewş û jiyana miletê kurd ê wê demê ye, li wê serdemê serçaviyeke girîng e.

Qedrî Cemîl Paşa dema ku diçe Stenbolê, derbarê jiyana rewşenbîrî û komalgayî ya wê wextê bi rewşeke nû re rûbirû dibe. Dibîne ku hinek mîr, beg û paşayên kurdan ku hukûmetê meaş û hatina wan jê girtiye, gelekê wan di nav cemiyet û grubên kurdperwer de cî girtine. Lê nakokiyên di navbera wan de li wê derê jî berde-wam in, ev rewş di nav cemiyetan de jî xwe nîşan dide. Digel vê rewşa ne bi dilê wan, ew û pismamên wî jî di nav xebata rêxistinbûna di cemiyetên kurdî de cîyê xwe digrin.

## Qedrî Cemîl Paşa bo xwendina navîn diçe Stenbolê

Qedrî Cemîl Paşa di 16 saliya xwe de bo xwendina lîseyê diçe Stenbolê. Bi tevî 9-10 kesên mirov û hemşeriyên xwe dikeve 'Mektebî Numûne-i Teraqî'. Li vê dibistanê ferqa di navbera kurd û tirkên de dibîne û hes-tên wî yên kurdperwerî geş dibin. Çünke wê wextê li nav xwendkaran grûbên hemşerîti û netewayeti hebûn. Arnawud (elban) grûbek xwe hebûn, ereb grûbek xwe hebûn, kurd grûbek xwe hebûn. Rojên tatilê Qedrî Cemîl Paşa jî wek xwendkarên kurd ên din diçû li cem hemşeriyên xwe li qehwe-xaneyên kurdan wextê xwe diborand. Li van qehwexaneyan bi kesên wek Xelîl Xeyalî yê Modkî, Mele Seîdê Kurdî (Seîdê Nursî), Mîrî Katipzade Cemîl Amedî... hev nasîn. Bi van ronakbîrên kurd re li ser mêjû û komelnasîya kurd sohbet dikir. Van ronakbîran tesîreke mezin li ser Qedrî Cemîl Paşa kir. Çünke van ronakbîran hem pêwendiyên xwe bi 'Cemîyeta Teraqî û Teawunî Kurd' û dibistana wan û rojnameya wan bi navê 'Kurdistan' hebûn hem jî di warê niştî-manperweriyê de zana bûn. Qedrî Cemîl Paşa di kitêba xwe ya bi navê *Doza Kurdistan* de gelek pesnên Xelîl Xeyalî û Mele Seîdê Kurdî dide.

Qedrî Cemîl Paşa wextekê li Stenbolê dibe şahidê hereketa turk-perweran jî. Damezrandina 'Îttihad we Teraqî' û yên din dibîne. Ku dewleta Osmanî çawan têkdiçe hemûyan dibîne. Rewşa siyasî ya dewleta Osmanî ku çawan tesîra xwe li ser gel

û xwendekaran dike, ronakbîr ku dikevin nav hewleke çawan, li rojnameyên tirkî çî tê nivîsandin, hemûyan taqîb dike.

Qedrî Cemîl Paşa di sala 1911an de dikeve 'Halkalı Yüksek Ziraat Mektebi' li wir bi alîkarîya Xelîl Xeyalî û bi tevî hindêk xwendekarên kurd ên din Cemîyeta Hêvî ya Xwendekarên Kurd dadimezrîn. Bi damezrandina Hêvî hestên netewperwerî yê xwendekarên kurd her roj zêdetir dibûn.

### Qedrî Cemî Paşa ji bo xwendina bala diçe Ewropayê

Qedrî Cemîl Paşa di sala 1913an de ji bo xwendina bala çû Swîsreyê. Li Lozan-Swîsre bi tevî Ekrem û Şemseddîn Cemîl Paşazadeyan, Babanzade Recayî Nuzhet, Selîm Sabit Dêrsimî şaxêke Hêvîyê li Lozanê damezrandin. Bi saya Hêvî hem hestên netewperwerî geş dikirin li nav kurdên Ewropayê û hem jî bo kurdên ku nû werin Ewropa adresek bû. Qedrî Cemîl Paşa li wir hem xebatên kurdperwerîyê dikir hem rewşa milletên din li Ewropa dinastî, hem jî hewl dida ku kurdan bi ewropîyan ve bide nasandin. Çûnke ewropîyan hîç kurd nedinasîn, yan jî wek eşîretên paşvemaî ku hê jî nebûne millet dinastî. Di salên 1914an de ku Şerê Yekem ê Cîhanê dest pêkir û çar meh şûn de vegeyîyan hatin Stenbolê. Îcar wextê ku were Stenbolê hin kesên ewropî jê re dibêjin "Bo çî tu diherî cem tirkî? Li vir be, xebatên xwe li vir bimeşîne." Qedrî Beg dibêje "Na, ez ê herim. Çûnke piştî şer mûmkûn e ku hin

guhêrînên mezin çêbibin, bo wê jî pêwîst e ku ez li nav xelkê xwe bim."

### Qedrî Cemîl Paşa di Şerê Yekem de Dibe Leşker

Qedrî Cemîl Paşa wextê ku ji Swîsreyê tê bo Stenbolê li ser rê li Awusturyayê rastî yekîneyek leşkerê ku nû jî nav şer derketine, perîşaniya wan dibîne, gelek dikeve bin tesîrê û pêşbîna metirsiya şer jî dike. Ku piştî sê rojan tê Stenbolê li wê jî propagandaya şer dibîne. Li Stenbolê dihere wezareta perwerdeyê, belgeyên xwe yê xwendina bala distîne. Bi wan belgeyan muracatî leşkerîyê dike û bi xwestina xwe dibe topçî. Bi tevî hin hevalên xwe ve diçe artêşa sêyem li Erzîromê. Li wê jî dişînin bo Alayên Hemîdî (ji leşkerên kurdan pêkdihatin). Di nav leşkerên kurdan de hin pêwendîyan bi efserên (subay) kurd re datîne li ser babetên kurdperwerî, lê mixabin kes tiştêkî jê fam nake. Çûnke serbaz û leşkerên kurd bi bawerî jî Xelîfe û dîn ve girêdayî bûn.

Qedrî Cemîl Paşa, di dema leşkerîtiya xwe de dibe şahidê koçbarkirina kurdan a bi zorê. Hukûmeta **Îttîhad we Teraqî** wê wextê yasayek bi navê 'Qanûna Tehcîrê' derxistibû, li gorî wê kurd her wext ji Rojhelatê ber bi Rojavayê didan koçkirin. Gelek kurd jî birçîna û di sar û sermayê de dimirin. Yê ku diman jî nedihîştin ku derêkê bicih bibin, her tim koçber dibûn. Qedrî Beg dîsa di leşkertiya xwe de dibe şahidê qirkirina pontusan li dorberê qezaya Çarşamba ya Samsunê jî.



Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa di dema Şerê Cîhanî yê Yekemîn de

Rojêk di operasyonêkê ya li devera 'Ayî Têpesî' de 20 xortan li nav gundekî pontusan kom dikin ku piranî salên wan 16-17 bûn li wê derê dikujin.

Piştî ku rûs hêzên xwe ji nav axa dewleta Osmanî vedikişînin, Qedrî Cemîl Paşa bi yekîneya xwe re diçe Filîstînê bo li hember îngilîzan şer bike. Li Filîstînê di şerekî li hember îngilîzan de yekîneya tirkên têkdîçe û Qedrî Beg bi tevî hin leşkerên din wek dîl dikevin berdestê îngilîzan. Sal û nîvekê di qampên esîran de dimîne û paşê ku leşkerên ereb têne berdan, ew jî bi wan re têtê berdan. Qedrî Beg ji qampê difilite û dihêt Amedê.

Qedrî Cemîl Paşa li Amedê hem dibe şahidê jiyana miletê kurd û hem

jî dibe şahidê siyaseta hukûmeta Mîstafa Kemal a derbarê kurdan de. Qedrî Beg beşdarî damezrandina 'Cemiyeta Tealî ya Kurd' dike ku ew cemiyet çawan têkdîçe, li Amedê wê jî dibîne. Wê wextê rewşa siyaseta kurdan û helwesta dewletê li hemberî kurdan baştir dinirxîne.

### Qedrî Cemîl Paşa Li Raperîna Şêx Seîd de Tê Binçavkirin

Di salên 1922an de li Erziromê rêxistina **Azadî** ji layê Mîralay Xalid Begê Cibrî, Îhsan Nûrî yê Bidlîsî, Mulazim Îsmail Heqî Şaweys ê Silêmanî, Xurşîd Vartoyî, Yûsif Ziya Beg û hwd. ve hate damezrandin. Îsmail Heqî wê wextê tê Amedê pêwendî bi Qedrî, Ekrem û Qasim Cemîlpaşazadeyan re, Doktor Fuad, Melhmed Efendî (Bavê Tûjo) re dike û şaxêkî **Azadî** bi navê xwe yê din **Komîteya Îstîqlal** li Amedê bi van kesan re dadimezrînin. Qedrî Cemîl Paşa dibe şahidê xebatên vê rêxistinê û di nav de jî cî digre. Mixabin hêj ku Azadî rêxistina xwe tamam nekiriye Raperîna Şêx Seîd bê plan û bê amadekariyek rêkûpêk dest pêdike. Qedrî Beg jî bê agahî li Amedê tê binçavkirin. Ku raperîn qediya û Şêx Seîd Efendî û hevalên wî hatin girtin, wan dihinin Amedê li Dadgeha Îstîqlal de cezayê darvekirinê didin. Wê wextê Qedrî Beg jî tê dadgehîkirin û berat dike, derdikeve. Qedrî Beg gorî ku li kitêba xwe ya *Doza Kurdistan* bahs dike, du sal li pêş raperînê Salih Zekî Sahibqiranî yê Silêmanî li Amedê berpîrsiyarê daîreya Îstîxbaratê bûye û

wê wextê jê re gotiye "min tevayî belgeyên derheqê Cemîlpaşazadeyan berhev kirin û şewitandin" Wextê dadgehkirinê de bo ku belge nînbûn nikarîn ku ceza bidinê. Bi hezaran zêrên sor dabûn endamên dadgehê û li ser navê mala Cemîl Paşa firokeyek şer kiribûn ji hukûmetê re û bi van ruşwetan tevayî Cemîlpaşazadeyan xeynî Ekrem Cemîl Paşa, berat kirin. Ekrem jî bo 10 salan bi cezayê girtîgehê hatibû cezakirin.

### **Qedrî Cemîl Paşa û Koçberî (Surgûn)**

Qedrî Beg dema ji girtîgehê derdikeve û bo bajarê Burdurê dihête sîrgûnkerin (nefîkirin). Burdur wê wextê navçe- yeke piçûk bû. Dema ku diçe Burdurê li wê derê 300 kesên din ên ku surgûn bûne dibîne. Di nav wan de yek jî Seîdê Kurdî (Bedîuzeman) bû. Pêşiyê nedihîştin ku malbat bêne cem hev. Lê paşê hêdî hêdî sist kirin. Malbatan dikarîn ku werin cem hev. Bi vî hawayî di pênc navçeyan de jimara kurdan bû 1000 kes. Ji bo ku evên surgûnbûyî zêde roşenbîr di nav wan de hebûn, xelkê kurd yê li wir zûtir di warê kurdperwerî de hişyar bûn. Piştî vê hişyarbûnê hin kesan bi awayekî xwe digihandin Kurdistanê. Qedrî Beg jî dixwest biçe Kurdistanê lê bo ku taqîb li ser hebû nikarî derkeve.

Serokwezîr Îsmet Paşa ji bo ku şerwanên raperîna Agirîyê bixapîne efûyekî giştî derxist. Surgûnan jî ji vê efûyê îstîfade kir. Qedrî Beg jî, bo ku here Amedê pêwist di ku here li

Kastamonu Ekremî bibîne û ji wê jî here Stenbolê. Ekrem jî ketibû ber efûyê, lê pêwist bû ku demeke kurt li wê derê be. Qedrî Beg piştî serdana Ekrem çû Stenbolê. Dixwest ku li Stenbolê derheqê yê ku diçine Kurdistanê agahîyan werbigre. Piştî çend mehan ji Stenbol çû Amedê.

Qedrî Beg dema ku hat Amedê pêwendiyên xwe ligel berpirsyarên Xoybûn datîne. Wê wextê ji bo ku agahiyên rast û zêde ji raperîna Agirîyê werbigre, bi navê Z. Egilî havalekî xwe diçine Agirîyê. Lê ew heval di rê de ji hespê de dikeve û birîndar dibe, nikare bigihêje Agirîyê. Piştî ku Ekrem jî dihête Amedê dixwazin pêwendiyên xwe bi navenda Xoybûnê re xurttir bikin. Ji bo wê jî, Cercîszade M. Efendî wezîfedar dikin da ku tuzuknameya Xoybûnê ji wan re bîne Amedê. Ku tuzukname hat, dixwazin gişt havalên kurdperwer li dor Xoybûnê û raperîna Agirîyê tanzîm û bi nîzam bikin. Ew kesên ku pêwendiyên xwe pê re hene zêdetir karmendên hukûmetê bûn û li Amedê bûn. Rêxistina Xoybûnê ji bo ku îlegal bû, nihêrîn ku li Amedê nikarin vê rêxistinê xurttir bikin. Ji bo wê jî, rojekê Qedrî Beg û Ekrem Beg biryar didin ku herin dereveyî sînorên Tirkîyê û xebatên Xoybûnê li wê derê berdewam bikin.

Di salên 1929an de Qedrî Beg bi tevî Ekrem û du pismamên xwe yê din biryar didin ku herin Sûriyê. Piştî amadekariyeke kurt, digel malbatên xwe ve bi dizî derbasî Binxeta Sûriyê dibin. Wê wextê Sûriye di bin kontrola fransîzan de bû. Bo wê jî mafî îltî-

cakirinê ji berpirsyarên fransiz dixwazin. Ku îltîcakerina wan tete qabûlkerin, diherin li Şamê û di bin şertên xirab de bicih dibin.

### **Xebatên Qedrî Cemîl Paşa di Nav Xoybûnê de**

Qedrî Cemîl Paşa û pismamên xwe, piştî ku tên Sûriye, pêwendiyên xwe bi navenda Xoybûnê re datînin. Rêveberên Xoybûnê bi tevlîbûna wan a rêxistinê memnun dibin û bi beşdariya nûnerên navendî û berpirsyarên mintiqeyan Xoybûnê dicive. Di vê civînê de Ekrem û Qedrî Began dikin nûnerên navendê. Di nav xebatên Xoybûnê de carcaran di navbera Cemîlpaşazadeyan û Bedirxaniyan de nakokî derdikevin. Piştî van nakokiyên Bedirxanî ji Xoybûnê tên avêtin.

Ji bo ku Xoybûn giraniya xebatên xwe ji raperîna Agirî re vediqetîne, wexta ku Îhsan Nûrî Paşa li Agirîyê alaya raperînê bilind dike, Xoybûnê jî biryarê dide ku li aliyê Başûr ve li hemberî hêzên tirk cêbhayekê veke. Gorî Qedrî Cemîl Paşa ku di pirtûka *Doza Kurdistan* de dibêje yekîneyeke çekdar di bin kontrola Ekrem Cemîl Paşa de sînorê Sûriye derbas dike û tê derdora Mêrdînê. Qedrî Cemîl Paşa jî di nav vê hêzê de bûye. (Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî) *Doza Kurdistan*, r. 117. Özge Yayınları-Ankara). Lê wek hêzên ku Xoybûnê şandibûn deverên din, wan jî nikarîne tiştekî bikin û dîsa vegerîne Sûriye.

Hukûmeta Mistefa Kemal di sala 1932an de bona asimîlekirina kurdan yasayekê derxist, Xoybûnê jî bona hiş-

yarkirina kurdan û serhildanekê di 16ê Hezîrana 1932an de belavokek belav dike. Di vê belavokê de xelkê kurdê çawan li hemberî vê yasayê rawestînin û li hemberî dewletê de çawan têbikoşînin tê de hatibû diyarkirin. Belavok bi înzaya Navenda Xoybûnê di nav gel de belav bû. Lê belavokê tesîrek girîng jî nekir.

### **Qedrî Cemîl Paşa Diçe Mehabadê û Serdana Qazî Mihemed Dike**

Di sala 1946an de bi yarmetîdana Sovyetê di bin serokatiya Qazî Mihemed li Mehabadê Komara Kurdistanê tete damezirandin. Ev bo tawayî kurdan dibe wek cejnêk. Xoybûnê jî bona pîrozkerin û pêwendîdanîna bi Komara Kurd re, Qedrî Cemîl Paşa wek nûnerê xwe dişîne Mehabadê. Qedrî Beg bi rêwîtiyekî zor û zehmet tete Silêmanîyê û ji wira jî diçe Mehabadê. Li Mehabadê serdana Qazî Mihemed dike û xwenasîn, hest û daxwazên xwe û Xoybûnê di nameyekê de dinivîsîne û pêşkêşî pêşewa Qazî Mihemed dike. Qazî bi germî pêşwazî lê dike û pêwist dibîne ku biçe bi konsolê dewleta Sovyet re li Azerbaycanê hevdişînek bike.

Qedrî Beg di wê hevdişînê de daxwazên Xoybûnê û miletê kurd bi nameyekê pêşkêşî konsolê Sovyetê dike da ku bigihîje berdestê Stalîn. Rojtira di bo dîdariyekê bi konsolê Sovyetan re diçe Tebrîzê. Li Tebrîzê serdana konsol dike û wê nameyê jî dide konsol. Lê konsol dibêje em nikarin bişînin ji Stalîn re, lê dikarin



bişînin ji komîteyekê li Moskov, ewan jî munasib bibînin dikarin bigihîjin Stalîn. Piştî vê hevdişînê dîsa vedigere Mehabadê.

### **Qedrî Cemîl Paşa Serdana Barzanîyê Nemir Dike li Mehabadê**

Qedrî Beg heyranekî Barzanî bû. Dema ku çû Mehabadê firsandek derket da ku bikare Barzanî bibîne. Wî berê jî derheqê Barzanî de gelek tiştên erênî bihîstibû. Barzanîyê nemir wê wextê fermandarê giştî yê hêzên bergirî yê Komara Kurd bû li Mehabad. Qedrî Beg li qerargeha leşkerî serdana Barzanî kir. Barzanî ew bi xoşhalî pêşwazî kir. Qedrî Cemîl Paşa di kitêba xwe ya *Doza Kurdistan* de bo Barzanî weha dibêje.

"Xwedî fikriyatek kûr û pratîk bû. Pirsgirêkên tîn ber çiqas bi zehmet û bi gengeşî bûne jî, wî dikarî çareser bikira. Xwedî bîr û bawerîyeke bi hêz bû di warê stratejiyeta siyasî û pêwendiyên komalgayî de. Min dema ku Barzanî dît hê zêde nasîm û min wê wextê fam kir ku hereketa Barzanî ne hereketeke xwe bi xwe ye. Hereketeke gorî pêwistiyên azadîya miletê kurd derketiye û bi qabiliyeta Barzanî jî rêkûpêktir bûye. Ji bo wê, min di helwesta Barzanî û hevalên wî de dahatuya azadîya miletê kurd û serkevtina siyaseta kurd dît." (Zinar Silopî, *Doza Kurdistan*, Özge Yayınları, Anqere, r. 183)

Qedrî Cemîl Paşa li vir tesbîteke rast dike. Çünke wê wextê mixabin di tevayî rêxistinên siyasî yên kurd de, hereketeke bi nîzam û xwedî stratejî

nîn bû. Bo wê jî bi ser neketin. Lê hereketa Barzanî di her hewlekê de gav bi gav pêş de diçû. Eger îro li Kurdistanê Başûr serkevtinek heye û destkevtinên mezin hene, ev berde-wamîya siyaseta û stratejiyeta û xebatên Barzanîyê nemir û hevalên wî ye. Qedrî Beg dîsa di kitêba xwe ya navborî de behsê ku Barzanî û hêzên xwe çawan li Mehabadê hildikişîne û bi taktîkekê çawan li nav hêzên Tîrkiye û Îranê derbas dike û derbasî Rusyayê dibe. Di vir de jî mirov dikare siyaseta û stratejiyeta Barzanî û taktîkên wî yên bi qabiliyet baştir bibîne.


Di encamê de em dikarin bêjin ku gelek endamên mala Cemîl Paşa di nav rêza tekoşîna rizgariya netewî ya Kurdistanê de ciyê xwe girtine. Qedrî Cemîl Paşa yek ji wan kadiran e ku jiyan xwe di rêka tekoşîna netewî de borandiye. Wî û Ekrem Begî, qîma xwe tenê di tekoşîna siyasî û xebata rêxistinî neanîne, her weha di warê xebatên rewşenbîrî de jî berhemên heja bo me hiştine. Ku di naveroka wan de, derbarê rewşa civakî ya wê demê û gelek bûyerên dîroka me nêzîk agadarî û şîrovevî giranbiha pêşkêş me kirine.

## Fehmî Firat Kî ye?

Mele XALID

Fehmîyê ku bi navê Fehmîyê Bîlal tê naskirin teqrîben sedsalek berê, li Licê ji dayik bûye. Navê bavê wî Bîlal e. Bîlal di dema Osmanîyan da jîyaye û di ordîya wan de zabîr bûye. Ji wan re dibêin mala Mela Xeyrullah. Fehmî dema ciwaniya xwe da li Cizîrê tahrîrat katibî bûye û di pey ra jî li Licê memurtîya tapûyê kirîye.

Li gor zanîna min piştî hedîsa Şêx Seîd, ew jî wekî hinek şêx û begên Şerqê hate wargêr(surgûn) kirin. Demekî dirêj li Îspartayê surgûn ma heta sala 1967an. Ew di vê salê da êdî bibû kalekî hihlilî. Ji Îspartayê hate Diyarbekirê, xwe li mirinê dinetirand. Piştî vergerê ji çend meh şûnde felc bû. Demekî li Nexweşxana Nimûnê ya Diyarbekirê raza, lê tu encam negirt, laşê wî yê aliyê rastê bêgan mabû. Çend rojekî li otêla yekî Licî ma. Ji bo ku nedixwest yek jê dilgiran bibe, xwe şewitan da ku dawî li jiyana xwe bîne. Lê biserneket û dîsa çû nexweşxanê. Hinek baş bû û îca wî



Fehmî FIRAT(Fehmî BÎLAL)


anîn otêla bi navê Ankara Otêlî ku kirêkarê wê yekê Çêrmugî bû. Xizmeta wî xelkê dikir. Yek ji wan ê ku xizmeta wî dikirin ez bûm. Yek şevan

min jê re xwarin dibir û pêdiviyên wî heba min hindî hêza xwe pêk dianiya. Cilên wî dibir malê bo şûstine. Şevêkî ez çûm hinda wî ku nikare xeber bide. Min li pey serê wî hebên xewê dîtîn. Min li qutîya heban mêzekir ku vala ye, lê qutî hêj taze vebûbû. Tu mebêj beriya min yek çûye hinda wî û ji wî re dibêje "kurê min tu dikarî ji min re hebê xewê bînî, xewa min nayê". Mêrik jî bi dilê xwe yê saf diçe jê re paketkî heb tîne. Dema ku ez giham ser min famkir ku wan heban tevan bi carek daqultandine. Ez çûm min mast hanî û bi kevçiyên da devî. Qasê nîv saet paşê êdî bixeberdanê ket. Hiş hate serî. Ev cara duyemîn bû ku dixwest dawî li jîyana xwe bîne.

Du şev li pey vê bûyerê min jê hêvî kir ku ji min re destpêkirin û dawîlêhatina hadîsa Şêx Seîd bêje. Her çend Fehmî Bîlal felc bibû jî hişê wî tevnegeryabû. Tiştên ku dîtibûn û derbas kiribûn, wek ku do bibe, tev di bîra wî da bûn. Me tevan jê re digot "xalo". Beriya ku ez jê hêvî bikim, min eva jê pirsî: "Xalo ma te qet tebakî nenivîsî serhatiyê xwe, yan jî hinek berhemên xwe?" Go: "Belê ewan ê ku min nivîsî, çend sal berê min dabûn hinda yekê Farqînî, lê mixabin dema ku min jê xwestin go xalo ji min negere, ji tirsan min tevan avêtin sobê û şewitandin. Li pey wê jî êdî derfetekî ji bo ku ez ji nû ve binivîsnim bi dest min neket." Xalo ji min re got îşev êdî dereng e, şevêkî dî parî zû were, ez ê ji te re bikûrtî hadîsê bêjim.

Kete şeva dî ez parî zû çûme hinda wî. Min pêdiviyên wî pêk anîn û ez li cem wî rûniştim. Ji min re got "Tu

amadeyî ji bo guhdarîkirnê ra?" Min got "Belê". Wî gote "Di sala 1921ê da Komeleya Îstiqlal a Kurdistanê hate avakirin. Di nav zemanekî kurt de li tevê herêmê rêxistin bû lê ne bi eşkera bûn. Li Diyarbekirê Dr. Fuad serokatiya vê komelê dikir. Ez jî yek ji endamên wê bûm. Di dawiya meha yekê ya 1925an da êvarekî ez hatim malê ku Fatoya diya Mihemed Eliyê Kendeşî wa ye li mala me ye. Min lê pirsî û paşê min gote halê Mihemd Elî çawa ye? Got "Baş e, lêbelê mahkum e. Wî min şande û gelekî silav li te kir û hêvîkî ji te dikir ji bo tu du roj paşê biçî Diyarbekir û di dêla wî da têkewî mehkema wî, doz doza erdan e; a ku di nava me û mala begekî Diyarbekirê da didomîne." Xalo got, ez gelek aciz bûm. Min got "Vî zivistanê ma kes li Diyarbekirê tunebûn ku vê şixulê pêk bîne, tu hatî heta Licê Fato?" Got: "Ez pîrek im, kî nas dikim?" "Di vê navberê da diya min berê xwe da min û got: Şerm e, Fato heta bi vira hatiye û hatiye mala me, divê tu herî. Êdî peyv ji min re nema. Min gote başe ez ê herim. Roja dî em çûn Kendeşê gundê wan û ji wir jî ez çûm Diyarbekirê. Ew şev ez bûm mêvanê miftî Omer Efendî. Serê sibê ez zû rabûm min diva ku berê ez herime ziyaretiya Dr. Fuad û hêj herime dadgehê. Roj hê nûh hilhatibû, ez di sûka Melîk Ehmedê da diçûm. Dikan hê yek heban vebûbûn. Min dî dikanekî qapaxekî deriyê wî vekirîye û di hundir da yek wa ye xeberê Cumhûriyetê dide. Ez matmayî mam. Ji min re bû xem, ez çûm dikanê ku Şêx Tahîrê birayê Şêx Seîd e. Wan



Ji milê rast ve: Fehmî FIRAT(Fehmî BÎLAL) û Şêx Zilkîf

tebayên ku ji dikan sendiye ji berêkê ve dike heqîbê û ji berêkê ve xeberan dide. Xwedanê dikanê li piyan wer bi çavekî tirsî lê dinêre. Min gote Tahir tu dîn bûyî, ku vêga pölêsekî yan jî bekçîkî di vir da derbas be wê çî were serê te, herhalde tu nîzani? Şêx Tahir got "Fehmî tu ji ku derketî?" Wê gavê xortekî bi kefi û egal jî li wê derê bû. Wî xortî got "Fehmîyê Bîlal ev e Şêx Tahir?". Wî gote belê. Ew xort jî zivirî got "Ez li te digirim, kerem ke em herin". Em hatin derve min got "Tu kî yî ?" Got "Ez Mehdî me, birayê şêx Seîd, ez hatim Licê mala we, diya te got çûye Diyarbekir". Min got "Xêr e?" Got: "Kekê min mektubekî ji ter e şiyandiye û ev e mektuba wî ye." Xwest derxîne , min got acele meke, em herin ciyekî minasib hêj derxe. Em çûn muayenexana Dr. Fuad. Du

hevalên wî li nik wî bûn, xerhatin da me û got "Xêr e, vî di sermayê da tu hatî bajêr?" Min got: "Ev feqî newxweş e, divê tu wî muayene bikî". Wî got: "De rûnin heta mêhvan herin". Qasekî şûnde mêhvan çûn û hê ji min pirsî. Min ji Mehdî re got "Ka mektubê derxe". Mehdî mektûb derxist û da destê Dr. Fuad. Diqtor mektub wer bi dilekî kûr ve xwend û paşê da dest min û min jî xwend. Di mektûbê de Şêx Efendî dinivîsand "Malumê cenabê we ye jî, çendekî berê Xalid Begî girtin û wî birin Bedlîsê. Heftekî berê qaymeqamê Kela Xunusê ji min re xeber şand û xwedêgiravî ji min hêvî kiribû dema ku roja îne ez bo nimêjê herim mizgefta Xunusê, piştî nimêjê serîkî li daîra qaymeqam bixim, da ku sohbetekî bi min re bike. Di rastiye de ev ne sohbet û ne jî vexwendina sohbetê

bû, dixwestin min jî wekî Xalid Begî bigrin bibin Bedlîsê. Pîlan ew bû ku berê îne mifrezekî siwarî ji Erzromê bi rê dikeve û wê roja îne were Xûnusê. Dema ku ez herim hinda qaymeqam, wê min bigrin û bibin. Ev mifreze tê gundê Teşkesenê û li nav gund belav dibin. Amirê wê mifrezê yûzbaşîyek e. Ew dibe mêhvanê şêxekî û piştî şivê şêx jê dipirsê dibêje "Yûzbaşî xêr e, vî zivistanê hûn bi ser berfê ketine?" Yûzbaşî dibêje: "Sibê wê Şêx Seîd were qaymeqamlîxê, em ê wî bigrin bibin Bedlîsê." Dema razanê tê, Yûzbaşî dibêje şêx efendî tu jî here razê. Şêx dertê diçe merivekî xwe ji xewê radike, mektubekî dinivisîne dide wî merivî û dibêje tu vî mektubî bibî bigehîni Şêx Seîd, hêj ku nehatibe Xûnusê. Mêrik bi lez û bez diçe Qolhesarê, gundê ku Şêx lê dimîne, lê hîn nagîje gund li nêzikê Xûnusê rastê Şêx û civata li pey tê. Mektûbê dide Şêx, Şêx mektubê dixweyne û êdî naçe mizgefta Xûnusê. Di binîya Xûnusê da gundekî bi navê Erusê heye, Şêx li wir nimêja îne dike û vedigere diçe. Roja dinê bi çend çekdaran ve ji gund dertê û berê xwe dide Çebaxçûrê û tê heta digîhe Darayenî. Gelek çekdar tevî wî dibin û li wir mektûbek dinivisîne dide birayê xwe Şêx Mehdîn, dibêje "Here Licê hinda Fehmî û bira bi te re were Diyarbekirê û bi hev re herin hinda Dr. Fuad ka emrê wî çi ye?". Piştî ku min jî mektubê xwend. Dr. Fuad vegerya got "Xorto here ji birayê xwe re bêje bira wan çekdarên dora xwe bişîne malên wan û ew bi tenê here herema Siwanê li gundekî bicî bibe, bila kes pê

nizanibe heta buharê."

Piştî ku Mehdîn xatir xwest û çû, qasekî ma ji min re got "Fehmî, ev nebû, çavê min ji vî xortî nabire ku karibe vî karî pêk bîne, tu here çawa dikî bike bira Şêx bi tenê here herêma Siwanê." Min got "Ez hatime têkevim dadgehê ji bo doza Mehmed Elî û mala Barutçîn. Doza erdan e." Wî got: "De rûne" di wê navberê de şiyand pey Qadrî Begê mala Cemîl Paşa û jê re got "Divê tu di dewsa Fehmî da biçî dadgehê, Fehmî wê biçe îşekî dî bibîne. Qadrî Begî got "Baş e, ez ê biçim." Qadrî Beg çû û ez jî bi rê ketim.

Wê demê Çemê Dîjlê qeşa girtibû, ez bi siwarî di ser ra derbas bûm. Heta derengê şevê ez giham gundê Îyîbanê ku di bin milkîyeta min de bûn. Ez çûm mala nazirê xwe, mi jê re got divê tu hespê baş têr bikî û sibê zû xurînî ji min ra hazir bikî ku ez zû herim. Nazir çû alif bide hespê, ez jî razam. Şefeqê zû gazî min kir, ez rabûm bi rê ketim û rast çûm Darayenî. Lê di nivê rê da ku jê re dibên Qayma Reş, liqê Şêx û çekdarên pê re bûm û ku bi beyt û selawatan dihatin. Êdî keysa xeberdanê çênebû. Em hatin Licê, wan çekdaran tev li nav Licê belav bûn. Xelkê wan bir mêhvandariya xwe û Şêx jî bû mêhvanê Mehmed Begê. Çend mêhvanên min jî çêbûn. Piştê şivê em çûn ba Şêx, heta dema razanê li wir man. Dema razanê min mêhvanên xwe anîn malê, ew ketin xewê û ez rabûm çûm hinda Şêx. Şêx û Mehdiyê birayê xwe bi tenê li odê mabûn. Şêx gote Mehdî "Here ber derî, yek neyê gohdariya me." Ku Mehdî çû, Şêx got "Bêje

Doqtor got çi?" Min go "Ma Mehdî ji te re negotiye?" Got "Belê, lê min divê ku ji devê te seh bikim." Êdî emrê ku Doqtor dabûn min jê re got. Wî gote "Baş e." Bû serê sibê, em çûn wan bi rê kin, Şêx li dervayê Licê gote wan çekdaran "Her kes herin mala xwe." Tevan xatir xwestin û belav bûn. Şêx û du siwar bi tenê diçin û digêhin binê gundê Biryasê, Şêx Tahîrê birê wî digel du rûsipîyên Serdî tên pêşiya Şêx û ji wî hêvî dikin ku şevkî bibe mêhvanê wan, yanê biçe Serdî. Pir hêvî dikin û Şêx dibêje "De baş e, ezê ji vir herime Siwanê." Ew şev li Serdê dimînin û serê sibê hew dibînin ku Salih Begê Hênê digel çend siwaran hatin Serdê. Salih Beg dibê "Şêxê min divê tu şevkî werî mêhvaniya min jî." Bo vê gelekî lava dikin û rojtira dî şêx diçe Hênê jî. Roja dî Şêx Evdirehîmê birayê wî û digel hinek giregirên Pîranê têne Hênê. Îca ew dibêjin divê tu şevkî bîy Pîranê û bibî mêhvanê me jî, hêj ji wir biçî. Şêx wan jî naşkîne diçe Pîranê û ew bûyera ne bi xêr li wir diqewime "

Min hazîrîya vegerê kir ku werim ji Dr.Fuad re bêjim min emrê te pêk anî. Min hesp anî der li ber kevirê siwarîyê, ez daketim ser kevir min lingê xwe kire zengû û dikir ku siwarê hespê bim, min dî yekî bi dimilî got "Qurban han ji te re mektuba Şêx." Lê ew meriv bi çek bûn, dilê min wek camek şikiya. Ji hêrsan min gotin ji mêrik ra gotin. Ez hinek li ser piştê hespê mam, lê tû çarekî min nema. Ez mam bêgav, min xatir ji malê xwest û bi rê ketim. Ez hatim hinda gundê Elîbardaxan gihome Şêx. Em hatin

gundekî jêr digotin Dêrimtêç. Ew şev çekdarên Şêx Diyarbekir dorpêç kirine. Piştî şevkî şêxekî Qerejdaxê digel gelek çekdaran ve hatin hinda Şêx û gotin em jî di emrê te da ne. Min got "Şêx'im, ku ez bim bila ev çekdarên Şêx li dora sûra bajêr bisekinin, ji bo ku leşkerê bajêr dernekevin der. Em jî derbasî sûrê bibin ji bo ku Fransîz alîkariya me ya çekên giran bikin. Em bi van tîfingên eynelî nikarin li hember ordîya çekdar xwe biparêzin. Ji wir ve tir jî hêzekî çekdar bişîne rûbarê Qerejdaxê. Ji bo ku ji rojavayê ve Alaya Siwarî ya Siwêrekê nikaribe bê vê alî. Ev daxwaza min nehate qebûlkin. Hew çekdaran şandin hêla Siwêrekê. Civata Şêx belav bû û em her kes çûn malê mazûvanê xwe. Dema ku em ê têkevin nava cî, Kazîmê birayê min hat hinda min û got "Kekê civata me ewha biryar da ku sibê Diyarbekir berdest bibe û ez dê bibim mudîrê Banka Zîraetê." Ez kenîyam û min got "Tu hespê me baş têr bike, hespê kî têr be, ew ê xwe xelas bike. Lewre bajarekî wek Diyarbekir bi tîfingên eynelî nayête girtin. Her çekdarekî çend deste fişek digel wan in, ew ê bavêjin, dema qedîyan tifeng dibe darekî di dest wan de dimîne." Bû sibê em hatin nêzikê Qadiyan, peyakî tîfinga wî li ser milî bû ber bi Têrkan ve diçû, min gazî kir got "Xorto kûda?", got "Tîfing bûye dar, gule qedîyan de herin bêçek çawan bajêr tête girtin!.." Ez zivîrîm ser Kazîm min got "Te dît."

Çekdar ji dora Diyarbekirê ve hilkişyabûn, tev hatibûn ber bi Tilelo. Li wir civiyabûn, benda Şêx sek-

inîbûn. Ji bajêr gullê topan dihat dige-  
hîşte Tilelo. Disa li wir min got "Şêx,  
em herne Sûryê." Salih Begî got "Em  
herine çiyar çekdaran berhev bikin."  
Min got "Ev ne îşê çîya û çekdaran e,  
çekdarên ku hebûn tev hatin. Werin bi  
gotîna min bikin; em herne xeta  
Fransayê yanî herne Sûryê eger em  
neçin em dê tev werin kuştin." Vê carê  
jî weke ya êvarê gotîna min pere nekir.  
Êdî em ber bi çiyar ve hildikişyan. Ez  
û birayê xwe çûn gehîştin Licê. Lê ji  
bo ewlehiya xwe em neçûn nava Licê,  
em daketin çiyayê piştî Licê. Ew şev  
em bûn mêvanê Salihê mala Dobir.  
Bû sibê Salih got " Ez ê herim nava  
Licê bo nimêja îne û binêrim hela  
tevgera hikumetê di çî halî de ye."  
Salih çû û min qasekî şûnda Kazim li  
pey wî şande diyarê çîya. Min got  
çavênîya Salih bike, dema ku ji Licê  
zivirî ka bi tenê ye yan pêre leşker filan  
tunebin. Te dî çî dibe çî nabe. Kete  
dana êvarê Salih hat. Min got "Salih çî  
hebû li Licê?" Got balafirê kaxiz  
avêtiye û gotiye bila kesekî bi cîkî ve  
neçe. Sûcdar hew Şêx û dû-sê hebê  
dinê ne. Her kes li kar û îşê xwe  
binêre. Kete piştê esrê em çûn Xincisê.  
Xincis taxekî Licê ye. Lêbelê du  
kîlometir jê dûr e. Em li malek bûn  
mêhvan. Ji bo ku ez xeber bişînim ji  
Tahir Axa ra, Xoce Abdulhemîd û  
hinkî dinê ra, da ku werin em herne  
Sûryê. Bersiva tevan ev bû gotin waye  
balafirê kaxiz belav kiriye û tê de  
gotine kesekî neçin cîkî, tu kesekî sî-  
cdar nahête dîtin. Li ser vê bersivê min  
hêviya xwe ji wan birî. Ez û birayê xwe  
piştê şivê em birê ketin û çûn. Heta  
em gehîştin Kendeşê, bû serê sibê. Me

dî ku Cemîlê Seyda jî wa ye li wir e.  
Mebêj ew jî wê here Sûryeyê. Ew roj  
heta bû hêvar em li wir man. Îca em  
bûn sê kes. Em gihan ba çemê Dîjlê  
me dî ku çem gelekî bilind bûye. Mi  
got "Cemîl de li avê bixe, mêze bike ka  
av bûhûr dide yan nade." Cemîl got  
min "Maşallah(!) hûn dido ne, ez yek  
im, bira Kazim li avê bixe. Eger av wî  
bibe dê tu bimînî, lê ez ku herim hûn  
her du jî dê bimînî." Paşê Kazim li  
avê xist û derbasî wî alî bû û hêj me  
herduwan li avê xist. Em bi şefeqê ra  
gihan gundekî Mazîdaxê. Em çûn  
mala muxtar Cemîl. Got eviya Xelîl  
Çawîş e û ev jî zefiyên wî ne. Hinek  
xwarin danê me û em ji wir çûn binê  
xetê. Piştî ku em derbasî binê xetê bûn  
û hinekî çûn, em rastî konekî mezin  
hatin. Ji bo ku em parîkî bîhna xwe  
bidin, li ber konê hatin xwarê û serê  
hespên me girtin girêdan; me dît ku  
ereb in. Qasê ku me cixarekî kêşand  
min dît ku tevgerên wan nebaş in.  
Mêrekî navsere ku mezinê wan bû, bi  
erebî ji her du kurên xwe ra gote  
"Evana revoke ne, dema nanxwarinê  
em ê wan bigrin, hesp û sîlehên wan ji  
me ra dimînin. Em wan bidin tirkên  
belkî pere jî bidine me." Wan nizanibû  
ku ez erebî fam dikim. Min gote  
Cemîl "Tu bi mahna destmêjê rabe û  
bi çeka xwe ve here, ewana çavê wan li  
kuştina me ne. Tu derketî berê tîfingê  
bide wan û ji me re jî bêje rabin."  
Cemîl bi qesta xwe givaşte serhev û  
gote wan mîsîn bînin ez ê herim  
destava xwe xweş bikim. Ewan av anîn  
û Cemîl bi dûr ket û gule da devê  
tîfingê gote wan "Xwe tev nedin". Ew  
tev man di cî da û ez û Kazim rabûn,

me hespê Cemîl jî girt û em ji wir dûr ketin. Li pêşiya me gundekî kurdan hebû em çûn li wî gundî, rokî du ro em li wî gundî man. Paşê em çûn hinda zabitekî Fransewî û me halê xwe jê re got. Wî gote me, "Vêga hûn li vir bin, ez ê bi walî ra biaxivim û paşê ez ê bi we ra xeberdim." Ji ber ku min bi fransîzî zanibû, ji min şik kirin. Êvarê bi dizîka Cemîl dibin û jê dipirsin dibêjin "Ev meriv xwedan eşîr e yan jî nîfûsekî wî yê zêde heye?" Cemîl jî bi safîtî dibêje kesekî wî tune ye û hew ew û birayê xwe ne. Haya min ji vî çenebû. Em çendekî li wir man, ev zabit tu bersivê nade me. Ez dîsa çûm hinda wî min dît ku bi min re ne jidil xeber dide. Min gote Cemîl em ê herin Iraqê, Cemîl got ez nayim Iraqê. Ez û Kazim çûn Iraqê. Em gihan Mosilê çûn hinda hikumeta Îngiliz. Me got em ev in, yanî ji Tirkîyeyê tîn û em reviyane. Gotin baş e, herine otêlekî em ê ji we ra cîkî bikar bînin. Wê demê Şêx Elî Rîza û digel hinek kesên din jî li Iraqê ne. Ji wan dipirsin dibêjin merivêkî hatiye dibêje ez Fehmî me, gelo rast e. Şêx Elî Rîza çendekî berê ji radyoyê bihîstîye ku Fehmî hatiye kuştin. Şêx dibê derewan dike, ew kî ku heye casûs e, wî bigrin. Du roj şûnde me girtin û avêtin zîndanê. Lê min gelekî di ber xwe da, dawê ku casûsiya min çawan hîn bûne. Heftekî şûnde yekî di jî anîn ba me. Ewî ji min re got ku kurê Şêx Seîd wa ye li Silêmanî ye, eger tu wî dinasî qedrê wî gelek dîzanin. Min arzuhaletî nivîsand û şand ji walî ra. Dawe ku min bibin hinda Şêx Elî Rîza. Dema ku wî min di gelekî kêfa

xwe hanî. Bi vê hawayê ez ji girtîgehê xelas bûm. Min kirin mamosta û birayê min Kazim jî kirin polîs.

Em li wir man, heta ku efoya giştî derket. Piştî derketina efoyê em hatin mala xwe û min sîrgunî Îspartayê kirin. Piştî ku sîrguna me xelas bû, pîreka min û kurê min û keçekî min ku ji pîreka min a dawîn bûn nehatin, venegeryan. Lê ez carna dihatim bi salan li Licê û deverên di dimam û dîsa diçûm. Lê îca ez ji bo mirinê hatime, ji ber ku êdî gelek kal bûme. Ez dibê dema mirina min hatiye...

Piştî mehekî şûnde Xalo dîsa êvarekî agir dayêje nivîna xwe ji bo întiharkirinê. Mîşteriyên Otêlê digihin û nahêlin bişewite, wî dibin nexweşxanê. Li pey wê bûyerê êdî xwedanê otêlê wî negirt otêlê. Got wê otêla min bişewitîne. Îca me wî bir Muş Otêlî. Çendekî li wir jî ma, kurê wî Xeyrî wî bir Licê. Lewre mala Xeyrî li Licê bû. Piştî ku salek û du sal li wir jî ma çû ser heqîya xwe.

*Ez qewetê ji te digrim  
Serê te bi destê dibirim  
Tu nedî min destê bivir  
Ha ez û ha ev kevir  
Ev mesela kurdan e  
Derdê serê derdan e  
Hindek heramzade ne  
Nankorê ewladan e  
Ji bigane ra dibin destgîr û piştgîr  
Kurdan dixin binê nîr\**

\* Muuncu Ogur(Ji gotina A. Melîk Firat),  
Serhildana kurdî-îslamî, r. 113, weşanên Tekîn)




# Yê Ku Peyv Ji Ezman Daxist Erdê: CEGERXWÎN!

Arjen ARÎ

Bi bangdana li dû hev, dîkên xweşxwan berî hilatîna rojê mizgîna rojêke din didin bûnewerên xewwar û xwazêya nivistî. Niha derdawên konê şevê bi destên spêdeya zend-spî ji ser mala xakê tê danhev, bîsteke din Tor çarmedor dê têkeve bin destê tacîdariya rojê.

Wî qewmê ku bi hilatinê re berê xwe dida rojê û roj dixist kefa destê xwe û ayîna xwe fikir, niha bi dû çend qametan de destên xwe ber bi jor ve vedike, duayên dawî li xwe û ummetê bela dike, bi "amînê" re guhkên tejkên limêjê heta limêjeke din lê diqulîpîne...

Bavê Şêxmûs jî vê siharê weke hemû bawermendan piştî limêj û diayên dîdirêj, û selewat û silavvedanê, sakoyê xwe yê li erdê raxistî da hev, li ser piya çend caran destê xwe yê



Cegerxwîn

rastê di ser rûyê xwe re bir û anî, pêlava gizlewêd a ji paş ve bi du pişkokên spî nîşankirî bi ser lingê xwe ve kir, û berê xwe da kerên li hewşê devên wan di cuheran de wenda.

Kerên ku ketibûn ser kaya bi ceh mîna ku zanibûn dê bidin ser rêyeke dîdirêj carcaran firrinî ji firnikên bêvil- ên xwe dianîn û dîsa li cuheran vedi-

geriyan.

Koça wan ne koçeke giran bû: Çend dest livîn, sêl û dergûş...kûzz û çend firaxên tutya...

Barê herî giran pahra kerê boz bû. Bavê malê bi alîkariya Şêxmûsê xwe ferdên ard û kîsên burxul li ser pişta kerê boz rast kir, da bar pişta ker ne-êşîne navteng şidand, du zewr li werîs dan û berê xwe bi kerên din ve kir...

Teştî sifr î çarmedor-sor û binî

neqr-neqrî li ser bar nediedilî. Ya herî bêkeys test û dergûş bû. Bav li dêya Şêxmûs vegeriya, bi dilekî peneber, pirsî:

- Hûrme, dergûş bi cih nabe. Ka em wê nebin?

Dêya ku ji berî bangdana dîkan de li ser piya hewş û hundirê xanî mîna gêrikekê tevdida, bi hûçikê kiras pozê xwe paqij kir, keserek veda û bi dengêkî mişt gilî û lava, got:

- Ev textik landika van zarokên bi pêya ketî ye. Warê me dimîne, ma em dergûşa zarokan jî bihêlin ji van zaliman re?

Zalimên dikirin ku ev malbat serê vê sihara zû zevî û xanî û rez û werzên xwe li şûn xwe bihêle û ji ber zext û zordariyê gund terk bike û terkedinya bibe, merivên dê û bavê Şêxmûs bûn.

Pêşyan belasebeb negotibûn 'ya ku meriv dike, dujmin nake!' Di wê hîna ku xirepiş bi gund ketibû de, ne ji hêla dê, ne ji aliyê bavê, musulmanekî Xweda nehatibû li deriyê wan nedabû, û negotibû 'bavo, we xêr e? hûn ê bi kû ve biçin?'

Birêwîkirin li hêlekê; pismamê wan î ji heft bavikan de yê hev, pala xwe dabû şenca hewşiyê li hewşê, çixara qaçax di nava lêv û tiliyên xwe de dibir û dianî, bi du guhên miç, dengê pêlav û siman dipa, da mîna gûrekî sibatê dade hewş û hundirê xalî!

Şêxmûsê 13 salî ku niha berê wî ketibû war û welatên di xewnên şevan de ne dîtî û ne bînayî, ji ber ku ji merivên xwe yên di tenga xwe de pirr hez dikir, di vê kêlika ku bi dû dê û bavê xwe de dabû ser rêya çûn û nehatê de, hemû çivîkên dujminahiyê ji hêlîna dilê wî firiya bûn, ji niha de

pêlên bêrikirinê qerexên dilê wî dipelandin, hemû şanên laşê wî yê rexî didan ber xwe, û mêjiyê wî bi hestên wî re ditevizand.

Li serê wê stûkurê, Şêxmûs dîmenê Hesarê; qesra mala axê, gasîn, kaniya jêr, spîndarên pel-lerizok... bîh û tûreşkên porgijk... bi nerîneke mişt bêrî di kevalê çavên xwe de bi cih kir, keserek zarokane veda, li vî evrazê ku du qevzên din bavêje dê nema Hesarê bibîne, hemû bîranên xwe ji nava tar û taxan dan hev, piştî du sê xilolîkan, piştî xwe da Hesara zaroketiya xwe.

Çavên Şêxmûs ên ku niha dixwestin mîna kaniyekê biherikin bi ser coyên rû de, li yên xalan çûbûn. Keskinê nefelî, bi bîriqîn, û awirşîrîn bûn. Dîvî û dêmên xwe jî ji wan wergirtibû. Lê bi qama xwe li hêla apan çûbû; navmil fire, bi zend û bend, te yê bigota pêlewanek e.

Hê di vî temenî de ku destê xwe diavêt tehtekê, te yê bigota wê ji kokê de, ji erqê binî de dê hilbike!

Yê ku gotiye 'heyîn hêz e, çi qasî rast gotiye!'

Tûneyî bi ser tahtên çîyan de neyê, piştî mirov dişikîne!

Ku bêxwedîtî jî bi ser tûneyiyê de bêt, mîna lehiya lêmişt li berê; Xweda mû'înê meriv be!

Ereb dibêjin, 'dilê her kesî bi sêwîyan dişewite, lê her kes zikê wan têr nake!'

Şêxmûsê ku hê têr li kolanên Amûdê negeriyabû, di binê çavan re tolaz tolaz li qîzeke esmer bi dilbijokî nemeyzandibû; ji hemû tax û mihelên Amûdê pêşî Girê Şermola nas kir, girê komcivîna miriyên Amûdiyan..

Şêxmûs di salekê de, li dû hev pêşî

bav bi dû re dêya xwe spart bextê xaka arîyî yê Girê Şermola...

Piştî mirina dê û bavê peyva ereban rast derket: ne xuşkê na bira... nekarîn hembêza xwe ji vî naşî re bikin landika jiyîn û hedanê.

Jixwe xuşkê... xuşka ku Şêxmûs bi heza lawekî jê hez dikir û bi çavê dêya xwe (?) lê dimeyzand, xwest wî bike şivanê çar kulekên xwe! Şêxmûs ne yê şivantiyê bû û ne jî yekî ku karibe bibe hemalê minatê. Piştî sê çar heyvên bi nanûzikê, rojekê şiva di destê xwe de mîna ku li bextê xwe bihejîne, bi vir de wir de dawêşand, du sê caran bi kerb tû kir erdê, çend kulekên di çêrêyê de jî şûm û bêcir da ber heytîn û şivê, û berê xwe da mala xuşka xwe.

Ne dema bêriyê bû ne jî wexta hatina malê. Kulekên ku dabûn pêşiya xwe, rast ajotin hewşî, tûrikê bi milê xwe ve, di ser stûyê xwe re anî, û bi bahc bi ser xuşka xwe ya ku zîq zîq lê dinerî de, hîlbû:

- Hişte tûrikê te. Gepa nanê te serê te bixwe! got, û ne berger, ne dijûn, ne heyran û qurban... çi deng nebîr xwe; li yek tûşê berê xwe da bi hêla Bakûr de...

Xuşka ku pêxwas bi dû de ketî, piştî demekê rawestiya, bîhna xwe berda, û mîna ku nexwaze kesek bi dengê wê bihese, di ber xwe de:

- Sêwîke heram, tu ê li kû binivî, li kû bixwî vexwî? got û bi gavine jovan vegeriya mala xwe!

Piştî 'heft heşt salan hin bi hin' û têr-ezab Şêxmûsê ku navê xwe bi dû navê Hesarî de dê bike Cegerxwîn, û di nava xêrxwaz û xêrnexwazan dê bibe 'Seydayê Helbestê'; îcaza xwe werdigire û li Hasda Jor 'ser bi şaş' û bi

'cibepoş' dest bi melatiyê dike. Îlm, zanîn ew tiştê ku Şêxmûs daye dû ye; lê belê melatî? Di demeke kurt de, ne dîn; 'dîndarên serdemê; şêxên bejîk î rih-xweşik, teriqetên xîzanxapînok, meleyên rihbost û zikexur, axayên pevy-ferman û serîbirr... xulq û derûnê Cegerxwîn ditengjînin; ew jî ji bahc û kerba nezanên bindestên ji aqilê xwe razî, riha ta ta hinetîtkî dide ber devê guzan, serî ji bin şaşikê derdixe, û temberiya xwe bi paş de diqulipîne.

Ew, êdî li gorî gelek kesan merivekî 'dîn e', 'kafir e', 'yekî jî rê derketî' ye!

Jixwe piştî 'feqîtiya Feqî', 'melatiya Mela' û 'seffartiya Xanî' 'dînîti bû ya ku Cegerxwîn xwe radikêşayê. Şikestina serhildana Şêx Seîd û du-sêbarekirina Mem û Zînê, kir ku 'dîn' bibe 'dînekî' ku bi qeyd û merbedan jî neyê zevtê!

Elhmedê Xanî bi 'naqosa mezin' nekarîbû kurdan şiyar bike!

Wî jî biryar da, ku bi 'ceres' û bi sewta helbestê li deriyê her kurdî bide!

Vê viyanê, bindestiya qewm û e'wametiya xelkê kir ku piştî koçberiya ji Hesara bavûkalan vêca dev ji Cehinnem û Çêlekê berde, bêt li Qamişloka ku wê demê di bin dagirk-eriya Frensawîyan de ye, li Taxa Xerbî bi cih bibe!

Li gorî Çêlek û Cehinnemê Qamişlokê navendek e. Navendeke hewn û sebra her cûre mirov, ji her ol û ayînê, ji her qewmên ji ber devê şûr filitî! Di nava van mirovên her yek ji hêlekê, penaberên Bakûrî jî cihekî girîng digirtin. Berî ku bêt û li vî bajarokî bi cih bibe, Ermenan, Asûriyan, navê Cegerxwîn bihistibûn,

û di mitaleya dîtina wî de bûn.

Çendî di 1945ê de dîwana wî ya yekemîn bêt çapkirin jî, Cegerxwîn mîna 'reşkê şevê' helbest bi helbest li Kurdistanê digere! Yek ji wan helbestkarên ku bi helbesta xwe di ser sînoran re qeviziye, di nava Kurd û Tirk û Ereban de hatiye naskirin e Cegerxwîn!

Li hêline mîna Serhedê ne weke şa'irekî, nola dengbêjekî têt naskirin. (Agahiya Kawa Nemir)

Bi baweriya min murîdên helbesta Cegerxwîn ji yê Şêx Ehmedê Xiznewî jî pirtir bûn.

Yek ji wan murîdên pirr, ku min di salên 70yî de nas kir Ehmed Kurdî bû. Kurdî ji Seyda bêtir helbestên Seyda jiber dizanibû. Wê demê jî bîra wî ya zexm ya vî mirovî ez heyirandibûm: Pîra Torê, Kîme Ez, helbesta çîrokî ya ku ristek jê 'bû qidqida mirîşka/dîka xwe da enîşka'...

Bîra min ku min neşehetîne, cara ewil min di destê Mûsa Enter de dîwaneke wî dît!

Wê gavê ez 'peyrewê' Nazim û Ahmed Arîf bûm. Û pirr di bin bandora helbesta Nerûda de bûm, bi taybet helbesta bi navê 'Almeriya'nin Kan/Xwîna Almerîa!

Piştî girtin û hepsitiya bi qasî şeş heft rojan, û peyva Mam Mûsa ya ku di rêwitiya trêne de aresteyî min kir, ma tu jî lavoo?! Hişê min hate serê min, û min jî weke Seydayê xwe da ser rêya 'sê car faîlat'.

'Sê car faîlat' li gorî baweriya Seyda di nava şêwaz û qalibên heyî yê şî'ira dîwanê de ristesaziya herî hêsan e. Ku em nexwendetiya kurdan, çarkenarî û

bandora zimanê degerkeran, bi taybet ji ber olê karteka zimanê erebî ya li ser jiyana civakî bigrin ber çavan, em ê ji erdê heta bigihe ezman Seyda mafdar bibînin di hîlbijartina zimanê sivik û zelal yê ku bo helbesta xwe hîlbijartiyê.

Jixwe peyva wî ye 'min peyv ji ezmanan daxist erdan!'

Wî danexistibûya 'peyv' hê jî dê di nava çar dîwarên medreseyan de, di nava refikên kitebxaneyên mela û alîman de di taritiyê de bimaya!

Neheqî jî li helbestê bête kirin, dawîya dawî bo helbestkarekî zimanekî bi raz û mişt hêma û pirr-wate; û zimanekî zelal î fesîh ku her kes jê fam bike, hîlbêjiriyek e. Ev hîlbijerî li gorî nerîna mirovî ya li helbest û hunera helbestê; û rewşa civakî, aborî, siyasî... û çandî dikare cuda cuda be.

Ehmedê Xanî xwestibe bi afirînerî û hunerbaziya xwe ruhê Mela, Feqî, Herîrî 'hey' bike, Cegerxwîn jî carcaran bi Mela re ketiye 'heft û heştê! Lê wî, berê dengê helbestê ji dol û nawêlan razê dagerandiye, ji ziyan û ziwana biyan xalî kiriye û spartiyê hêza bangê!

Banga Cegerxwîn, bi qasî banga li kurdan bangeke li mirovahiyê ye. Li herêma Serhadan, Serhedîyan ku ew weke dengbêjekî naskiribin û bi nav kiribin, dengê wî negihîştibe guhên wan... banga wî bo 'reşikên bindest' e, bo tekoşerên li Asyaya Nêz û Dûr e... û heta ku bigehe erdnîgarên din...

Lê, çi dibe bila bibe, Cegerxwîn jî kurdûn û kurdayetiya xwe qevzekê jî xwe nade paş!

Tê gotin ku helbestkar bê welat in! Ev gotin rasterast li bejn û bala

Cegerxwîn têt. Kurdistan perçe perçe be jî welatekî wî heye: Ew geh li Başûr li rex Sebrî Botanî bi kincên pêşmergeyan tekoşerekî Kurd e, geh li Gîlala di dîwana nemir Barzanî de xweşsohbet e, geh li Rojhilat li Sine û Mehabad e, geh li Bexdayê mamosteyê zimanê kurdî ye.

Li hepsa Mezê jî gellek caran bûye mêvan!

Heyranê Heval Stalîn be jî, îstirakiyetê biparêze jî ji dil û can, ew û Ba'hsî li hev nakin di biwarê çareseriyê pirsê kurd de!

Ku saziyekê nasnameya hemwelatîyê gerdûnê bidayê jî, wî 'nemiwatintiya' li Qamişloka Binxetê nedida pê.

Şa'irekî mîna Cegerxwîn bi axa xwe ve hişk girêdayî û temek siê gorî bindestiya kurd û Kurdistanê kiribe, dikare navê wî Hejar be, dikare Ehmedê Xanî be...

Ew, Cegerxwîn bû.

Di navbera Bateyî û sedsala xwe de pira herî qayîm.

Bi qasî hezkiriyên wî dujminên wî jî pir bûn: El Muxaberat, şêxen qewm-firoş, axayên kedxwîr û hevpişkên dujmin, û xîzanên nezan...

Dîtina wî piştî salan bû nesîbê min.

Havîna 76ê bû çûm seredana Seydayê xwe.

Mala wî ya li Hara Xerbî ji kelpîç û axê, nizme, hima bêje wêranxaneyek bû.

Dema ku min xaniyê wî û yê hin siyasetmedarên wê demê berawirdî hevdu kir, serê min ji ber xwe ve berjêr bû, min ji xwe jî ji şa'irtiya xwe jî û ji kurdayetiya xwe jî fihêt kir.

Şopên wê fihetê hê jî di dil û derûnê min de xwedî dews e. Min feqirtiya şa'irekî xwediyê şî'ira 'Kîme

Ez' qebûl nekiribû. Lê di wê xizaniya eşkere de maqûliya wî, bi xwe bawer axaftina wî, rûniştina wî ya mîna ya esilzadeyan ez bi ceger kiribûm, û kiribû ku bi du sê peyvên li tevî sohbe-ta wî bibim. Di nava guftûgoyê de çandî bi awirên xwe dipirsî bê ez bi çi karî mijûlîm jî, min nedixwest mijar dagere ser helbestê, û min nediwêriya qet bi helbestkariya min bihese! Heke gotibûya 'ka helbesteke bixwîn!' Ez wê kêlikê bimrama. Wê kêlikê te xencerek li mêlaka min bida, xwîn dê ji min nehata!

Min di wê saet û nivê de her çavên xwe ji çavên wî revand!

Çiqasî bi çûrisî bûn!

Tayekî reş jî di nava porê wî nedixuya.

Porekî ewçend çîl-spî, bi tov û bi paş de şehkirî ençex karibû yê şa'irekî bûya.

Di dema xatirxwestinê de, daqûlî destên wî bûn, erza min şikand, 'Ez ewçend extiyar im ku tu tê destên min? Rûyê min ramûse, xorto' got. Min bi siyanet hinarkên xwe gihandin hinarkên wî. Li devê deriyê hewşê, dema ku min xatir jê xwest, min ev jê re got:

Seydayê min, min û qewmê min efû bike! Xweda 'emrekî dirêj bide te. Bi soz be dema tu bimrî ev qewm tirba herî spehî dê jo bo te ava bike...

Cegerxwînê ku li devê derî bi rodroşambir dişibiya maqûlekî rojavayî, bi bişîrîn pirsî:

- Tu ji kû zanî, kuro?

Min zanibû.

Ji ber ku vî qewmî ne ji zindiyên jî miriyan hez dikir!

14. 08. 2007 Amed

# Hostayê Peyvan: Şêx Eskeriyê Axtepî

Fehîm Işîk

Berî ku em behsa Şêx Eskeriyê Axtepî bikin, bi kurtî be jî divê em behsa Axtepiyên din, bi taybetî jî behsa Şêx Evdirehmanê Axtepiyê bavê Şêx Eskerî bikin.

Nivîskarî û şêxîtiyên Axtepiya, bi Şêx Hesênê Nûranî destpê dîke. Şêx Hesênê Nûranî yek ji şêxên mezin ê Nexşibendiyan e. Lê bi qasî ku em dizanin ji nivîsinên Şêx Hesênê Nûranî gelek negihîştîye roja me; ji bilî *Maiyeta Elmiştanûl*... Ev berhema Şêx Hesênê jî heta niha nehatiye çapkirin. Ev berhem jî 96 rûpelan pêk tê û di sala Hicrî 1266an de hatiye nivîsin. Tê de behsa silsîleya îlmê tesawufî tê kirin.

Her çiqas mezinê malbata Axtepiyan Şêx Hesênê Nûranî be jî yê di nav malbatê de bi zêdeyî tê naskirin, kurê mezin yê Şêx Hesênê Nûranî, Şêx Evdirehmanê Extepî ye. Şêx Evdirehmanê Axtepî li pêy xwe çar



Şêx Eskerî

pirtûk, salnameyekî Rûmî û çend wergerên din hiştiye. Ji bilî helbestên Kurdî ku piranî bi mahlasa Rûhî û Şemssettîn nivîsandiye, hin helbestên wî yên Tirkî jî hene.

Birayên din yê Şêx Evdirehman jî li pey xwe hin berhemana hiştine. Hinek ji vana hatine çapkirin û hinek jî tenê di nav meleyên medreseyan de mane û bi tîpên Latîni nehatine çapkirin. Ji ber ku babeta nivîsînê ne ev e, emê behsa berhemên van hêjayan bi dût û dirêj nekin; lê bi kurtî be jî divê em hin tiştan bêjin:

Çar kurên Şêx Hesênê Nûranî hene. Her çar kurên Şêx Hesên jî li pêy xwe hin berhemana hiştine. Lê bi qasî ku em dizanin tu berhemên Şêx Mihemed Nûr îro di dest de ne mewcûd in. Yê Şêx Mihemed Can, Şêx Mihemed Sîrac û Şêx Evdirehman di destê malbatê de mewcûd in û hin berhemên van hêjayana ango berhemên Şêx Evdirehman û Şêx Mihemed Can bi amadekirina Mele Zeynel Abîdîn Zinar bi tîpên Latîni jî hatine çapkirin.

Her weha neviyên Şêx Hesênê Nûranî jî li pêy bav û kalên xwe meşiyane û ew jî dest avêtine qelêmê. Nas- kiriyên neviyan jî Şêx Kerbeleyî Axtepî û birayê wî Şêx Eskeriyê Axtepî ye.

Wekî kurte gotin ya li ser pirtûkên malbatê divê em vê yeka jî binin ziman ku ev berhemên malbatê bi piranî kurdî ne; lê di nav wan de yên bi erebî hatine nivîsîn jî hene.

### Nivîskarê Çîrokên bi Helbestkî

Şêx Eskeriyê Axtepî nivîskarê kitê- ba *Iqdê Dûrfam* û *Keşkûl* e. *Iqdê Dûrfam*, çîrokên Kurdî ne ku Şêx Eskerî van çîrokana bi helbestkî nivîsandîye. Dîwana din yê Şêx jî *Keşkûl* e û ev

dîwana heta niha bi tîpên Latîni nehatiye çapkirin. Divê bê gotin ku her du berhemên Şêx Eskerî jî bi Kurdî hatine nivîsandin.

Şêx Eskeriyê Axtepî di sala Hîcrî 1316an de, ango di sala 1898an de li gundê Axtepeya bi ser Çinara Amedê hatiye dinê. Şêx Eskerî di sala 1952an de jî çûye ser dilovaniya xwe. Piştî rehmet kiriye jî li gundê ser bi Amedê, ango li Çûliyê hatiye definkirin.

Şêx Eskerî kurê Şêx Evdirehman e. Heta ku bavê wî di heyatê de ye, xwendina xwe li bal bavê xwe didomîne. Lê piştî ku bavê wî rahmet dike xwendina xwe li bal birayê xwe yê mezin, ango li bal Şêx Kerbela didomîne.

Jiyana Şêx Eskerî piştî rehmetkiri- na birayê wî, bi piranî li gundên Erxenî û Egîla(Gêl) li ser Amedê didome. Lê bi piranî li gundê Bîrsina bi ser Egîlê, bi malbatî dijî.

Berî ku em behsa nivîskariya Şêx bikin, em dê hin peyvên Mele Zeynel Abîdîn Zinar bigrin nav nivîsa xwe. Mele Z. Abîdîn, ji bo nivîskariya Şêx weha dibêje:

"Nivîskarê hêja di wan demên tarî û li bin xwîn-xwarî û barbariya Komara Tirkîyê de bizivîye û di şûna şûr de xameya devjehrî lipikandiye û ev herdu pirtûk nivîsîne. Hem jî çî nivîsar! Çîrokên bi helbestkî nivîsîne. Meriv guman dike ku ew pirtûkên bi vê rewşê li dinê tinebûn, yan jî pir kêr hebûn!"

Bi raya min Mele Z. Abîdîn nehaq nîne. Hem kitêba wî ya *Iqdê Dûrfam* û hem jî *Keşkûl*, ji helbestên bi kafiye pêk tên û di herdu kitêbê de jî gelek



Şêx Eskeriyê Axtepî

dersên hêja hene. Ji van helbestên Şêx diyar e ku ew hostayê peyvên Kurdî ye.

*Iqdê Dûrfam*, wekî fabl e. Çîrokekî bi helbestkî ye û tê de behsa ziknebarî û çavreşiya însanan bi devê hin heywanan tete kirin. Çîrok bi kurtî weha ye:

Derweşekî li rê rastî kurikekî tê û penêrê destê xwe dide vî kurikî. Kurik hê ku penêr nexwariye, diwaze dest û serçavê xwe bişo. Penêrê xwe datîne ser keviyekî û dest bi şuştina ser û çavê xwe dike. Di vê navberê de qirokekî tê û penêrê direvîne, dihere li ser darekî datîne. Roviye zexel, dixwaze penêrê ji qirokê bigre. Xwe dike şiklê sofîyekî bibawer û xwe bi qirokê re wekî şahê bilbilan dide naskirin. Qesîde û beytên welê dibêje ku qirok bi rastî bawer dike ku rovi şahê bilbilan e. Qirok radibe, penêrê xwe dide roviyê. Lê roviyê çavnebar û zikbirçî, têr nabe, fen û futê xwe didomîne. Ji bal qirokê dûr dikeve û li rê rastî dûvekî pez tê. Dixwaze ev dûva jî bixwe. Lê dûv, dafikê nêçîrvanekî ye. Rovi ku xwe çawa nêzî dûv dike, dikeve dafikê û dibe nêçîra nêçîrvan. Nêçîrvan li dawiyê serê roviyê jêdike.

Li *Iqdê Dûrfam* de, hin beyt bi tirkî jî hatine nivîsîn. Bêgûman, di pirtûka 204 rupelê ku ji 12 beşan û 2584 malikan pêk tê de, tenê çend misreyên bi tirkî hene û ew jî bi piranî hin pêsgotinên tirkî ne. Şêx, bi van peyvên tirkî jî dilîze û bi hostayî van pêsgotinan bi kurdî şirove dike.

Divê em carekî din jî bêjin ku ev çîroka li *Iqdê Dûrfam* hatiye nivîsîn tev bi helbestkî ne. Em hin misreyên vê pirtûkê wekî mînak jî binivîsîn, wê nivîskariya Şêx Eskerî delî baş bê



zanîn:

"Di 'alem de seraser qet kem û bîş  
Nemabû xeyrî yarî wan bizan îş

Ji rez û 'îşweyên dîlber wuha giş  
Mufserreh pir dibûn hem mest û bêhiş

Bide saqî di vê navê qedehkê  
Di dil de hîs bikin em jî ferehkê

Dixwazim saqiya pir mestî bim ez  
Nebim mehw û fena ta hestî bim ez

Tu zanî nabe rehet ev dilê jar  
Ji derdê vê denî dunya wekî mar?

Bide ta mehwî bim da hestî bim nû  
Ji rengê dîlberê ku mestî bim nû

Bide camek hevalî ey dîlara  
Ji hiş xistim firaqa yar û yara"

Ev kurtemisrayên ku me ji kitêba  
Şêx Eskerî wergirt, ji bo nasandina  
hunera qelesa wî ye. Lê ew behsa  
gîrîngiya nivîsîna bi zimanê Kurdî jî  
dike:

"Gelek şêrîn e ev ezmanê Kurda  
Derîxa! Me ji dest yekcarî berda"

Belê, wekî Şêx jî dibêje, zimanê  
kurdî şêrîn e; lê mixabin me dev jê  
berda ye...

Ji bilî *Iqdê Dûrfam*, divê em hinek jî  
behsa *Keşkûlê* bikin:

*Keşkûl*, 104 rûpel e û Hicrî 1412an  
de hatiye nivîsîn. *Keşkûl* jî wekî *Iqdê  
Dûrfam* bi kafiye hatiye nivîsîn. Lê yên  
tê de hatiye nivîsîn ne çîrok in; piranî  
beyt û qesîdeyên Şêx in ku hin ji van  
beyt û qesîdeyan li ser jiyana rojane ya  
wê demê hatiye nivîsîn. Şêx di *Keşkûl*  
de her weha li ser hin şexsiyetan jî

radiweste û bi alîkî ve pesnê hinan  
dide; bi alîkî ve jî rexne li wan digre.

## Di Demên Herî Zor de jî bi Kurdî Dinivîsîne

Wekî li jor jî hate behskirin, dema  
jiyîna Şêx Eskerî, jî alî kurda ve  
demekî zor û dijwar e. Serhildana  
1925an têk çûye û di serhildana  
1938an de jî peywendiyekî di navbera  
Şêxên Nexşîbendî û Alewiyan de  
çênebûye û ev serhildana jî têk çûye.  
Her weha, birayê mezin ê Şêx Eskerî,  
ango Şêx Kerbela jî hatiye nefikirin.

Şêx Eskerî di vê demê zor de  
nikaribûye li Axtepe bimîne. Ji xwe  
berî Şêx Eskerî jî apê wî Şêx Mihemed  
Nûr hatibû li gundên Erxenî, Gêl û  
Çêrmûgê cihwar bûbû. Şêx Eskerî ev  
bingeha apê xwe bikar anî û ji çavan  
dûr û bêdeng nivîsîna xwe ya bi  
zimanê kurdî domand. *Iqdê Dûrfam*, di  
sala 1942an de li Bîrsinê qedand. Piştî  
*Iqdê Dûrfam* jî ranewestiya û *Keşkûlê*  
nivîsand.

Dema jiyîna Şêx Eskerî ne ewqas  
kevn e. Bûyerên wê demê hê jî jibîr  
neçûne û baş tê zanîn. Hewce nîne em  
dûr û dirêj behsa wê demê bikin. Lê  
baş tê zanîn ku piştî têkçûna serihildana  
1938an Komara Tirkîyê bi ser  
ketiye û tiştên li ser kurd û kurdayetî,  
hemû hatine qedexekirin. Şêx, ber-  
hemên xwe yên kurdî tev di wê dema  
tengasî û dijiwariya de afirandîye û dev  
ji nivîsînên kurdî bernedaye. Ev hel-  
westa wî, ray û ramana Şêx û welat-  
perweriya wî êşkere dike.

Em carekî din behsa *Iqdê Dûrfam*  
bikin û hin rengên welatperwerî ya wê

demê, bi kurteşiroveyekî ji naveroka pirtûkê derxin.

Şêx, wekî me li jor jî got, di *Iqdê Dûrfam* de bi awayekî kafiyeî peywendiyên di navbera însanan de, başî û nebaşîyan şirove dike. Li vir eşkere dixuye ku Şêx ji kiryarên hin însanan eciz e; hesudî û zexeliyê, her weha çavnebariyê wekî dijminê mirovahiyê dibîne. Bi ya me rastî ew e ku, hesudî jî, zexelî jî, çavnebarî jî, durutî jî bi têkçûna kurda ve girêdayî ye û Şêx, bi beyt û qesîdeyên xwe ve rexne li vê yekê digre. Têkçûna kurdan, durutiya hinekan jî derxistiye holê û ev jî, tiştên wekî hesudî, zexelî, ziknebarî ne. Şêx, li hember vana radiweste û riya dirustî bi metelokan nîşanî însanan dide.

Şêx tena bi serê xwe maye; birayê wî li sirgûnê ye. Mecbûr maye dev ji gundê xwe berdaye. Tenê ew û hin sofîyên dilsoz bi hev re ne. Di sohbetan de piranî li ser durutiya însanan radiweste û di helbestên xwe de jî rexne li vê durutiyê digre. Tenê dikare vê yeka bike.

Pîştî vegera kekê wî Şêx Kerbela jî rewş, her bi xerabiyê diçe. Şêx Kerbela jî dinivîsîne; lê ew pîştî nefikirinê çî nivîsandiye diçirîne. Li odeyekî tarî de şev û roj ew û qelema xwe tena bi serê xwe ne. Dixwîne, dinivîsîne û dûra diçirîne. Ev nimune bi xwe jî rewşa wê demê dikare ji me re eşkere bike. Lê Şêx Eskerî naçirîne. Nikaribe sohbetên fireh û mezin bike jî, dîsa dest ji nivîsînê, bi taybetî jî ji nivîsînên Kurdî nakşîne.

Ev jîyana nivîskarên klasîk ya kurda, ji alî rewşa dema ew tê de jiyane jî, fikrekî dide me. Lê ev têrî me

nake. Divê, li ser van babetana lêkolînên berfireh bêne kirin. Bi rastî jî pêwîstî bi lêkolînên berfireh hene ku kurd hem berhemên xwe yên klasîk û hem jî afirînerên van berhemên bi awayekî rêk û pêk bizanibe; rewşa wê demê fam bike û bikaribe şirove bike û encamê wan bighîne xwendevanên îro...

Ne ev nivîsîn û ne jî makaleyên bi vî rengî, êdî têrî nasandinên klasîkên kurdî nakin. Her saziyên kurd, her nivîskar û lêkolînerên kurd, divê li ser vê babetê serê xwe biêşîne.

# Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê

Ahmed ARAS

Rojhelatnas û kurdologên Ewropî wexta ku li ser kurdan lêkolîn kirine, di serê serî da li ser folklorê kurdî hûr bûne. Bavê kurdolojiyê Aleksandir Jaba dema ku bûye konsolosê Uris û di salên 1850an da hatiye Erziromê, li ser daxwaza Akademiya Urisetê ya zanyarî, li ser kurdan dest bi lêkolînê kiriye, ewî ewilîn berhemên zargotinê berhev kiriye. Pey ra ewî destnîvisên berhemên klasîk bi dest xistiye û ew şandine Urisetê.

Kurdologên bi navûdeng yên wekî Bazil Nikitîn û Vîlçevskî jî bi girîngî li ser zargotina kurdî sekinîne.

Vîlçevskî girîngiya zargotina kurdî bi vî şêklî aniye ziman “Herçi kesên ku li ser kurdan dest bi lêkolînê dike -bi çi tehrî dibe bila bibe- di gera serî da li ser zargotina kurdî hûr dibe.”

Dewlemendiya zargotina kurdî bala hemû kurdologan kişandiye. Di vî warî da B. Nikitîn weha dinivisîne “Wexta ku meriv li ser zargotina kurdî hûr dibe, tiştê herî balkêş, bêhediya dewlemendiya wê ye.”

Nikitîn, sedemê vê dewlemendiyê waha şirove kiriye “Ji ber ku di nav kurdan da xwendin û nivîsandin tune bûye, yan jî pirr kêr bûye, kurdan hemû tiştên xwe di zargotina xwe de aniye ziman.”

Zargotin çi ye? Kilam, destan, kilamên destankî, mesele û metelok in. Lêbelê eslê zargotina kurdî di esasê xwe da kilama kurdî ye. Ji pirs û gotinên pisporên Ewropî jî diyar dibe ku kilama kurdî li ser vî esasî tê şirovekirin. Kilama kurdî nasnama kurda ye. Dengbêjên kurdan li ser hemû bûyerên ferdî, civakî û siyasî kilam û destan afirandine. Ji ber wê yekê meriv dikare bêje ku ew bi her tehrî arşîva kurda ye.

Destanên kurda, di dem û dewranên kevn da rewşa jiyana civakî çawa bûye, mantelîteya kurdan çawa bûye, vana nîşanî merivan didin.

Di van du sed salên dawî da çiqas bûyerê siyasî bûne, dengbêjan li ser wan kilam derxistine û ew kilaman îro jî di nav gel da tên gotin.

Di dem û dewranên bihurî da, kur-

dan bi wasita kilamê bi hev ra pêwendî girêdane. Kurdên ku li deverên cuda-cuda bûne, bi saya kilama kurdî ji hev haydar bûne. Kilama kurdî di eynî wextê da wezîfa medyayê aniye cî.

Wexta ku dengbêjan li ser bûyerên civakî kilam afirandine, ew bi hostetî û bi qaîde meqamên xweş va anîne ziman, gel wan ecibandine, di nav xwe de xwedî kirine û ew derbasê deverên din kirine. Mînanî ça ku meriv kevirê davêje gola avê, ciyê ku kevir lêdikeve, av pêl dide, ew pêl fire dibe, dice xwe digihîne qeraxê golê, eynî wusa.

Kilamên kurdan mînanî stranên gelên din ne tenê stran in. Taybetiyên xwe hene. Ew hem stran in, hem jî belgeyên dîrokî ne. Hem neynika sosyolojiya kurda û mantalîteya kurda nin û hem jî xezîneya zimanê kurdî ne.

Ew kesên ku li ser kurdan roman dinivîsin, li ser dîroka kurda xebatê dikin, li ser zimanê wan lêkolînan dikin, bi mûzikê ra mijûl dibin, li ser rewşa jiyana civakî pirtûkan dinivîsin, eger ji kilama kurdî haydar nebin, kî çî dibêje bila bêje, hemû çalakîyên wana kêm in, bîngeha wan lawaz e.

Bo mînak, bi kurdî ez çend tiştan bêjim; meriv dema li destana Kerr û Kulik mêze dike, tê derdixe ku dem û dewranin kevn da, di jiyana civakî da koçerîti pirr gumrah bûye. Di bûyerê da jin jî bi qasî mîran xweyî rol bûne. Wexta ku meriv qewlê xwe birrî, mirin jî tê da hebe ji sozê xwe venagere. Dîzî eyba herî giran e, lê talankirin nexşê mîranîyê bûye.

Di destana *Memê Alan* da, meriv (di şexsê Qeretajdîn da) xerîbdostî, mendî û fedekariyê dibîne. Di şexsê mîre Cizîra Botan da, mîrên kurdan ên aqilsivik, di destê kesên fêlbaz da (Bekoyê Awan)

çawa dibin pêleystik, ew bala merîyan dikşîne.

Di destana Sîyabendê Silivî da gelek xalên girîng henin. Lê ez ê tenê yekî nîşan bikim; gava ku Sîyabend terkedinya dibe, ew û Qeregêtran rastî hevdu tên, hal ehwalê xwe ji hev ra dibêjin û xebirdaneka waha di nav wan da dibe: Sîyabend dibêje “Neyarê min felek e, ez li pey wî ketime, ew li ku be ez ê wî bigrim, biqefîlînim û heyfa xwe jê hilînim.”

Dema ku Qedê dibê: “Kuro felek ku heye ji xeybê ye, ew qasidê Xudê ye, tu kes nikare tiştêkî bi wî bike” Sîyabend vê pirsê dibêje “Wele ew qasidê Xudê be jî ez dev jê bernadim.”

Ev gotina Sîyabend, taybetiyeka insanê kurd nîşan dide. Îsanê kurd, wexta ku neyarê xwe neçar dike, ew “qasidê Xudê” be jî dev jê bernade.

Destana Sîyabendê Silivî rastiyeke din jî rayî merîyan dide. Di kovarekê de ez rasti nivîseke M. Zahir Kaya hatim. Destana Sîyabendê Silivî û destana Gilgamêş muqayese dike û gelek xalên hevbeş destnîşan dike. Ev jî nîşan dide ku kurd di eynî wextê da xweyê mîrata Mezopotamyayê ne.

Bazil Nikitîn jî ji du rêzikên kilameka Evdalê Zeynikê taybetiyeka kurdan a din nîşan dide. Li ser şerê kurên Surmeli Memed Paşa û Çerkezan Evdalî kilamek derxistiye. Di kilamê de pirseke waha heye:

*Evla Begê min ji diwanê derket, dimilmili  
Çû diwana Çerkez Omer kire gili  
Diwan teng bû, mile Mîrê Zirav tê da ned-  
iftili.*

Nikitîn dibêje: “Meriv ji vê gotinê têderdixe ku kurd di ciyên teng da nikarin şer bikin, ew di ciyê fire da şer dikin.”

**Li Ser Bedewiya Jinan  
Kurd Çi Difikrin**

**Ji Kilama "Qaza Muksî" Çend Rêzik:**

*Lê lê muhibê, serî diêşe  
Dilê min ji bona te yan e, yan e  
Taxima sing û berê Qaza min,  
Yalîkî deşt e, yek zozan e,  
Tê da hêşîn bûne gul û fidan e,  
Serê hemûyan li hewa ne.*

.....

*Wey gundîno Qaza Min qaz nîn e,  
Yeka bejinzirav e, çepeldirêj e, porkej e,  
Navik qendil e, garden zirav e, jê  
diêlîne,  
Zarave şîrîn, zimanê tûtîn e,  
Bi şêst û şeş awazan ji xwe ra diqe-  
bîne,  
Suretê sor û sosinê xal-xalî ne,  
Cavê reş in, kildayî ne  
Birîyên tenikê qeytanî ne  
Nava birîyan çar tilî ne.*

*Li serê Qaza mi kofî ne,  
Li ser kofiyê şar û şemaqî ne,  
Li ser şar û şemaqîyan mirîşkî ne  
Li ser mirîşkîyan qotek zêrê Mehmudî  
ne.*

*Taxima Sing û berê Qazê mînanî  
zozanê li Çulyê, li Maçulyê  
Li Axuryê, li Sine û Sînegê,  
Qazgol û Bîngolê, Şûşan û Tekmanê,  
Li welatê me Serhedê,  
Meriv konê xwe lê dayne, çadira xwe  
lê biçikîne,  
Çend rojeka bi mêvanî  
Li taxima sing û berê Qazê bimîne,  
Lezetê ji bedena xwe bibîne....*

Kivşe ye ku "sing û berê" jinê, ji yalê bedewiyê da xaleke pir muhîm e.

Evîndar bi devê dengbêj va "sing û berê" dilketiya xwe dişibîne zozanan, hemû zozanên Serhedê yên bi nav û deng rêz dike, "çardaxa xwe lê biçikîne" û "lezetê ji bedena xwe dibîne."

Evîndar ji serê dilketiya xwe da dest pê dike, kofiyê li sere wê dike û şemaqîyan va dixemilîne û qolê zêra li dorê dicivîne, bejn û bala wê terîf dike û rewşa porê wê jî tine ziman. Kivşe ye ku "porê keş" meqbûl e. Rewşa eniyê jî muhîm e. Gerek enî fireh be, birî "qeytanî" bin, nava birîyan fireh be, "çar tilî" be. Gerek bi "suretê sorê xal-xalî" va diran jî hurik û mircanî bin. Di nav xalên bedewiya jinê da, şiklê xebardanê jî gelek muhîm e. Bi qasî ku ez dizanim, li rûyê erdê di nav tu gelî da nexşên bedewiyê bi "zimanê tûtî", "zimanê şîrîn" û bi "dev û lêvên şekirî" va nehatiye terîfkirin. Xêncî meriyên kurd tu kesî xebardana dilketiya xwe neşibandiye qebqeba "kewên gozel".

Ewên ku ji van taybetîyên kurdan haydar nebin, ew ê çawa "hikayetên kurdî" yan jî "romanên kurdî" binivîsinin?...

Aniha gelek kesên ku bi "mûzîka kurdî" ra mijûl dibin hene. Beşek ji wan xwedênegiravî "mûzîka kurdî ya modern" çêdikin. Ez bala xwe didimê, pîr-raniya wan ne ji kilama kurdî ya klasîk agadar in, ne ji motifên strana kurdî. Bi vî tehrî stranên wan jî ji yalê gel da nayên ecibandin û demekê şûnda jî mînanî fîseguran li ber bayê winda dibin û diçin.

Li jorê min gotibû ku kilama kurdî nasnameya însanê kurd e. Ew bi qayde û meqamên xwe va, bi şêwe û awazên xwe va ruhê însanê kurd e û ji kûrahiya dilê însanê kurd diherike tê.

Lê mixabin ew kesên bi çand û wêjeya kurdan ra mijûl dibin, pîrraniya wana ji vê rastiye haydar nînin, guh nadinê. Li gorî wana kilamên kurdan stranên sîstema feodaliye ne, ji çend “lê, lê...!” û çend “lo, lo ...!” yan pêktêne. Ew bi çend sloganên “Kurd û Kurdistanê” va dilê xwe rehet dîkin û xwe didine alîkî. Yan fehmkor in, yan jî çepitîye ji xwe ra dîkin bahane. Gelek ji wan jî bi kurdîtiya tirkani va cila xwe ji avê derdixin.

### Dengbêjiya Serhedê û Dengjên Serhedê

Kilama kurdî li Serhedê pêşda çûye, geş bûye, xweş bûye û kemla xwe dîtiye. Li welatê jêr lawaz maye. Li gorî me serhediyên “welatê jêr” hêla Ruhayê, Mêrdîn û Diyarbekirê ye. Em beşeke Sêrt û Batmanê jî li ser Serhedê dihesibînin. Ji yalê çandî va hêla Çolemêrgê ne Serhed e, ne jî welatê jêr e, ew parçekî hêla Behdînan e.

Çend sedemên serdestiya dengbêji ya Serhedê henin: Ez dixwazim qala wan bikim, li gorî min yek ji wan ev e: Li welatê jêr sîstema feodalî pir hişk bûye. Ya duduyan jî, welatê jêr ku nêzikê ereban bûye, zêde di tesîra mantalîta ereban da maye. Serhed ku ji ereban dûr bûye, zêde di bin tesîra wan da nemaye. Çawa ku pîrsa pêşiyên dibêje “kê ku jê dûr e, gul û nûr e” eynî usa. Sedemê sisiyan; li herdu hêla cudatiya rewşa jiyana axa, beg û paşayên kurdan e. Jiyana axa, beg û paşayên welatê jêr bi tersê osmaniyan (tirkani) bûye. Ji ber vê yekê zêde guh nedane çanda kurdî. Lê rewşa jiyana axa, beg û paşayên Serhedê bi terse “kurmanciyê” bûye. Li

çanda kurdî bêtir xweyî derketine. Ji wana her yek dengbêjê wan ê taybetî hebûne. Evdalê Zeynikê dengbêjê Surmeli Memed Paşa bûye. Beriya Evdal Gula Fille dengbêja wî bûye. Gulê bi eslê xwe ermenî bûye û qîza keşîşekî ermenîyan bûye. Di eynî demê da dengbêjê Tarxanê Qeleneyê Şêx Silê bûye. Bi wasita Evdalê Zeynikê em ji Şêx Silê haydar in. Ev di sale 1950 da bi Evdal ra ketiye lejê û dest li ber Evdal danîye. Qelene erdê Îranê ye û li ber sînore Romê da ye, ji ber wê yekê li ser Serhedê tê qebûlîkirin. Tarxanê Qeleneyê ji “Torînan ê Mala Şero” bûye û pismamê Kor Husên Paşa ye.

Dengbêjê Kor Husên Paşa berê dengbêj Taha bûye, paşê jî Feqiyê Qizqapanê bûye. Li gorî gotinên gotinbêjan, dengbêj li cem Husên Paşa pîrr bi rûmet bûne. Bîst û çend sal berê merivekî bi emir ji min ra qal kiribû. Ewî digot wexta ku Husên Paşa diçû cîyekî, muheqeq dengbêjê xwe bi xwe ra dibir. Wexta ku çûye “Şerê Filan” (1920) tenê karyola xwe û dengbêjê xwe bi xwe ra bîriye. Ewî Feqiyê Qizqapanê jî dîtibû. Ji Feqî anektodekî neqil kir. Weha digot “Feqî ji min ra qal kir. Husên Paşa wexta ku dê raza, bi min kilam dida gotin, bi kilaman va xew ra diçû. Şevêkî ewî dişa xwe li ser nivînên xwe dirêj kiribû û min jî jê ra distra. Demekê şûnda min dît ku çavên wî hatin girtin. Min jî got herhal di xew ra çûye û min dengê xwe birrî. Min hew dît ji nişkê va ewî çavên xwe vekir û zûz-zûz li min mêze kir. Mînanî ku min sûc kiriye. Min jî hema dengê xwe hilda û kilam got.”

Dengbêja Rizayê Xalid (Serokê Emerya) Pêroya Têxutê bûye. Di salên 1960î da camêrekî biemir ji min ra qala

Pêro kiribû. Li gor gotina camêr, Pêro bi husnê xwe va nerind bûye, rûyê wê bi xurî bûne. Ewî digot wexta ku Pêro distra, xêlî diavête ser serê xwe ku di nezera guhdaran da xweşiya kilama wê neteribe.

Ew camêr ji hêla Melezzgirê bû û şerê Kejik baş dihate bîra wî. Li ser Kejik Emerya û Şewêşya şer kirine û gelek mêr ji hev kuştine. Ew şer bi texmîn di sala 1890 yan jî di 1891 da bûye. Rizayê Xalid, birayê wî Fetullah û Eshed çûne Kejik, li wir bi şewêşyan ra şer kirine û kilama "Dêran" li ser wî şerî hatiye gotin. Wî camêrî got "Piştî şer, her du seriyan cinazên xwe li erebeyên ga kiribûn û dibirin, Pêro bi kêleka ereba cinazeyên Emerya ketibû kila-man digot."

Dengbêjê Xalid Begê Hesenî jî, Evdilkêrîmê Kuştîya bûye. Evdilkêrîm -bi texmîn- di navbera salên 1890-1920 da li cem Xalid Begê maye. Ew jî dengbêjekî serdest û bi navûdeng bûye. Pey ra gelek dengbêjên hêla Melezzgirê û Bilanixê (Kopê) di sfîla wî da kilam gotine.

Li cem axe, beg û paşayên Serhedê dengbêj pir bi rûmet, bi qedir û qîymet bûne. Li Serhedê pirseke weha heye: "Dengbêj destûrdayî ne". Ji ber vê yekê tu kesî nikaribûye ji dengbêjan ra, "ji gullê girantir" pirsekî bibêje. "Ha şah, ha paşa." Eger axe yan jî begekî bexatirîya dengbêjekî bikira, ew ji yalê gel da dihate ricimandin, êdî di nav gel da rûmeta wî nedima.

Hemû axe, beg û paşayên Serhedê li dengbêjên baş geryane û ew birine kirine dengbêjên xwe. Çimkî ew bi dengbêjên xwe va şerefdar bûn. Wana daîm dengbêjên bi nav û deng birine

şênahî, dawet û dîlanên xwe. Bi dengbêjan pesnê xwe dane. Wekî "filan dengbêjî hatiye li dîwana min çok daye erdê û kilam gotine."

Rewşeke usa ya axe, beg û paşayên welatê jêr tunebûye. Bêşik ji welatên jêr jî dengbêjên baş derketine. Lê tu yekî ji wana mînanî dengbêjên Serhedê tu rêçek li pey xwe nehiştine, tradisyoneke dengbêjiyê li dar nexistine.

Ji ber vê yekê -beriya wexta jî min gotibû- gelek bûyerên muhîm, yên civakî, yan jî yên siyasî li welatê jêr qewimîne, lê li Serhedê bi zor ketine.

Ez bi xwe bi salan bi karê dengbêjiyê ra mijûl bibûm, min peyvika "mitrib" nebihîstibû. Ez ku çûme welatê jêr, min ev peyvika li wê hêlê bihîstû, ez şaş û metal mam, çima ku navê dengbêjan li wê derê "mitrib" bû.

Ez dixwazim ku li vê derê anek-totekê neqil bikim. Ez di sala 1964 da li Erziromê bi zilamekî biemir ra hevnas bûm. Xalê Silêman. Wê demê salên wî 83 bûn û xortaniya wî li Dîyarbekirê derbas bibû. Ji malbatek pêşhatiyên Çata Erziromê bû, merivekî welatparêz bû û bi fakir û raman bû.

Xalê Silêman got "Min bi xortên mala Cemîl Paşa ra hevaltî dikir, em bi şev û roj bi hev ra bûn. Rojekî em li dîwana mala Cemîl Paşa bûn, zilamek hate cem me. Dema ku em pê hesîyan ew zilam stranbêj e, em pêda ketin, me got ji me ra bistre. Li ser daxwaza me wî zilamî dest pê kir sitra. Demekî şûnda mezinê wan bi hêsr û gef kete hundir, got "Yah, yah ma kuro ev axurê ker û hespan e ku dengê zirrîna kera jê tê!" Wî zilamî jî dengê xwe birrî û derket çû."

Sedemekî serdestiya dengbêjiya

Serhedê jî kurdên êzidî ne. Li gelek deverên Serhedê kurdên êzidî piranî bûne û hetanî salên 1850an kes zêde têkilî wana nebûye. Ji ber ku li Serhedê pirrdengî û pirrengî hebûye, her kesî li gor bawerîya xwe jiyana xwe domandiye.

Navê hêla Intabê (qeza Agiriyê, Tutax) “Êzdîxane” bûye. Çimkî pîr-raniyê wira êzidî bûne. Hêla Ebexê (dorhêla Muradiyê, başûr û rojhilatê Qersê) kurdên êzidî bûne. Sineg bi temamî êzidî bûne. Li Serhedê “Zozanên Sinegê” bi nav û deng in û ew hêl di navbera Tuzlîcê û Qerekosê da ye. Navê wê “Sinaga êzidiyan” bûye.

Pûşkîn şerê rûsa yê bi navûdeng di pirtûka xwe ya bi nave Rêwitiya Erziromê da dirêj-dirêj qala kurdên êzidî dike. Wexta ku di sala 1828 da di navbera romê û uris da şer derketiye, Pûşkîn jî wê demê li cem fermendarê orduya uris ya Qafqasyayê bûye û bi orduya uris ra hatiye Erziromê. Orduya uris jî Arpaçayê da ketiye nav sinorê romê, di tapa Qersê ra xwe gihandiye Sarîqamîşê, di ser Hesenqelê da çûye Erziromê. Helbet di derûdorê rêya wan da pir êzidî hebûne ku wan bala wî kişandiye.

Ehmedê Mirazî di pirtûka xwe ya bi nave Bîranînêd Min da qala kurdên êzidî dike. Ehmedê Mirazî bi xwe jî êzidî bûye. Ji gundekî Dîyadinê (Tutax) bûye û di wexta Şerê Cîhanê yê Yekemîn da ew 14-15 salî bûye. Li gor gotina wî gelek gundên êzidiyan li wan deran hebûne.

Di pêşdaçûyîna çand û dengbêjiya kurdî da kurdên êzidî roleka pir muhîm leystine. Wana ku piştî Şoreşa Sovyetê, li Rewanê mecal dîtine, çalakîyên

giranbuha kirine. Li wê derê hejmara wana jî ewqas zêde nebûye, 40-50 hezar bûne. Rewşenbîrên wekî Erebe Şemo, Casimê Celîl, Heciyê Cindî, Ehmedê Mirazî, Cerdoyê Gêncî û gelekên din, li ser çanda kurdî lêkolînên bêhempa kirine. Bi taybetî di pêşengiya Casimê Celîl û hevalên wî da li ser dengbêjiya kurdî xebatên pîrr muhîm hatine kirin. Dengbêjên kurdên êzidî yên Rewanê, di pêşengiya kompozîtorên rusî û ermenî da enstrumentên modern di kilama kurdî da bikaranîne û kilama kurdî ji nû va bi ruh û can xistine. Dengbêjên mîna Şeroyê Bro, Sosika Simo, Aslîka Qadir, Hemîdê Mecîd, Efoyê Esed, Egîdê Têcîr û Zadîna Şekîr û gelekên din, bi stranên xwe va ji gelê kurd ra xizmetên giranbîha kirine.

Di dengbêjiya Serhedê da Evdalê Zeynikê fenomeneke pîrr muhîm e. Ew di dengbêjiya kurdî da tradisyoneke nû derxistiye. Hemû dengbêjên Serhedê bûne domdarê vê tradisyonê. Evdalê Zeynikê ne tenê şair-dengbêj bûye, ew di eynî wextê da destanbêj bûye. Ewî hem destanên kurdan ên kevin li gor qayde meqamên xwe girtine, hem jî bi xwe kilamên destankî derxistine, ew kilamên destankî me hildabûn pirtûkê (Binêre, A. ARAS, Şairê Kurda yê Efsanewî E. Zeynikê). Ji ber vê yekê gelek pîspor û nivîskaran jê ra gotine “Homerosê Kurdan”. Ew bi fikr û raman bûye. Ewî bûyerên civakî li gor ramanên xwe, felsefeya xwe şîrove kirine. Ji ber wê yekê ye ku gotinên wî mînanî pîrsên pêşîyan di nav gel da îro jî têne xebardan.

Min berê jî gotibû ku lîrîzma kilama kurdî bi Evdalê Zeynikê gehîştîye dereca xwe ya herî bilind. Lîrîzm wekî



“strana bi coşîn” tê tarîfkirin. Lê di lîrîzma kurdî da tişteki din jî heye. Bi strana coşîn va hesret û kesera ruhê însanê kurd jî derdikeve holê. Ew sewta lîrîk ku ji kûrahiya dilê dengbêj derdikeve tê, ruhê kesên guhdar qepeçe dike, hildide nav xwe û her wekî dihelîne. Ez dikarim bêjim ku, tu sewtên stranbêjên gelên din bi qasî sewta dengbêjên kurd li ser ruhîyeta însan tesîreke ewqas mezin nekiriye. Lîrîzma kilama kurdî bala kurdologên Ewropayî jî kişandiye. Bi vê sedemê Bazîl Nikîftîn gotiye “Lîrîzma kurdî tesîra xwe li ser gelên cînar jî kiriye. Ermenî di hemû şahî û dîlanên xwe da kilamên kurdî dibêjin, tirk jî pirsên kilamên kurdî werdigerînin ser zimanê xwe û li ser qayde û meqamên kurdî wan kilaman bi tirkî distrên”.

Evdalê Zeynikê nûnerê hesreta dilê însanê kurd e. Ewî feqîrî, bêkesî, perîşanî û belengaziya kurdan anîye ziman. Lema di kilama xwe da gotiye:

*Wey dinyayê, wey faniyê!*

*Wlle Temo lawo mirin çetire ji feqîrîyê*

*Temo lawo feqîrî ne tu çek e*

*Xudê mile bavê te têra kiriye*

*Milê mêrê camêr têra neke!*

Hewce nîne ku ez li ser Evdalê Zeynikê zêde bêjim, ew di pirtûkê da henin. Emê qala dengbêjên Serhedê yên din bikin. Lewra haya kesî zêde ji wan tune. Lê beriya wiya jî ez dixwazim hinek qala nebiyê Evdalê Zeynikê, Emerê Zeynikê bikim. Min Emer di sala 1966 da dît. Ew bi xwe jî dengbêj bû û bi qayde û meqamên kalikê xwe va distira. Ji du seta zêdetir min kilamên wî guhdarî kirin. Ewî kalikê xwe dîtibû û jî wî kilam guhdarî kiribûn. Li gor gotina wî hemû dengbêjên Serhedê di stîla

Evdal da kilam gotine. Min jê pirsî û got “îro ji van dengbêjan, yên ku eynî mînanî kalikê te distirên kî ne?” Ewî got “Welle hemû dengbêjên me yên Serhedê pir-hindik nêzîkê wî distêrin. Lê Şeroyê Bro, ewê ku di radyoya Rewanê da distrê, ew hema hema eynî mînanê kalikê min distirê.”

Piştî Evdalê Zeynikê li Serhedê dengbêjê herî bi navûdeng Mistefayê Xellê Heyran e. Mistefa -bi texmîn- di navbera salên 1896-1898 da li gundê Qazîcelalê hatiye dinyayê û di sere salên 1950 da jî çûye ser heqîya xwe. Qazîcelal gundekî Xaylazê ye, nêzîkê Qereyazî ye, lê li ser Xoresanê ye. Berê li ser Hesênqelê bûye, paşê ku di sala 1936 da Xoresan bûye qeza, bi Xoresanê va hatiye girêdan.

Piraniya kilamên sîyasetê wî derxistine. Kilamên ku li ser serhildana Berazan û Seyidan aniha tên gotin (neh-deh kilam in), Ew gişk yên wî ne. Serhildana Berazan û Seyidan (serhildana Elîcan û Seyidxan) di sal 1929 da dest pê kiriye, di sala 1935 da dawî lê hatiye. Lêkolîna min ya li ser vê serhildanê di zemanekî nêzîk da dê bê weşandin.

Min bi gelek kesên ku Mistefa dîtibûn, pê ra cinartî kiribûn, jê kilam guhdarî kiribûn, xebar da. Min di derheqê Mistefa da bi destanbêjê hêja Hecî Sêvdînê Remedana ra jî xeber da. Hecî Sêvdîn wexta ku 16-17 salî bûye û dest bi dengbêjiyê kiriye, çûye xwe gihandiye wî, şeş meh pê ra geryaye. Mistefa naye “Çiqil” li Hecî Sêvdîn kiriye. Yanê ew dar bûye, Hecî Sêvdîn jî çiqilê wî (şagirt) bûye.

Di zemanê Mistefayê Heyran da, li deşta Melazgirê du dengbêjên bi nav û


deng hebûne: Zibêtê Qirka û “Mistefayê Çiftborî”. Dengê Mistefayê Çiftborî pir gumrah û xweş bûye ku xelkê navê “Çiftborî” lêkiriye. Meriyên ku wî guhdarî kiribûn, digotin “wexta ku distra, deng ku ji qirikê diherikî, mînanî du-sê dengên cuda dihate xwarê.”

Mistefayê Çiftborî jî li ser bûyerên siyasî kilam derxistine. Ew kilamên ku li ser serhildana “Kurê Girîdaxê”, li ser “Geliyê Zilan” û bûyerên din yên anihî di nav gel da tînin gotin, ji yalê her du Mistefayan da hatine afirandin. Lê kîjan yê Mistefayê Heyran in, kîjan yên Mistefayê Çiftborî nin, kivşe nîn in.

Mistefayê Xellê Heyran, li gor salixê salixdanan, digotin hema di rê da diçû, li der û dora xwe mîze dikir û kilam derdixist. Çawa ku dibêjin, Şêx Seîd Efendî ji dengbêjan pir hezkiriye. Digotin wexta ku wî ji dengbêjan kilam guhdarî dikir, her wekî dihate wejdê. Salekê yan jî du salan beriya serhildanê, Şêx Seîd diçe hêla Şûşanê. Wê demê Mistefayê Xellê Heyranî li wir bûye. Şêx Seîd ku dibihîze, dibê “Eman derhal gazî Mistefa bikin bila were, ji min ra bistrê.”

Diçin gazî Mistefa dikin û wî tînin. Şêx Seîd Efendî dibêje “Mistefayê min, gelek salixê te ji min ra dane, min jî meraq dikir, de hela tu bêje, em jî te guhdarî bikin.”

Mistefa dirêj dirêj ji Şêx Seîd ra distrê. Şêx Seîd jî serê xwe dike ber xwe, wî guhdarî dike. Dema ku Mistefa strana xwe xelas dike, Şêx Seîd jî mînanî çawa ku meriv ji xewnekî hişyar dibe, hema bi wî karî çavên xwe vedike.



### **Çiqilê Mistefayê Xelle Heyran**

Ew kesên li dorê, hew dibînin ku hesir ji çavên Şêx Seîd Efendî rêz bûne hatine xwarê.

Şêx Seîd dibê “Haza ku tu dengbêjî, pir xweş distirêyî, Xudê emrê te dirêj bike, te ez îro çiqas bextiyar kirim lawo, Xudê jî te bextiyar bike!”

Piştî serhildana Şêx Sîd, Mistefa kilamekî li ser Şêx Seîd derdixê; kilam weha ye:

### **Wey Lêêê...**

*Wey lêêê... wey lê, wey lêêê...*

*De bira şewqa Kela Xînûsê lê nexista,  
Li Bîngolê ji xwe ra çiya bi çiya*

loloooo...

Bira neda bimbareka Qolhêsarê,  
Derê mizgefta û camîyan...

Bi destê bavê şêx Xiyasedîn digirtin,  
kelepçe dikirin,  
Didane pêşiya cotê cendirmeyê  
singûliyan,  
Berê wî dane Enqerê-Horgofê,  
Nava hezar û pênsed mêrê di girtiya,  
Kelaka dînê îslamê ji xwe ra wel-  
geriya...

Xoce Elyas, xocê cumhuriyetê,  
Rûniştî li kavila Enqerê, li serê van  
têla,

Têl li ser têla dida welatê Serhedê, li  
ba Şêx Elîriza,  
Digo mala te xera be,  
Tu yê kilîta lêxe, li devê hucra û  
camîya û medresa...

Tu nizanî, piştî bavê Şêx Xiyasedîn,  
Qanûna me bû qanûna Nîgaloduwalê  
ejnebîya...

Lo bira, tu gula şêxan î bira, tu piçûkê  
biran î bira,  
Li welatê xerîbiya tu derdê pûçê bê  
derman î bira,  
Heya dinya ava be, tu keder û mereqa  
me hemûyan î bira....

Heyla lê way lêêêê...

De bira şewqa Kela Xînûsê çiya li çiya  
nexîne,

Sura Enqerê tê bi gimmin e,  
Bayê Xamirpêtê xeberê tîne,  
Destê kekê Şêx Xiyasedîn digirtin  
kelepçe dikirin,  
Didane pêşiya cotê cendirmê singûlî ne  
berê wî dane Enqerê-Horgofê,  
Nava hezar û pênsed mêrê di menfî ne.  
Feleka malxerab lema keleka dînê  
îslamê weldigerîne  
Xoce Elyas, xocê cumhuriyetê,

rûniştiye li Enqera rengîne  
Têl li ser têlê ji şêx Elîriza ra dişîne  
Dibê rabe kilîta li derê hucra û  
camîya û medresa bixîne,  
Tu nizanî, piştî kekê Şêx Xiyasedîn,  
Qanûna me bû qanûna Nîgalodewletê  
ejnebî ne,  
Hela rabe emê bi destê hev bigrin,  
Xwe berdin nav bajarê Dîyarbekirê,  
Herin ser tirba şêx Şemsedîn e,  
Belkî li ba Xudê rica bike,  
Efûya van menfîya derîne,  
Fedîle bûka çar mehan e,  
Çavê wê li rê û dirba nemîne....

Lo bira, tu gula şêxan î bira, ti piçûkê  
biran î bira,  
Li welatê xerîbiyê tu derdê pûçê bê  
derman î bira,  
Heta dinya ava be, tu keder û meraqa  
me hemûyan î bira...

Min li jorê qal kiribû ku ew hemû  
kilamên li ser serhildana Berazan û  
Seyidan yên Mistefayê Xellê Heyran in.  
Di wan kilaman da Mistefa navên mal-  
bata Elîcan bi temamî rêz dike; navê dê  
û bav, xuşk û jin û kur û qîzên wana  
dibêje, lê tenê navê Seyidxan, kurê wî û  
birayê wî di kilamê da derbas dike.  
Rojekî ku Seyidxan û Mistefa hevdu  
dibînin, Seyidxan bi laqirdî dibê "Lolo  
Misto, tu di kilaman da hemû navên  
Berazan rêz dikî, çima tenê navê me her  
sêka dibêji?"

Mistefa bersivê dide, dibêje "Ez  
heyran, de Berazan cînarê me nin, hel-  
bet ez navê jin û zarokên wan gişkî  
dizanim ku di kilaman da rêz dikim, lê  
hûn ji min dûr in, ez tenê we her sêka  
nas dikim. De tu were navê meriyên  
mala xwe ji min ra bêje, soz be, ez ê  
navê pisîka te ya ber tendûrê ji bikim

kilaman.” Seyidxan dibê, “Na, na heyran, hema tu dîsa mînanî xwe bike.”

Kilamên Mistefayê Xellê Heyran tesîreke pirr mezin li ser gel dikin wê demê. Hemû dengbêjên wê demê li Serhedê kilamên wî dibêjin. Helbet berpirsyarên dewletê jî ji wê rewşê haydar dibin û gelek aciz dibin. Walî-Paşayê Erziromê ji fermandarê Hesênqela yê eskeriyê ra xeberekî dişîne, dibêje “Me xeber hildaye ku di mintîqa te da hozanekî kurda derketiye, ew firar û qaçaxên ku ji dewletê ra serî hildane, li ser wan kilaman derxistine û dibêje û xelkê tehrîk dike. Derhel wî zilamî derdest bike û li çara wî mêzeke.”

Fermandarê Hesênqelê (Bînbaşî yan jî albay bûye) cendirman dişîne pey Mistefa û tîne huzûra xwe. Jê dipirse dibêje “Ma rast e, ku dibêjin tu li ser firar û qaçaxan, li ser xayînên dewletê kilaman derdixî û dibêjî?” Mistefa dibê “Belê rast e.” Fermandar şaş û matel dimîne û dibêje “Tu bi çi cesaretî awha xeber didî? Ma tu nizanî ku ev dewlet jî bi tiştên waha keleyê merîyan difirîne?” Mistefa bersivê dide dibê “Dewlet qet nikare tişteki bi min bike.” Bi vê pîrsa wî fermandar şok dibe, bi gef û hêrs xeberdana xwe didomîne, dibê “Lo tu kî yî, tu bi çiyê xwe guman î ku awha xeber didî?” Mistefa dibê “Ez hozan im, hozanekî mezin ê qurna bîstan im. Li der û dorê min çi bibe, çi cirya be, ez li ser her tiştî kilaman derdixim û dibêjim. Eger tu dixwazî ez aniha li vira li ser te, li ser Fewzî Çeqmaqê te û li ser Atatirk jî dikarim kilaman derxim.”

Li ser vê pîrsa wî fermandar nerm dibe, dibê “Tu Fewzî Çeqmaq û Atatirk bide alîkî, hela li ser min kilamekî bêje, çika tu çawa dibêjî!” Mistefa tirkî baş

zanibûye. Mistefa dest pê dike, bi tirkî ji bo fermandar distrê. Lo femandaro tu kexşe yî, bejna te bilind e, ûnîforma çîqa xweş lê hatiye, stêrk û bişkoken te mîna zêr li ser dibiriqe... Nizanim çi û çî...

Fermandar dibê “Helal be ji te ra, te strana xwe baş cî-war kir û got, here ku tu hozan î...”

Digre kaxizekî dinivîsîne, têda dibê “Ew zilamê hanê hozan e, hunermend e, tu kes têkilî wî nebe!”

Mora xwe li kaxizê dixê, îmze dike û didê. Dibê “De here, bira oxira te vekirî be, êdî kes têkilî te nabe.”

Wan kilamên Mistefayê Xellê Heyran, yên ku li ser Berazan û Seyidan gotin, em ê wana di pirtûka xwe da binirxînin. Lê mînanî kilamên din, kilamên Mistefa jî ji nivîsandinê baş nayên fehmkirin. Wexta ku merî guhdarî dike baştir deqefilîne û dicibîne. Ji ber vê yekê, dixwazim ku wan kilaman bikim CD û bi tevî pirtûkê bi hev ra biweşînim.


Ji Mistefayê Xellê Heyran vir da, li Serhedê gelek dengbêjên baş derketine. Lê ji wana sê dengbêjên serdest henin: Ferzê, Resoyê Kopala û Şakiro. Mixabin di derheqê Ferzê da zêde tiştek di destê me da tune. Her kes dibêje ku Ferzê dengbêjekî pir baş bûye, şair bûye, dengbêjên hêla Melezgir, Bilanix û Mûşê gişka bi qayde û meqamên wî va kilaman gitine. Lê kes zêde nizane ku ewî çawa dest bi dengbêjîyê kirîye, li cem kîjan dengbêjî perwerde bûye, kilamên ku wî derxistine kîjan in.

Min bi Şakiro re du-sê sal berîya mirina wî hevpeyvînek kiribû. Li gor salixê salixdanan Şakiro şagirtê wî bûye. Min ji Şakiro pirsibû, ev rast e yan na. Bersiva wî ji min ra tu qenaetekê hasil nekir. Şakiro digot,

“Meqamên Ferzê pirr li min xweş dihatin, min jê îstîfade kir lê paşê min ev terzê xwe bi xwe afirand.”

Li gor salixan, terzê Ferzê û Reso pirr nêzîkî hev bûne, lê ew ne şagirt û hostayên hev bûne, hemsal û hevalên hev bûne. Lê gelo Ferzê wî terzê xwe ji kê hildaye? Dîsa di wê hevpeyvînê de Şakiro gotibû ku Ferzê ji stîla Evdîlkerîmê Kuştîya îstîfade kirîye lê ewî li gorî xwe terzê xwe afirandiye.

Wexta ku Ferzê di dawetan gundê Kevir da hatiye kuştin salên wî li dora pêncîyî bûne. Di sala 1952 da çûye ber rehmetê. Şakiro digot, “Ferzê ji min pirr hez dikir. Çend meha carê ez neçûma, min ew nedîta li min hêrs diket. Ji min ra xeber dişand ji bona ku ez herim cem. Dawîya havînê bû, wî dîsa xeber şandibû. Ez li hespê xwe siyar bûm û çûm. Ew li daweta gundê Kevir bû. Min rê qedand, wexta ku ez bi pêşya gund ketim, min nihêrî siyar in, şênî ye, qerebalix e, bûkê siyar dikirin. Demekê şûnda min dengê teqîna gullekî bihîst. Wê demê min xof kir, hîseke usa xirab nîqutî dilê min, di dilê xwe da min go yeqîn ne bixêr e. Li ser wê min hesp ajot û xwe gihand nava gund. Min hew dît ku jin bi hawar digrîn. Min go “Çi ye, çi bû?” Wana go, “Lê Ferzê hatiye kuştin!” Ez çûm ku ji derî da ketim hundir, min dît Ferzê li ser doşekê dirêj kirine, hema usa ji xwe ra dilubîne. Wexta ku çav bi min ket, go “Heyla mala te xera bûyo, tu li ku mayî?... Te dît kurê qehpîkê gulle berî min da!” Mîlet li dorê kom bibû û birfina wî xedar bû. Êdî dîzanî ku wê bimre. Wesyetê xwe kir, go “Li Zekîyê Mêralî nebin şikayetçî, eger ewî bi qest berî min



daye, ez yeqîn bawer im ku Xudê yê heyfa min fitîl-fitîl di pozê wî ra bîne. Eger bê hemdê wî sîlah di desta herikîye, ez çi bêjim dême ew jî qedera min e.”

Ya rastî gule ji sîlaha Zekîyê Mêralî da herikîbû û li Ferzê ketibû. Paşê li cem dengbêj Şakiroyê Piçûk (Şakiroyê Şewranşêxê) ez rastî kurê Zekîyê Mêralî hatim. Min jê pirsî. Ewî got “Heyran, hinek dibêjin ku bavê min bi qestî gulle berî Ferzê daye. Wellahî ne rast e. Tebanca wî sîlaheke teqeze bûye û gulle jê herikîye. Heta roja mirinê bavê min bi axîn û ofîna Ferzê bû, pirr ber diket.”

Ferzê û Reso bi hev re wekî bira bûne. Min bi kurê Reso Sadiq re hevpeyvînek kiribû. Sadiq ji min re qal kir, got “Bavê min pirr ber Ferzê diket,

qet ji bîr nedikir. Hinê caran bi şev ji nav nivînan radibû xew nedikir. Şevê Ferzê tê xewna wî, dibê lo Reso mişk û maran pozê min xwarin, rabe pozê min çêke.” Bavê min gelek fikirî, dawîyê da hate ser. Got, welle ewî xastîye ku ez kilamekê li ser derxim. Ew kilama ku niha li ser Ferzê tê gotin, ew ya bavê min e.”

Kilam hinekî dirêj e, destpêka wê wiha ye:

*De Gulnazê digo hê hê hê, digo lê lê  
Beyazê rebenê*

*Payîz e, bavê Mihemesalih, şahê  
dengbêja*

*Hêsir im dayê, karê xwe xilas kir...*

*Xudê reş bigerîne dawetek di gundê  
Kevir da çêbû*

*Şandin dû bavê Mihemesalih, şahê  
dengbêja*

*Digotin, “Rabe wexta me dereng e.”*

*Gava ku bavê Mihemesalih li gundê  
Xellê sîyar bû*

*Mihemedê Elikê û Silhedînê bira bi  
xwe re sîyar kir...*

*Digo, “Lo lo Silhedîn lawo, fayda  
min ji te ra tune.*

*Mala te mîrat bûyo, Zekîyê Mêralî  
derbek li min daye.*

*Mîratê gullê çar tîlikê ji cîgera min  
derbas kir!...”*

Ez ê niha li ser Şakiro çend tişt a bêjim, pey ra qala Reso bikim. Şakiro jî minanî Reso hemwelatîyê min e. Cara ewilîn min di zivistana 1953 da ew guhdarî kir. Min li gundê Hesenavayê di sinifa sisêyan da dixwend. Berêvarekî ew û bavê xwe hatin li wir bûn mêvan. Êvarê gundî hatin li oda pêştahatîyên gund li hev civîyan. Ode tijî bû, merya nikaribû lingê xwe bavêta. Şakiro jî wê demê 17-18 salî bû. Kivşe bû ku wî teze

dest bi dengbêjiyê kiribû û di demeke kurt da navê wî belav bibû. Wexta belavbûnê, gundîyan bi hev ra xeber dida. Pirsê wan hê bira min da ne. Yekî digot, “Peh, heyran teres çawa distrê!... Welle min di heyata xwe da sewteke waha guhdarî nekirîye.” Yekî din lê vedigerand, digot “Welle camêr xweş distrê, meriv dibê qey ew ne dengê însan e, dengê qulingê biharê ye.”

Çend roj pey ra min dît ku du xort derketine ser loda gihê, bi hev ra guft û go dikin. Di destê yekî (Emerê Ehmed) da bilûr hebû. Ez hilkişiyam ser lodê. Wana çend kilamên Şakir jiber kiribûn. Alîkî da kilaman digotin, alîkî da jî lê dixebitîn ku bi bilûrê meqamên wan kilaman lêxin.

Piştî re min gelek caran li wî guhdarî kir. dawîyê da hatibû li Îzmîrê bi cih bibû. Di sala 1987 da em rastî hev hatin. Çend caran tevî hinek hevalan ewî ji me ra sitra. Nexweş bû, dengê wî jî êdî mîna berê nebû. Me qerar dabû ku em hevpeyvînekê bikin. Kîngê kum in daw lê fikir, digo “Niha na, ji ber nexweşîyê dengê min baş dernayê, sebir ke, ez ku sialmet bûm, ez ê j ite rab i dilê te bêjim. Ha îro, ha sibê, sê-çar sal usa derbas bûn. Rojekê dûsa ku em rastî hev hatin, min got “Şakir bira, meriv nizane sibê halê dinyayê wê çawa be. Mirin li pêşîya me hemûyan e. tu hebûna vî gelî yî, millet j ite pirr hez dike. Tu ku mirî çuyî ser heqîya xwe, însanê kurd wê meraq bike. Wê nebêje gelo jîyana Şakiro bi çi şiklî bûye, ça derbas bûye?...” Got “De baş e, em xeber din.”

Em rûniştin, min pirsî û wî got. Xeberdana me band û nîvekê girt.

Piştî mirina wî, ji ber wan bandan min nivîsek hazir kir. ew nivîs di

kovarekê de hat weşandin. Piştî wexta ku mecal bibînim, ez ê li ser dengbêjîya wî gotarekê hazir kim.

Bi kurtî ez ê niha çend rîştan bêjim. Şakir li Elajgirê hatiye dinyayê, paşê çûne Cemalvêrdîya Intabê (Dutax) da bicih bûne. Hetanî panzdesalîya xwe li wir maye û li wir dest bi dengbêjîyê kirîye. Cemalvêrdî, gundê ku Evdalê Zeynikê lê hatiye dinyayê, ew gund e. paşê hatiye li gundên Qereyazîyê û Xînûsê bicih bûne û gelek cih guherîne.


Şakir şaîr-dengbêj bû. Li gor gotîna wî, ewî gelek kilam afirandine. Ji bo mînak, wê çaxê ewî kilama "Ha wer esmer, ha wer esmerê" ji min re got.

Piştî wê hevpeyvînê tiştekî bala min kişand. Ewî çend kilam bi xwe derxistine lê pirranîya kilamên ku ew dibêje, ewî ji yalê xwe da hinek gotin li wan kilaman zêde kirîye, beşek jî li gor xwe guharandîye. Lema hinek kes wana wekî kilamên Şakiro dipejirînin.

Dawîyê da ez dixwazim du anek-dotan ji Şakir neql bikim. Kenan Evren di sala 1981 da diçe Qereyazîyê. Şênî diçe pêşwazîyê. Şakir jî di nav şênî da bûye. Herhal di derheqê Şakir da, berya hatinê, berpirsîyarên dewletê jê ra hinek tişt gotine. Yanî "Hunermendekî kurdan yê waha heye, bi kurdî kilaman dibêje, mêla gel jî pîr li ser e û filan..."

Şakir got "Şênî li dora wî civîya lê ez dûr sekinim. Kenan Evren ji wan kesên cem xwe pirsî, ka dibêjin hozanek we heye?" Ewên li cem ku ez destnîşan kirim, ewî gazi min kir, ez jî çûm cem. Got "Ew hozanê ku kilaman dibêje, tu yî?" Min go "Belê, ez im, ez benî". Kenan Evren got "Baş e, baş e. Tu kilamên xwe dîsa bêje lê wan stranên nelirê nebêje! Temam! Haydî bakalım!..."

Rojekê şakir li Karşiyakayê diçe



Dengbêj Reso

cem Cemîl Eker. Cemîl li ber nexweşxana Karşiyakayê bufe dixebitand. Wê demê doktorekî dostê Cemîl jî tê wir. Cemîl Şakir bi doktor dinasîne, dibê "Eva hozanê kurdan ê herî bi nav û deng e." Doktor tiştekî ji pîrsa Cemîl dernaxe, dibê "Çawa?...Hozanê bi çi karî ye?" Cemîl dibê "Yanî ev jî Zeki Mürenê kurda ye ha..." Şakir bi tiqetiq dikene, dibê "Hey mala te bişewite. Wula te kesekî din li dinyayê nedît, te ez kirim hevalê wî q..deyî!"

### Resoyê Kopala

Reso di sala 1906 da li Îdirê hatiye

dinyayê. Bavê wî Welo ji Rewanê hatîye Îdirê. Piştî Şerê Cihanê yê Yekem Reşo tevî êla xwe bar kirîye û hatîye li gundê Qereyazîyê Kopala da bicih bûye. Kurê wî Sadiq ji min ra qal kir, got "Bavê min pirr bi hewes bûye, hê şeş-heft salî bûye dest b stirînê kirîye. Wê demê diçe nav civatan, dengbêjan guhdarî dike. Bi texmîn 8-9 salî bûye, kirasekî dirêj lê bûye, diçe nav cemata Gula Fille. Ew Gula ku bi Evdalê Zeynikê ra ketîye lecê. Gulê êdî pîr bûye, salên wê li ser heştêyî bûne lê stirîna wê hê baş bûye. Giregirên Îdirê li dorê kom bûne, ewê ji kilam gotine. Bavê min diçe li bilinga dîwanê rûdine, ji xwe re guhdarî dike. Demekî şûnda yek bavê min destnîşan dike û dibê, "Ev kurikê hanê ji kilaman dibêje." Gulê gazî bavê min dike, dibe kêleka xwe. Dibê "Hela bistrê, çika tu çawa dibêji?" Bavê min ji dest diavêje pelinga guhê xwe û dstrê. Du-sê kilaman dibêje. Gulê dibê "Bes e, bes e. Te perda guhê mi qetand lawo!... Eferim ji te ra, welle tu xweş dibêji, di pêşerojê da tu yê bibî dengbêjekî yekta."

Reso di piçûktîyê de dest bi stirînê dike, lê navê wî piştî eskerîyê di nava gel da belav dibe. Di hevpeyvînekê da Munîr Binici ji mi ra qal kiribû. Unîr Begê digot, "Di serê salên 1940îyan de bû. Kurapê min Xeyredîn li Edîrneyê ekserî dikir. Reso ji li cem wî esker bûye. Ew û Reso eskerîya xwe xilas kiribûn, bi hev ra hatibûn. Xeyredîn ji bavê min ra qala dengbêjiya Reso kir, pensê wî da. Heyredîn digo "Wexta ku Reso diçû nobeta şevê, hema usa ji serî da distra hetanî dawîyê. Dengê wî ewqas xweş û gunrah bû, hetanî kilometrekê dihate bihîstin. Wan xortên kurdan

ên k udu saetên wî da qerewîl bûn, ji xwe ra kêf dikirin." Wê çaxê jî daweta pismamekî me hebû. Bavê min êdî îzna Reso neda, me ew hilda û bire dawetê. Çar-pênc rojan li cem me ma. Yanî li Soylemeza Jorin. Wê demê nav û dengê wî belav bû û hate naskirin."

Piştî xebardana min û Munîr Binici, di hevpeyvînê da min ji Sadiq pirsî, min got "Sadiqê bira, Munîr Begê ji min ra waha gotibû, tu çi dibêji?" Sadiq got, "Belê, rast e. Piştî ekserîyê bavê min deng da."

Sadiq li ser eskerîya bavê xwe qala tiştên din jî kir, got "Bavê min û hevalekî wî, rojekê ku derdikevin îzna hefteyê (îzna bazarê), diçin nav bajêr (Edîrme). Ji xwe re digerin. Di kuçeyekê de rastî kaniyekî tîn. Ji kaniyê av vedixwin, av êli ser û çavê xwe dikin û rûdinin, ji xwe re xeber didin. Li ber xaniyekî nêzikî wan camêrek runiştî bûye. Mêrik ku dibîne ew kurmancî xeber didin, deng li wana dike, dibê "Lo lo xortno, hera werin vira!" Diçin hev-nas dibin. Camêr hetanî êvarê îzna wan nade. Rûdinên, xurek dixwin, hetanî êvarê xeber didin. Ew camêr li wir surgûn bûye. Dibê, "Xortno, ev zemenakeî dirêj e kum in kurmancî xeber nedaye, ez fetisim. Bi we bêhna min derket, Xudê emrê we dirêj ke." Bavê min go, "Li ser daxwza wî, her hefte, roja îznê em diçûne cem. Wexta ku em diçûn, me dinihêrî wa ye, xurek hazir kirîye, li hêvîya me ye." Bavê min ji ra distrê jî. Bavê min go, "Wexta kum in kilam digotin, ji çavên wî hesr dihatin xwarê."

Navê wî Îbramê Beyro bûye. Xelkê Bilanixê bûye, lê mala wî li Tetwanê bûye. Ji Tetwanê wî surgûnê Edîrneyê



kirine.

Bavê min qala bûyereke din jî dikir. Go, "Alaya me rakirin, em çûn tetbîqatê. Berêvarekê emrê îstîrehetê dan, gotin "Stran, henek, leyîstik, kî çi dike bila ji xwe re bike. Serbest e." Dest pê kirin, her kesî li gor dil xwestina xwe tiştekî dikir. Her çiyê distran, her çiyên direqisîn, her çiyên ku ji xwe re oyun çêdikirin... Xortên kurdan jî li dora min kom bibûn ku ez ji wan ra bistrêm. Min hinekî xwe girt. Wexta kum in denêg xwe hilda û dest bi strînê kir, hemû eskerên alayiyê dev ji karê xwe berdan. Wana ez guhdarî kirim. Min kilama "Mala Paşê (Kor Huseyn Paşa)" got. Dema ku min kilam xilas kir, esker di nav xwe de dest bi xeberdanê kir. Hinekan jî ez pîroz dikirim. Digotin, "Welle heyran em ji ziman fehm nakin, lê strana te tesîreke ecêb li ser me kir." Roja pey ra yuzbaşî gazî min kir. Go "Tu ji kî derê yî? Tu pirr xweş dibêjî. Hela rûne wê kilamê ji min re bibêje." Di oda wî de tenê ez û ew bûn. Min dest pê kir strîyam. Wexta kum in kilam xilas kir, min bala xwe daye, wa ye hesr ji çavên wî hatine. Camêr kurd bû, pey re her tim gazî min dikir, di oda wî da min jê ra distra."

Herhal bala xwendevanan kişandî-ye, min sê guhdar destnîşan kirin wexta ku wana dengbêj guhdarî kirine hesr ji ôavên wan hatine. Gelo çima?... Realîteya însanê kurd usa ye lema. Di jîyana însanê kurd da her daîm feqîrî, belengazî, bêçaretî û xeribî hebûye. Ha Şêx Seîd efendî be, ha Sebrîyê Beyro be, ha jî yuzbaşiyê dewletê be, ferq nake. Li ser rewşa wê jîyanê, wexta ku ji yalê dengbêjên mînanî Mistefayê Xellê Heyran û Resoyê Kopalan da, bi wê lîrîzma kurdî ya bi şewat, kilam bêne gotin; ew, hesran jî ji çavên merî-



Sakiroyê Şewranşêx'ê/Şakiroyê piçûk

yan dibarîne, dil-cîgerên merîyan jî diperitîne.

Reso û Mistefayê Xellê Heyran hevdu dîtine. Sadiq got "Bavê min kilamên Mistefayê Heyran jî digotin. Bavê min meraq dike, diçe Xeylazê, Mistefa dibîne, dixwaze ku şexsen wî nas bike. Ewî jî navê bavê min bihîstîye. Wexta ku tîn cem hev, bavê dibê, "Ez hatime kut e guhdarî bikim." Mistefa dibê "Na, berê ez ê te guhdarî bikim." Bavê min jî distrê. Mistefa radibe diçe çavên wî, dibê "Welle min salixên te hildabûn lê ewqas min texmîn nedikir. Tu pir xweş distrê. Pêşîya te vekirî ye. Xudê oxira te lê bine." Paşê ew jî ji bavê min re distrê.

"Bavê min kilamên Evdalê Zeynikê jî digotin. Ewî hem Gula Fille guhdarî kiribû, hem jî şagirtên Evdêl yên din. Mala kurê Evdalê Zeynikê yê piçûk Mihê li gundekî Milazgirê bûye. Rojekê ew û bavê min rastê hevdu tîn, Mihê bi bavê min kilaman dide gotin. Pey re dibê, "Bawer bike tu jî bi qasî bêvê min xweş dibêjî. Hela be j ite re, dengî te jî

tesîrekî mezin li merîyan dike.”

Min di havîna 1966 da, li Qereyazîyê Reso guhdarî kir. Ewî ji me ra sê saetan strîya. Min suwala Evdêlê Zeynikê jê kir. Min jê pirsî, min got “Bî qenaeta te Evdalê Zeynikê dengbêjekî çawa bûye?” Reso got, “Evdalê Zeynikê dengbêjekî pirr baş bûye, lê ew tiştên ku hatine serê wî, nehatine serê tu kesî. Lê ew dayîna ku Xudê daye wî jî, nedaye tu kesî.”

Reso şaîr-dengbêj bû. Ewî gelek kilam efirandine. Ji wan kilamên wî gelek niha di nava gek da tên gotin.

Şakiroyê Piçûk (Şakiroyê Şêwranşêxê) ji min ra qal kir, got “Hinek dengbêjan kilamên Reso dibirin, diguherandin, dikirin malê xwe. Yanî me ev kilaman derxistine, Reso ji vana pirr aciz dibû. Yek ji wan jî Huseyno bû. Ewî gelek kilamên Reso guherandibûn. Dinya alemê dizanîbû ku ew kilamên Reso ne, ewî digo “Na! Min derxistine.”

Şakiroyê Piçûk him dostê Reso û Şakiro bûye, him jî şagirtê wana bûye. Ez bawer dikim tu kesî kilamên wana minanî Şakiroyê Piçûk xweş nabêje. Reso di eynî wextê de destanbêj bû. Destana Memê Alan (ya gelêrî) û ya Filîtê Quto, yên ku wî gotine, ew di arşîva min da ne. Min jî gelek dengbêj û destanbêjan van destanan guhdarî kiribûn, çend varyantên yên din jî di arşîva min da hene. Lê tu kes bi qasî Reso van destanan ewqas baş, ewqas xweş nabêje.

Reso, dema ku destana Filîtê Quto bistrê, ji cematê dora xwe re waha dibêje, “Gelî cematê, hûn gişk dest bidin ser wijdana xwe, eger kesekî din vê kilama ji min xweştir bistrê, ji min ra bêjin, ez ê dengbêjiyê biterikînim.”

Li gor gotina kurê wî Sadiq, Reso şeş-heft helbestên Cîgerxwîn jî kirine

kilam. Lê mixabin nedihatîn bîra wî ku ew helbest kîjan in.

Sadiq qala bûyerek din kir, got “Sala 1968, yan jî 69 bû. Mala Bişarê Çeto li Qamişloke ji malbateke kurd qîz xwestibûn. Baş nayê bîra min. Ez dibêim qey Mala Haco ye. Berîya wexta jî, ji hev mêr kujtine, îja ji bo ara xwe xweş bikin xinamîti danîne. Ewê Qamişloke xeberê dişîne dibê “Îlla hûnê Reso bînin. Reso ku neyê, dawet nabe!” şandin pey bavê min, bavê min qebul nekir. Îja merivên bixatir kirin ortê, bavê tînin dîsa qebul nekir, go “Heyran wana berîya wexta jî hev mêr kuştine, ez ku herim niha wana jî dengbêjen xwe hazir kirine, em bavêjin ber hev, dengbêjen wana serdest dibin, ez serdest dibim, ew muhîm nîne. Lê eê bî mîletê me dizanim, dawîyê da ji rûyê min da dê seqetîyê derxin. Ji bo vê yekê ez naxwazim herim.”

“Dawîyê da dostê bavê min î herî pêş Hecî Sebrîyê Çuxurî kirin, anîn. Hecî Sebrî li cem bavê min pirr bi xatir bû. Êdî bavê min mecbû ma û çû. Wanên Sûrîyê di dewletê da neh-deh dengbêjan tînin berî pêsîra bavê min didin. Du-sê rojan ew bi hev ra dstrên. Dawîyê da ew dengbêjen wana gişk dest li ber bavê min datînin, yanî bavê min berî wan dide. Sibetirê jî bavê min ra qehwe tînin, qehweya tal, navê wê “mira” ye çî ye. Bavê min li qehwê dikeve şikê. Çimkî berîya wê di nav wanên Sûrîyê de pistepist çêdibe, bavê min jî dibîne. Bavê min di dilê xwe da dibê “Heyran, eê ku vê qehwa we nexwin dê xelet şirove kin, paşê dê li ser xebardan çêbe; de welle ew zehîr be jî ez ê vexwim.” Go “Dema ku min qeh -we vexwar, min usa hîs kir her wekî jehra marê kor bû, di qirika min da çû xwarê.” Li ser wê qehwê êdî dengê bavê min tê birîn. Wexta ku ji dawetê

hat, nikarîbû xeber de ji. Deng bi temamî çûbû. Dema ku nan-av dixwest bi îşaretan ji me r atarîf dikir. Bêdengîya wî zemanekî dirêj dewam kir. Paşê çû doktor, derman-merman, dengê wî hêdî bi hêdî vebû lê êdî minanî berê nebû.

Piştî Kopala, Reso pênc-şeş cara barkirîye. Di gundên Bilanixê û deşta Mûşê da maye. Gundê Koxaga, Pîyongê, Xoşgeldî û Qereaxil. Dawîyê da ji Qereaxilê bar kirîye hatiye li Golmara ya Manîsayê da bicih bûye. Sê-çar sal şûnda ji li gundê Pagê erazî kirîye, çûye wir.

Di sala 1983 da di nexweşxaneyêke Anqerê da wefat dike. Sêx Xiyasedîn (Giyasettin Emre, parlamentenê Mûşê yê zemanê Demokrat Partiyê) cenazeyê wî dibe welat, li Pagê defin dike.

Reso û Sêx Xiyasedîn dostê hev bûne. Wexat ku Reso wefat dike, ew li cem bûye.

Di hevpeyvînê da min jê pirsî, apê Sêx Xiyasedîn got "Ez û Reso ji mîj va dost bûn. Min pir jê hes dikir. Kingê ku pirsgrêkên wî çêdibûn, bi qasî ku ji destê min bihata, min alîkariya wî dikir. Nexweş ketibû, min ew bir Anqerê li nexweşxaneyekê bicih kir. Doktor nas bûn, axirê qedrê min digirtin; min ew temî kirin ku baş li Reso binihêrin. Ez her roj diçûme nexweşxanê, min bi doktoran ra xeber dida, Reso didît ku ez dihatim. Nexweşîya wî xedar bû. Ez diçim cem, ferah dibû. Carekê ez li ber serê wî rûniştî bûm. Got "Destê min bigrel!" Min destê wî hilda nav destên xwe û miz da. Demekê usa bi melulî li çavên min mîze kir, paşê serê xwe vegevand. Li ser wê dilê min xira bû. Hêr bi çavên min ketin. Wê demê doktor ku kete hundir, wî halê min dît û vegeriya. Paşê ez ku ji cem Reso derketim,

rastî doktr hatim. Doktor go, "Ezbenî, ewê gundî kî ye ku usa jê rab i rêz û hurmet î, û ewqas ber dikevi?" Min go "Doktor, ez nizamî ku j ite ra çawa îzeh bikim!" Doktor go "Çawa yanî?" Min go "Doktor, ew hebûna me ye, ew xezîneya gelê me ye, ew ruhê gelê me ye..."

Min neh-deh kilamên Reso tesbît kirin. Pêşerojê da, kingê mecal bibînim ez ê wana biweşînim.

Kilam du cure ne: kilamên govendê û kilamên edetî. Kilamên govendê bi wezn û kafiye ne, kilamên edetî serbest in. Kilamên govendê li gor leyistika sivik û leyistika giran hindik-kite û pirr-kite ne. Mijara wan tenê eşq û evîn e. Mijara kilamên edetî eşq û evîn e, mîrxasî ye, tebiyet û her tişt e.

Serbestîya kilamên edetî îmkaneke pirr mezin dide dengbêjan. Ji ber vê yekê, dengbêj minanî romannivîsekî dikare bûyerê bi dilê xwe bihone û her tiştî bine ziman. Lema pirranîya kilamên kurdî wekî destanan in.

Enstrumentên musîqîya kurdî berê def û zurne, bilûr û meşk bûne. Ji salên 1950yî û virda di musîqîya kurdî da ew enstrumentên din yên wekî mey, klarnet, akordiyon, pîyano û tembûr û hwd. hatine bikaranîn. Pêşengîya vî karî jî kurdên êzdî yên Rewanê kirine.


Dengbêjên Serhedê ne li sazê xistine ne jî saz nas kirine. Wana navê tembûrê jî nebihîstîye. Kurdên Serhedê, di sala 1960 da bi wasitaya Radyoya Erîwanê ji tembûra Mihemed Arifê Cizrawî hayedar bûne. Belê kurdên Rewanê enstrumentên modern di kilamên kurdî de bikar anîne. Lêbelê wana wî karî bi zanistî kirîye.

# Îxtîraseke Bêfesal

Roşan Lezgîn

Mewlido Dimilî yê Osman Esad Efendî (Usman Efendiyo Babij) ku ji alîyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatîye çapkirin, bi alfabeya erebî bi îbareya “*Înnellahe we melaîkethû yusellûne 'ellennebîyyî...*” (r. 11) dest pê dibe. Lêbelê di transkrîbeya latînî de vê îbareyê kirine “*Laîllahe we melaîkethû yusellûne 'ellennebîyyî...*” (r. 10) Di îbareya pêşî de wate ev e: “Muheqeq Xwedê û melekên xwe silavan li ser pêxamber tînin...” Lêbelê li gorî transkrîbeya latînî, wate di berevajîya wê de ye: “Tû îlah nîne û melekên xwe silavan li ser pêxamber tînin...”

Pîşt re “Bismîlla”ya ku di musulmantîyê de kilîta destpêkirina her karî ye, ku orîjînalê wê ya erebî -kurdîya wê jî bi heman telafuzî ye- bi vî awayî ye: “Bismîllahîrrehmanîrrehîm” (r. 11). Belam transkrîbeya wê ya latînî her wekî telafuz û nivîsîna bi alfabe û zimanê tirkî, wek “Bismillahir-Rahmanir-Rahîm” (r. 10) hatîye nivîsîn.



Osman Esad Efendî, *Mewlido Dimilî* (Zazakî), Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, pûşper 2007 Diyarbekir, 93 rûpel

Bêguman, hema di serê serî de, dema ku meriv bala xwe dide vî karê hanê, tavilê ev qenaet li meriv hasil dibe ku tu ciddîyetek di vê xebatê de nîne! Lêbelê, ev metnên wisa, ji ber ku hem ji alîyê bawermendî û manewîyatê ve û hem jî ji alîyê dîroka wêjeya neteweyî ve, her wiha, ji alîyê manewîyata millî ve qedr û rûmeteke wan a bilind heye û danerê wan jî êdî

ne li vê cîhanê ye, ango ne muqtedîrê parastina berhema xwe ye, lewma jî divêt ew berhema bi vî awayî nehatana çapkirin!

Estûtuya Kurdî ya Amedê piştî ku vê berhema çap kirîye, hingê ji bo danasîna wê li malpera [www.netkurd.com](http://www.netkurd.com)\* derbarê *Mewlîdo Dimilî* de gotarek weşandîye. Hem bi dimilkî û hem jî bi kurmançî ye. Di beşa kurmançî de dibêje, "Wê demê yekê [yekî] bi navê Hecî Êsib Efendî bi Tirkî mewlid nivisandibû lê ji aliyê gelê Suregê (Sêwereg) ve nehatibû ecibandin. Ji ber vê yekê Osman Esad Eefendî biryar dide ku mewlidê bi kurdî binivîsîne." Îcar di beşa dimilkî de dibêje "Vanê ki Hecî Êsib Efendî bi Ziwandê Tirkî ya mewlidêk nuşt, mewlidê cira [ci ra] mileta Sêwregî bol hes kerdo." (Beşa dimilkî li kovara Wî jî weşiyaye)<sup>1</sup> Gelo ev çî ye? "bol hes kerdo" ango "gelek [jê] hes kirine". Lêbelê di ya kurmançî de dibêje "nehatibû ecibandin"!

Di heman metnê de wisa têye gotin, "Li gorî lêkolîn û lêgerînan Mewlîda Osman Esad Efendî, pirtûka yekemîn e ku di Zaravayê Dimilî de hatiye nivisandin." Ev lêkolîn û lêgerînên çî ne? Gelo referansên wan çî bûn? Wan li ser çî lêkolîn û lêgerîn kirine?!...

Dişan di heman vê daxuyanîya ku em behsa wê dikin de dibêjin "Osman Esad Efendî dema ku Mewlîda xwe dinivîsîne nawêşîne û çap nake. Heta

îro jî nehatiye weşandin. Heta niha wekî destnivîs di merasiman de di hate xwendin. Ev mewlid bi alîkariya Mela Nezîrî Suregî [di] sala 1933'yan de digihîje Şamê ber destê Mîr Celaded Bedirxan. Bi navê "Bîyîşa Pêxember", di Hawarê de tê weşandin." Bala xwe bidinê ku ev her du hevok hevûdin derewîn dikin. Pêşî dibêjin "Heta îro jî nehatiye weşandin." Dû re dibêjin, "... Bi navê "Bîyîşa Pêxember", di Hawarê de tê weşandin."<sup>2</sup>

Lêbelê di esase xwe de her du jî ne rast in. Çünke Celadet Bedirxan ne ku di Hawarê de, na, wî vê berhema hanê bi navê *Bîyîşa Bêxember* di sala 1933 de li Şamê bi hejmar 4. ji Kitêbxana Hawarê weşandîye ku 46 rûpel e. Ev berhema hanê niha mewcûd e. Her wiha, ew metna orijînal û metna ku niha ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hatiya çapkirin qet hev nagra. Bo numûne, di metna orijînal de pêşeke kurt ya ku ji 3 beytan pêktê heye û dû re beşa hikayetê dest pê dike lê di vê metna nuh de pêşek gelek dirêj e, ji 9 beytan pêktê û qet hev nagra. Îcar piştî ku hikaye dest pêdike, her pênc beyt di metna orijînal de wisan in:

*Jew hikayet qal keran to rê bira /  
Qedrê mewlûdî bizan ti ci ra  
Sûka Bexdadî mîyan di bî cenîn /  
Zeydê cê nêdîbî kes erbabê dîn  
Lajekêndo salih û hol yeqîn /  
Ay cenî rê dabi Rebilalemîn  
A cenîk merd û lajek bi warisey /  
Çaxo may merd mend altûnê cey*

<sup>1</sup> Pr. Mehmet Guzeler, "Ustadek û Berhemek: Osman Esad Efendî û Mewlidê Ciyo Dimilî" W: Kovara Wêjeyî Çandî Hunerî, Hejmar 15, Amed Tîrmeh-Gelawêj 2007, r. 64

<sup>2</sup> <http://www.netkurd.com/nuce.asp?id=7855>

Labelê vatên bi nê çi çi bira /  
Ez birînan şaş bîya ya Rebena<sup>3</sup>

Îcar di metna ku niha çap bûye de her pênc beytên pêşin wisan in:

*Jew hîkayet qalkeran to rê bira /  
Qedre mewlîdî bizanê ti cira  
Sûka Bexdadî mîyandi jew cenî /  
Zeydê ay nîyame bi kes erbabê dînî  
Da bî a cenî rê Rebbil - Alemîn /  
Lacekên do Salih o ehlo yeqîn  
Çaxo may merd mend'i bî altûn'nên di cey/  
Lacekî altûn girot bî warişey  
La belê şaş bîn biney çi çi bikeran /  
Ez berînan şaş bîya ya Rebena  
(r. 14-16)*

Her wekî ku dixuye, di navbera her du metnan de cihêtiyên gelek grîng hene. Heta ku di heceyan de jî şaşî hene. Bo numûne, digel ku rêzên din 11 hece ne lê di metna nuh de rêzên “Zeydê ay nîyame bi kes erbabê dînî” û “Çaxo may merd mend'i bî altûn'nên di cey” 12 hece ne. Ji vê çendê meriv guman pê dibe ku, îhtîmaleke mezin ev metna nuh ne sehîh e, angû ne ya Usman Efendiyo Babijî ye.

Ev versiyon an jî metna ku niha em qala wê dikin, angû *Mewlîdo Dimilî* 93 rûpel e, di pûşpera (hezîran) 2007 de li Dîyarbekir çap bûye. Têvayî nivîsan hem bi alfabeya erebî (lugata kurdî) û hem jî bi alfabeya latînî (alfabeya C. Bedirxanî) hatine nivîsîn. Piştî pêşkekek bi sernavê “Osman Esad Efendî Kam o?” ku têde behsa Usman Efendiyo Babijî û nivîsîna wê berhe-

mê dikin, dû re beşa mewlûdê dest pê dike. Li ser berga pirtûgê “Arêkerdiş: Mila Selîm ACARLAR - Av. Mehmet GUZELLER” hatiye nivîsîn. Herçendî di beşa “Osman Esad Efendî Kam o?” de kovara *Hawar*, hejmar 23 û hindê kitêbên tirkî ku navê wan bo dimilkî hatiye wergerandin, wek referans didine nîşan û dibêjin, “... Bi wasite dê [wasitedê] Mila Nezîrî Suregî jî [Suregîjî] serra 1933'di Şam di bi terefê Mîr Celaded Bedîrxan [Celadet Bedirxanî] bi name dê [namedê] Bîyîşa Pêxember, kitabaxana *Hawarî* di neşr bîyo” jî lêbelê tu agahîyek nadin ku gelo wan ev berhema hanê jî ber nuxweya ku Celadet Bedirxanî çap kirîye hildane yan jî dereke din *arê* kirine (berhev kirine). Di kovara *Hawarê* hejmara 23 de gotareke dirêj ya Celadet Bedirxanî derbarê dîyalekta dimilkî de heye û behsa çîroka çapkirina *Bîyîşa Pêxember* a Usman Efendî dike. C. Bedirxan di dawîya gotara xwe de wisa dibêje:

“... Paş ko min mewlûd û ev benda ha nivîsandin herdu şanî birayê Şêxê rehînetî Şêx Evdîrehîm efendî dan. Hingê ewî ji min re got ko ji wê mewlûdê pê ve mewlûdeke din jî bi zarê dumilî hatiye çêkirin û bi ser xist: “Li gora ko di bîra min de maye ji wê dirêjtir bû û ne bi şewa Sêwrekê lê bi ya Pêçarê bû. Yekî bi navê Ehmedê Xassî çêkiribû”.

Lê Mela Nezîr ko ji dumiliya Sêwrekê pê ve dumiliyê naçibînit dibêje: “Belê Ehmedê Xassî jî mewlûdek çêkiriye û ew mewlûd gihaye Sêwrekê jî. Min ew dîtiye. Hima sê çar pelik bûn. Ji pirsên kur-

<sup>3</sup> Babij, Usman Efendî, *Bîyîşa Pêxemberî*, Kitabxana *Hawarê*, Hej. 4, 1933 Şam, r. 20-21

dmanciyê tijî bû. Lê piştî ko Mewlûda 'Usman Efendî derket ew betal bû" Lê ji ber ko min dil nîne ez wê betal bikim ji xwendevanan hêvî dikim heke pê dizanin û dikarin peyda bikin nivîşteke wê ji min re verêkin da ko ez wê jî bêxim çapê."<sup>4</sup>

Ê de baş e. Meriv çawan kovara *Hawar* hejmara 23. wek referans nîşan dide û çawan radibe dibêje "Li gorî lêkolîn û lêgerînan Mewlûda Osman Esad Efendî, pirtûka yekemîn e ku di Zaravayê Dimilî de hatiye nivisandin." Meriv ji xwe re heyirî dimîne! Îhtîmaleke mezin, tenê pê hesiyane ku li hejmara 23. a kovara *Hawarê* hindêk tişt derbarê wê berhemê de heye, lê wan bi xwe kovar nedîtiye.

Her wiha, tu agahdariyek an jî malumatek ku bi xwendevan bide têgihaştin, bê hela van kesan wê metna hanê ji devê kê (bi devkî an destnivîskî?), çawan, li kû, bi çi awayî, bi kîjan metodê arê kirine jî nîne. Heke li şkeftê, di haletê silûgê de wek wehyeke îlahî ji asîmanan bo wan nazil bûbe jî, dîsan diviya bû ku ev yek bihatana beyankirin. Heke wan bi xwe bîr bi wê yekê nebirîye, diviya bû ku amadekar bi xwe, ew amadekarê ku berpirsîyarê *enstîtuyekê* ye, wê yekê ji wan pirsîyar bikira. Heke amadekar/berpirsîyarê weşanê bîr bi tişteke wisan nebirîye, hingê ew sazîya ku bi komîsyana xwe biryara çapkirina wê berhemê daye û çap kirîye, wek pêdivîyeke zarûrî ya kar û barên weşange-

rîyê û ji bo silametiya sehîhbûna naveroka enstîtubûnê û ya wê metnê, diviyabû ku doza wê yekê li wan bikira. Dê bi vî awayî wê sazîyê 'sehîhbûn' û 'ciddîyet' û 'zanistî'bûna xwe bo me nîşan bidana! Ji wê çendê meriv digihe wê qenactê ku, tu derdekî zanistî/ilmî li meydanê nîne. Tenê ixtîraseke bêfesal! Bila bête dîtin ku em kar dikin. Hem jî karekî gelek girîng! Ev e, me *yekemîn metna dimilkî* ji tarîtiya dîrokê deranî û bo neteweya kurd pêşkêş kir: "Mewlidî Osman Esad Efendî, di ziwanê dimilî [dimilkî] di kitabo siftekêno [siftekên o]. Verdê ney qet kitabê di [bi] Ziwanê Dimilîya [ziwanê dimilkî ya] yazî nê bîyo, nê dîneyayo. Qandê ci jî no mewlid bol mihîm o." (r. 8)\*\* Û di wê daxuyanîya ku li malpera [www.netkurd.com](http://www.netkurd.com) weşîyaye de jî dibêjin, "Heta dema ku Osman Esad Efendî wê nivisandîye tu pirtûk bi zaravayê Dimilî nehatine nivisandin."


Gelo çima metna *siftekên* [yewin]/*yekemîn*?

Ma ji *yekemînîyê* pêştir prestîjeke bala heye?! Ewê *yekemîn* -her kî be, di çi warî de be, yan jî te divê bila berhemê gelek lawaz be jî- her tim dibe pêşengê peyrewên xwe. Ew kar her û her êdî li ser navê wî tîye qalkirin. Di serîya kanonê de, li ser textê xwe yê zîvîn rûdine û taca zêrîn her li serî ye. Îcar ewên ku dû re hatibin, te divê

<sup>4</sup> Bedirxan, Celadet "Zarê Dumilî Û Mewlûda 'Usman Efendî" *Hawar*, Hej: 23, 16 tîrmeh 1933 Şam (Cilda yekem a *Hawarê*, Weşanên Nûdem, r. 603-608

\*\* Li vira xeletiyên rastnivîsinê ne têde, gelo min meraq kir, çima li ciyek ibareya "ziwanê dimilî" bi herfên piçûk hatiye nivîsin û çima dû re wek "Ziwanê Dimilîya" bi herfên mezin hatiye nivîsin? Gelo li gorî amadekaran; li gorî Enstîtuyê kîjan standard e, kîjan rast e?

bila şaheserên cîhanê bin jî, di bin sîya yê yekemîn de dimînin. Piştî ku ew wisan e, ewên ku wê berhema yekemîn arê kiribin, ewê ku *Tîprêziya Erebişkerdiş* [Tîprêziya Erebkî] û *Berg & Rûpelsazî* kiribe, her wiha, ligel vana ew sazîya ku biryara weşandina vê berhema hanê daye, mohra xwe li ser xistiye, bi hêza xwe ya maddî çap kirîye û belav dike, belê, tev dibin şîrîkên vê yekemîniyê. Ma gelo bidestxistina rûmeteke wisan di dîrokê de bûye qismetê çend kesan an çend sazîyan?!



Rûpela pêşî ji *Mewluda Kirdkî* ya Seydayê Xasî (Xasî, Seyda, *Mewludê Kirdkî*, Çapxaneyê Litografya, 1899 Dîyarbekir)

Lê mixabin, ku *mewluda Usman*

Efendîyo Babijî *di ziwanê dimilî* [dimilî] *di qet jî ne kitabo siftekên e*. Em baş dizanin ku berîya wî li roja 25 adar 1899, li Dîyarbekir, li Çapxaneyê Litografyayê, bi alfabeya erebî 400 nusxeyên *Mewlidê Kirdkî* yê Seydayê Xasî li çapê ketine. *Mewludê Kirdkî* 16 beş û 756 rêzik e, her rêzik 11 kîte ye. Ev mêjûya çapkirina wê ye, bêguman, mêjûya nivîsîna wê hê pêştir e. *Mewludê Kirdkî* cara pêşî ji aliyê M. Malmîsanijî ve ji alfabeya erebî transkrîbeyî alfabeya latînî bûye û li

Ewropayê hatiye weşandin.<sup>5</sup>

Pişt re ji aliyê Mihañî Licokicî ve bo alfabeya latînî hatiye transkrîbekirin û di sala 1994 de li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneyê Fîratî ve ji nû ve çap bûye.<sup>6</sup>

Seydayê Xasî muftiyê Licê ye, Usman Efendîyo Babijî muftiyê Sêwregê ye. Di navbera Licê û Sêwregê de bi siwarî

<sup>5</sup> Espar, J. Îhsan "Çend Nuştay û Kitabê Kirdkî" *Zend*: Kovara Lêkolînê, Hejmar: 1, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Payîz-1996 Stenbol, r.44-48 / Malmîsanij, "Ehmedê Xasî, "Mewlidê Nebî", *Hêvî*: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 4, Êlon-1985 Parîs, r. 75-97 / Malmîsanij, "Destpêka Edebiyata Kîrmanckî (Zazakî)" *Gotarên Konferansa Edebiyata Rojhilata Navîn û Pîrçandîyê*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Sermawez-2004 Stenbol, r. 39-43 / Babij, Usman Efendî, *Biya Pêxemberî* (Mewlûda Nebî), 1933 Şam / Bedirxan, Celadet, "Zarê Dimilî û Mewlûda Usman Efendî", *Hêvî*: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 2, Gulan-1985 Parîs, r. 10 / Roşan

Lezgîn, *Bîr*, Kovara Lêgerîn û Lêkolînê, Hejmar 4., Zivistan-Bihar 2006 Dîyarbekir, r. 195-200 / <http://www.peyamaazadi.org/modules.php?name=News2&file=article&sid=2397>

<sup>6</sup> Xasî, Seydayê Mela Ehmed, *Mewludê Kirdkî* (Transkrîbekerdîş: Mihañî Licokicî), Weşanxaneyê Fîrat, 1994 Stenbol



qonaxek rê, bi lingan du qonax rê heye. Her du jî hevçerxê hevdu ne; hempîşe ne. Ne mumkûn e ku Usman Efendîyo Babijî ji berhema Seydayê Xasî bêxeber be. Lewre jî, min ew bawerî qet nîne ku Usman Efendîyo Babijî bi xwe îddîa kiribe ku berhema wî *yekemîn berhema bi ziwanê dimilkî* be. Lê kesên navborî ligel vê îddîaya xwe ya bêmesnet ruhê Usman Efendîyo Babijî rencide kirin. Her wiha, bi vê îddîaya ku bîyî tu *lêkolîn û lêgerînan* (!) ku wan ji kîsê xwe derxistîye, webala nivîskarê yekemîn berhema kurdîya zazakî (kirdkî/dimilkî/kirmanckî) ku bi destê kurdekî zaza hatiye nivîsîn jî, ango wan webala Seydayê Xasî jî xistîye stûyê xwe. Divê li vira ez agahîyeke din jî bidim ku, ji berîya Seydayê Xasî jî berhemek bi dimilkî hatiye nivîsîn. Lê nivîskarê wê berhemê ne kurd e, Lê nivîskarê wê berhemê ne kurd e, Peter I. Lerch e ku camêrekî rûs e. Ev berhem di sala 1858 de li St. Petersburgê ji devê hindêk kurdên zaza (Ji Nêrîba Hênê ya bi ser Dîyarbekirê ve) ku di şerê Qirimê de wek dîl ketine destê artêşa Rûsyaya Qeyser, hatiye nivîsîn.<sup>7</sup>

Mewlido Dimilî, di her du lugatan (erebî û latînî) de jî seranser ji her alîyan ve tevlihevî, xeletî şaşî tije ne û li gelekê ciyan qet hev nagrin. Lugata

erebî tiştekek dibêje, ya latînî tiştekekî din dibêje. Bo numûne, bi lugata erebî wiha têye gotin: "Çaxo aya bî, eribna yow beran (Çaxa hîşyar bû, beranek kirrî)" (r. 19) lê di muadileya wî ya transkrîbeyaya latînî de dibêje "Çaxo aya bî erênayo beran (Çaxa hîşyar bû kirrîye beran)" (r. 18).

Di dîyalekta dimilkî de li hindêk devokan îzafeya aîdîyetê (bi tirkî: iye-lik eki) "de", "dê" yan "do" ye. Bo numûne, "nurdê xo, koşeyêdo berz, guneyandê xo, girwedo rengîn û hwd." Heta ku li dîyalekta kurmançî jî li hindêk devokan ev dengê "d" her bi vî awayî heye. Bo numûne, "malêd me, bavêd min, pezêd we..." Lê li hindêk devokan yan dengê "d" nîn e, yan jî jê ketîye, tenê dengê "ê" yan jî "o, ko, yo" heye. Her wekî "nûrê xo, koşeyêko berz, guneyanê xo, girweyo rengîn û hwd." Di hemî dîyalektên kurdî de ev îzafe bi peyvê ve têye nivîsîn. Îcar çî dema ku ev îzafe ji peyvê cihê, bi tena serê xwe bête nivîsîn, hingê dibe edata dema pêş "ê, dê, do" yan jî tu wateyek têde namîne. Di Mewlido Dimilî de hema bibêjin tevayî îzafeyên aîdîyetîyê yên wek "ê", "dê", "do" ji peyvê cihê, bi tena serê xwe hatine nivîsîn. Çend numûne: "Goş ê xo ..." (r. 26), "... girwe do rengîn" (r. 10) "Lacekên do Salih ..." (r. 16), "... koşeyên'do berz ..." (r. 18). Ev seranser wisan e. Lê hindêk îzafeyên aîdîyetê jî kirine edata hevgi-hanekê. Bo numûne, bi lugata erebî dibêje "Wa bêro, no qesro alî cayê ey" (r. 19) lê di transkrîbeyaya latînî de dibêje "Wa bêro no qesr û alî cayê ey" (r. 18).

<sup>7</sup> Malmîsanij, "Arêkerdax: Peter İvanović Lerch, "Qewxê Nêrib û Sîwanî" *Hêvî*: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 3, Sibat-1985 Paris, r. 109-111 / Malmîsanij, "Arêkerdax: Peter İvanović Lerch, "Qewxê Nêrib û Hênî" *Hêvî*: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 5, Gulan-1986 Paris, r. 88-91 / Malmîsanij, "Arêkerdax: Peter İvanović Lerch, "Çend Tekstê Dimilkî (Zazakî)" *Hêvî*: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 6, Tebax-1987 Paris, r. 69-79

Li hindek cîyan peyvên ku di lugata erebî de hene, di tarnskirîbeya latînî de nehatine nivîsîn. Bo numûne, “Va, min zerrî kerd şîra ey koşkî mîyan” (r. 19) lê di traskirîbeya latînî de dibêje “Va min zerrî kerd şîra koşkî mîyan” (r. 18). Her wiha, di lugata erebî de dibêje “Wanîyan cayêndê [cayên di] mewlid, ti ame raşt” (r. 17) lê di transkrîbeya latînî de dibêje “Wanîyan cayêndê mewlid ame raşt” (r. 16). Heke ev “ti; tu (bi tirkî: sen)” ya di nav hevokê de jê derkeve, wate dikare ji binî ve biguhere.

Zemîrê kesê yekem ku li dîyalekta dimilî wek “xo” têye gotin û di *Mewlîdo Dimilî* de jî bi lugata erebî her “xo” hatîye nivîsîn lê di transkrîbeya latînî de hem wek “xo” (r. 14) hatîye nivîsîn lê li gelek cîyan wek “xwi” (r. 22 û yên din) yan jî wek “xwe” (r. 6) hatîye nivîsîn.

Bi lugata erebî gihaneka “çunke” wek “çunki” hatîye nivîsîn lê di transkrîbeyê de gelekê wan wek telfuza tirkî bûne “çunku” (r. 22 û yên din).

Qertaflêker, hema bibêjin ku seranser bi bêjeyê ve hatîye nivîsîn. Bo numûne, “Ki ti zanî ki no dinya senîno / Bizani a dinî cayê ciwênîyo” (r. 12) Li gorî rastnivîsînê divê wiha be: “Ki ti zanî ki no dinya senîn o / Bizani, a dinê cayê ciwênî yo” (Ku ti dizanî ev dinya çawan e / Bizane, ya din cihê benderê ye).

Sufîks û perfîksên karan (fiil) bi giştî ji hev cihê hatine nivîsîn. Çend mînak: “Da bî [Dabî] a cenî rê...” (r. 16), “Kesî ferq nê kerdo [nêkerdo]...” (r. 20), “Bi bî [Bibi] cennet mesken...” (r. 24), “Beado Hewa bî bî [bîbî] peyda ame rew” (r. 26)

Hema bibêjin ku gelekê zemîr û gihanek û qertaf û sufîks û prefîks xelet hatine nivîsîn; cihê ku divêt bi peyvê ve bin, cihê nivîsîne, lê cihê ku divêt cihê bin, îcar wan bi peyvê ve nivîsîne. Bo numûne: “Goş ê [Go?ê] xwi [xo] ser-nê [ser nê] cema'at Rebbêma [Rebbê ma]” (r. 26), “Kam ki adirîra [adirî ra] xelas xorê [xo rê] waşt” (r. 32)

Li gelek cîyan heman peyv bi çend awayan hatîye nivîsîn. Bo numûne: “xwe” (r. 6) “xwi” (r. 10) “xo” (r. 14), “Qur'a” “qur'e” (r. 30), “Çunku” “çunki” (r. 62) “Ummehani” (r. 66) “Ummahani” (r. 82) û gelekê din.

Pîten ku ji alfabeya tirkî hatine karandin. Bo numûne: “Hec Eyyûb Efendî Müftiyê keanîyê Suregî yo” (r. 6), “Berddî ersî ser dî rona o nebî” (r. 78)

